
FÊRÎKÊ ÛSIV

# BIJARE



**FÊRÎKÊ ÛSIV**
**1934 - 1997**

ՖԵՐԻԿԵ ՈՒՍԸՎ

# ՀԱՏԸՆՏԻՐ

Երևան
«Լեգալ Պլյուս» հրատարակչություն
2010

**FÊRÎKÊ ÛSIV**

# B I J A R E

Yêrêvan
Weşanxana "Lêgal Plyûs"
2010

ՀՏԴ 891.5-1 Ֆերիկե
ԳՄԴ 84.5 Քրդ
Ֆ 474

Ֆ 474 Ֆերիկե Ուսըվ
Հատընտիր Ուսըվ Ֆերիկե.-եր.:
Լեգալ Պլյուս, 2010.-350էջ:

Helbest bi teherê xronolojî, yanê bi hesabhildana wedê nivîsara wan cîwar bûne

ՀՏԴ 891.5-1 Ֆերիկե
ԳՄԴ 84.5 Քրդ

ISBN 978-9939-815-28-2

## GULÎZERA MIN

Gulîzerê, dengê te tê ji êla dûr, wa bi kurdî,
Kubira delal, seda şîrin ez helandim li vî erdî,

Seda te tê, gendî mîna deng û seda gozel kewê,
Dengê te bye teyredeke - perwaze li nava hewê.

Dengê te tê, dixulxule mîna avek kaniya zelal,
Hezar-hezar kurdê cahil li te mane heyr û metal.

Gulîzerê, tu dibêjî: “Hergê dila dil hebandiye”...
Tu çi zanî, te li vira dilek ser xwe nehelandiye...

Gulîzerê, tu li wira distirêyî: “yar gul, yar gul...”
Tu çi zanî yek li vira ser te nebûye şarur-bilbil.

Gulîzerê, ez heyrana seda şîrin, te wî dengî,
Dengê teyî ezîz şede, ez li ser te bûme bengî...

## QAZÊ

Bedewê, rindê, qîza kurd Qazê,
Dev û lêvê te gulê Şîrazê:
Hîva çardeşev-eniya te kever,
Gaz-gerdenê te mînanî mermer:

Biruyê te mîna baskê reşêla,
Çevêd te gendî çevêd xezala:
Sûrtêd te sorîn-hevêd hinarê,
Bejn û bala te dara çînarê:

Xeberdana te şekirê nevate,
Ramûsana te avliheyate:
Bedewê, rindê, qîza kurd Qazê,
Tu gulek gula vê Elegezê.

## GOZEL

Sîng û berê kew-gozelê Elegeze,
Vê biharê wê xemilye rez bi reze:

Memikê yarê ser bedenê cot kanîne,
Xalêd sûret mîna konê kurmancîne.

Guliyê yarê mîna cewê der biharê
Hev girtine, fitil-fitil têne xarê.

Ezî li ser kaw-kubarê bengiyê xefûr,
Min da desta û lîlandin sîmê tembûr,

Min go:-Yarê, tembûr destê minda helya,
Were lawikê xwe keremke cotê guliya...

Go:- Beytûyo, porr û guliyê min qumaşin,
Yêngê mîna te bêsewda û bêhişin:

Sîng û berê min zozane, ez çevreşim,
Ne ya teme, para lawikê xwe keleşim...

Got, berzeqê û bi avir min nihêrî,
Avirê wê min bûn mîna kêr û dirî...

Cotê guliya bûn cote mer û min venîn,
Sazê min ket, tilî-pêçiyê min lerizîn...

Mêrg û geliyê Elegezê girtin dûman,
Nizam çira gelo bihar bû zivistan...

***

Zeriyê zenda zer hildaye ta enîşkê,
Raser hatye, dibişêve serê keşkê...
Ew keşk nîne, reben dilê mine, yazix,
Ji dest huba wê dihele, usa dişkê...

***

Xwezil, xwezil, ya min biyayî,
Xwezila bûka diya min biyayî,
Te çok veda ber pîngê wê,
Serî bida ser sîngê wê,
Porr û guliyê xwe reş berda,
Diya min porê te vegirta,

Û min destê wêyî çira
Li ser porê te paç kira...

***

Ez bûm kanî, jorda hatim,
Ber bi baxçê te xulxulîm,
Sura dilê te da ser min,
Ax nîvê rê ez cemidîm.

***

Lawikê min çû, bû xwendekar,
Berbi gundê me nayê,
Yara xwe hişt, çara xwe hişt,
Bîrkir sozê dinyayê.

Şeherlûke tîtik-mîtik
Qey muhbeta wî kirî,
Dilê lawikê min bû kevir,
Çerxa min çep zivirî.

Ez çi bikim bejina bilind,
Xirxê xweyî reng-rengî,
Gava lawikê minî ezîz
Ser şeherlûyê bû bengî...

Hergê bêjim: "Were, lawik,
Ez xezala serê çiya",
Ax wê bêje: "Şeherlûya min
Kew-gozela nav baxça".

Hergê bêjim: "Were, lawik,
Ez sosinim, gula reng",
Ax wê bêje: "Barişna min
Hewirmişa al-fireng"...

Wekî bêjim: "Ezê tera
Çêkim berr û xalîça",
Wê bê: "Dosta min dizane
Nexş-nîgarê şah, padişa".

Min rebenê, hergê bêjim:
" Ez xanimeke cindî",
Heqî-heqiyê wê bê:
"Dostê prafesor û xwendî..."

Na gidîno, qesem-qirar,
Xwendikarî bûye dem,
Ezê hildim qey xatira
Defter, kaxwez û qelem...

## PAMPA MIN

Pampa mine baş, Pampa min kubar
Wê pal vedaye wan quntarê sar,
Pamp mîna bûka, bûka xeml lê bend,
Dorê çiyayêd me girtine govend...

Çiyayêd me bilind, çiyayêd me kubar
Jê dixulxulin cew û kaniyê sar,
Şimalê mij tê mîna karvana
Ser çiyayê mera diçe arana.

Êvarê bi hewas mij guje-guje,
Û nav mijêda Pamp dihênije...
Pampa mine sar-gulistan Şîraz,
Min jê baq kirin gulêd xweye xas...

Ax, çiqa dixast min hezar guman,
Ku wextê mirin min bibe mêvan,
Cimeta min meytêm şahîrî
Çelbike serê çiyayê Dibûrî...

Ku mija Pampê mîna karivana
Bê û ser minra here arana-
Bîna gulê min,huba dilê min,
Huba dilê min, derd û kulê min
Bibe arana,
Bibe arana,
Bibe arana,
Qurn û dewrana...

## DENGÊ ŞERO

Dengê Şero perweze bû li van kona, şên û dûza,
Go: "Hekîmo,malhemekê, pêşkêşa te memikê qîza".

Agir girte dilê xorta, van cahila, van tunsiza,
Feqiyê Teyra tirbê rabû û Dîlbera xwe ramûsa...

Dengê Şero kire zingîn, çû gihîşte erşê ezmîn.
Ji hewas û hijmekariyê cî lerizîn pêvir û mêzîn,

Berfa heçê Elegezê- ku hê nediye bahar, havîn,
Te go, helya û jorda hat, çem û cewa kire xulîn...

Pîrê diha li dev gorê, bi rû-hedem kalê zemîn,-
Dilê wan jî tev hevdu bû û evîntiya xwe bîr anîn...

Dengê Şero, te go, gihîşt heylo Sîpan û Cizîrê:
Rabûn hevra kirin sowbet Mem û Zînê ji kibîrê...

Te go, Xecê rabû û got: "Siyabend, rabe, hatiye bahar...
Dengek pêra ji wêda tê, ez mam hewas û hijmekar.

Dibê: "Hekîm, hey hekîmo, dû-dermanê xwe tu hilde"...
Rabe Sîyabend, belkî hekîm bicebirîne birînê te...

Kubra Şero perweze bû li van kona, şên û dûza,
Bengî Fêrîk bû sewdeser, hilda hezar hub û mûsa,

Go: "Bistirê, Şero, bira, dilê min bû kûra êgir,
Ez têr nabim kilamê te, ku helandin berê kêvir..."

***

Adar go: - Dilê min mêrg û zevî,
Xezalê, canê, kuda direvî...
Hergê bilbilî, ez – gula kezî,
Gulê dihêlî, kuda dibezî...

Xezal zivirî dêmê hewasî,
Şibêta horiyê min kire nazî,
Go: - Adar, dilê min bête-bête,
Wele ditirsim ba-bagerê te.

Min go: - Xezalê,- min go, - delalê,
Ez heyrana te, wê galegalê,
Were netirse bayê adarê:
Pey adarê tên gulêd baharê.

***

Agirê hubê ez kirim bilbilê te,
Hêsirê min cew, kişyane ser gulê te,
Ax cemidîn, ax nîvê rê bûne bûz
Ji dest seqem, surr û serma dilê te.

## WERE, KAW- KUBARA MIN

Were, kaw-kubara min, çevê min rê qerimî,
Îlaca min, çara min, eşq û şayî herimî:

Ragire rext û riştê xwe, dakeve nav meydanê,
Ez xefûrê bengzê te- bîr nakim te terlanê.

Bengzê teyî nûr neder min bûye bîrî, mitale,
Emir min bûye tengezar, halê min bê pergale,

Rewşa dilê minî tu, dil bêyî te bêçare,
Derdê giran bûye edû, wehîdî pir xedere.

Pirsa yartiyê, evîntiyê xorta, dota hevra dan,
Te da derdê muhbetiyê, çevê min li riya te man.

Aliyê şênê gundê me def û dewat gimîne,
Nakim kêfê bêyî te, dewat li ber min şîne:

Arzî yara min tune, pormijîme ber deriya,
Miştin zeriyê dest hine, çî min û çî van zerya?

Unda nakim kubira te, ez rojîme, tu-fitar,
Nebe xewn û mitale, were, kawa min kubar.

## ÊVARA ADARÊ

Êvara adarê
Qarxûn tê xarê
Û dike xuşîn...

Hewa çîk saye,
Steyrika penc daye
Li ser rûyê ezmîn...

Li jor tê xanê
Steyrika mêzînê
Û rêça kadiz.
Li ser milê çiya –
Belekiyê berfa
Û hewa temiz...

Û ji dûrecî
Rûviyê qolincî
Dike waqînî...
Tê ji kuleka
Dengê çêleka
Û golikê virnî...

Û li ser darê
Pûpiyê biharê
Distirê – tû, tî...
Selam te tebyet,
Selam te tebyet,
Cineta rastî...

***

Agir barî mêrg-beyare,
Bûn kerkong û rijik:
Bilbil baxê min ne yare,
Li dewsê ma qijik...

Çi bêhedin gunê xelqê:
Yara mine ziyaret,
Dewsa nemerd bike delkê,
Min dide cizaret:

Nade dest min soz û gilî:
Dilkê minda-eman,
Baxçê minî gulî-milî
Dibe toz û dûxan...

Ezê herim-ziyaretvanim-
Ber bi ezîz yarê,
Wele, wêra ez qurbanim-
Li dest-piya bêm xarê.

Bera mîna berxa qurban
Ber şerjê bim yekcar,
Tek rema wê bive baran
Xûna minra bê xar.

## EZ Û CIMET

Ez û cimet-
A eve muhbet,
Kilam, şiyêr û saz,
Hunur û hewas.
Ez xezaleke tî li çiya-baniya,-
Cimeta min – ava ser kaniya,
Ez cûcika fira, cûcika kewa,-
Cimet minra per-bask û hewa.
Ez moza hingiv, moza nav şana,-
Cimet gula nava kewşena.
Ez mesiyê avê, cimeta min –ber,
Ew okiyana kûr, qayîkim li ser.
Ez keskesora li pey baranê,-
Cimet roj û teva aranê.
Ez steyrikim, steyreke geş,-
Cimeta min- min ezman û erş.
Helbestvanim ez, siyarê Pêgas,
Cimet minra - meydan û Parnas.
Ez û cimet-
A eve muhbet,
Kilam, şiyêr û saz,
Hunur û hewas.

## GUNDÊ MIN

Wetenê min best-beyare,
Ez kevotka firra,
Gundê min cî û sitare

Û hêlûne minra.

Weten heqiyê jî dewate,
Ez – zevangê terr-can,
Gund dergîstiya min şurete
Nav dewata giran...

## DI NAV KOMA QEWIM Û BIRA

Gundê Pampê dewat gendî,
Ez lê teglîf, ez lê xwendî.
Di nav koma qewim û biran
Min wergirtye xemla giran:

Li bejina min çuxê kurda,
Kembera zîv, qayîş serda.
Ber- pêsîrê min nitirî,
Papaxê reş yan qotkirî,

Kihêlê min Pêgasê dîn,
Min lê şdandye û teng û zîn:
Rext û rismê wî neh mûsa,
Meydan ketye rast û dûza.

Sazbend Şamil lêdixe "cirîd",
Li min vebûye bend û şirît,
Li ser pişta kihêl Pêgas
Xweş hêl dibim ber bi Parnas.

***

Qemerdax çiyakî ji van bilinda,
Şaxê me li ber – nolanî kunda,
Lê gava ro ket pişta vî kundî,
Qemerdax li ber siya wî bû unda...

***

Ezê rabim mîna Mîrmih, mîna sofiyê Bexdayê,
Yêr-yêrinde dewremîş bim her çar qulbê dinyayê,

Mirin heye, bona meye, ciyê bê mirin nagerim,
Ezê hildim tembûrê xwe pey evîntya dil herim.

Belkî heta mifriq-mişriq, heta "mala felekê",
Ji bona xwe maşoqê dîn peydakim kar –xezalekê...

... Ax, ditirsim mîna Mîrmih emirê min here bêxeda,
Yanga dilê min dixweze, bîter nebe tu erda...

## ZERÊ – ZORO

Hildigirim
Herdu sosin û gulê xwe,
Didim ser sîng û dilê xwe,
Ez ku mirim...cinyazê min
Herduyê bidin ser milê xwe?

***

Ava gurr tê devê bendê,
Li ser erqa belav dibe,
Delav dertê ji wê hindê,
Diçe kêmav, zirav dibe,
Baqê gula ji ser mila
Tê, yeko-yek me par dibe,
Li ser beden, hezar dila
Kêm rewiş û bîn, dîndar dibe.

Ardû-agir di nav kûrê
Ji hev hiltê, bela dibe,
Nade şemal, nade nûrê,
Bê pêlasû, alav dibe...

Lê hizkirina dê û bavê...
Weke çemê ser delavê,
Weke mêrga gul di navê,
Çiqa ewleda par dibe –
Ne kêm dibe, ne jar dibe...

## MÎNA ÇEM

Mîna çem, mîna çem
Her wexta û her dem
Fikira min dikişe
Û dike leme-lem.
Carna tê cîkî rast,
Cîkî dûz kûr dibe,
Û bi nerm, bi hewas,
Hemdê xwe fûr dide...
Carna tê ciyê kevir,
Ciyê xişir
Û zinar,
Dixuşe,
Diqûje,
Û dike zare-zar.
Carna tê dewlê kûr,
Lê dibe gêjgerîng,
Xwexwe xwe vedipû
Û dide defa sîng.
Carna tê li bendê,
Ciyê hasê gol dibe,
Dicive wê hindê,
Hev digire bol dibe,
Lê nake leme-lem...
Ez hingê ditirsim,
Dilê min dibe xem,
Xwexwe xwe dipirsim:
"Ax dibe binice
Çemê min van dera
Û neçe, neghîje
Tu okiyan û bera..."

...Lê car din av hiltê,
Av hiltê, ava gurr,
Tîş dike wê bendê,
Bend dibe lê buhur.
Û dîsa dikişe
Û dike fûre-fûr,

Dikişe û diçe
Rastêd kûr, warêd dûr...

Mîna çem, mîna çem
Her wexta û her dem
Fikira min dikişe
Û dike leme-lem.

**BONA BÎRANÎNA ETEME REHMETÎ**

Kurr dikşîne nefesê,
Ruh hatiye ber qefesê,
Lê teyîsye reng û rû,
Dê nagirî, xwe venarû.

Bigrî – kurê bitirse,
Negirî – ax dil diquse...
Bûye rûnê ser sêlê,
Hê nehele qertelê?

Kurr dinhêre çevê dê:
"Min sar bûne dest û pê,
Çira nagriyî, dayê can,
Bigirî, bigirî, binele,
Ez jî zanim, xayê can,
Ya min boş û betale"...

***

Dîsa were yar keçikê, min bi evîn û surr bike,
Hubê bike liva pîçkê, agirê dilê min gurr bike.

Tengezerim, hesera teng li min pêge, buhurr bike,
Cahiltiya min min têke beng, xewn û mitala pirr bike.

Cahiltiya min ji dest min çû, ez bûm dîlê te, nederê,
Neder jî çû, ev kula han li min hate miyaserê:

Birîndarim, muhbet sebeb, lê bê evîn – ezî bêçar,
Were kawê, belkî baskê cahiltiya min neêne xar.

Heyat xweşe, ezî – tûnsiz, yazixe derd bibe qeda,
Emirê minî terrî cahil here deya û bêxeda.

Were, were, yar keçikê, min bi evîn û surr bike,
Hubê bike ba û birûsk, agirê dilê min gurr bike.

***

Ew porê te reş,
Ew enya te geş
Çawa hevdu tên!

Ew çevêd belek,
Ew qaşêd xeleq
Çawa hevdu tên!

Ew dêmê gulav,
Ew lêvêd alav
Çawa hevdu tên!

Ew çena te kurr,
Ew gerdena durr
Çawa hevdu tên!
Ew bedena ber,
Cot hinarêd ser
Çawa hevdu tên!

Ew bejina şitaf,
Navkêlka zirav
Çawa hevdu tên!

Û ew bejin û bal,
Ew kubira delal
Çawa hevdu tên!..

Ew sewdê min feş,
Dilê min serxweş
Çawa hevdû tên...

***

Cahiltiya min bû xezaleke kûvî,
Min zeft nekir, banzda ji dest min revî,

Û şev û ro çiqa li pey direvim,
Nagihîjmê... aqa jê dûr dikevim...

## DEWATA TEBYETÊ

Mîna rûviyê dewatê,
Ba hat cab da tebyetê,
Bax hejya got "bimbarek",
Erdê xwe dît tivdarek:

...Û her tişt bû tundurist,
Ewira def û zurnê xist,
Birûsk mînanî siyara
Pekya ber bi beyara.
Dûman bûkê bû xêlî
Û dakete ser gêlî,
Hingê erdê û ezman
Hatin û hev ramûsan.
Ji şabûna ro derket,
Keskesorê girt govend,
Teyr-teyreda li vira
Şabûna dil istira...

Pey dewata pirr giran,
Li her zozan û aran
Meh derbaz bûn, roj serda –
Erd xemilî û ber da.

## BERANÊ QERQAŞ

"Qaş, qaş, qaş-qaş...",
Ka beranê qerqaş?

Çi xweş bû wan çola,
Ser derav û gola,
Berx diketin kêşê,
Qaşo dida pêşyê
Û tewil digirt li sirt,
Berxa dorê digirt

Mîna hîv û siteyr,
Ez lê hewas û heyr...

Û koloyê renghîv
Hey min dibû teglîf.
Min qewiz dikir once,
Simlê genim û ceh,
Li ber digirt, wî zû
Leber dikir diçû.

Yan wexta min cara
Qerxman dida ber ba,
Ew dihate bi rev
Û me dixar tev hev...

Û min digo: - Hirr tel,
Herdu guhê wî bel,

Dihate min bê tirs,
Û çevada hê pirs,
Wekî "rast, yan qestî?"
Bengizê min guhastî
Wî fem dikir yekcar
Û guh danîne xar

Mîna guhê tariş,
Dêmek eme bariş,
Hev ne xayîn, dijmin...
Ew dûr diket ji min...

Û hê diçe, diçe,
Hê ez divêm – çeçe,
Qaş, qaş, qaş-qaş...
Ka beranê qerqaş?"

## PAYÎZA GEŞ

Tuyê bêjî teze bihar tê,
Tuyê bêjî teze yar tê,
Ax, hêwirza çivîka
Usa hewas û hişyar tê.

Kerî kundirrye berpalê,
Zevya payîze şîn dike,
Rûvî li hafa newalê
Kuna kêwrîşka bîn dike.

Cewa cinetê berwar bye,
Ada ajirûda gêrre,
Teyr dora têlêva tarbye,
Xwe di cewêda dinhêre.

Hîv heyrî rozgara îro
Met maye û naçe ava,
Ro li hema ezmanê îro
Dikene wek zara sava.
Li ber vê nedîr û tîrincê
"Hevtêmanat" û "Qemerdax"
Nolî du birê qazancê
Li hev dinhêrin sidiqê sax.

## BER BI EZMAN

Hê dewrada erd û ezman hev maşoq û yar,
Lê sûra wan ji hevdu dûr, li hev nedîhar,

Qey bê sêfîl kewgirîne ji derdê evîn
Erdê meyî hezar terzî û ezmanê şîn.

Û qe çendik-çend cara bye – ji dest huba pirr
Erşêd jorîn barandine hêsirêd xweye gurr.

Û erd şabûye, nûr û neder li rû bûye heyran,
Heyrana wê bûye xêr û bêr ji bona îsan:

Û îsanê şêkirbilyan şereze û merd
Bi xêr-xweşî gîhandin hev destê erş û erd.

Bi "Vostoka" me dewranbêj Gagarîn eslan
Pekya berbi sitêrkê nûr û hîva terlan.

Û bû mêvanê heqî heq li ezmanê durr,
Soz jê sitend û kire yek li wir qet û birr...

Û verê bû eznafê me bi ezet-qulix,
Hat û birê xweyî çûkra da salix-sûlix...

Û birê çûk, şêrê ji nav şerzada ketî,
Mîna birê çûkî mêrxaz, birê hikyatî,

Hêl bû berbi hêlanê jor bê tirs û bê xof,
Ezman xwera kire qonax şêr Gêrman Tîtov.

Û şêrê me bi sidqê qenc û erşê nedîr
Hevra kirin pirs û sowbet şeva kîr û bîr:

Vepeşirî erşê nazik, li rû barî nûr
Û bi hemd û hemadê xwe evdira da destûr.

Evdê rûspî û jêhatî bi merd û kemal
Hivde gistîlk kirin destê ezınanê şemal...

Û da xatir û xatir xwest, heya dewatê,
Û ramûsa enya bûkê, hat rû hewatê.

## NÎKOLAYÊV - POPOVÎÇ

Ne qulingê Evdalê min perr bi nexşin,
Ne qanatê birîndarin jor diweşin,-

Cote gemiyê zirîkirî serî perin,
Çar hewarê erşê ezmîn zor digerin.

Zûda çûne perwaz dane ser Hebeşe,
Ji ser çevê evd hildane ava reşe...

Û kubarin nav gemyada herdu cêwî,
Ji ber pêşa ulim welidî bûne rêwî.

Ser tevekê jor hiltêne hildiqoşin,
Ro – hîvêra dewîkarin, şert û qoşin.

Qey bêjî ro ber "Vostoka" dilerize,
Serê hîva rûbixêlî ber wan nimze.

Bera ezmîn hev dikeve, kefa gewire,
Ku ber gemya zû direve mîna ewire:

Dewlê berê kaw-kubarin, pêle safî,
Xoznebar lê sovekarin bi şitafî.

Şewq û şepal, nûr û neder wanra xemle,
Ulimê dewirê destê wanda sêr û remle.

Li ser pêla serbest, aza ewan syarin
Û li xizna binê berê ha dîndarin.

O ber çine, vir wextekê evidê ji wir
Bera bînin, dewsê topkin lal-cewahir:

Yan ji erda ber-okyana bibin ezman,
Dewsê bavên bax û baxçe, rez û bostan.

Dive mîna zom-zozanê evan heça
Her havîna Marsê mera têkin daça:

Hesok ji wir bilûrêxe ewê demê,
Zelxê vir nav êmanekî here hemê...

Û dibe em dewsa yêr û warê benda
Ezmên têkin ciyê dewata û govenda,

Û wê hingê hîva zer jî xwe têkin text,
Wexun eşqa evan şêrêd xwey nav û bext.

***

Gulnaz, wekî minra yarî, îda min çi derde,
Piş min çiyayî û beyarî, çî min çel û nerde...

Çevê teda soz-îmane, min qirar û şerte,
Te sîng çayîr û çîmane, minra war û erde.

Muhbeta te min bihare, sufet teva şerqe,
Çi xema min hewa sare, zivistana serte...

Hub-evîna te esmerê dermanekî merde,
Nakim xofê jera merê, xayîn û nemerde...

Minra dinya û alemî, şîrin, de xeberde,
Hezar lutbî û kilamî ez hilînim ber te...

## TE BÎR NAKIM

Xewnêda jî te bîr nakim, zerî,
Xewnêda jî xewna al û zerî,
Riya muhbetê hê diçe hevraza,
Hê em syarin hespê bext-miraza.

Hê ew sêra pala çiyayê gundda
Ber çevê min ne betal û unda...
Wede mîna mija wan bêlana
Nenixamtiye xewnê min hêlana.

Bîna çiyayê Qemerdax hê xweş tê,
Hêwa sivê ji çevê te reş tê
Lîqe-lîqa kenê te hê tame,
Cewarra bûye xulîn û miqame...

Û tewirî em hê pêda qestin,
Ji muhbetê jar û melomestin:
Û rûdinîn em li rex newalê,
Serê min ser çoka te zewalê.

Tarihanî tu li hafa gêlî,
Ser bedena minda xar û mêlî.
Porr û guliyê teye zêrîn pencin,
Pencêd tevê ser sîngê min gencin:

Û tilyê te hê ew nermebane,
Bayê nermik porê minra şane.
Ramûsana te keremî min kir,
Dengê wê tê hê ji qefa kêvir,
Ber guhê min hela zinge-zinge,
Dilê minda keser û hizinge.

Na, bîr nakim, te bîr nakim, zerî,
Xewnêda jî xewna al û zerî...

***

Xewn û mital fikarê min,
Hûn mîna berx û karê min...
Û çaxê ez, berxvanê gund,

Li deştêd me, çiyayêd bilind,
Min ku pêşya berxa berda,
Bela dibûn mêrg û erda,
Xwe didane berpalêd çiya,
Diçêrpandin gul û gîha...

Lê carna jî li wan erda
Min ku pêşî zef berdida,
Berxê mine nes direvyan
Diketin ciyê qorix û ziyan.

***

Elegeza min mîna deveke bêhed, bargiran
Bê tog û dizgîn wê xwera îx bûye bi qurn û dewran,

Herdu heçêd wê mîna gurmikê pişta vê devê
Kawik û kubar dûrva dixwênin rojê û şevê.

Û gul-gîhê wê mîna terr-xurcê pişta devê bar,
Bi hezar terzî, hezar awazî daketine xar.

***

Şeva Xidirnebiye, û çiqas jî derew,
Kêfa min jî vebye vê derewa bedew.
Min pêçaye ser-guh, derketime derva:

Qey ezmanê sayî arîka xên-mêne,
Siteyrikê lê dayî nexşê arin, lêne.

Hîv "kuleka" "xaniye" li jor ewê tangê
Û penc jorda aniye mîna dolîdangê...

Ezê bikevmêda, xwe bikilêm dilbarî,
Paşê nav berfêda razêm totikxarî...

Xewnêda tî-mest bim, bihara reng-rengî
Tas av bide dest min mîna qîza bengî.

***

Îşev dîsa kalekala berxa bû ber guhê min,
Îşev dîsa wek tifala kêflû bûbû ruhê min.

Îşev dîsa bê şerr û dew ez li çiya û baniyê me,
Û kerê xwe min berda bû dora cew û kaniyê me.
Ezî xewa nîvê şevê, vanê siya xwe min pîva,
Û hetanî serê şivê sî bû sê ling û nîva...

Û çev minda va mexelin berxê me li ser ava,
Kerê şivîn ji birn derket û hate wan hindava.

Bergalêd me li ser fêzê, pez hêwirî li biniyê,
Şivan tase şîrê miya dot, bir danî nav kaniyê...

Û paşê kir kêf, laqirdî, çika kê dil ketye kê,
Wexta berxa bela dikin yara kê pêşyêda tê...

...Û hey qise, hey laqirdî, dîsa gilî û qirar,
Kevçî hatin dorbidorê, sirê hate şîrê sar...

Sî ket nava terazina, bakî hênik nerm gujya,
Şivan "yehkir" li bizina, û berxê me pey kişyan.

Bû pişkînya karêd kever, xirmîn kete dor ava,
Ez dîndarê çolê mabûm hetanê ro çû ava.

Roavayê min berxê xwe bir belakir, şiv danî...
Vê sibê rabûm û qelema xwe şayîrtiyê hilanî...

***

Wextê beranberdanêye, ax li kume ez...
Pez-berxê min xemilîne bi sor û gevez:

Kerê şivîn binya gunde, berxvanî li bale,
Xemla berîn çiqa rinde, malda kalekale...

Rêncber keriya lê badixin, hîvya zedane...
Zed hazirin, û kêf-kêfa qîz û gedane.

Û bêsebir beranê sor dertê ji hundur,

Û kevanî dide pêşiyê, li pey – qîz û kurr.

Û keleşê minî delal datê nava pêz,
Li ber şivan û berxvana zed dibine rêz.

Xozana nan dibe mîna sifra têr-tijî,
Dixwun-davên, leber dike kelbê şivîn jî.

Gedêd biçûk nan loq dikin û nava ada
Dor kerê pêz çapik-çeleng didin tirada...

Û geş vetê rengê deşta wek bengzê qîzê,
Serda zerr-zîv dibarîne teva payîzê.

## KILAMA MIN

Kilama min, kilama min –
Qîz zerîke dewatvan,
Çek-libasê xwe sazandin
Qam-qanatê terî can.

Rextê durr li ser bedenê,
Porr û biskê xwe berda,
Hat dewata xwendevana,
Ket govenda qîz-xorta:

Û çarçev bûn "dewatvanî"
Hatin sêr û temaşê
Li vê "qîza" tarihanî,
Dîndara wê û rewşê:

Hineka li dêm nihêrî,
Hineka jî – xemla wê,
Hinek hatin heyr-hewasê
Li nazê vê bedewê:

Hineka go: – Bêqusûre,
Hineka go: – Na welle
Li pêsîrê nateîsin
Ew lal û durr û tulle...

Hineka ji go: - Pişta wê rind
Nehatiye girêdan,

Û sekinîm ez dilbarî,
Temîke wa min da wan:

Min go: - Hemû dewatvanî
Dixemilin ber eynê,
Lê boy "qîza" min terlanî
Hûnin eyna lap eynî:

Û kembera wê xarbe jî,
Hûn lê bibin eyna rast,
Te dî semta vê kemberê
Min hilanî û guhast.

***

Sirsûmê diya mine ezman li hêlanê,
Û ewirê kirkişî – toxavka kildanê.

Cenûb û şimal jî palikêd sirsûmin,
Bi milê dayîka min qewat û qudûmin.

Gurîn ket, şingîn ket "azixê berkelê",
"Dayîka min" kesirî, firk kete navmilê,

Û denkir toxavka sirsûmê zimzimî,
Dinya bû sîtil ber, erdê dew parzinî...

***

Çivîkêd xapokin ev fikir û mital,
Eme lê maşoqin wek zarê tifal.

Difirin, datînin çûkêd perrawaz –
Me pey xwe hiltînin bi sêr û hewas.

Bîr dikin mal û cî, em kes û lêzim,
Li pey wan lalicî, kel-bîn dibezin.

Û divên "ma du gav, vaye, va me girt"...
Ew hiltên ji hindav didin dêm û sirt:

Bi fêl û fenin ew, em pey kesirî –
Nêzîk dikenin, hey dûr dikin girî...

Lê bêxem diçin, ew diçine hafa,
Em diçin li pey wan bi zemet, cefa...

Û nagrin, wan nagirin, lê feqet çil-çiya
Em dûrva dixwênin li ser bilindcya...

## ŞÊLÛ NEKIN

Bra deştê we- li we bimbarek bin,
Xweyê deşt-dûza,
Bra çiyaê me-li me bimbarek bin,
Me tebiyethiza.

Evil û edet we rehetiya ruh
Wan ciyada dîtye,
Lê hilbet me jî kar û keremek
Van çiyada dîtye.

Em şêlû nakin bi nixta nemerd
Tû cew û kaniya,
Wekî ser weda dixulxulin tên
Ji van çiya-baniya.

Na, şêlû nakin em tu ava qet,
Lê hûn jî feqet,
Dema qasekê em xwera hiltên
Serê çiyayêd xwe,
Dinya dêmdelal hemêz dikin bi
Nûra çevê xwe,

Bi qelbê qenciyê bilind dibin wek
Çiyayêd xwe tîtan
Û êmanekî Xaliqê xwera
Tên pevgirêdan,

Hûn Xwedê xwekin, hûn jî wê hingê
Bi cebh û cerme
Nekin tepilxan û şêlû nekin
Ezmanê ser me...

## SOVÊT

Sovêtê, sovêtê, sovêta –
Dayîka me demê û axretê,
Bextê me, yaziya me şivêta,
Xilazê ber zulm û zulmetê.

Miletê me pêla sêlavê,
Rênga wî, benga wî tunebye,
Û şûrê qetlêyî di navê,
Belabye, bextreş û gunebye.

Mîna îcatek nedîtî
Deravek ji navê xulxuliye,
Hatye ji xezayê derketî
Nav dewla te berda ediliye.

**Sovêtê, xwelya te melheme,**
**Kewandye birînêd me kurda,**
**Lê dilê min îro bi xeme**
**Boy kurdê me dûre êgirda.**

Avxûnek der-besta hildayî
Ber çevê min şev-ro xuşîne,
Dayîkek ewlede undayî
Digirî û keserê dikşîne...

...Miletê qurnada xapandî
Bûye dîlê îman û mesevê,
Û îro dijîn şûr kişandî
Hatîyêda bi zulm û xezevê.

...Û dewa heqiyê ji qecera
Tu dikî dîsa nav dewleta,
Sovêtê, tu çara bêçara,
Sovêtê, gumana mileta...

## KURMANCIYA MIN

Kurmanciya min xalis, wa kura tû hatî?
Wellehîn nizanim, min nayê bîr-

Mîna teva geş çawa min hilatî,
Min û vî dilê halsax û sexîr...

Qey xewna sêrê bû, ne nava xewê **bû,**
Min nedî, lê rabû û ruhanî,

Gezongê şîrin bû, şev nîvê şevê bû,
Nerm hat û ser baxçê minda danî.

Qey dengê bilbilra tu ketî guhê min,
Yan bûyî xulîna cewa zelal,

Bûyî ba-werzeba û dara ruhê min
Bi xişîn û weşîn kir gale-gal.

Dilê min qey deştek, deşta der baharê,
Akla te, wekla te toximê zêr,

Litbê te barankî jorda lê hat xarê
Û zîxê deştêra bûn similê kêr.

Qey aşbûm û cinet xwe arvançî bû
Û dexlê ruhê min wek dexlê aş,

Pirsêd te nerm hatin û têda cî bûn
Mînanî arekî xasî qerqaş.

Qey qelb qinazê min geliyê bêbinî,
Şiletê min serê hezar gula,

Hat û hat, nerm hilat mîna cew û kanî,
Wan çil û çiyayê nûr, der û çola.

Min ne dît, ne pîva - tu ne bi heva bû,
Qe nizam kura hat, çawa kişya,

Min hew dî dilê minva çilk û çeva bû
Û av-heyata min hat û rijya.

Kurmanciya min xalis, wa kura tu hatî?
Wellehîn qet nayê, qet nayê bîr,

Her hatî mîna ava avilheyatî
Û mîna roja geş te da nedîr.

## XÊRÎ KILAMIM, ŞERÎ KILAMIM

Xêrî kilamim, şerî kilamim,
Ji bo xelqê xwe qûl û xulamim.

Rojek min geşe, rojek min reşe,
Yek teve, yekê baran direşe:

Wa bol-biletim, bîn-bereketim,
Kêzik û kirêt qe ser neketin-

Sêwirê min çine, şêwirê min çine,
Çem û deravê şiyêra min çine?

Çiqa lalicîn, çiqa qaqicîn,
Çem û deravê şiyêra penicîn:

Çiqa lalicîn, çiqa qaqicîn,
Çûn ji ber lêyê, wek xwelî û çîm,

Ê, hizkî bivin sûra Çîn-Maçîn,
Çemê şiyêr-beyta wê kuda berdin,
Çawa jî berdin, hemî cî erdin:

Erdê bi çemê heyatî canbe,
Tijî ter û tûr, gul û şîdanbe...

Heqî gotine-mer pûngê tune,
Pûng jî şîn dibe ber qul û kune,

De pûng eşqera girara kurde,
Lê meriyê mera merez û derde.

Kilam tacê gulayî xasin,
Rewş û şuretê dilê xêrxazin.

Kilam heyate, kilama min bexte,
Gerdena keçê kurdada rexte.

Ew bo nemerda- postê xezeve,
Mereqa dile, kula kezeve.

Lema nemerdî dilkul û rike,
Vediqepiçe, jer dipirike,

Wekî axînkim, wekî ku bigirîm,
Ku hela hene bendê sitrîn...

Ew ku giriyê min, axa min beyte,
Dijmin li ber mirî û meyte...

Xêrî kilamim,şerî kilamim.
Dema xelqê xwe qûl û xulamim.

***

Keskesora rengê teme,
Hey tu roj û teva min,
Bedew û qeşengê teme,
Ay, ronaya çevê min.

Beyt min têne dor bi dorê
Aşiq ezim, tuyî kan,-
Her hevt rengê keskesorê
Tên ji pencê teva can.

Ay, ro, binhêr wê qirqişî,
Keskesorê girt kevan,
Ken li dêmê te niqişî:
Bûm dengbêjê wan çevan.

Feqet, ro çû piş wî tetî,-
Rengê keskesorê çûn,
Lê tu çûyî, min dûr ketî,
Ax, beytê min hê gurr bûn.

## TE GO

Te go: " Ez maşoqim, evîndarê dînim-
Huba tera, keçikê, beyta li hev tînim"...

Ezê hatim, hatim li derê te xweber:
Lê ka çima nakî qe tu pirs û xeber?"

Lê naxwezim bêjim, wey la terez bavê,
Xemê dila derdim wek agir-alavê:

Min kir deykim, bêjim, lê zar min negerî:
Min go: "Kew-gozelî, tirsim firdî herî..."

***

Reş li xweke, ezîza min, reş te tê,
Nerm bigere, ew gera hûrmeş te tê.
Sîngê te ezmanê şeve, sedef-siteyr,
Hêkela nav mîna hîva geş te tê.

Ez ji axim, min rû erdê kiriye seyr,
Lê li ezmên pir hewasim, mitilheyr.
Ka rusqetke sîng-berê te cinetî
Berk hemêz kim dewsa ezman, hîv û steyr.

## GULNAZ

Min hizkir Donayê, Rayîsê,
Muhbeta Gulnazê başqeye,
Begem kir qiseta her qîzê,
Sowbeta Gulnazê başqeye,

Çûm dêrê, mizgevt û kilîsê,
Zyareta Gulnazê başqeye,
Min vekir "Qurana" medrîsê,
"Tewreta" Gulnazê başqeye.

Ez çûme nav baxê gulgulî –
Biçûktiya mine dînc ji bîr hat,
Bi bengzê dayîka min edilî,
Bi pencê wî şemsê nedîr hat,

Çûm geryam li mêrgêd xemilî,
Bîra min domaına bi pîr hat,
Ne bihar, ne kubra payîzê,
Tebyeta Gulnazê başqeye.

Bextê min her wext û demêye,
Ger "Al" jî min têke hesarê,
Kemala min Borê Memêye,
Wê banzde bi gem û hevsarê.

Yara min meleka remêye,
Vedike qeydê û çîdarê,

Hizkî bê xundkarê miclîsê,
Şîreta Gulnazê başqeye.

Şayîrê hêleyî hunarim,
Tu kesî ez nakim minetê,
Bihuşta felekê dîharim
Bi xewn û mitalêd remetê,

Pelqîza horî jî ne yarim,
Dizvirim ji dewla cinetê,
Ne buhuşt, ne huba Pelqîzê,
Cineta Gulnazê başqeye...

***

Şayîrtiya min gurr, çemekî avê,
Zîyayê derd-kula xwe daye navê:

Û çirave av naçe ser ehlya,
Ehilî tîbûna zûriqî, delya:

Û dike-bike mesref, tivdarek-
Bikire xatirê ziyayê "bimbarek"...

Îda nizane bi heyteholê
Hûtê sewdefeş tu nayê yolê:

Ne ew hewceye-heft sîtil pelaw,
Ne def, şivêviya, ne tifal û law,

Her lazime ew zeriya lal û durr
Rabe, nazdarî bê ser çemê gurr

Û tek ser ziyêda bêje gilîkî,-
Wê xwe ber avê bide alîkî...

***

O, çi edilye, çawa xemilye dilê min îro,
Roje çi xweşe, erdî bi rewşe, ezî lê gîro.

Rêke nitirî, kerr û sitirî li pêşiya mine,
Pîrê muhbetê, sêwir û sowbetê ber pêşa mine:

Hisret bi gurrim, dikim ku herim yêr-yêrinde bim,
Weten rengîne, ez ser bengîme, li ber kundebim.

Û li Moskovê tev Têrêşkovê rûnêm sowbetê,
Li ezmên yarbim, "Vostokê" syar bim, herim "qurbetê"...

Û bo tûnsiza, zeriyêd rûsa steyrêd ezmana
Sinî – selakim, bînim belakim sûk û meydana.

Û hildim hîva- zer bi dizîva paşila xwekim,
Bînim û wê jî bi dil pêşkêşî xezala xwekim.

***

Vê êvara dînc û kerr
Bala min ezmanê gerr,
Çar hewarê berda perr,
Çiya û baniyê dûr.

Va kenarin çiya banî,
Erş-ezmanî xwe kanî,
Hîv tas şîrê nav danî,
Isteyr – xişirê hûr.

Usa xweş tê dengê bê,
Ji mitala û hubê
Hijmekarî, tê qey bê
Saze yan bilûr...

Rast, bilûre diguje,
Kanî qey bê dikişe,
Şîr pel bûye dirije,
Ka şivanê nûr?

***

Egrîdax dûr ber çevê me
Mîna kon û birc tê kivşê,
Fîla mezin û ejdehe
Serê mêşe hirç tê kivşê,

Qulinga rû erşê ezmîn

Pirtî per û pirç tê kivşê,
Bardanê ser milê sevan
Hemî têr û xurc tê kivşê.

Hergê çola ne beledî-
Xar û mêle riya rast û dûz:
Gul-sosina serê rê jî
Mîna qal û qirş tê kivşê.

Çiqa bêjî, şiro vekî-
Ro zara sebîra tope:
Dîwarê kor xalîçeke,
Yeke, wîra cil û lope:

Bîne dayne kursiyê qutnî,
Erbeçîra dîsa kope:
Xas û qumaş li mirtivke –
Mîna kevn û kurc tê kivşê.

Fêrîk bilya, go:- Şayîra
Şayîr heye-dara xurmê:
Hêşîn dike li baxçê xas,
Li bin tevê, nava germê:

Lê, ax,dara xurmêbe jî,
Yan ya sêvê, yan ya hurmê,
Yeke, li ber destê aspêj
Postê qonc û qirc tê kivşê.

***

Ezmanê bi steyr xitxitî-
Ça parzûnê şîn pitpitî
Mezin, bêhesav...
Hîva şîvxarî gulover
Mîna serî penirê ter
Dixwêne li nav...

***

Çi rinde ev mêrga hêşîne mezin,
Tev tût û xudûde mawar û sosin,

Her tûm û gujmekî – kanîk jê dizê,
Cewikêd jîrekî ketine rêzê.

Çardora fireye hesavê gerra,
Mêrg ber min raxistiye mînanî berra:
Diçim û ez şame ku mêrga avî
Bê pel û kevire, temize, safî...

... Lê gava se-kûçik ewtyan min li wir,
Min axkir, ku tune çend pel û kevir.

## QELÎBOTKA PAMPÊ

Wey tiştîrê, tiştîrê,
Tiştîra mak bi şîrê,
Îsal pêra ber teke,
Kê kiribu ev yeke:

Şeref çûye gomêye-
Cabek daye Xemêye,
Gotîye: "Kirrê dizîne,
Neke deng û hisîne"...

Xatiya Xemê aqile,
Qenter daye ser mile,
Hatye taxa jêrîne,
Caw gîhandiye mêrîne:

- Hey Şerefo, Şerefo,
Fikir li her terefo,
Fatê li ser çirikê
Gotye- "La min qirikê"...
Hatye mêrê pisporî
Ketye xewa hingorî,
Şev ser xweda daxistî,
Potê xwe gewr êxistî,
Ben û çarix mal hiştî
Ketye pênca vî goştî,
Ser kuleka Hemikê
Mêrik kirye tomikê:
Hemik xwe qal û bale,

Dor tencerê digale:
Hesk li desta ta daye,
Simêla zer badaye,
Gotye: "Fatê, ha Fatê,
De pêda ke- kel hatê"...

Fatê qurse dil daye,
Hemik çîtîk hildaye.
Dua kirye xêlekê
Û nihêrye kulekê...

Şeref wek melle Resûl
Gotye: "Kêra te qebûl"...

## SAYAT – NOVARA

Çi hêjeye tera bêjim lal û cewahirî, qurba,
Me bûye xelaya xebera, pesina derbaztirî, qurba,

Kûra hubê te vêxistye, navda disincirî, qurba,
Ka çira xwe bi te vêxim, atafî, agirî, qurba.

Hizkî herim Hind û Hebeş, lal û durr û almas bînim,
Herim Fireng, Yênîdunya, zerr û zerbab û xas bînim,

Ji buhuşta horî-periya hezar çek û libas bînim,
Wê xam derên temam li ber xizna te rokirî, qurba.

Te methê gozela xwe da bi hezar eşq, hezar muhbet,
Kir zêrr û zîv, steyr û hîv, dîsa li te nehat tabet,

Te go – royî...lê ez çawa te royêra bikim tabet,
Çaxê şev jî qelbê minda nûra netemiriyî, qurba.

Dunya hukimî-hakimê te şahbaz Êrêklêra nema,
Îskenderî Zuqurne jî tişt nebir bi şûr û qema,

Bi beytê nûr hê zeft dikî welat-welat dewir û zeman,
Dinya ne şûr, bi nûr dijî, tu dinya nemirî, qurba.

Were, dîsa pirs û gilya em te hostê bi pîr bikin,
Ger dixwezin kilama xwe bi qedîm û kibîr bikin,

Ez ne ew Fêrîkbim eger weysetê te ji bîr bikim
Û hîm nebim ser binyata, qeya bi kevirî, qurba.

***

Dîsa xewa dest berbanga min teqisiye,
Micizatê vê bêxewiyê li ber serê min reqisiye...

Eze hişyarim, ne ji banga van dîkane,
Ne ji giriyê van çûkane,
Ne xemanê vî zimêrî, vî dirrlikî,
Lê hêbeta kana kula – vî dilikî...

Belkî bext û talebext ha, risq û keda wî dubarke,
Yê radive vî heyamî tişkî karke:

Yê dixweze qav û qorrê xwe debarke,
Yê dixweze den-arvanê xwe li barke,
Yê dixweze hespê dewatê tîmarke...
Belkî bext û rastgela min jî çarke,
Libasekî horî-perya jorda xarke,
Yanga min dî – malê dinê dinyagozel
Mîna Zîna wê Cizîrê li hemêza min dîharke...

***

Derdê ewira jî mîna derdê min
Giran û giran.
Û ji hêbeta
Ewira tap neda
Mîna min bi kel giryan û giryan:
Û ewir hêsa bûn, ji derd aza bûn-
Li herçar qulba bû bilindayî.
Lê çiqa giryam, ez çiqa zêryam,
Li ser dilê min qet nebû sayî.

***

Herê bê guro, wehîdo, guro,
Ciyê tu digerî, ez jî li wiro.
Ca were bêje, ez-tu xeberdin,
Ka te çi kulin, ka min çi derdin...
Herê, rebeno, tuyê wê ji birçya,
Ezê ji derda ketim çil û çiya:

Û min kir-nekir, ev kul û kovan-
Hevsûdya îsan ji dil derneket...
Tuyê wê geryayî, pîngê te maşyan,
Nêçîr bû asax, nêçîr ber neket.

Hey bimbareko! Tu pîrê xwe kî!...
Ger ya min dikî,
Were, bese em xar û hevraz bin
Wa li wî erdî, ha li vî erdî-
Were min bixwe, û em xilaz bin-
Tu ji wî derdî, ez jî vî derdî...

***

Heta sivê xirta-xirta kêrê bû:
Hê zarîna berxikê li jêrê bû:
Qey bû kabûs û hate ser pişta min,
Kêra bêwa xirpişî tenişta min.

Min xweşivand dil heyanî kezevê,
Xew teqisî heta destê vê sivê.
Vêsê rabûm, bavê min hat lihêrê,
Min nihêrî çevê guman û xêrê.

Lê gava dî meşetê min hêrs û tel,
Axîn hatê û wa pirsî- şaş metel:
- Lawo, axir dûh şerjêkir min qurban,
Îro tera qet nebû tu dû- derman?

## KURÊ MINRA

Car-carna têm melûl, dilxor û mirûzim,
Lawo, kerba binê lingê te radimûsim...
Şaş nemîne, berxikê min... êh, kî zane...
Dinê heye kaşkişika dest îsane:

**Dive rokê Kurdistana mezin vebe,**
**Bavkê teyî hisret dilda lê tunebe...**
**Bira hingê lingê te bi hisreta min**
**Bigere nav ax - topraxa cimeta min...**

***

Ez dihelim notila şekir,
Cimet, paşila xwe veke,
Ji vir heta Dîyarbekir,
Dilê xwe ber fireke:

Şekerqendim, ez ev çendim,
Ne çirekim, ne çivî:
Wekî hilşim nav bera te,
Xelqê bêje tu hingivî...

Çiqa mayî şorav, girav,
Gola mer û dûpişka,
Deme- rave, telxe bide
Û col bike her pişka.

Bira pêlek te rahêle
Musul, Kerman û Wanê,
Pêla dinê min tev xweke
Ji kenarê Rewanê.

Ez xwey dême, ne yê wême,
Dê anîme –animet,
Were hilde ji destê wê
Animetê silamet:

Hergê germbî, ezê nermbim,
Xêr ku sarbî- bûzim ez,
Bigrî berê dinyayê jî,
Bêmed û mirûzim ez.

## XÛNA MILETÊ MIN

Çend cara wê roja heqiyê here ava,
Wek wan ewira sorke xûna zarê sava?

Dê zarînke, çawa kurdê wêyî keleş
Ji çiyada bê tevî cewêd bi xûna geş.

Eman, xûna miletê min bûye Ferat:

Me çi hewar, me çi medet, me çi firyat?...

Fitil daye, Birca belek kirîye şînê
Û ragirtye ser mezelê Mem û Zînê...

Hey hûn Mem û Zîna mine hubteribî,
Destê nemam roja bextê we qulivî,

Nevî bext-mirazê cmeta min jî
Bû bext û mirazê weyî hêsir tijî ?

Beko hene ? Xwera nakin heq û hesav,
Wekî dijmin qewm û milet bûye qesav.

Çira bona kêra dijmin bûne hesan?
Dest-piyê wanda – pêpelînga pîs û nuxsan:

Agirê dijmin wekî gihîşt ser xanê wan,
Çiye, wê neyê korî negire ser canê wan?

Carek bila ca derên bin dest-piyê neyar,
Hevra bibin omid, umud û tifaqdar.

Û vir diha dijmin xwera difemîne,
Wekî dewa bendaye heq badê nîne:

Wekî kurda tu jin û zar, mal û nefer
Vê oxirêda badilhewa nedane der..

Ewê hê bên, hê horînkin mînanî şêr,
Serê heçê çiyaêd bilind dakevin jêr,

Dest bavêjin çerxa dinê rast û heqiyê,
Hê tap bidin ber guregur-teqeteqê...

Birêje jî, xûna miletê min gure:
Wê bê derê her kenare, her buhure,

Rabe mîna wê tofana agir zeman-
Niqo bike leşê wane pîs û nuxsan...

Û meremê miletê min mîna gemî,
Mîna ewê gemiya Nuhê axirzemîn –

Wê hilgire lawêd xweye ber xîretê,
O bigihîne serê Sîpan û Xelatê...

***

Cimeta min ker-kerî,
Cimeta min ber-berî,
Ax, xwezila li çiya, banî
Ez bibyama cew û kanî:
Tu bihatayî ji her yêrî
Bi hisretî û dilxêrî,
Te ser evê kaniya qudiret
Hevdu bikira sivexêrî...

***

...Teyare, dayne tu min Sibîrê,
Wextekî bijîm ez li wêderê.
**"Rêysa" te tune ber bi Êrbîlê,**
**Binhêrim ka ça dijîn wê derê?...**

## SER MEZELÊ DENGBÊJ

Aşiq Evdale...Gozel, fesal were...
Duh li miclîsa bû, îro-l ax û bere...

Zar û kubira şîrin duh gul dibarandin,
Îro bi hev xweliya sik-sar hatye girtin.

Ev Evdale, gozel...gula êl-eşîra!
Axê dengbêja bû...şahê mîr-êmîra...

Û dengî hê-l dinya bê bend û mezîle,
Ew di pirtî gorda hebsiye û dîle.

Yareb çi bêbexte, mirin çi neyare...
Tê û deng û seda qet nake pirsyare,

Rem nakeve dilda, dest lê naricife,
Gula nav govenda kokbir dike, dive...

Ev aşiq Evdale...gozel, pak binhêre:
Wê ser tirba wîda gulek melûl kêre:

Ew hisreta emire, ax, hê dilda maye,

Bin axê tap nanye,usa şax vedaye...

Ewir-ezmane, gozel, lê gul wê xeyîriye...
Dengbêj wehîd maye, çev li riya teîrye:

Kanên heval-hogir, çima navên "tew-tew",
Kanên qîzêd bikur, kanên bûkêd bedew?...

Tu bi caniya xwekî, boy xwedêbe, gozel,
Ca were çok vede dor vê gula mezel,

Bi hêstira avde, bigrî, bikarize,
Belkî gula Evdal tucar neçilmise...

## HEVALCÊWIYÊ MIN

Zoroyê min û Zera min,
Herdu pirtiyê cegera min,
Car-carna tên,
Beşer li dêm,
Ber min disekinin, dibên:
Kî me rinde?
Kî bilinde?

***

Qurbana webim,
Hûn minra hebin-
Besî minin.
Nav tengasiyêda
Terî û siyêda
Kesê minin.

***

Fêza ewirada, li ser rûyê ezmîn
Royê geleştir siteyrek zêrîn,
Îşiqê dide hertim ruhê min,
Dibiriqîne nêt û sewdê min...
Ew steyrik kîye? Ew jî hûn bêjin...

***

Sed qîz û bûk ber min rêzbin, horya min naz tuyî,
Nav-dengê min beyt-karêzbin, eşq û hewas tuyî.
Mêrga min çilk gul û rez bin, reng û rewaz tuyî,
Yêr welata padişa ezbim, tecê min xas tuyî.

## ÎKIRAM

Got:- Keremke, ca han temke evan sêva!
Min go:- Neınerd, çima nadî herdu lêva?

- Sêva naxwî, hinar hene, hilde bixwe!
- Çima nadî herd hinarêd sûretê xwe?

Go:- Dinhêrim orta te û êmîş tune,
Hilde loqke vî loşî – dest avê mine.

- Hey nanxweşê, zinanxweşê, nan kirikê,
Merdî, bide loq lewaşê wê qirikê.

Go:- Mêvano, bona te pirr cefa min dî,
Tu bedhalî? Yan qusûr mesrefa min dî?

- Hey nazdarê, nazfroşê,
Xweya naz-nemetê xasê, nanê loşê,
Merdî, were cotê çeva cole kaske,

Çilk şereva evînêye xweşe xaske,
Ezê hildim herdu desta ac-ac vexum,

Îşte, medê xwe pê vekim-
Mesrefa te mêvanhizê erdê naxim.

## ŞAYÎR

Qureyî, qurebe,
Ger lal û durr hebe,
Kemalek pirr hebe,
Nav kar û keda te, ey şayîr.

Diqûjî, biqûje,
Ger xem û xuşûşe,

Hisretek pirr tûje
Nav deng û seda te, ey şayîr.

Difirî, bifire,
Ger teyrê sîmire,
Ne mûkî bafire
Zên merîfeta te, ey şayîr...

**DILÊ KURR**

Dilê kurr, divê, tînin
Tendûra dêda dikin
Nikarin bipijînin,
Çiqas jî pêda dikin.

Lê, divê, ji kerbî kurr
Diya reben nasebirîne,
Xwe davê tendûra gurr,
Ku agir bitemrîne.
Û, divê, agir hiltê,
Bi dayîka hêsîr digire,
Û teze ser agirê dê
Dilê kurr dikizire...

**HEYKEL**

..........................................................................
Bi hevt zara min lutubê huba zeriya av dixwest,
Tû merezê kaniya hubê avek nanî li ber dest:

Û min hêbet li hevdu xist, hêsirê çeva kir herî,
Ji dilê xwe kevir derxist, taraq dayê û birî.

Taraq dayê bi kêrt-kêrtî, hev girêda, kir dika,
Û heykelê xweyî kurdî kubar rakir ser niga,
Rakir li sîng pir zemetî nexşê kerge niqişand,
Dêmê dota bi hisretî ser dilê dax kûr kişand.

**Û navê Kurd û Kurdistan mîna morek xadimî**
**Û bi kubar, dilbaristan, ser pêsîra xwe danî.**

## DENG, CENG

Mehmed Arif distirê, ez bi girî dem digrim,
Dinya ber min dive sêr, ji mirinê xem digrim,

Hey "ezrahîl" û şerbaz, wekî hûnin mirina min,
Werin sehkin dengê wî, belkî pirtî rem bigrin...

Ez xêr hatim vê dinê, min xêr jî dî, lezet dî,
Yara xweye dêmneder çol û baniyê cinet dî,

Mehmed Arif tev rakir dilkê minî hisretî,
Wey min deng û seda wî zêdetir tu sêr nedî.

"Eyşa Elî" heyrim ez, li dengê wî heyrim ez,
"Asa Delîl" heyrim ez, şûr-şengê wî heyrim ez,

Ez çevê xwe çi derxim,ez zarê xwe ça pevxim,
Wekî nevêm-bengizê wî, li rengê wî heyrim ez.

Xwezilya ttûb tunebiya, bend û sînor tunebiya
Ser qedemê dinyayê kenc û kînor tunebiya,

Lê çi bikî? Çi feyde, ku zevtkarê dereke
Hê rû-barê dinyayê dikole gor û tebiya...

Ey çikûzê cengbazî...ey nemerdê dilkotî,
Deng-seda vî Mehmedî yareb qe tu nesotî ?

Te dest daye "ezrayîl", te deng daye top-tiving,
Nahêlî pak sehkim ez dengê wî om-om gotî.

Tê ji vê dinê çi bivî, ka bêje fikar bikim?
Lê tu, lê tu, ay hevsûd, ji te çi pirsyar bikim?

Tu vî dengî merd navî, çeva xelqê bar navî,
Ka pût xweliya ser kulîk ser çevê te bar bikim.

Hucet meke bi xezeb, bi şerr û şeng,ey merî,
Çkûziya xwe meke qan, sînor û bend, ey merî,

Bihêl, bera pêla deng bive pirak merd-qewîn
Him bo meriyê vî berî, him bo meriyê wî berî...

## BEDEWA GUND

Qasik-qenter li ser mila,
Ser namilê cotê guliya,
Tê ser avê bedewa gund
Ser kirînda mêl dibe rind.

Û qasekê çirka dengbêj
Mêl dibe nav elba rindê,
Wek merê tî guliya dirêj
Di ser elba avêda tê.

Paşê rindê xwe radigire,
Xwe riya taxa jorîn digire,
Dilê min wek poçik virçe-
Guliya xweva dike, diçe.

***

Min ramûsa çev û brûyê kewêd gozel,
Min binvîsya hezar û du beyt û qezal,

Min zînkira hespekî şîn bozî kihêl,
Min bajota merd-merd nava Cizîr û êl,

Min bidîta bengz û bala Hesen, Mehmed,
Min hil kira durrya Mem û Zîna rehmet...

Min seyr kira serê çiyayê Sîpan-Xelat,
Min seh kira fûre-fûra çemê Ferat,
Min pê danya ser topraxa kulî tebyet...

Min vergirta ulm-zanîstiya dinyayê tam,
Min femkira sêr-îcatê erşê ezman,

Min bidîta mala dinê bi tomerî,
Min bidîta merî gişk rast bûne merî,

Hingê ezê rehet biçûma ax û ber,
Dilê minê derd-kulara nebya mexber...

***

Îşev ber derê teme,
Lewandê, dêrî veke,
Ax tengezerê teme,
Dîlbendê, dêrî veke,

Cinûbet, turikim te,
Xwedêkî înkar meke,
Qertelim qirikê te,
Neheq û sûckar meke.

Adare, qarxûn rabye,
Heyranê, nayê zevtê,
Laşê min ber xwe danye,
Gîhandye mala mevtê.

Qetandye min saw û sû,
Sî kiras û sî perde,
Jarê dil zor tê neçû,
Sik bûme ha li ber te.

Min çarke, bextê teme,
Rebenim, te qûlim ez,
Yan minxe kêr û qeme,
Min bikuj, qebûlim ez,

Tek jêkî kezîke xwe
Daynî ser sîng - mibedan
Tek bêxî kirasê xwe,
Ji minra têkî kefen.

## KANÊN WERDEKÊN GUNDÊ ME?

Kanên werdekên gundê me?
Meral, medekê gundê me?

Çi to qîz bûn!
Çi zerîngê nav ezîz bûn:
Yek Çîçek bû, yek Zeytûn bû,
Yek Xanim bû, yek Xatûn bû,
Yek Çîlê bû,

Yek Fîlê bû,
Yek Seyran bû,
Yek Ceyran bû,
Yeke cote gulya zer bû,
Çevkê dilê min li ser bû...
Ay çi bêjim...çi domam bûn!
Çi horîngê tam- temam bûn!

Ringe-ring bûn,
Bi hizing bûn,
Bi keser bûn,
Bi beşer bûn...
Dema esireke teng fesal
Mîna bire karêd xezal
Dimaşyane berbi avê,
Çevê xortêd gund wê gavê
Mîna tîrê dil lê kevan
Radiçyane evêd nevan...
Dema nava zevî, mêrga
Diketine hon û cêrga,
Xar-mêl dibûn
Û hêl dibûn.
Te digo gulin,
Dimilmilin,
Gîha-sitrîna nahemlînin,
Usa pêra şerr û kînin...

Dema diketin govenda,
Xas govenda van lewenda,
Dibû keskesoreke çiya,
Mala dewatvan radiçya...

Dema mîna pilîtanka
Diketine dolîdanga,
Û bi nazî,
Qîrîn, gazî
Digotin "wey",
Digotin "pey",
Em kaw dibûn,

Bê saw dibûn,
Me dipekand heta dîwar,
Ew tirsana dihatin xar...

Hey gidî, ha!
Kanên naha?
Temam-tev çûn,
Ew bedew çûn:
Yê bi def çûn,
Yê bi rev çûn...
Çend pitê xam,
Hubê nezan,
Çirtê-virtê
Man li ortê...

...Gelî xortê tûncî-tûre,
Hûn jî bistirên
Cûre-cûre-
Metihê zeriyê
Di wextê xwe,
Metihê yazî
Û bextê xwe.
Û zeriyê we pesindayî,
Ger xelqê lê kir timayî,
Ez adkarim,
Neyî çevqul, çevnebarim,
Ezê hingê qelema xwe
Ça mizgînî
Bavêm dest-piyê domamêd we
Bi xwezgînî...

## QÛLINGÊD BERRIYÊ

Qulingno, berriyê hûn tên,
Ca çiqa heyra weme...
Dengê we şîrin dibhêm,
Motacê seyra weme.

Wê çibe, vê sala nûh
Hûn riya xwe bixalifin,

Neçine derez û dûr,
Bên daynin der mala min.

Ez perr û baskê wekim,
Ev avê zef li we bê...
Ez gaze-gazê wekim,
Ev tevê zef li we bê...

Bona we, cûcikêd we
Ezê nan, xurek daynim,
Li serê darê dulme
Hêlînêd fire daynim.

Tek hûn bên, em tev bijîn,
Ez bengizê we mêzekim,
Hûn têkin qingîn-qîjîn,
Dengê we ezîz sehkim...

Qulingno, hey wax, hûn çûn...
Êwir nebûn vî miskenî,
Dilkê min wera hêlûn,
We nehat lê danenî...

***

Dikim çevê te ramûsim, keçikê, tu înkar dikî,
Bi hizkirin ber bi te têm, berê xwe min xar dikî:
Lê bizanbe, kafira min, wextê wê bê tuyê bi dil
Hildî xweliya mezelê min ser çevê xwe war bikî...

***

Tu merd were, baş were, wekî tera dil vekim,
Mîna bakî xweş were, hemêz û paşil vekim,
Nevî serma, nevî surr, şext û surê sertim ez,
Tu wek royê geş were, wekî tera gulvedim.

***

Min mîna aşiqê kor dil vekir hesavê dest,
Sîmê saz hêle lûvand û heve çirax te xwest.

Te şûna maş û çirax, ji dilê xweyî kevir
Kerrame kevir hilda, kir dilê muhbetperest...

***

Koriyo dilo, tê wê gurrî, tê wê hêrsî,
Wek tendûra pêl bavêje arrîk, hêrsî,
Ax wê hêrsê kela teyê avkî here,
Tuyê jî binda bitemirî, xweda vêsî...

## BEYT

JI BONA APÊ MINÎ REHMETÎ HESENÊ ÎVO

Hewar, heyatê heware,
Padişê mirinêyî syare.
Werin, zêndînê remxwestî,
Lêzim, kinêzê dilşikestî,
Ser vî hakimî, vî mîrî
Daynin şîneke eşîrî,
Serya bi reş – şimaqîkin,
Hêsira di kasa baqîkin.

Bînin cawekî çendgaze,
Têkin kefenê cinyaze.
Di nav tabûta çamîkin,
Mermer kêlek û şamîkin.
Reme, ruhê wî remete,
Bê şerr, bê zor û zehmete.
Serda de axekê werkin,
Xêrê mala xwe bîterkin.

***

Çi çikûzî, çi mirtivî, tebyet,
Herçê dayî, çima divî, tebyet?
Yê nebûyî em lê mukurr nînin,
Yê ku diçin em li ser axînin.

Ax ne bide, ne bistîne, tebyet,

Bira dinya wa bimîne, tebyet,
Derdê ewled dê nevîne, tebyet,
Ewled bê dê, bav nemîne, tebyet,

Destê yara ji hev meke, tebyet,
Qenc, cînara ji hev meke, tebyet,
Merdî, remî, rem bimîne, tebyet,
Bira evd herdem bimîne, tebyet...

Herê, belê, - tebyetê go, - bende,
Ya tu serî xweş qirar û qende,
De tu were, tu jî zeviyê bavê,
Des û kêlendiyava nekev navê,
Fêkyê darê ji çiqil jê neke,
Berxê nekuj, makê şerjê neke,
Qalvê mesî bera ruh dernexe...

...Te ku ev kir, ad dikim Ademe,
Hingê ez jî ser qirara teme.

## DEYN

Ax...
Hey ax û ax, sed carî ax, ax bi toprax...

Min nizanbû her tişt deyne, dayîn deyne, heq û çirax,
Min nizanbû heta erd jî
Deynî dide bendê reben, kesîv, destteng,
Evan fêkî, rez û berê bi hezar reng,
Eva nanê deşt, kewşenê bol û bilet,
Van azix û temazixê bîn-bereket.
Van durr, lala, çek-rihala, xizna mala...

Lê axirî?
Axiriyê jî dike hed-sed, dew-doza deyn,
Û îsanê sexîr, reben
Dike, nake dernayê bin deynê giran,
Û dewsa deyn erdê xweydeyn
Wîya dive çawa geraw.

***

**Bira xwezil Kurdistana min şên bûya,**
**Miletê min aza, xwendî û zên bûya,**
Derge-dîwan bi zman û zarê min bûya,
Qewm û milet li her çar hewarê min bûya,
Bira hingê ayê şevê li min çar bûya,
Kelefekî wêran minra cî-sitar bûya,
Qerpalekî reş li stûyê minda xar bûya,
Bira gêzîk dergevana destê min bûya,
Soqaqeke Êl-Cizîrê "posta" min bûya...

## KURDISTAN

Agir û antêxî tu,
Hew maye – min vêxî tu,
Hal û îlik bêxî tu,
Hey zor û zordesta min.

Lê çi agir, nûrî tu,
Hevdu nafûr-fûrî tu,
Ji hev bela , dûrî tu,
Hey tu rast û qesta min.

Minra hergedayî tu,
Diya dûr-derayî tu,
Ne li van erdayî tu,
Hey tu erd û besta min.

Ez bilbilim –qal û dax,
Tu sorgulî,dinya-bax,
Li minra venabî,ax,
Hey merem û qesta min.

**Qurn û dewir û sal-zeman**
**Heyrî bengzê te ez mam,**
**Kurdim, kuyî Kurdistan,**
**Wey dîl û bindesta min...**

***

Dengê Arif dengê min bûya,
Rengê Memê rengê min bûya,
Sazê Ahmed sazê min bûya...

Rûniştama ser textê şên,
Serbest, dilbar, bê mûr û kên,
Nava koma qewim û bira,
Dil û hinav min bistira...
Yarê tasa min dagirta,
Min vexara eşqa merda...

**Huba milet serxweş bûma,**
**Egît,mêrxas keleş bûma**
**Û biçûma bi rezanî**
**Nav leşkerê şêr Barzanî...**

**Teyarekê êz siyar bûma**
**Li ser best û beyar bûma,**
**Bê tirs û xof, zor û qeşeng-**
**Min dijminra danya qal-ceng**
**Û bo azadbûna kurda**
**Serî danîya ax û erda...**

***

Dinya bere, nav berêda cimeta min ade,
Kenar-kenar ez digerim wek gemîke sade.
Û tim ada xweye hêşîn dûrva ez qenter dikim
Dajom, gemya xwe westyayî pêva berk lenger dikim.
Û ber jî minra ji yêrê dûr distirê û dey dike,
Lê ku dive ba-firtone, ada min ew xwey dike.

## GUNDÊ ME

Min dîne gund û şeher,
Min dîne qesirêd mermer,
Soqaqêd kawe dirêj
Heykelêd bi dewranbêj

Û çûme dilê rehet
Şeherêd rengîn, bêhed.

Lê wek vî gundê me çûk
Min nedî bajar û sûk:
Her cara tême navê,
Bi hêbet dil min davê.
Qey dibim cabdarê wî
Ber çûk û extyarê wî...
Bend divim diyarî îsan,
Ber silav û ramûsan...

Qe nizam ev çi yêre?
Çi surre û çi sêre –
Ev sêra vî gundê me
Kaw-kubar û rindê me.

***

Ez nafroşim gilyê badê û arzan,
Ezê bêjim, xwendewano, tu bizan:
Ew şayîrê şiyêr, kilamê rind dide
Û pêra jî pesinê xwe bilind dide,

(Hizkî bira nemam, neyar biteqe),
Ella-wekîl- ew şayîr rast û heqe...
Çimk mirîşka hêk dike û kêfa xwe
Paşê dike qinge-qing ser hêka xwe,-

Ew qinge-qing, ew gaze-gaz lê saz tê,
Û li merya miqîm xweş û hewas tê...
Lê çi bêjî wê mirîşka xwerazî,
Ku hêk nake, dike qingîn û gazî...
Şayîr heye, wekî wa hêk nekirye,
Qinga-qinga xweva serê me birye...
Lê, îcar min... ne axir min hêk kirye...

***

Zefî hiz dikim ewilê baharê
Çaxê ji çiyada karxûn tê xarê,

Çaxê kelekel dikeve erdê,
Xam hêşîn dike û binevş dertê.

Belekiyê berfê xwe didin hewraz,
Li jêr diçêrin kerî-sûriyê pez...
Qelfê qîz-bûka
Dertên gêdûka,
Komê zarr-çûka
Diçin pîçoka...

Çivîka li ser baharê bengî
Distirê, dikare bi hezar dengî,
Qûrtîn dikeve teyrê atmece,
Jorda dinhêre li serê heçe
Û cara ewil ewirê nîsanê
Kel digirije li ser zozanê.

***

Mîna toxim direşînim pirsêd melûl ser kaxez,
Wê pey minra guldin gelo, bigihîjin, bibin rez?
Yan hêsirê kesî serda wê nebarin wek baran,
Û bêxeda wê birizin, pûçbin, herin bê deng-hes...

***

Şeve sayiye, hîv niqo bûye nava bera çap der,
Ba tê li rûyê berê dixe bi kîn, kul û keder,
Û bera dîn –guhî li ser bayê pûçî dexes,
Telxe dide, hûrxweş dike hîva nûr û neder.

***

Hewa xweş bû, şilyê vekir,
Bilbil bêxda çikçike.
Ro mînanî qîzek bikur
Erdê nexşa çê dike.

Diwîrwîre dengê teyra,
Hewa şûştye û miştî,

Meriv hisret, meriv heyra
Çol û baniyê buhuştî...

Çiqa xweşe hisreta gurr,
Li hespekî kihêl syar,
Tevî qelfa heval-hogir
Bigerî best û beyar.

Temaşekî der û doran,
Hildî bîna cinetê,
Dilê te jî bi gul, rihan
Tijîbe wek tebyetê...

## BEXT

Kîjane bext, kîjane text?
Fem nekir min tu car, tu wext.
Her vê zanim ferih, nexdî:
Wextê qezya û bêbextî
Me zor dikin mînanî wan
Ewirê bê wa, teyroka zyan,
Em dikin ax, dikin firyat,
Ku ewirê qan bibyana qat,
Bibya sayî,
Bilindayî...

Lê çaxêd ewir
Wek dêwêd gewir
Vediçixin, dibe sayî,
Û pencetev gûjlî ser hev
Li me dixin ça bext, şayî,
Hingê jî em sergêj dibin,
Hingê dikin êcizayî.

## GELÎ ÇIYA

Hûn miskenê gul û gera, gelî çiya,
Selam wera, sebax wera, gelî çiya.
Zef geryame li bêlan û qaşê we,
Ez jî bûme hogir û taydaşê we.

Min jî serê xwe mînanî serê we
Daye ber ba, birûsk û bagerê we.

We ber pê min gul û gîha raxistiye,
Lê qe çendik-çend birûska min xistiye...

Û kenyame, ez kenyame dil û can,
Mîna gul û sosinê we tor-mircan.

Hûn dê bûne, hûn dê bûne, ez- dergûş,
Li hafê we firîme wek qerequş,

Û min danye nava konê kurmancî,
Bûme bengiyê qîza bikure tûncî.

Dota kurda hiş min biriye, gelî çiya,
Min sîngê we muhbet kirya, gelî çiya,

Avliheyat min we xarîye, gelî çiya,
Hersal hûnê vegirin hêşîn, gelî çiya,

Û ezê jî wek we bijîm, gelî çiya?

## WEXTÊ DAGÊRÊYE

Erd îda gewir bûne,
Pez îda stewir bûne,
Wextê dagêrêye.
Kanî nihicîne,
Teyr-tû xaricîne,
Berê koçê rêye.
Zaru naçin çola,
Ser delav û gola
Û navêjin "peşkê",
Qîz-bûk betal bûne,
Bê xem-xyal bûne,
Kila nadin meşkê...

Hê bihar bû, bihar,
Kerî dihatin xar,
Girmîn li çiyê dihat...
Roj çi zû çûn, firîn,

Ewira nekir gurrîn,
Dengê cewê hilat.

Îda qîzê neçin,
Ax ezîzê neçin
Ser cewik û kaniya,
Û bilûra şivîn
Wê xweş neke guvîn
Serê çiya û banya...

Ciyê bilûra şivîn
Bayê bagera dîn
Wê gujînke qalim,
Kaniyêd qîz û bûka,
Warêd bindarûka
Wê berfê bên girtin.

Çiyayê bê kes bivin,
Bê deng û hes bivin
Ta biharek teze -
Wê bê bayê berriyê,
Wextê av û heriyê
Çiyayê xwe bihese.

Û tebyeta mezin
Wê bê careke din
Biharek nûh veke,
Lê cara me diha,
Bihara me diha,
Diha ne ew yeke.

## ÇIYAYÊD PAYÎZÊ

- Hey çiyano, çiya, hey çiyano can,
Gul-şîdanê we kuda çûn?
Kulîlkêd we lal û mircan,
Lal-mircanê we kuda çûn?

Qûrtîn diket bet-bazê we,
Şivan distira li gazê we,
Pez hêl dikir hewrazê we,

Xam-xozanê we kuda çûn?

Cew û kanya dikir xulîn,
Qîz û bûkêd benge gulîn
Derdiketin kon û kulîn,
Zom-zozanê we kuda çûn?

Çiyano, bêjin, ka nexşê we?
War-mikanê we kuda çûn?
Ax ez digirîm bo rewşê we,
Rewş-rihanê we kuda çûn?

Çiya gotin: - Were megirî,
Hey maşoqê sax û sexîr,
Eve, ev sal çû buhurî –
Wê me şîn bin mêrg û çayîr.

Teyr-teyredê meye xerîv
Wê bên çêkin hêlînê xwe,
Koçerê bên şax û şeqîv,
Wergirin kon-kulînê xwe.
Emê şîn bin, şên bin car din,
Bixemilin sal û zeman,
**Lê gelo tê hebî hertim,**
**Ku xemla me têkî kilam?**

***

Wê got: "Ger min pirr hiz dikî,
Surr-sêra me beyan neke...
Gerr min kel û gurr hiz dikî,
Muhbeta me eyan neke..."
Min go: "Sebram, can û ceger,
Çawa bikim surr neçe der?...
Axir muhbet agire ger,
Surra êgir dû dide der..."

***

Keçikê qurba, ramûsanekê keremke min tunsizî,
Bira can û cesetê min tevda bigire şîrin sizî,

Hergê min jî kilamek xweş li navê te venegerand,
Minra bêje – tu deyindarî, bêqirarî, tu heqsizî.

***

Tu dîn, îman, meseva min, zyaret û şex tu seva min,
Tu xêr û him xezeva min, tu kul di nav kezeva min,
Zeriyê ez motacî te mam, hijmetkar û acî te mam.

Çi rindî, çi qibraxî tu, beybûna al, hevt şaxî tu,
Fêkiya cinet nav baxî tu, lê boy min, ax, asaxî tu,
Zeriyê ez motacî te mam, hijmetkar û acî te mam.

Dewatî tu, sêrkarim ez, kihêlê zîn, qoşkarim ez,
Bi def – zurna te harim ez, lê ax bi gem, hevsarim ez,
Zeriyê ez motacî te mam, hijmetkar û acî te mam.

Nav derd-kula ez hiştim te, ez xewn-mital gihîştim te,
Bi herd desta rahîştim te, lê ax tucar negihîştim te,
Zeriyê ez motacî te mam, hijmetkar û acî te mam.

Xwe ne ezman, siteyrî tu, bêjim zevtê lap derî tu,
Va li rex min diseyîrî tu, belkî li xwe biheyîrî tu...
Zeriyê ez motacî te mam, hijmetkar û acî te mam.

Lezet û xêr zeynetî tu, li rû dinê cinetî tu,
Eger tê me şa nekî tu, çira dinyayê ketî tu?
Zeriyê ez motacî te mam, hijmetkar û acî te mam.

Bilbilê gul havêjim ez, qefesêda ker-gêjim ez,
Hêsirê xûnî dirêjim ez, boy te gulê divêjim ez:
Zeriyê ez motacî te mam, hijmetkar û acî te mam.

***

Kafir, te ez met kirim, çawa methê te bidim?
Te ez şil û şet kirim, ça qametê te bidim?
Bengizê teda niqo bûm mîna berî, sovekar,
Pêla kenê te da ser, kurra derêm ser kenar?

Axir tu rex min bûyî, te kî alî telxe da?
Mîna mesiyê ruhberî dilê min hişt nav xweda,

Wek du steyrê ezmana herdu çevê min rijand,
Kir du çemê muhbetê, berbi bera xwe kişand.

Tu Sîpana min bûyî, hatim berbi sîngê te,
Terr û cana min bûyî, hatim dest û lingê te.
Tu çûyî, û qey bê min Şengal û Hec unda kir,
Mîna Meınê û Sîyabend min Zîn û Xec unda kir.

Kizîn dilê min diçe, ez mame şaş û metel,
Min nizanbû tu – bihar, ez havînim germ û kel,
Ez hatim te kel û gurr, germa hubê li ser min,
Mîna bihara rengîn tu reviyî ji ber min.

Here, ezîz, çira xwe ku dixwezî vêxe tu,
Çi miskenê te dil kir, konê hubê lêxe tu,
Ez melûlim, ku ez mam hewcê çev û kubira te,
Lê kubarim, ku dinê heye kurdek mîna te...

***

Heyr –hijmekarî teme,
Şahîn – şikarî teme,
Na, ez nokarî teme,
Derê bînaya çeva.

Reben, hêsîrê teme,
Wan ber-pêsîrê teme,
Şemam hêjîrê teme,
Derê bînaya çeva.

Biskêd xeleqî kanên?
Çevêd belekî kanên?
Horî melekî kanên?
Derê bînaya çeva.

Zendêd mircanî hêlke,
Pêsîra canî kêlke,
Çevêd fîncanî mêlke,
Derê bînaya çeva.

Ne ez ber derê teme,
Ez sewdeserê teme,

Heyrana serê teme,
Derê bînaya çeva.

Ne der-cînarê bêjin,
Ne çev û zarê bêjin,
Ax ne neyarê bêjin...
Derê bînaya çeva.
Tu şems û teva minî,
Tu roj û şeva minî,
Tu bîn û hewa minî,
Derê bînaya çeva.

**DIL JI MIN BIR**

Diranzêrê, brûkêrê...
Dil ji min bir, dil ji min...
Helandim xweş xeberê xwe,
Bîna misk û emberê xwe,
Cineta sîng û berê xwe,
Dil ji min bir, dil ji min...

Çevê belek wê kil dida,
Beşera rû xweş gul dida,
Zerqê hubê li dil dida,
Dil ji min bir, dil ji min...

Hey wax, min bîr naçin diha
Naz-nûbara xase biha,
Zulfê zêrîn dora guha,
Bîn-beşera bedew, biha,
Teyr-tawisa per bi zêrê-
Dil ji min bir, dil ji min...

Hilnegeryan em tu wara,
Gul neçinîn tu beyara,
Dosta mine nav neyara
Ez zû xistim riya dagêrê,-
Dil ji min bir, dil ji min...

Xeşibîme, hîlar ketî
Ji hisreta wî sufetî,

Bêbiata qelp derketî-
Dil ji min bir, dil ji min...

Kilama min hubê-xalis,
Ew defîna mine dengiz,
Wek kûtekî nanê garis
Girt û avît nav savêrê,-
Dil ji min bir, dil ji min...

***

Gul-perîke kurmanciyê
Ji pirêza pêşa çiyê
Peza xwe berjêr dike,
Loma li cînêr dike,
Divê:- Zilekî kayê
Ji destê te dernayê...

- Ê, te çi xwe daye min?-
Cînar divê,- ay xanim,..-
Te nan û av daye min?
Qend û gulav daye min?
Soka sêva daye min?
Şekirê lêva daye min?
Ka te çî xwe daye min?..

## TU ÇÛYÎ, ÇÛYÎ...

Ezê çevê te îd neyêm sêrê,
Neçim xewin, xêrê
Wê cinet yêrê...
Tu çûyî, çûyî...

Ezê paç nekim îdî porê te,
Birû-qorrê te,
Gerden torrê te,
Tu çûyî, çûyî...

Ezê neêxim ewan lepikê te,

Herdu tetikê te
Nevim sîngê xwe,
Tu çûyî, çûyî...

Gustîlka tera ezê nelîzim,
Ezê nebihîzim,
Dengê te lêzim,
Tu çûyî, çûyî...
Tu çûyî, hema
Ser zarê min ma
Navê te biha
Nolanî dua,
Tu çûyî, çûyî...

## DELALA MIN

Mîna mesîya zêrîn, sêrê
Wê pal dabû li dev berê,
Û pey qisa hêsa, hênik
Navkêlka wê zirav, tenik,
Mîna eyna avê şimşat
Nerm hildlhat û dadihat.

Şirka avê nolî karbar
Ji porê wê dihatine xar,
Lê milê wê nazike çîl-
Nolanî du hesungê fîl,
Fesal û semt, qeyqac û kêr
Çûbûne bin serê porzêr...
Biçengê wê bibûn hêlûn,
Têl-têlê zer lê xûda bûn...
Û wek perêd kewa kurka,
Ku radigere li ser hêka,
Pirtî libasê nazikî nar
Şemdanêd wê bibûn sitar...
Û pal dabû wê dev berê
Mîna mesîya zêrîn, sêrê,
Ez jî rex wê mîna torçî
Li bengzê wê mabûm birçî.

## PEZ

Ax pez, ax pez...
Pêşiya avtiyê bê lez û bez
Dikşe hêdî mîna Erez.
Şofirê lez
Çêrr dike nes
Vî şivanê hanî "qemez"...

Lê ez, lê ez...
Dilê xweda hisret-hewas
Hic dikim êw miya hane qer,
Wê bizina hane kever,
Hevûrê han bi rû-heden,
Wî beranê hanî dende,
Wê gîzka kirr,
Kavira kurr,
Rind rast dikim wa kerê xwe,
Dajom divim ber derê xwe:
"Ax kevanî, ax kevanî,
Porzêra min nûr-nazanî,
Ca binhêr min çi doşanî
Tera anî... ax kevanî..."

Ax pez, ax pez,
Ax, mitalên geş û gevez...

***

Dûman dibûrya dewkî dapalyan,
Sêla ewira gewr nixamt kûra şems,
Şop û şembelîk heçava alyan,
Dilêm wek parçevk qefs bû li qefes.

Salek jî kişya, berf danî çiya,
Da ser serê min xwey dost û dijmin,
Beng-bihara min di xweda nicya,
Neguldayî man çiqas gulêd min!

***

Şevêd havînêye hîveron,
Hêlma hênik, xweşbîn,
Hîva sûravêlkî soron-
Nava gola ezmîn...

## MEM Û ZÎN
### Pêşxeber

"Fêrîk, ji kemala tî bi kemal,
Meydana kemalê te dî betal,
Dengbêj tune bûn li çar hewar-
Lema xwe gumanî, xwe bawer?

Qernek bêtxûb hat yek kibîr kir,
Sihabê kilama te ji bîr kir-
Carek ca dawşîne tûrê bîrê:-
Dîharbe dewrêşê wê Cizîrê,
Feqî bê baxê te wek çem û ab,
Xanî li te bibe konê zerbab,
Culetke, vehilde tu tev û mer,
Bi av can bike sosinêd ter,
Zanibe, ewin xwe te Mem û Zîn.

Fesal be, neçarê xudan qelem-
Qelema te nebe li wan-kelem:
Xeberek betsarî bêruh te go-
Wan nebe niqitka xûna Beko.
Maşoqo, riya hubê gele dijar,
Yê nedî navêda meste û jar,
Tajdîn xwe şewitand mal û hal tev,
Destê bext-miraza negîhand hev.

Huba Mem û Zînê li ber te ber,
Tu şaş û metel sekinîyî ber:
Navkeve, eger tu dikarî-
Xêr ku na, dûrkeve wî kenarî.

Bera kûr alavkî dide telxe,

Wey li wî nav keve dura derxe.
Dur binê berêne, ne li kenar,
Kenara digerin yêd bê hûnar:
Digirin destê xwe hev xişrê xam
Diçine nav sûka qure-qutam.

Êy Fêrîk, gumanim - tu ne ji wan,
Husinê te-ji husinê Ahmedî Xan,
Diya te tu anîî rû-hewatê,
Bi heq û çirax tu hatî dîhar-
Vê dinê nemînî boş û deyindar,
De were ramûse pêşa diya xwe,
Bi tivdîr dakeve serê riya xwe...

***

Serê defterê navê Xudaye,
Bêyî wê, defter ne tam, kutaye.

Êy Xuda, tu kan bo husinê hubê
Heyî, nedîhar, tu ji mehbûbê....
....................................

*(Peyhatin me nedît.)*

## H. CINDÎRA

Bona 60 saliya bûyînê

Neçûyî Hecê, lê bûyî Hecî –
Çim cimata te, ev misken, ev cî
Tera bûn ziyaret, tera bûne Hec,
O tu lê bûyî ziyaretvanê qenc...

## BAGER

Zîwa-zîwa darêye
Digirî mîna sêwî,
Gurînya bagerêye,
Davê çevê rêwî.

Rê çetine, rê şepe,
Meriya qudûm dêxe,

Pêşiyê çele û tepe,
Hal û qudûm dêxe.

Tişt nake...
Ger pêşiya te
Heye besek xêrê,
Xezev be jî, tê ese
Bigihîjî yêrê.

***

Bedewa gund hat ser avê,
Dilê xorta xist alavê,
Dilê kalê helke jî sot.
Kalê kerr-kerr kir axînî
Û cahilê rex xwera got:
"Eva hanê tu nastînî?"...

***

Na, heye îsaf nav dil û dînê her bendê xudê.
Tek hinekara îsaf dêmariye, hinekara –dê...

Tek carna-carna esas namîne - hiltê û datê,
Carina vedikşe, carna mînanî pêla serva tê...
Carna mînanî gamêşekî reş diingire – cî,
Carna dilîze wek kihêlê ber zurna kurmancî.

Carna dudile, ditirse xwexwe ji xwe, îsafê,
Carna dibe gur, gurekî hêrs-har, xwe davê sawê...

Carna bang dide wek dîkê nîşev, te hişyar dike,
Carna radizê hetanî nîvro, te xewra dike...

Carna tê mîna xercberevkirê şerqêyî hêrs-har,
Carna digirî wek zareke êtîm, ji dinê bê par...

Û dil qul dike, dilê min xedar, dilê we kûr-kûr,
Û melûl-zelûl em xweda digirîn, dikin pûre-pûr...

Îsaf, wey îsaf, cizaretdarê meyî xapxayîn,
Kengê gav-dugav emê rê herin – te bi arxayîn?

***

Dinihêrim ez dayîka xwe,
Dinihêrim li bavê xwe:
Kîjan başe, kî bahaye û delalî?-
Ez mêl divim ha vî alî,
Ez mêl divim ha wî alî…
Usa teyr-tû wextê firê, bi firqaskî,
Ha mêl dive ser vî baskî,
Ha mêl dive ser wî baskî…

## ERÊ, LAWO

- Dakê, tu xwekî-xwedêkî,
Padişê ezmîn û erdêkî,
Tu bi serê xalê minkî...
Tu bi bext û talê minkî,
Qey xatirê wan şêraza
Qîz û bûkê çev miraza,
Heznî-jinê mêr şehîda,
Dergê hatin ber kilîta,-
Qey xatirê wê Şuretê,
Dergûşa da ser xîretê -
Tuyê îtmaza min bi sekî,
Dîsa rûnêyî lezekî
"Keser-axekê" tezekî,
Derheq Roma Reş qisekî...

- Erê , lawo...Axirset bû...
Ha-ha îda esirek tam bû.
Qîz û xortê malbavê min
(Belkî korbin herd çevê min),
Xwera civya bûn der gomê
(Kê zanibû hatina Romê?),
Gilî, henek, kêf-laqirdî,
Bîrde me dî
Gedê gundê mey gaxtikan,
Me jêra digo Selmyan,
Hat wê reng û rû avîtî,
Go:- Rom hatye, tê gund îdî...

Bavo, negot, ev koma han -
Gişka çêr kir, gişk pê kenyan.
Bi qerf- qûçik,
Nav û nûçik
Xwera-xwera hatin gede:
- Pî, go, evî lapî rede...
- Kuro, kê go, roma çiwanî?...
- Qe, henek bû, min lev anî...
Go, lo wê hat Gozelderê,
Eve, eve gundva derê...
- Pî, go, kuro, evî gêje...
Gedengê tat çi divêje?
- De, go, ez- tat,
Aha ku hat,
Ku ser hevda em ne birîn,
Hingê emê hev binhêrin...

...Erê, lawo, gede wa got,
Xwera kenyan ew qîz û xort...
Derbaz nebû ser vê yekê
Awa, êmê cixarekê,
Qîjîn gund hat,
Go, wele hat!
Rastyê jî hat....
*(Peyjatin me ne dît)*

## DEWETIYÊ DÎLBEND

Hey gidî, eva oda Ozmîne...
Dîwar derizye, mertek rizîne,
Peltik xitimye, bi konê pîrê,
Nemaye îz û toza bexîrê.

Çi hebûye vira? Zef-zef du dika,
Du lempê neftê nava peltika,
Kulavekî nerm,
Bexîreke germ...
Lê bi du dika, bi du peltika
Wê çi kêfxweş bûya paşayê tirka?

Şandibûye wî pey "gyûzelek" êzdî...
Lê feqet dewsa "gyûzela" êzdî
Jineke kinc û kitan qelişî,
Ser û çev temam pêda herişî,
Xûnêda mayî,
Por-bisk berdayî,
Mîna tofanek biharêye gur
Bi hewar- firyat filitye hundur,
Zarek şewitî, kûtbûyî, rijik
Danye ser textê qumandarê tirk...

Çi bûye? Çi nebûye?... eskerê sûckar
Şirokirine bona qumandar,
Wekî xwestine wê bedewa "bed"
Ji bona paşê xwe bînin, feqet,
"Cencelî" kirye wê "bêebûrê"...
Zara wê hingê ketye tendûrê...

Zefî hêrs ketye wir Toran paşa,
Wekî wehîşê kurê wehîşa
Rê dane ewê êzdiya "dêlegur"-
Bîne nav odê wê bîna mukur...

Tuyê bêjî, wekî tirkê "aryamêr"
Hindik dîtine olacaxêd şêr:
Zarêd şewitî...yêd singûkirî...
Yêd ser bedena dayîka mirî...
...Û wir dayîka qertele qijik
Hildaye birye kûtê reş-rijik...

Lê îçeriyê kurd: Dewetiyê dîlbend
Hildaye hukimê paşayê bînteng,
Ku herin jêra bînin wê lezê
Kulfeteke rind bi dil-rezê wê...

Yeke merîfet, ku bi dilê şa
Zanibe qedirê muhbeta paşa...
Çimkî çi lezet, wextê ku kulfet
Mêr hemêz nake bi heyr û hisret...

Hey gidî, eva oda Ozmîne...

Dîwar derizye, mertek rizîne,
Peltik xitimye bi konê pîrê,
Nemaye îz û toza bexîrê...

Xerede bûne sekû û sivder,
Lê mereka rex hedimye yekser:

Mereka mezin, ciyê sed sakarka,
Wekî wî çaxî taxbûra tirka
Sed mêrê Pampê xap-xap girtî dîl,
Wê merekêda kirine qendîl...
**
Lê şeva şipûk, wextê bûye terî,
Tev zapitekî tirkî îçerî
Ketye merekê Dewetiyê bîlbend,
Rûyê girtiya xistye pirseke bêeybet:
"Gelî lawika, jina kê ku bê
Paşêra qulix bike ta sibê,
Bi îzin-îzbat mêrê wê jinê
Wê elbêra bê aza kirinê"...

Bûye niçe-niça mêr û malxwê dîl,
Xûlimîş bûne-wî qewilê rezîl.
Lê pêşda hatye Simkoyê Bavik:
Mêrê Şagula bedewe qavik.

Gotye:- Carekê kum-kolozê xwe
Min bi xweliyêva daye serê xwe...
Here û bêje Şagula çeleng,
Bela xelazke min ji dergê teng...

Û serika wî, dezmal û tizbî
Zivtiya hildane çawa îzbatî,
Û siyarî, bi çek, şevereşa no
Êrîş birine ber derê Simko.

Derî vekirye bi temiya malxwê
Ewê bedewa babetî Zelxê.
Lê gava kurd çev Şagulê ketye,
Kirekî kizîn dilê wî petye:

"Wey,-dilê xweda gotye Dewetî,-

Ez gora bavê Simkoyê kotî...
Ezê çawa vê kulîlka nazik
Bivim û bikim nav paşila tirk?"

-De rabe,- gotye,- beniya şeng-şoxe,
Bixemilîne ber û piştê xwe,
Arayîş bike birû-biskê şê
Layîqî hub û huzûra paşê...

Û rabûye wira beniya şeng-şoxe,
Xemilandine ber û piştê xwe,
Kil dane çev û birûyê xwe belek,
Bisk dor cênîka kirine xeleq...

Siyar bûye li terkiya siyarê kurmanciyê.
Lê, bîrde, gurîn ketye debençê...
Zengûyêva kaşbûye tirkê îçerî,
Lê kurmanc mîna dêwê heftserî
Hişkem girtî bi navkêlka êzdiyê,
Hesp zengû kirye ber bi birnê çiyê...

Tarî hilatye, kew ketye ezmîn,
Şewqê avîtye mereka Ozmîn.
Ber ten-avirê heval-hogira
Simko sekesiz ponijye wira.

Lê paşayê tirk hurî bêferseng
Har biye ku nedye Dewatiyê dîlbend,
Ku darda kira kurdê "nemerî"
Bona kuştina tirkê îçerî.

Bona wê yekê, wekî nava gund
Ji wîra nanî kulfeteke rind:
Jinek merîfet, ku bi dilê şa
Zanibya qedirê muhbeta paşa...

## MÎNA XWEBE

Çillê pêşe, meha zivistanê navîn,
Feqet germe, hewa xweşe nolî havîn.
Dua dikin: "Sala xẹre"...

Hîviyêne pez here çêre...

Lê ez... hîviya bagerême, bagerê seq-
Têl dizûkin nolî gura,
Teyir xwe davên qul û pira,
Zivistan tê, "bazirganê" xwe "îx" dike,
Ba "birincê" xwe "têx" dike,
Deşt û çola dişûlikin "ziyayêd sipî",
Evd û ruhber xwe jê dipî,
Surr dişidin, berf direqe dive şepe.
Ez hiz dikim, ku zivistan
Mîna xwebe...

## BAHARE, ŞAYÎR

Bahare, şayîr...

Qelemê cem xwe hazir xweyke...
Te hew dî xumam kete guhêra,
Te hew dî çemê hemle hilşyan,
Pêla pertavkir nolî kihêla
Û "syarêd" sipî ser hilqoşyan.

Te hew dî şepê şeqal meheskir,
Situ zinêrva bû çalma çîl
Qulinga çîtê ezmîn meqeskir,
Gêlîda girya rûvîkî pîr.
Te hew dî refê reşêlê dengbêj
Şirîtava bûn şeve-şirdan,
Li ser "mezmezkê" "Dibûrî" dirêj
Raçya zîncîra kerê şivan.

Te hew dî berxa koza kir kalîn,
Dûyê pûş, pelaşa ser gund bû ewir,
Te hew dî bîrde Gulperya narîn
Tera kenya wek binewşa gewir.

Û dilê te jî te hew dî jîr-jîr
Sitira nolî teyra torxe.
Ê, olecaxin, bahare, şayîr,
Qelemê cem xwe hazir xweyke.

***

...Va min hem kirye çiyayê Dibûrî,
Ça yar hemêzke yara xwe nûrîn.
Ba tê, li sîmê stûna dixe ,
Bager dilîze "çarlstoa" xwe.
Kêfa min koke, o, neyar, neyar...
We teyax kira ber surr û seqem,
Weyê li vir jî lêxista leqem,
Dek-dolav daniya
Van çiya û baniya...

## CÊNÎK

Cima cênîk sipî divin,
Ku ne wextê wane?
Difikirim... axir cênîk
Nêzîkî guhane...

## DEMAXATIRÎ

Birê birêz Kemalra, wextê vepêkirinê

Radîo mînanî zengilekî sêr
Sêwrek batinî radihêle jêr,
Û verêkirê dor rêwî girtî
Bîrde dibirin ji kêf-laqirdî.

Dem dibe beraş, giran dizvire,
Dive deqîqa tima dibire.
Û, aha, aha, yek û dudu jî,
Dilê evd dibe ewrekî tijî...

Bêçarin vira xeberê îsan:
Heyr dibe hêsir, dibe ramûsan,
Dibe gultim dest, hêl dibe hewa,
Û hev dikeve wek porê kewa...

Rêwî tar dibe ser pêpelînga
Çend gava diçe-dizvire hanga:
Dem tevîheve û çeve tijî,
Mora melûlyêye xala wî reş jî.

Xwe dixurdile û deqek demek,
Xeber dibilqe: "Qurbanî weme..."
"Qurbanî weme..."

Te digot, ku ev xebera kurdiyê
Şems bû, wekî nerm hate rûyê erdê.
Û heland, heland,
Her tişt vir heland,
Erd heland, hesin û kevir heland,
Firinde heland,
Û bende heland,
Heland, perçîm kir hevva tomerî
Çendik-çend xeyset, çendik-çend merî.
Û êmanekî bedew, bimbarek
Gişk pêda hevra bûn dil û zarek.
Kelimîn kûr-kûr:
"Birê meyî nûr,
Dîlim dilê te jêbû, ma li vir,
Dîlim dilê me te birrî û bir"...

***

Min pêz didot li ber dêrî,
Gede-lawik hat dabirî,
Kenya, çevê xwe min qirpand:
Bêxweya miyê şîr welgerand...

## RINDÊ

...Çevê teda yaqot hene
Yantar hene çevê te?
Çevê te cot hevkê durra,
Helyame nav hevê te.

Çevê te şîn, binevşê geş,
Dêmê berfî dane der,
Birû- baskê kevotka kej,
Kêr û kevan bûne ser.

Enya eyne bi xem, xerêq

Hela nebye xet û xaz,
Kê xwe navda mêze dike,
Dive xortê bermiraz.

Guhê gulîn, şêbiskê zer
Lê penc bûne nolî tev,
Bîn û buhuşt, misk û ember
Davê ji xal û xevxev.

Rindê, bûyî xeber û bes,
Wey halê min bikirçî.
Baharî tu, havînim ez,
Berbi te têm, tu diçî.

***

Fîrdûsiyê mezin nava "Şehnema"
Bedewe biha mera nivîsye :
Hebûye şahekî ecêvî neheq,
Navê wî şahê Ecêv – Ejdehek.
Li ser milê şah hebûne du ziya.
Rojê mejûyê du cahilê tûre
Bûye xurê ewan ziyayê bêcûre.

Du aspêjê heyf, du qencê Xwedê,
Gunê wana zef xortê tûre tê.
Divêjin: "Qe na, ji herd zilama
Em mejûyê yekî parî ser ziyakin,
Yê din cûrekî kerr-kerr azakin".

Û usa aza dikin yek merî,
Davêjin zerzemîneke terî.
Çaxê dighîje çil-pencî hevî,
Wan berdidin bi rêke neqevî.
Ewana diçin, serê çiya, baniya,
Xwera çê dikin koxik û xaniya,
Mal xwera tînin, dikin hal-zewac,
Û ji wan pêşda tê miletê kurmanc...

Belê, ev qise hikyate, ese,
Wekî şayîrê mezin seh kirye

Û mera bedew wa qise kirye.

Em meriyê dewran û ulimê teze,
Nakine tarîq her hemû qise.
Em bawer nakin li van ziyayê ser
Milê Ejdehek, lê bawar dikin
Gelek, zef gelek, ku ziyayêd zulmê
Divin çînêd ser milê yêd mîna
Qasim û Enver û dixun serê
Wetenhizê kurd, serê wan torin
Û tûnsizê kurd...

## BAHARA MIN

Çaxê belekî dikevin erdê,
Telaşê berfê dêwkî dinelin
Ruh gultim-gultim hulmayî hiltê,
Çirav hêsirkî nerm vedimalin,
Çaxê reşêle zinêrva dertê
"Qewlekê" wek ya Şêxadiyê hakim
Duxulxulîne mîna şerbetê-
Baharê hingê, hingê hiz dikim...

Çaxê ji tasa royêye zêrîn
Tev tûnc dirije mîna firşkê têz,
Û, çawa penêr şijû bê birîn,
Ezmên diqetin ewirê xar û xêj,
Çaxê quling ji serê serhedê
Çît-berê ezimîn nerm meqes dikin,
Û dengê wan tê nolî hisretê,
Baharê hingê, hingê hiz dikim.

Çaxê qalçîçek ser lêva gêlî
Vedibeşire hewas û heyran
Û xweş vedike gotin û gilî
Çawa navçîke amin, pêguman,
Wekî zûtirê bahara bedew
Mîna hizkiriya xewnaye xadim
Wê rastî te bê bi bîn û beşer-
Baharê hingê, hingê hiz dikim...

## ELEGEZ

Elegeza min mîna deveke bêhed, bargiran,
Bê tog û dizgîn wê xwera îxbûye bi qurn û dewran,
Herdu heçêd wê mîna gurmikê pişta vê devê
Kawik û kubar dûrva dixwênin rojê û şevê,
Û gul - gîhê wê mîna têrr-xurcê pişta devê bar
Bi hezar terzî, hezar awazî daketine xar.

## SÛRETSÛFÊ

Rebilalem qas û qudret rastgele kir,
Libsê horiyê Tflîsvanya çev belek kir,
Li topraxa Pampa dêriz tesele kir,
Dewra dilêm teze-teze çerx-felek kir.
Sûretsûfê, Sûretsûfê, Sûretsûfê,
Sûretsûfê, min hinkûfê, ez miqûfê,Sûretsûfê.

Sûretsûfê, te ne got, vir şayîr heye,
Xizm û xûnav, erf û edet, eşîr heye,
Dilketina edet zortir, kibîr heye,
Hevsûdîke hare bi qîr û sîr heye...
Sûretsûfê, Sûretsûfê, Sûretsûfê,
Sûretsûfê, min hinkûfê, ez miqûfê, Sûretsûfê.

Sûretsûfê, ji kerba te wê nederê,
Ezê bidim kevezanê ser seferê,
Rê raçev kim ber bi Misrê û Enqerê,
Ezê bêjim - padşak heye wek temerê,
Qirar derxist, hukum danî- welêt derêm...
Sûretsûfê, Sûretsûfê, Sûretsûfê,
Sûretsûfê, min hinkûfê, ez miqûfê, Sûretsûfê...

***

Remel çûyê webe, heznîno,
Loma kilama me nekin:
Şîna we-li me ne mizgîne,
Merd û merî me mêzekin.

Eve qend-qirarê dinê:
Hinek diçin, hinek tênê.
Kilam jî eşqa hatiyane,
Şîna li ser remetiyane.

***

Ey xêvê dil, tu eyleqî bêbexta,
Ketî çenda, jê sar bûyî wek şexta?
Zanim, erde yara teye dûmikdewr,
Ketiyêda, dernakevî tu wexta...

***

Hema hevkî em werq didin,
Hema hevkî hildifirin -
Kevirê bûxdên meva dikin,
Wekî cîda dalingirin.

## DEWAT

Keremkin, keremkin, keremkin, mherin,
Hewşa dewatê vekirye hem,
Hinek hundurin, hinek li derin
Dilik davêjin bi eşq û xem.
Dilêd cahila, dilêd bêsebir
Wek kewê ji nav qolîtk-qefes
Pirtîn- qûrtîna refê xwe sehkin,
Hev dixurdilin hêbet-hewas.

Û, wek şampaynê piropka bavên,
Gazin û gilî dipekin jor:
"Kengê wê veke teviya şeravê,
Govend rakeve wek keskesor?"...

Ax, govenda me kurmanca xweşe,
Ew jî keremek li rû dinê.
Bext xêlekê wek xezalek xişîm
Bend dike nava xanek xinê...
Dizvire mîna çerxa felekê
Ser nêt-merema dilê îsan,

Sur û suhbeta emir xêlekê
Ditifiqîne ser rûyê qîzan.

Jinêd jêhatî, mêrêd hurmetê
Rêz-rêz rûdinên kafkelijî,
Lempê tokê wek hurmiyê cinetê
Dadiliqin ser textê tijî.

Dûr didefîne bîna bîvoka,
Buxza etrana davê firnê,
Çingîniya tasa, belg û birqoka
Dihele nava sewita zurnê...

Zurneçî, qey bê "Dêlû –Dewrêşe",
Lêdixe, pêra xwe xar dike,
Gepa radihêle, miqam digvêşe,
Ku sêrek delal diyar bike.
Û va, çawa ewrekî tenik
Hêdî veçixe li gêdûkê,
Xêlî vedikşe, wek royê ronik
Ter ditifiqe dêmê bûkê.

Û bala gişka wek gulbaxana
Hanga dizvire ber bi walî.
Sor dibe dêmê xilfîna xama
Mîna katekî di sersalê...

Zeva hêbeta xwe dixurdile,
Nizane çibike dilikjendî,
Dora govendê lez difitile,
Dezmalê dide sergovendî...

Sergovendî ji kêfa xwera
Qey difirîne kewek kedî.
Mêr hev qûrtînin nolî sîmira,
Kewkî dimeşin qîz-bûk hêdî.

Hesavê perr û dûçikê tawisa
Şên dişûşilin dêrêd kove,
Ax, xwezil bivin babeşîn wisa
Li dilêd germe nolî sove...

Zûkîn-zimîna qeydê "Zûloye",

"Şoror" xindûkiyê dike çoka
Gazîn-girmîna defçî Siloye,
Dive xirmîna sol-sapoka...

...Lê wextê govend ser hevda tê,
"Koçerîkêva" hildifirin...
Lê ka? Destpê jî nebye hela hê,
Saçûye, "hurmetê" wir dikirin...

Temadê maqûl, kurdê pozberan,
Eşqek enzelî raber kirye,
Mexulqet mîna gemîke giran,
Bera îçkêda lenger kirye...

- Oro, ca,- divê,- kasê xwe dagirin,
Qayîşa ragirin mêrkîmî, merd,
Bira çevê we hevkî şêlûbin,
Hevkî we sorbin sûret-sufet...

..................................

Saçûya me, welle tiştekî başe:
Dayîn-derdimiya cînar-cimet,
Lê her tişt bi çap û qeyde xweşe,
Her bira bolbe eşq, merîfet...

**BAVÊ MIN - ÛSIVÊ ÎVORA**

Û naha, naha,
Wextê tu diha
Ji vê dinyayê zey bûyî çûyî,
Bavo, ez teze
Mitalê xweva kaş-kamço bûyî,
Tera çê dikim zeynetek xinê
Rû-barê dinê:
Davême, awa, qesreke qube-
Nûr-neder tijî,
Baxekî delme,
Hewzekî mermer-
Reng-reng niqişî.
Û ji bo seyra maqûlê êlê
Şiverêke şîn dorê derdixim,

Kevezanekî diniqişînim
Ji dara gêlê,
Tizbiyê karûbar-
Zêrr li tev dikim...
...Bûkek berbihêr dikim cariya te,
Ofîna tera têm hewara te,
Dilxem dizarim: "Kîder te dêşe?
Çevê ewledê xwe jî birêje,
    Bike dû-derman,
    Binhêr, bavo can,
Çi êmek, êmîş dilê te diçê?
Tera, ca bêje, bînim çi kincê?
...Wey li min...ezî tima bûm awqas,
Wekî te xwelî xwera kir libas?

***

Bona dayîka min
Bavê min rokê nemirye, neçûye,
Herdem dimire:

Bahar tê, havîn, bavê min dimire...
Çandin tê, çinîn, bavê min dimire...
Birrîna pêz tê, kirîna pêz tê,
Bavê min dimire...

Şînada dimire, şayada dimire,
Hatin-çûyîna zeyada dimire...
Ser textê tijî,
Xweşiyêda dimire,
Xewnêda dijî,
Rojêda dimire...
Û... usa hertim bavê min dimire,
Û diya min digirî û dikewgire...

***

Tuk digrîyî, min jî tirê kaniyê gundê me av dizên,
Hêsirêd te dikin bilqîn, mîna çirav ji nav dizên,

Delala min, rem û îsafa dilê te aqas pire,
Wekî çevêd te çevkanî bi hêsirkî îsaf dizên...

***

Sal hate salê, û dîsa, dîsa min qutar nekir
Sêwra dilê xwe tera bi pirsek xweş fitar nekir.
Hat rojeke rind, ne bi nexweşiya mine kerbî te,
Hevkî bêkêf ket mêr-malxwengê te bi êşek cude.
Û seva jêra bikim nemamtîk wek ya nemerda,
Min hal-hewalê mêrê te pirsî, tera xeberda...

***

Dema heçê çiya dinhêrim,
Kenar-keviyê some sayî,
Usa ferruh ez fem dikim,
Ka çiye emir, çiye şayî.
Çiye lezeta vê dema kin,
Çiye qedîmî û çiye nuhî,
Usa hêsa ez gem dikim
Raj revoyê xweye çûyî...

Diçim, diçim ser vedibim
Li huba xwe undakirî,
Ber zinarekî dervedibim
Mîna cewek cewahirî.
Ser vê cewê qey da dive
Hulma berxik û karê min,
Qey ezmanê şîn çarqulbe
Bye parzûnê fikarê min...

***

Vê şevê quling ref-ref ser çiyara firin û çûn -
Ezmanê çît û çarsev meqeskî birrîn û çûn.

Ax, dîsa xurdilî xêv, guh pînckir penc deranî

Hisreta mine ecêv: "beraza" min beyanî...

Çendî wext dînc bûbû- kerr, min tirê xilmaşe ew,
Ji kubra reng û ruhber têre, bê talaşe ew...

Lê naha çi bikim, wax, bendekî bê baskim ez,
Ser çemê wextî herçax pirtî per, pêqaskim ez...

Telabext roda berdam, û diçim, diçim, diçim
Ber bi wir, ku siye, sam, dojeye, miskenê cin...

Lê bahar, berrî û ber? Payîzêd bi aş-arvan?
Lê çem, çiya, rez û ruhber? Lê kêşa koç û karvan?

Lê kubra çûktya min "no"? lê kêlma amojna Hac?...
" Qulingê beriyêne, go, diçine Serhed û Hec"...

Payîzek zerîn bû, ax, berdana berîn bû, ax...
Li ezmîn quling qûrtyan, li erda kerî bû, ax...

Firîn çûn ew roj, ew ref, amojin û zarutiya zêrr,
Firîn ew ref jî îşev, dagêre, dilo, dagêr.

Em diçûn şerq û şimal, negeryan berrî û best,
Berbi hîv, stêrkê şemal nefirîn hisret-perest,

Em xwe jî dagerin, dil, em xwe jî vegerin, dil,
Ji xewnêd xweye xadim, hisretên nûre fadil.

Ez mîna Evdalê kor, tu mîna qulingê wî,
Ser koziya tendûrek sar kund vedin mîna sêwî.

Dewsa bext, bengzê bedew, erd, erşê bê sero-bin
Bi kaxe avsîr û dew qorîbin, îtqat bibin.

Û den-den dua bikin ji Xwedê, bende razî,
Hetanî dibin kozî, hetanî dibin kozî...

## ÇENDIK Û ÇEND SAL

Çendik û çend sal
Mame kerr û lal
Çawa komira

Bê zman û zar
Li bin erdê sar.
Û îro heger
Gulpîn ji min bê
Bişxulim gurr-gurr ez li ser dikê,
Hûn şaş nemînin,
Hûn şaş nemînin…

Çendik û çend sal, çend bahar, payîz
Baskhem nekrye min Cûd û Êrbîl
Û Sîs û Sîpan, Serhed û Sibîl…
Qaz-qulingara neqûryame zîz,
Negazyame tev pûpûyê bihare,
Nequryame tev ewrêd eware.
Û îro heger
Grmîn bê, gujîn
Qasî qarxûnek çol-banî paqiş
Kêşbim û herim bêsewda, bêhiş,
Hûn şaş nemînin,
Hûn şaş nemînin…

Ev deştên han merd,
Destên şiyêrnivîs
Vê dewra nemerd
Nebûn kergîtê porê qismî qîz.
Û îro heger
Bikim tûfe-tûf,
Li hevxim destê betlome, miqûf
Wek kevir-hesta,
Agir bipeke ji ber van desta,
Hûn şaş nemînin,
Hûn şaş nemînin…

Ev çevêd hewce,
Wekî nedîne ew bax û baxçe,
Ew çiya, ew banî,
Çiya jî kubartir bejina Barzanî,
Eger nişkêva Dicle û Ferat
Bilqîn kin, bikşin

Ji herdû çeva,
Hûn şaş nemînin,
Hûn şaş nemînin...

Û naha, hergê
Ez ev ewledê miletê hê dîl
Bivim luxmeke
Destê pêşmerge,
Biteqim bin turumpêlek zîl,
Hûn şaş nemînîn,
Hûn şaş nemînin...

Lê îro, feqet,
Li rêke emir teng û frêqet,
Milê minda tûr,
Dînc û dinêdûr
Wek sexîrekî li guhê gunda
Herim xalifî, belengaz, unda,
Hûn şaş bimînin,
Hûn şaş bimînin...

***

Kurd xerîbdoste,
Kurd ji mileta aqa hiz kirye,
Wekî navê wan
Bi hewas-heyran
Ser zar û dilê kurdada dijîn,
Gotye Înglîs,
Romo û Receb,
Kurê xwe ezîz
Navkirye Ecem,
Navkirye Ereb,
Ûris û Gêrman.
Û hela Çerkez,
Cahûd, Emîran..

Kurd xerîbdoste,
Her milet û merd
Ser zar û dilê kurdada dijîn,

Lê hene nemerd,
Ku naxwezin kurd
Erda jî bijîn…

***

- Hinek hene,-tuyê bêjî,-
Malê dikin palat...
Hewşê, garaj û jinê jî-
Serdapê-xas, xelat...
- Êh, çi bikim, evda xwedê,
Ya min jî wa lêda,
Merîfeta min tunebû
Di wê rê-rismêda.

Hema xaliq her kerema
Nehiştime miqûf:
Dane min ber-baharê şîn,
Zivistanê dêmsûf.

Siteyr û hîv xwedê dan min,
Ger-guhêrê kûrsî,
Zang û zinar, kevî-kenar-
Xwera têkim kursî...

Û hisretê qizê bedew
Xaliqê min da min,
Şabûneke serxweş, berxweş
Û derdekî amin.

***

Şev-mişev sê kire kastîn
Dest seqema wek ruhistîn.
Şev û mişev zuke-zuk kir,
Girya, derî pencirû kir.

Hema-k derî sivê vebû,
Banzda hundur, bi min şa bû,
Dest û lingê min ramûsa,
Lîst, reqisî babetî sa…

- Şabe, şabe, kelbê kêfxweş
Û nenihêr me-evdê serreş...
Em jî carna xweşiyêdanin,
Em jî carna reşiyêdanin.

Nav reşiyêda em dizêrin,
Reşiyê çetin dadibêrin.
Lê dema bi destekî rem
Dertên nava xweşiyê bêxem-
Em ji roja xwe buhurî
Aqa dikin gazin-girî,
Wekî xêr û xweşiya me jî
Di ser meda dive reşî...

## USA MIN DIXWEST

Mîna ku meriyê tokê lêdayî
Davên nav xweliyê,
Ku ziyan bibire ji hinav- hestya,
Ûsa min dixwest
Serê xwe bida ser bedena te,
Belkî dilê min
Hevkî rehet bûya...

***

Ez bimirim, bengz-beşerê vê tolbavê nevînim,
Kîn-kirêtiya evd û îsan, dek- dolavê nevînim,
Qencî-qelpiyê dinê hene-du beraşê miqabil,
Ez bimirim, mîna arvan xwe li navê nevînim.

***

Gelek fort û çêrr min ku seh kirye,
Min bi dûrşerî hevsa xwe kirye.
Lê xeysetekî kûçka pîs heye:
Çiqa jê direvî, ew aqa tê te...

Û dema naha pirsek pîs dibhêm,

Ez bi irinê dil xwe-xwera dibêm:
"Kul di teda bê, netiştê, ne tu,
Ne ji miletê Barzanîyî tu..."

Û hingê, hingê carekêra zerp
Hiltê dilê min şayîrtiyêyî nerm,
Dişide merd-merd, jor radikeve,
Çawa konekî sitûn berkeve...

***

Bikin toz û fisildûman,
Kirêtêd bê dîn îman,
Ger çiyame, serê min wê
Bixwêne sal û zeman.

***

Hûn usa min nenihêrin, nevêjin-kesîve Fêrîk...
Tamê xweyî nîvçêkirî nikare bîne sêrî.

Nikare xwera "Volga"-ke layîq bikire,
Saçûya bavêje, bide- bistîne, qelena bibire,

Nikare bêminet rûnê rex merdekî,
Hezar manat pere bixwe li erdekî...

Ezî dewletîme bê hed, bê hesab, bê çap û qeder,
Xezina min heye çelkirî serê çiyayê Qemer,

Sor û sipî, şîn û qîçik, kesk û zer-
Bahar-bahar bol û bilet dide der.

Xezina min ji Romê tê, ji Romê wêda,
Tê û nava vê "sandoqa" mine sêrêda

Usa şingîn, zingîn jê tê,
Dil pêra dihele, ruh diçe cinetê...

Xezina min heye – zêrrê xurû helandî-
Ser serê delala min – têl-têl kişandî.

Û ez qêmîş nakim vê xezina xwe baş

Bikim şerav, dirav, avto, tam û taş,
Seheta zêrîn, gustîlika bi qaş.

Xezna min erhede heye – bol û bilet
Li rû ber û berya, li ezmanê bêhed,

Ew av, rez, teyr-terewil, steyr-peyrê zêrîn,
Dîna xwe bidinê, bi dil lê binhêrin-

Û nevêjin, dêmek, kesîve Fêrîk,
Mirazê xwe nîvcî nikare bîne sêrî.

## HÎVERON

Vebûye ezmanê bi steyr xitxitî,
Mîna parzûnê şînî pitpitî.
Navda sîs dike hîva giloverr,
Wek kila rûnê nivîşkîyî terr.

Hesabê şop û şirkê avdewê
Nûr dadipale nerm nava hewê.
Binda birqokê berfê lal û durr,
Weraq vedidin usa geş û gurr.

Aliyê roavayê bi keys-kubra siyê
Çilk-çeva bûne gerr-guhêrê çiyê.
Him ba, him bende razane kûr-kûr,
Lê nizam bi çi heyr-hisreta dûr –

Vê şeva şîrin hêbet dizûkin
Yek sehê şevder, yek jî dilê min...

***

Ev şev şeva hîveronê,
Çi çayîrek bê ser-binî...
Desa hîvê kete honê,
Gul-sosinê ezmên çinî...

Qirix hilket ser miskînya,
Hîv dakete ser Dibûrî,
Derdê dilêm gula kurda,

Tu min dûrî, tu min dûrî...

Binhêr, kew çû paşila kewê,
Bilbil ser gulêda xare,
Dinya alem ketye xewê,
Lê dilê min zare-zare...

Ax, dil zarre, muhbet dêye,
Te nat negot "lûrî, lûrî"...
Derdê dilêm gula kurda,
Tu min dûrî, tu min dûrî...

***

...Wext tê wextê, ha min diçin, ha car dinê min dizvirin,
Ezê dinelim, diqelim, dikelim, dikewitim.
Hemî ev çend sale mîna kûrekê dişewitim.

Hûnê minra dew û doz û qal û ceng û şerrin,
Min puf didin, wekî zû-zû bişewitim û herim.

Lê ezê mînanî agir-ardûkî darî terim,
Ham-ham nikarim bişxulim, bişewitim û herim.

Kizîn min tê, çizîn min tê, dû min hiltê, dûxan hiltê,
Diçe nava çevêd weye nebar, nexwez, kîn û sitrîn
Û hûn kerba digrîn, digrîn, digrîn, digrîn...

***

Berê çembya, berê xembya,
Dîtina rê, yan rêza,
Asaxîbya, xatircembya,
Derbaz dibûm ez hêsa...

Naha nava her gavekê
Ez sed qaqî dibînim,
Sed pirsîra – tu cabekê,
Niha têda dimînim.

## MIRIN Û MAYÎN
### ŞIKOYÊ HESENRA

Sakartvêloyê av xwe dikir,
Hetanî sivê av xwe dikir.
Sivê tevê da, ber me raket
Şaristanekî bedew, bikir.

Mîna xeysetê emir lez, bez
Avtomaşîna me dipekî...
Lê te zef dixwest bi heyir-hewas
Ber her tûmekî xwe egilekî...

Lê te zef dixwest li keviyêd kevz
Lûvîna Kurrê qedîm sehkî...
Lê te zef dixwest li dûr, derez
Dilê xwe çil û çiyara vekî...
Û wan çil û çîya, ruhê xwe tez
Ruhê Vajara perwedekî...
Kaw bû Gurcistan, esil bedew,
Mînanî huba ewil bedew.

Û teze li wir
Te fem dikir,
Ku çira Çavçavadzê digo:
"Bînaya çeva, Sakartvêlo..."
Teze sax dibû, qey bê, Tabîdzê,
Teze te Şota raçev dikir...

...Lê em wê rojê çûbûn Tivlîsê...
Me şayîrekî xwe çel dikir...

## ŞERA ZER

Kesek tune hilde bîne şera han:
Siheteke li ser têlê raxistye,
Dane birrîn bala min – erd û ezman,
Surra sêrê hinavê min daxistye.

Çawa bilbil diçe berbi bax-bostan,
Usa dilêm diçe berbi şera zer.

Minê çawa xwera têkira tuluzmet
Û bînkira û ramûsa şera zer.

Ba tê, ba tê, ber bayê bûye babirkan,
Ruhêm bera cinetêva derxistye,
Kesek tune hilde bîne şera han:
Siheteke li ser têlê raxistye...

***

Li zeviya emir heval û hogir zû ji te biryan,
Tu hela bengî, zeriyêd cewahir çûn, ji te biryan,
Tu xaşxaşk bûyî, dor te digirtin mînanî qalçik,
Te ku şax veda, qalkê dora te hişk bûn û weryan...

***

Pîrka mine rem
Werda remetî
Digo: "Min xarye
Ava heyatî.
Digo, ez namirim,
Hetanî hetê,
Ezê bimînim
Li rû, hewatê.

Pîrikê rastiyê jî
(Nizam çi wextî)
Xarye, qey bêjî,
Ava heyatî:
Va ber çevê min
Ew sax, silamet,
Destê wê di bin
Mêzera xilmet,
Berdevka çîl ber,
Sedef tijî ser,
Kumişk li sêrî,
Şera reş dorê,
Kund vedaye ber
Keviya tendûrê.

Pêşa dêrê kesk
Pejal vedaye,
Pişîka belek
Ser pal vedaye.
Çevê xwe girtî
Dike –mirre, mirr,
Silq dike çizîn
Nav tendûra gurr.
Û beşereke
Şîrin ser lêvê,
Hikyata "Silqo"
Ji mera divê...
Ji mera dike
Gilyê cinetî
Pîrka mine rem
Werda remetî...

## JI ROJÊD BUHURÎ

Quçe sergîn-qulçê xênî,
Du cot mirîşk ser razayî.
Diçûrisî çira tenî,
Piş çeperê pez dikayî...

Dor tendûrê-zarr û zilam,
Lingê wan ser qirbiyê çayê,
Çevê wan li peltika nan,
Lê kilît ber pişta dayê...

Dayê kevnekî gincirî
Pîne dikir, dikir serpê
Û hey dêrî dinihêrî,
Kanê kengê malxwêyê bê?...

## ODÊ KEVIN

Mertekê rizî, maxê qelişî,
Çop û şembelîk pêva darda,
Hêlînê kêranava pelişî,

Sitûnê palik ber dîwara...

Bexîrê sik-sar, bê kêle-kozî,
Peltik-pêçirê kevine sade,
Kerrayîk li ser hevda tevizî –
Odê hizhiziyê hezarsale...

Îda dimirin, ketine "ber ruh"
Bi rewşê xweye kevine sade
Lê didine min nifûseke nuh,
Li min can dikin xêlî wede...

***

Dîsa gulan gelyara hat,
Ba bîneke xweş bela kir,
Hîv ji milê Miskîn hilat,
Li çayîra çem qela kir.
Dengê beqa xweş-xweş raçya,
Ça fîqêxin şivanê çiya...

Qey bê, ne sî salî berê,
Li vir çend seheta pêşda
Pez guhêrê da mexelê
Kurikekî qamçî destda.

Şivanê ap tas hilanî
Û kete ber mîke hirrik,
Te tirê hîv jorda anî,
Danî orta xwe û kurik.

Wan firre-firr şîrê germ xist,
Du nana ser hevda anî.
Paşê şivan ttûn derxist,
Kurik ser pot serî danî.

Bala xwe da siteyr û peyra,
Ew arîka wane, qey bê,
Wekî diya wî hewas, heyran
Diniqişand şeva eydê...

Hîv "kuleke"... tîrinca nûr

"Dolîdanka" ji hermûşe,
Daketye ser wê gola dûr,
Ku dibiriqe nolî şûşe.

Kurik kete nav mitala,
Kete ewê "dolîdankê",
Bê nerm hejand, beqa sitira,
Û ew raza ta berbangê.

## PÛPÛ

Tarbûyî li ser dûkêşka bê dû,
Bi kilama xwe yekta, yekawaz,
Bin qeydê meha martê teverlû
Pûpû distirê, dike gaze-gaz.

Kê bistira pesinê vê hewa sert, sar,
Vî xelqê-xeyset hewahildayî?
Xêncî pûpûyê şevkoxî bêçar,
Xêncî şayîrê bi xewn xapyayî.

***

Vê şeva şîrin, şeva şerbetê
Zeynê distirê,
Nûr û nexş kiriye metihê muhbetê
Û min jî tirê
Beyarê berfî ber min bye sifre, û gerr bûne tas,
Ji cêrê hîvê xulp-xulp dadigire
Yek şeravek xas.
Veduxum, û nav nûra muhbetê
Helyame, tirê
Vê şeva şîrin, şeva şerbetê
Zeynê distirê.

## MIN BÎRA HAVÎNÊ

Min bîra havînê gund kirye,
Min bîra şevînê gund kirye,
Bîra wan şiverya hêşîn...

Wekî ku dibire perê gund,
Ber malek sed sale, nolî kund-
Melisî nav çayîr û çîm...

Pîreke pazaxe pitinî
Der malê nancûcik diçinî,
Diçinî û dua dikir.

Ceweke cinet li berwarê
Seh dikir dua wê extiyarê,
Seh dikir û xwera dibir...

Ecemkî çoş dikir "hêşekê":
" Ha werin, soxîk û pêjekê",
Tax bi tax jinekê dikire qûrîn...

Ser "şoşa" nav gunde reqyayî,
Li pey du canegê westyayî,
Erbekê dikire çirîn...

Ser kopê erbê em syar dibûn,
Di aliyê adada xar dibûn,
Gol digirt, xwe davît golê.

Digeryan em hetanî dereng,
Diçinî me tirşo û kereng,
Pêqask û pincara çolê...

Havîne, ez dîsa heyîrî
Digerim van çolê çayîrî,
Gundê şên, şiverêyê hêşîn,
...Lê min bîra havînê gund kirye,
Min bîra gulçîna gund kirye,
Bîra wê şiverya hêşîn...

## HECÎYÊ CIHDÎRA

*Bona hevtê saiya wî, bi hizkirin*

Ew kî dibêje - hevtê salîme,
Min xitim kirye deh û du sî,
Ew "hevtê-mevtê" kê lev anye

O li min kirine xewna qazî...
Îda "hobêlyar", îda "emekdar",
Îda "aqilbend", "kana ulma",
Îda "nivîskar", "doktor" û "dersdar",
Nizam çi û çi...na, qurba, na...

Kengê min hevtê berevok çêkir,
Hevtê cildê xurt - xurû çîrok,
Hevtê serhatî-beyt ji ber lêkir,
Hevtê cild kilam, hevtê dîrok,
Hevtê laûjok, hevtê nivêjok,
Hevtê qelîbotk, hevtê qewilik,
Hevtê metelok, hevtê zûbêjok,
Hevtê bend beytê "Kerr û Kulik",
Hevtê berevok kilamê şînê,
Hevtê ya şayê, xêr û xweşiyê,
Hevtê varîyantê "Memê û Zînê",
Hevtê yê "Sîabend û Xeca Zerîn",
"Ûsivê Nevya", "Ûsiv û Xezal",
Ya "Zembîlfiroş", "Xanê Çengzêrîn",
Û hevtê şaxê "Rostemê Zal",
Hevtê pirtûkê şiyêr û poêma,
Hevtê ferhengok, xebername,
Hevtê yê dersa, hevtê yê ulma
Û hevtê pirtûk jî yê tercma...

Û Xwedê ku hat hewara hevtê
Û du mileta, ya me jî tev,
O min nivîsî hevtê "Hewarî",
Hevtê romanê baş û bedew-
Hingê, heyrano, hevtê salî na,
Hiz dikin bêjin sed û hevtê,
Hingê, qurbano, ez jî tevî we
Çi bêjim – bejina siyarê min tê...

1978

## SIBA ZIVISTANÊ

Kew dibe kerr-kerr tasa ezmîn sût,
Elegez dibe sêxca durr, yaqût,

Li berpêşa çiyê mirêxa mijê
Dimelise ser kelefêd kurşê...

Şems hêdî hiltê, Dibûrdaxê som
Zer dibe, mîna şîrê rûzihom.
Di bin lêvêda zoxale sya terr-
Bi kubira qerqaş beşervetê gerr.

Mînanî xewn û mitala çûka,
Gultima kewa difire dirûnga...
Dû dibin sitûnê mermere hêşîn,
Hildikevin ber arîka ezmîn.

Tev dilîze tevî şêbiskê Şurê,
Dil mîna çivîk, xweber distirê.

## MISTEFA BARZANÎRA

Me mal-miletî nekir şîn-girî,
Şîna şehîdiya te Merdemêrî.
Me li roja ava nihêrî,
Wekî ku emir dide rojek din,
Me li toximê şova nihêrî,
Wekî ku zeviya dide gîhandin.
Me li serê wan lawa nihêrî,
Ji kîjanara dibên Barzanî
Û me bi sebirê girî guherî,
Me bi hêsira nekir arzanî...

Bera ew milet hêsira birêje,
Yê ku nikare birêje xûnê,
Yê ku çewdera rizî davêje,
Dixweze gênim hilîne şûnê...

Lê me aqa xûn meydanada rêt,
Wekî em pêda bûne Cegerxûn,
Em bûne Hejar, Şivan, Celaldêt,
Xoşnav, Xêrûlle, Leylê û Mehmûd.
Em bûne lawê wan dayîkê tê,
Ku tûr vedide herke bîst berî,

Û miletê me nav sur û şextê
Ragihîşte bîst mîlîon neferî...

...Belle, serê me ket, lê em **nagirîn,**
Şîna te nakin, bavê cimetê,
Emê mînanî kurikê dêmbirîn
Bigrîn, bikenin ber hemêza dê:

**Dayîka Kurdistan... kengê xwe ragirt,**
**Kengê merema te hate sêrî,**
**Hingê wê nava şaya meye gurr**
**Bihele şîna te merdemêrî.**

s.1979

***

Ji ewê rojê, ewê hindavê,
Çaxê hevaltî te ji minra kir,
Mîna rezê ku kulîlka davê,
Te min dûr xistin heval û hogir.
Te dor-bera min kaxan kir, şêland,
Te raqetandin him dost, him dexes,
**Çi hevalekî kumreşî, talant,**
**Naxwezî xêncî te hebe tu kes.**

***

Îda "qirix" hilatye,
Serî ketye rojêd kurt,
Cenubêda daketiye
Ro bi meydaneke xurt.

Germ ezîz bûye wek yara,
Diçe Şam û Helebê,
Ez li teldê dîwara-
Pal vedidim ber tevê.

Ramûsana wê şîrin
Nûş dikim wek gulbaxan,
Belkî ku pê qurîbim
Heta sal din van çaxa...

***

O, mûsa min, o çara min,
Dema tu têyî hewara min,
Min tirê wekî Rostemî Zal
Ji minra dibe pişt û heval...

***

Por û pencê şemsê zêrîn
Pîj bûn nava hewê,
Sêwan şîn û zer xemilî
Ber nûra bedewê.
Her teherî telxe veda
Heta gaz-gêdûka,
Xam, Dibûrya sovay kirin
Navda mîna hûta.

***

Ji hisreta çiya xewa min nayê,
Diçim bilindciya-hewa min nayê,
Bi xewn difirim dinya zarutiyê,
Ew jî bi minra kewa min nayê.

***

Mînanî deravê baharê,
Ser heyr û hisretê min germ
Gol dibin dîdemê nivîsarê
Şayîrêd şulete miqerm.

Şîraza Xayam û Sehed,
Bax-bizinê Vîrgîlîos Maron,
Dîkanka Gogole cinetî,
Lêçîngêr, Londona Bayron.

Bax-bergê Yêsênîn kîmkîme,
Bagera Pûşkîne geleş,
Min kamço dike wek çiyayê me,
Wek “Kaniya Celîlê Keleş”...

Mukuryê Sîbîrê ez dikim,
Tûndira nênêsa, çûkçiya,
Cizîrê Bota ez hiz dikim,
Meke û Medîna hecya...

Dilê min difire Viyêtnamê,
Cineta bi bax û lotos,
Erq-ava Sûyêzê, Panamê,
Bîngola bi gelî, geboz...
Pey kîjan hisreta xwe herim,
Mimkûnbim bi kîjan erdî?
Ser axa çi şayîrê miqerim
Zêde kim axa xwe kurdî?

Ez bûme mîna wî bavê kal,
Yê wekî ewled û lêzim,
Reşyane ji xwera çarniqal
Rûbarê vê dinya mezin:

Yek Şerqê, yek Şamê dimîne,
Yek serê Sîbîra sik, sar,
Yek heyr û hewasê dibîne
Li Malta bi zang û zinar.
Yek dijî li yêrê fransiz,
Yek – Yapon, yê din li GDR-e,
Û bavê rebenî ewledhiz
Nizane kalîda here...

***

Nedin min nav û dengê nemira, text û tacê şa,
Misqala guman bidin min, evdino, hevaltîk amin.

Hêsirê min çevê minda sar nekin, dema mine şa
Xurû bihêlin mîna şerava berkelê şîrin.

Pêl hesa mine xilfikî mekin, ger nikarim ez
Meşq û meydana şaristaniyêda gavdim firêqet...
.............................................................

***

Min çêkirin ev tam-taşê tûfîn,
Li dorê kişand sûreke mitîn,
Û çawa pezhiz, çawa kurdê çiya
Axilek avakir min li sirtê çiya...
ûû
Ser şaneşîn û şênlikê minra
Salê bifirin nolî sîmira.
Û wextekê jî du rêncber wê bên,
Xwe bidin ber siya axilê minî şên:
- Hey gidî,- bêjin,- Fêrîkê rehmetî
Ser van tam-taşa çiqa zehmet dî...

***

Qurbana tamê xwe min nedaye.
Dixwezim mîna Xayênê Adem,
Dewsa peza ku edetda maye,
Hine rez bidim, bîvok û bedem...

Lê, tirsîm xaliq qebûl neke rez,
Hê minra bajo kina qîr û sîr,
Min bizêrîne bi derd û merez,
Çawa ku zêrand Xayênê hêsîr...

...Lê destêm nagire, wîkim bi Xwedê,
Birêjim xûna heywana bêzar...

***

Û rebilalem bi qas-qudretî
Kêlimî û got: - Heywanet nekuj,
Ji hûtê bera, ji gura girtî
Heta mûrînga nuxsane nekivş.

- Lê malê goştî? Ya rebilalem,
Ew nayên kuştin dest benîadem?
- Êh, go, şayîrê dînikî gêjî,
Gere eseyî tişkî tel bêjî...

## MAL - NEFERÊ MIN

Ne ewe, wekî em li gund bijîn,
Ne jî şeherda dijîn dil û ced:
Ji hisreta gund dikim şerr û şîn,
Ji gund direvim şeherê şulet...

***

Xaliq daxa poşmanbûnê ser dilê min daniye,
Dil-fikarê edil-esas bê îz û toz hilaniye...
Poşman, poşman... aqa poşman, ku poşmanim bûyna xwe,
Lê bûyînê ku poşmanim, çûyîn çima poşmaniye?

***

*"Mûyekî te ez nadim bi sed Zîn û Şîrînan*
*çi dibin hesavkî tu ji min Ferhad û Mem"*
Melleyê Cizîrî

Methê dîndara te nûr Meyremê
Her-bi her minê bedew bigota
Ger navkirama te jî ez Memê,
Ey Zîn-xatûna Cizîra Bota.

Cizîr û Hewlêr, Meqrûb û Şerga
Ketin kifara zevtiya û zorga.
Zevtiyê ereba, farisa, tirka
Kurdistan kirin şova ber cota.

Cot û cobarê me birin talan,
Dezge,duruşme, kaxet û kilam
Û hesav kirin em xêv û xulam,
Beytû-beyaniyê bê nexş û nota.

Û siyar dibin hê bergîrê kurda,
Ji hev bîr dikin eşîrê kurda,
Bedewê kurda şayîrê kurda,
Û me kivş dikin bi kevn û kota...

Kevne kinyata erxêd şelûze,
Dibe çêr, lêgênd,qelebotk,qise,
Lê biha nakin lêgêndê bînse
Babetî postepilingya Şota.

Babetî beytebora "Mem û Zîn"
Wê şam-şureta gênya me qedîm.
Na, miletê Mem û Qeretajdîn
Unda nabe bi tu anêkdota...

Reş nabe warê Ahmedê Xanî,
Wekî pirsa dîn-dewletê danî,
"Mem û Zîn" kire beyta ruhanî...
.............................................

Belê, em tûra wîne, erhede,
Tu Zîn xatûnî bi nûr perwede,
Rusqetke, ji ber nûr-nedera te
Vêxim şemdana kilama kurda...

***

Min dîtin qesir û qubê niqişî,
Min çêkir şane-şînekî zeman.
Lê ruhê min hê nav teda dijî,
Xaniyê meyî kevn - çevî li ezman.

Qe nizanim jî gundim, yan bajêr?
Paldayîme, yan digerim çolê?
Royê daxistiye dolîdanka zêr
Pişîka belek xwe têda diklê.

Şîrê nixamtî wir haveyn digre
Bin çize-viza mêşê anîzaz,
"Pîrka hevhevok" qulçida vedigre
Têl û tevnê xwe ziravoke xas...

***

Tîrinca tevê kulekêra mêl daye dîwêr.
Avzêr bûye, qey bê, dîwarê sivax-qîçîk qilêr.

Mêşeke mirî zivistanêda can tevizî
Bin tîrincêda ruh berda hatye, dike vizîn.

Pîrek rûniştye, pişîk telyaye li ber pêşê,
Hey dike mirrîn, hey guh pînc dike aliyê mêşê.

Bizineke şîn, li ber qarça wê pirtî pêtavik,
Qulçê xênîda xwera dibjêre gîhê lêlavik.

Pîra rûniştî gore çêdike, pîj diguhêre,
Serî hiltîne û li kuleka tev dinihêre:

"Welle, divêje, roja êpêce bîn vedaye,
Xwedê avake, bi xweşî diçe, hewa sayiye"...

Derva dewate, ji dûrva dengê def û zurnê tê,
Gazî min nekin tu kêf û şayê, tu dewatê,

Bihêlin, xwera ez aha rûnêm hetanî sivê,
Sivê dayîkê serbidewê çêke,
Sivê "Gîzkoye", dayîk divê...

***

Mînanî bezê ser hurê pezê
Girtye rûyê ezmîn ewirê payîzê...

Vê sibê şebeqê, ez hê nava ciya,
Hesek ser min ket ji derî, baciya,
Ji nava hewa payîzêye nêm
Piste-pisteke şîrin dibhêm...

...Nizam, diçin aş mezinê malê...
Nizam, bazarvan diçin bazarê...
Nizam, birrê pêz dajon qiraca...
Nizam, koç dikin zomê kurmanca...
Nizam, seferlya dane serê riya...
Nizam, difirin qulingê berrya,-
Hesek hisretî serê vê sibê
Min kamço dike ber bi cenûbê...

***

Selam, xweyê çînêd mezin!
Ez ji wera bext dixwezim.
Bera ser wan kursiyêd bilind,
Bi wan çek û rihalê rind
Hûn bibriqin nolanî baz,
Û...nenivîsin, nebine qaz...

***

Û bere-bere em jî fem dikin,
Fend û fokûsê dinya beter,
Lê yazix, heta carkê fem dikin
Bîst û yek cara didine der...

## ŞIKILÊ ARAKSYAYÊ

Hey cahiltîya bêkeder,
Hey hêbeta dilê dê...
Bengî bûbûm sewdeser
Ser zerîke şuletê.

Bi kubira wê dinya ron
Xemilî bû terz bi terz.
Min şikilê wê kir îkon
Ber xwe kurdê pût-perez...

Merem dikir min şev-roj-
Dayî qaym û qala xwe-
Ewê gula berbiroj
Bikim xemla mala xwe...

"Ha binhêr...,- diya min carya,-
Tu dîn bûyî, jîr bûyî?
Yan sêwîkî serê riya
Bê şîret û şîr bûyî?...

Çima êzdî qir pê ket?...
Ax, me çi dî, çi nedî...

Ma, wê teniya nisobet
Bînî bêyî rûyê medî"...

Dayîkê got, ez li ber
Dilşkestî mam ker û lal.
Roj derbaz bûn, meh-li ser,
Rojekê jî çûme mal,

Min dî, vaye, dayîka min
Ser şêmîkê rûniştye,
Dêmê dilsaxî momin
Xîyalada dahiştye:

-Tu hatî?-got dêm melûl,
Bir paşilê destê sist,
Şikilê dosta mine nûr
Ber bedena xwe derxist,

Mîna dîlime kate
Li pêşberî min ragirt,-
- Han,-go,-şikilê ewika te,
Min ji destê zara girt...

## ŞIVANO

Şivano, karî – pêz biçêrîne,
Yan na ciyê bade xwe nezêrîne...
Bernede pezê xelqê bêxweyî
Li van berpal û pêşê vî çiyayî...
Û bira jina te jî mecbûrî
Şivê hilnede, neçe ber sûrî,
Û qorixçî jî wê ranemûse,
Û xelq jî nevê ew bênamûse.

***

Badîlhewa nav ewê kûra duh
Digerim ewan persengê êgir,
Ku germ dikirin li min can û ruh

Û dikelandin minra şîr, şekir...
Bayê bêferseng temam sar kirye,
Kirye toz, xwelî,
Û dipekîne dev û çevê min
Usa bawelî...

***

Erdî sipiye, sirtî sipiye, rê wê sipiye:
Vir gotine- "ev topraxa dêwê sipiye".
Berfê usa deşt-kewşena tev rahiştye,
Qey mirîşkek çîl, terikî kurk rûniştye.
Danizilye ser serê çiya, ezmanê sût
Wek kaseke serê dêwa dur û yaqût.
Ro mînanî mertala zêr şewq û şepal
Werqê dide kuriyê berfa almas û lal...

## WEZÎRÊ NADIRÎRA

Dibêjin Wezîr bedew, bilind bûye,
Mêrê muhbetê Wezîrê Nadirî,
Dibên, kivşekî miletê kurd bûye,
Dara cinetê Wezîrê Nadirî.

Lê, dibên, birrîne dara rez li ser-
Çawa li Şerqê dibirin beyanî
Ax û bostanê meye rez û ber,
Dikine ardûyê kêfê xwe xûnî...

Emê bên birrîn, belê, bê îmdad,
Hê binelin nav derd û dilêşiyê,
Çaxê vê dinya bi fend û îcat
Em hê bi kulmê diçin dirêşê...

Çaxê hê dewsa beyreqa milet
Fûr dide ruhê kîn û ernûsiyê,
Nav birîna bêtifaqiya milet
Çê dibin kurm û kêzê cesûsiyê...

Mîna şêrekî bi fendê rûvî

Qend û bend bûye cimeta kurd,
Li ruh û rikê azaya kûvî
Diqirqile nav gampoxeyê qird.

Wê bicivîne bi top û tifaq
Hemû wersele û weynaxê xwe,
Lêde qet bike benda taq bi taq
Û rapêç bike av û axa xwe.

Hingê wê şên bin, bi bax û bostan
Dêrsim û Duhok, Hewlêr û Cizîr,
**Û ber daminê dayîka Kurdistan**
**Wê guldin xortê mînanî Wezîr.**

## ÎBOYAN

Îboyane femîla ıne,
Femîleke sade û kurt.
Lê eyane femîla me
Bi serî wî hekîmê kurd.

- Tu çî Sehîd Razgoyîçî?-
Bijîşk min dipirsin hercar.
- Birê wîme,- ez cî bi cî
Ji wanara dibêm dilbar.

- Çira, feqet,- ewan dibên,-
Ew qemere, tu wa qerqaş?
- Qey ew xala çûye,- ez dibêm,-
Ez bavanê meyî qerqaş.

Birê mine qerqaş, qemer
Gelek hene xêncî Sehîd.
Hinek dijîn bi mal, nefer,
Hinek –xerîb, tenê, wehîd.
Hinek – xwendî, hinek-nezan,
Hinek li gund, hinek bajêr,
Hinek nava kela-zindan,
Hinek di bin agirê şerr.
Hinek dûrin, hinek nêzîk,

Hinek – Îran, hinek Tûran,
Hinek sond dixun bi "êzdî",
Hinek – bi "kitêb û quran".

Lê em gişk jî birê hevin,
Temê dê-bavekî eyan,
**Navê bavê me Kurdoye,**
**Navê dayka me – Kurdistan.**

***

Dinya, tu çiqas delalî:
Êvar û berbangê safîva,
Bi erş û ezmanê xik-xalî,
Bi mêrg û çîmanê avîva...

Çi kawe zerbûna payîza,
Şînbûna bahar û havîna,
Beşera biçûk û ezîza,
Qurtîna teyrê ser hêlîna...

Yarebî, emê jî bên birîn,
Ji keys û kubra dinyayê?
Nevînin rûyê şemsê porzêrîn,
Nebihên hetanî hetayê?

Ji zerpa hesa vê zulimê,
Ça çeqmaq li kêvir dikeve,
Dilê min bengîda, tim-timê
Pirîskek gumanê vêdikeve:

Texmîna min, mîna kilamê
Ruh dijî, ji can der dimîne...
Texmîna min rebê alemê
Haqa jî bêîsaf nîne...

## BIN HÎVERONÊ

Vêsînin hemû van lempê tokê,
Bira xurû be dîndara hîvê!

Werin, pismamno, em qe na rokê
Bin hîveronê rûnên ser şîvê.

Wede difire, zûbe, yan dereng
Emê undakin vê dinya delal,
Werin, dil û ced em deng bidin deng,
Derbazkin demek hevaltiya helal.

Em dila derxin mûrêd mixenet,
Çawa sitirya desta derdixin,
Û bi sidqê qenc, bê tirs, bê minet
Dirêjî hevkin destê dilê xwe.

Ca binhêrin, çi bedewe ezman...
We qe nepirsiye bi dilê bengî:
Kê meda antêx kirye ev cahan,
Heyr û hisretê hezar yek rengî?

Çima xaliq wa dide merde-merd,
Dike maşoqê rewşê dinya ron?
Û çima davê bi destekî sert
Xûn û xebûra kêşverê Karon?...

Dibe ku şerav şêwirekê bide?
Em dagirin tasê gundîtiyêye kevn,
Vexun bi bîna gîhê perwede,
Bin nûr-nedera hîverona xewn.

Hingê bin tasê xwe valakirî
Emê bibînin bengizê kal, bava,
Kubira zarutya xwe unda kirî
Û bigirîn bi dil ça zara sava.

Û wexta îda şewq-şemal rêtî-
Hîv here ava piş çiyayê Dibûr,
Em bi dilê dînc, dilê verotî
Hemêza hevda xewra herin kûr.

Û...xwezil mîna wan çirê berê
Em bitemirin xewêda ker-lal
Û qe derc nekin ewê kederê,
Ka ça unda kir me dinya delal...

## DAYÎK Û TENDÛR

Car-carna, wextê ez xilmaş dibim,
Çevê min tên girtin bi teriya gevez-
Ber min birq vetê bengzê dayîka min,
Sufetê wêyî xurûyî remxwez.

Berewil dikim çevêd wêye rem,
Xala şîne ser eniyê kutayî,
Dêrê keskî wek belçike kelem,
Dora tendûrê pejal vedayî...

Xweyîngê hevin dayîk û tendûr:
Dû keys-keremê rû-barê erdê,
Ça ji dilê dê, ji wê "çela" kûr
Germ û bereket sal-misal dertê...

Ez xewna xweda diya xwe dibînim
Timê li dora ewê "çela"germ,
Û hişyar dibim û ez bîr tînim
Çela pala çiyê- qûçe xwelî ser...

Sare ew çela çolêye sade,
Bê kêle-koziye, bê dû, bê dûxan.
**Yazix, tendûr jî rind tînê nade,**
**Çaxê bi destê dê nayê dadan...**

## KESEK PAMPÊDA NABE ŞAYÎR

Dinêda hemu tişt çevdayîne,
Îlahî li Pampa mine karxêr:
Yek marge gizêr xwera biçîne,
Gişkê zevya xwe têkin gizêr...

Darê kizîrtiyê yek ku hilîne,
Dehê şer kin boy qulixa kizîr,
Lê ez bawarim, heta ku heme
Kesek Pampêda nabe şayîr:

Pampiya dibînin siya xeysetê min
Bi fikira xweye "gongil-alçax",
Piş ewê siyêva ewan nabînin
Kar-kemala min wek Qemerdax...

## NARA MINRA

Her sibe, hertim xewê radibim,
Porê xwe li ber eynê şe dikim,
Û, hew nişkêva jêr mêze dikim:
Şîrin û delal, bêsûc-bêgune
Şikilê neviya min minra dikene...

Ez xwe bîr dikim, ez xwe berdidim...
Ez Nara xwera xweş xeberdidim...
Narkê paç dikim, Narkê hiz dikim,
Toza ser porrkê wê temiz dikim
Û bi porê xwe neşekirîva,
Ber û pêsîrê xwe vekirîva
Nizanim çawa, bi çi teherî,
Ez sahil, sivik dertêm ber dêrî...

***

Û naha, naha, wextê neviya min
Diha ji minra divê "kalko",
Wextê werandiye gula enya min
Payîza emir nemerde no,
............................
Heyr-hisretê min dibişkivin-
Mîna xeberê nevînga min...

Xwezil, sed xwezil, derbaz nebûma
Sînorê çûktiyê ter, cinetî,
Derbaz jî dibûm, perwaz nebûma
Dû pûçika nav-deng hewaketî.

Xwezil mêl bûma wan mêrg û tata,
Ser gulek gundî, merivayê,
Wekî, wextê ku xewa min nata,
Min dey lê kira, bigotayê:

- Çîlê, yan Fîlê, yan ferzkim, Meyo,
Zavitê Eyo bîra te tê?..
Bigota: - Eyî...Zavitê Eyo...

Hestiyê wî herin nava cinetê...

- Te bîre, Meyo, havîna, çaxa
Pez diket koriyê orta herd taxa?
- Mîna vê gavê...
- Dihat, hemdê xwe dikete navê...
Pembû xûdana pîlê pêz dixist,
(Dihejyan guhkê kumê wiye sist).

Dibir ew pembûyê bi xûdan şil-şo
Temiz ziya dikir, dikire pîşo...
"Agir kulîlka zivistanêye"-
Apê Zavitê wa bigota,
Pîşo bolkira kevirê hesta...
Û... zivistana biçûya oda.

Danîn, ax, çend gurz pelax ber lodê,
Radixistin ser sekûyê bilind,
Kulav dikşandin ser sekûyê odê,
Ser rûdiniştin rehet û rind.

Mêr û maqûla xwe didan fêzê,
Diçûne fêzê tirêqêd pîr:
Û usa rex hev diketin rêzê,
Xwe didane piya cahilêd jîr.

Nexşê gorê wan, şingînya tizbiya
Qey bê diketin hevra lecê-
Lev dihûnandin giliyê gur-diza,
Hikyatê "Mem-Zîn", "Sîyabend-Xecê"...

***

Metel nemînin, ey qîzêd kezî,
Ku bengî dibim ser we zeriya.
Ezê we hiz kim û qîzê we jî,
Û neviyê we jî, neviyê neviya...

Çiqa car lêvê qîz-bûkê terez
Bilivin ser xet-xeberê min,
Aqa car ezê bi heyr û hewas
Ramûsim ewan lêvêd şîrin.

## SEQEM

Seqeme, Gulê, seqeme,
Heyamê arvan û ardûyane,
Kêwrîşk ber sitara keleme,
Dilê min tendûra bêdûyane.

Ziviriye rozgara zulmê,
Ezmana kulya xwe teşiyê kir,
Bayê dîn lûvand ji kezevê,
Ji çiyêra çalmeke çîl çêkir.

Sîng-berê te gul û bihare,
Dergê ber biharê mehkeme,
Dilê min bê cî û sitare,
Seqeme, delalê, seqeme...

Serî, wek Elegez, gerdenim,
Bin piyê min şepe û leqeme,
Gul weriyan ji sîng û bedenim,
Seqeme, Gula min, seqeme...

***

Derva teveke usaye xweşe,
Qey kinêza te te hemêz dike...
Bûkek rind berbi avê dimeşe,
Kalek dirûngê kîsî pêz dike.

Xizeka dajon çend kurik û qîz,
Qasekê te jî dikin zarek rind,
Roja xweş mîna dayîka ezîz
Destê te digire, dibe nava gund.

Va, Elo pesinê îçika xwe dide,
Wekî hildaye ji tiriyê "xercî",
Bi xeberdana wîra gul dide
Bengz û beşera Xudoyê xarzî.

Bedo dikene, wekî Feremes
Vê sala pêra wê bibe aşvan,

Dewatî dibê, ku şikilê Qeymez
Dane rojnamê, çawa ku pêşvan.

Lê Xeybo wira ten digirije,
Bi kenê ekis beşevetên qîl,
Tûka wiye bi kîn û kêm tije
Dilewitîne rengê berfa çîl.

O, ela neke, ji dest bihata,
Wê sepekira rûyê vê roja rind,
Ku birq neketa van der û besta,
Şa nebya awa mexulqetê gund.

***

Zarotiya me çû riya "hatê-hatê",
Raqetya mîna karek xezal,
Îda peyketin betale, badê,
Çiqas jî herî semt û fesal.

Zarotî diçe, dewsê dimîne
Birîna birya nav me û dil,
Û bîrî çiqas dil dikenîne,
Aqa kûr dibe ew kenc û kul.

Mekeve bîrya, bêkarin bîrî,
Hilde tifala xweye tiberk,
Li ser kevçika dilê xwe birîn
Mîna melhemê bigvêşe berk.

Bi heyr û hewas jêra qiseke
Henek-hikyata emir bêsûc,
Pirs û pirsyarê delalê sehke,
Vexwe şerbeta kenê wê tûnc.

Paşê tetikê wê bigire û here,
Bigere kevî-kenarê şîn,
Şiroke - çira beqê diqure,
Çira cewa jîr dike xuşîn.

Tevî tifalê biçine kariya,
Baq bike gul û kulîlkê reng,

Bi hewas dade kuçikê pesariya
Ber derê "mala" mişkoye teng.

Hingê tuyê derckî- ji dil ketine
Bar-birînê te nolî têra,
Û tuyê fem bikî - çira gotine:
"Xwedê derd daye – derman pêra"...

***

Li serê çiyayê Qemerdax bilind
Min hêbet fitand gurekî pîr.
Gur revî, feqet, egilekirin ling
Dûrva jende min avirêd tîr.

Di bengizê wîda – hebû dew-duan,
Hêrseke şewat, agir-bizot,
Teyê bigota evî debê han
Bi ten, bi loma minra digot:

- Tu ji deng-dewê dinê xûlikî,
Reviyî evan çiya û banya,
Li van dera jî beterya dikî,
Difitînî me wek beyaniya...

## DESTANA JIYANÊ

Ez naxwezim hê ruhistîn
Minra bikene xap-xapo
Dewsa neviya mine gulîn-
Bîn beşera li ber kalko.

Tê mîna bext, şewqa sibê
Bi bengzê nûr- neder tije,
Şîrin-şîrin minra dibê:
"Kalko, de çîloka bêje"...

Û ez jêra li hev tînim
Qisêd biçûk bêşe-bêşe,

Ya "Dîk axa", "Pişo xanim"...
Ew dibêje: "Dîsa bêje"...

**...Ez bi qisa emir kamço-**
**Merem dikim dîsa bijîm:**
**Kurdistana xilo-xaço**
**Bivînim ser hev û hêşîn...**

Minra bûne xewn û bîrî
Dews û dorê Muxurzemîn,
Tirba Mehimedê Cizîrî,
Daredurya nav Mem û Zîn...

Emirê xweda min nediye qet
Şimala dûr, adê bera,
Lê min jîtiye, qey bê, feqet,
Dewrek dirêj li wan dera...

Jîtiye, qey bê, bin berê kûr,
Nav ewirada-nolanî siyê,
Li Tayga kûr, û Tûndra dûr
Û dixwezim herim sêtiyê...

Xwezil dikim nolî Nêrû
Bibim berax, lê saxe-sax,
Bêm reşandin li ser hemû
Ber û banî, ax û toprax.

Merem dikim, hezar xwezî,
Bi dar, hevan, bi rav û rêz
Tevî yekî mîna Reşîd
Çend saleka herim ber pêz.

Havînekê herime çiyê,
Û, rokê ber "kaniya Mîrze"
Hizkim yeke mîna Çîçê
Nav pilûra gîhê teze...

Herim Ûrisêta rengîn,
Serxweş siyar bim "Troyka" sêr,
Heyra Pûşkîn û Yêsênîn
Bikewgirim, bizûkim têr...

Lê yazix, çi hisretek gurr
Dilê minda kûr dikele,
Derdekî pîs, nolanî şûr
Serda tê wek şîn, şetele...
.........................
.............................................

Alîkî-kirr, hewas hizî,
Aliyê din-îsaf û ruh
Sekinîne bi nexazî
Himberî hev sivik-sucuh...

Wek beranê hikyata kurd
Kêf kok dibe, ruh wê derê
Şivkut dike hewasa xurt,
Tîne ser qirara berê...

Qey bê mera dibê bê deng:
"Kêf kok nebe wa bê fesal,
Ku ji dergê mirinê teng
Derbaz bibî hevkî sihal"...

Lê mirin ku heye herdem,
Xaliq, bi qend-qirarê tê,
Bende çira bêwext, bêrem
Tîne ziyan û qira bendê?

Ew çi sêre-ji Roavê
Şerhiz tîne heta Şerqê?
Didefîne cor û cefê,
Nava xûn-xezeva xelqê...

Şorba şerhiz gelo tune?
Yanê tune midasa wî?
Yan kulfetek gerok tune?-
Hevala hub-hewasa wî...

Ew çi jere, çi înk û kîn
Nava dilê meriyêd cesûs?
Ku dor yekî nolî Pûşkîn
Hewa şêlû dikirin mexsûz...

Çira sûda merivê heq
Dikeve dest meriyê dekbaz?
Ava dibe bextê neheq
Ser bedbextiya yê belengaz...

Çira kêfa benî adem
Tê bi qetila berx û betê?
Zêrr dibire bendê bêrem,
Yê xudanrem kesîv dertê.

Ax, beramber bide her tişt
Bo oxirmê dinyayê bol...
Dişkên qoçê dewletiya xişt,
Yê "kol" hemîn dimînin "kol"...

Eceleye ketina şah...
Sihale ketina kesîv...
Yê zef dayî zef jê diçe...
Yê kêm dayî- misqal û nîv...

Yê ku rind û rihet dijî,
Ew gelekî çetin dimire...
Yê ku çetin, bêbext dijî,
Ew hevekî rihet dimire...

Lê, rusqetke, Xaliqê min,
Ka beramber dibe her tişt?
Hergê heye ew dinya din,
Hergê hene doj û buhuşt...

Seba ku çend salewexta
"Maqûl-mqûf" tên zêrandin
Berva dibî nav cineta
Heta-hetê, aşt û amin?...

Lê seba yek, koreqedê,
Dil dide kêf-kirek rojê,
Ceza dikî heta-hetê
Nava qîr-qetrana dojê...

Hergê heye doja qîr-sîr,
Îda çira tu cenimê
Çê dikî boy evdê hêsîr-

Heta saxe li rû dinê?
Nebî, Xaliq, tu usa sert
Qûl-bendê xwe xudan îsaf
Dikelînî ser agirê derd,
Wekî qirêj derên ji nav?

Wekî safî bibe jerê,
Telî-tirşiyê gunekariya,
Ku "wê dinê" layîq derê
Li cineta horî-periya?
Yan tu "qal-bal" dikî bende,
Berî hingê li vê dinê,
Wekî "wira" teyax bide
Ber oxirmê cor-cenimê?

Awa, Xaliq, te şik da me,
Wekî bibe xuşûş û xem,
Te talant jî hemîk da me,
Wekî hertim hucet kin em.

Wekî li ser vê hucetê
Cesûsekî zef "xwedê nas"
Me ber bawerkiryêd Xwedê
Hesav bike xwedê nenas...

Lê em, wekî vî halîda
Zefî zara xwe hiz dikin:
Em qûl-bendê tene îda,
Bengzê wêda te hiz dikin...

De, wekî te kerem kirye,
Hub daye me, zên û kemal,
Wekî te "xem-xerêq" birye,
Em anîne dinya delal,-

Usa bike qe na, rebî,
Wekî em jî gav û sehet
Nebên: "Xwezil ewî evdî,
Yê ku dinê neketiye qet"...

***

Em hê gerek li Pertew beg dagerin,
Mem û Zîna horî-melek dagerin,
Ahmedê wek şems û werşeq dagerin,
Li Melleyê zimanzîrek dagerin.

Em hê gerek- Murtula beg dagerin,
Bizanbin çiye hub, helalî, comerdî,
Paşê gerek-vê dewra dek dagerin...

## HAVÎNÊ PAMPÊ

Têr nabim ji havînê Pampê,
Êvarêd hênike hîveron,
Qurîna beqaye ta berbangê,
Şebeqêd sayiye soron.

Berbanga bi seda teyradê,
Ezmanê qudretî qube
Dighîje wek sêvek cinetê,
Alîk sor, alîk şîn dibe.

Hiz dikim ez siva çîk-sayî
Şemsê rem silavkim dil û can,
Êvara ber dîwêr paldayî,
"Verêkim" piş çiyayê "Qûça"...

Hiz dikim, li "Gêdûka Xemê"
Binya pêz pal dim, û bayê xweş
Bîna pêz mînanî melhemê
Bikşîne dilê min nexweş...

Sî- ewirek ser "Gera Ûsêra"
Wê dikşe wek xewna cinetê,
Xewna min xewnerojik bi siyêra
Difire Sibîl û Serhedê,

Kîderê ber û çem fûr didin,
Qaz-quling distirên, difirin,
Lê dikin û nakin nikarin

Tewiqê min ji Pampê bibirin...

Nusla nuh ser deb û dêşa xwe
Werguhastiye Pampa kal-bava,
Lê dîsa bi rem û rêça xwe
Ro dertê û diçe ava...

Pez dîsa wê hangê dikale,
Beq dîsa usa xweş diqurin,
Û baran mîna xwe dibare,
Kew dîsa bi kewikî difirin.

Û kêra, kêra jî bûbin ax
Dilsaxêd Pampêye rehmatî,
Minra tim zêndîne, timê sax
Bi bengz û beşerê cinetî...

***

Edilî bîna bagerê û bê,
Beşerek bedew hate rûyê qulbê,
Nolî xêliya çîl ser serê bûka
Biriqî berfa gaz û gêdûka.

Mirêxa mijê mîna birê pez
Mexilî li ber pêşa Elegez
Ber dîndara şems ewirêd gewrax
Helya li serê çiyayê Qemerdax.

Mîna werdeka bi gul timayî
Sovayî kirin li erşê sayî,
Lê li du wana bi heyr, bi hewce
Dilê min firî mîna atmece...

***

Roj mîna rojê kerr dikişe,
Wede, qey bêjî, dihênije...
Lê na, mînanî pişîka çil
Kerre-kerr emirê me dikoje...

***

Tu gul - sosina gundê me bûyî,
Beybûnek çayîr-çîmana çandî,
Bi nûr û neder perwede bûyî,
Lê heyf, ber çevê min ne dihatî.
Sal buhurîne, teze vebûyî
Tu dilê minda bi bîn-bereket,
Lê yazix, yazix, tu îda bûyî,
Gula werekî dûrî-dereke.

***

Wextê şaya min kirin-
Gula Fetî miribû…
Hobêlyana min kirin-
Mehê kurmet miribû.
Awa, hemû şayê min
Bi şînava sar bûne,
Borê nav û dengê min
Buxdanava bar bûne…

***

Hiz nekiriye çîn û rutib
Serekbazî min tu wexta,
Nebûm sedir, nebûm katib,
Ne jî dolebaşê texta.

Min texsîr kir şiyêra xweda
Hukmê mîr û mînîstira,
Lê xwexwe jî, koreqeda
Bûm mîrekî nav şayîra.

***

Payîza emir ha hucûm dike,
Derp-derp lê dide, bê qudûm dike.

Em heyr-hisreta parr û baska **bûn,**
Niha linga jî me merûm dike...

***

Gere tû bikim, nenivîsim tucar,
Heyra nav û deng bavêm bêminet,
Kaxez, qelema- êgir têkim par,
Raqetînim vî mûsayê mixenet...

Ev mûsa mîna dijminê durû
Tê û xwe dike dilê min mexsûz,
Wekî surêd min xalise xurû
Veke ber dijmin, ber cin û cesûs...

Teze ez dikim axîn, qare-qar,
Teze çêr dikim mûsayê oxreş...

***

"Ew mamostê meye, wekî
Me hîn dike zimanê dê,
Îro dewsa dersxanekê
Serak mezin va guh didê?

Kuçikê kartola dadide
Tev tifalê gunde tûre,
Lê ji bona poêziya me
Ew xwe-xwe bûye agir-kûre.

Ewî daye methê ewira,
Çiyayê Dibûr, Hevtêmanat,
Ser mezîla qurn û dewira
"Usivê Nevya" kiriye Ferat.

Wî sax kirye, qey bê ber me,
Kalik-pîrikê me pehmetî,
Texsîr kirye şerr û qirme,
Zêrandin û zinêqetî.

Pesiniye wek folkilorê
Rewşa rinda, dêrasora…
Meth û sena ji avtorê
Beyta "Rihana Resora"…

***

Esirê mînanî dayîka dergûş
Şemsê nûr daye milê xwe, diçe.
Tevna kerasiyê hêşîne hermûş
Sînorê çiyêva berjêr radiçe.

Ba difitîne qeydekî yekhang,
Nêktara gula dalêse nevsek.
Tîrinca royê kirye dolîdank,
Xwe têda dikilê çivîka zevzek.

Kala ber dîwêr serêd xweye sîs
Dane ber rema teva derengî,
Dadigerînin rojêd xwe ezîz
Bi şinga-şinga tizbiyê reng-rengî.

Çiqas bedewî, şîrinî, dinya,
Dixwezim bêjim hetanî –hetê…
Eşqî te bi stran dişxulim, dinya,
Û emirê min usa ser hevduda tê…

***

Tevekêd lazûr bi hêsrê ewira şûştin dêmê durr,
Hîv nazya dike nava belekiyê ezmîn û ewira.

Eyna ezmînda min dî sufetê ruhê xweyî mirr,
Digirîm, dinelim bi şîn-şewata qurna û dewira.

Yazix, min tirê surr û suhabî soze, laqirdî...
Û ji femkoriyê min xwe neparast ji lûr û leke,

Ruhêm hişyar bû mîna tifalê çev şîqal girtî,
Û digirî, digirî, nizane gaziyê xwe bi kê bike...

Dê nîne xwedê, wekî temizke çevê ruhê me
Em xwedêra –çi? Çawa ji mera - mûrîke topal...

Wê bipelçiqe mûrînga hêsîr nav dest û piyê me,
Ger hilnekişe zuxirê zyaretva bi semt û fesal...

Merivkoka jî derc kirin ev yek, lê min derc nekir.
Destêm eteka xwedê hat birîn, ji erşê mezin...

Eynatî minra, wa nazya dike hîva cewahir,
Eynatî minra ev surr û sêwan îşev dilîzin...

***

Ser mezelê diya min
Şînbye gulek hêşîn,
Kulîlkeke nermik,
Bedew, bedew, xweşbîn.

Ez qurbana rema
Dilê dayîka xweme,
Ev gul xût kerema
Dilê wêyî reme.

Navê wê Cemed bû,
Lê dil usa germ bû,
Dêmê wê qemer bû,
Hinav nûr-neder bû.

Ji wê nûrê dan der
Ji wî dilê helal –
Guleke nûr-neder,
Şayîrekî kemal.

## MÎKAÊLÊ REŞÎDRA

Tu çûyî, pismamo, tu çûyî,
Bi qewlî gotyava, dinya "heq",
Em hela kir-kaş û kamçobûyî
Mane vê dinya han neheq...

Emirda aqas jî dil û ced
Me şurya hevaltiyê nedikir,
Lê tim jî, lê tim jî bi hisret
Min mêla xeysetê te dikir.

Min nava mitala xwe nûrda
Li taxek Pampa xwe hizkirî
Çêdikir ji tera zef zûda
Tamekî tûfînî kilskirî.

Wî gundê bedewî bilindcî
Em diçûn sersal û eydê hev,
Û li ser kulavê kurmancî
Guh dida me şiyêr û beytê hev.

Digeryan em çil û çiyayê me,
Kêf dikir me tevî rêncbera,
Di nava zeyneta şayê me
Ax dikir ji derdê dîlbera...

Me şûrtik-şirdanê mitala
Ji pencê berbanga ba dida
Û tevî dilsax û tifala
Me kuçikê kartola dadida.

Me tev hev pez dibir bazara,
Ji gundiya gundîtir me dijît
Û gêl û girmîna bajara
Me tenê xewnêda didît.

Ax, emir û xwestin li dinê
Hevra ne pevketî-pîgarin,
Lema jî zergêd mirinê
Aqasî bi xem û xedarin...

Melekê mirinê xayîne,
Neyarê her emirhizyê,
Lê emir ne tişkî mayîne,
Eger – ne mesqera yaziyê...

***

Gund bû, xanî bûn, tendûr û dîz bûn,
Dîzada kirçik û kelindoş bû,
Em gedê gunde xêve xemsiz bûn,
Bêyî hev roja me qe ne roj bû.

Kulek dikenyan bi zerqa tevê,
Çivîka gazî dikir deşta.
Me eşqa reva li pey merkevê
Dûmayî dikir xewnê xweşda.

"Xwendin vedike erşê ecêva"...
Mezina qulac qelina didan,
Me diqelaştin belgê kitêba,
Kuçikê kartola pê dadidan...

Lê karoz dikir, feqet,mektebê
Wek mîsîonêrê erxî beter,
Qetandî em ji dîn û mesevê-
Şiqitandin nav gêla şeher...

"De gidî, pêşda, ez bextê weme"...
Me bihîst dengê xwendiyê êlê
Û di nav leca tevî nemama
Xaricîn nava xiringêlê...

***

Diçim gund, divêm: "Ne gunê teye",
Têm şeher tera dîsa dikim şerr-
Li cîkî hewa ziyan û zedeye,
Ciyê dinê bende zedeye û jer.

**BIZANBE**

...Wextê şuxulda dibim kelamper,
Bizanbe, wekî ji te hiz dikim.
Wextê mest dibim melûl texveger,
Bizanbe, wekî ji te hiz dikim.

Wextê heq, neheq tera dikim şer,
Bizanbe, wekî ji te hiz dikim...

## HEYAMEK HEYE

Heyamek heye- payîza dereng,
Beta vedibin kulîlk û kereng.
Dewisê çend çopê gewire qudûm sist
Guhê hevduda dikin piste-pist –

Nizam derheqa bayê harî dîn,
Wekî talan kir rewişa wan rengîn,
Yanê derheqa wê mija nêzîk,
Wekî serê çiyê lev dibe gizîk?

Kerê pêz xwe ji dûmanê dipî,
Dişiqite nav qeselêd sipî.
Nav bostanêd rût çend golikêd jar
Pirçêd bijoqî dalêsin bêçar.

Lê dayîkeke daw-dêre pejal
Pilêçêd paşin direvîne mal.
Çend çivêrûkêd pêşa wê girtî
Pêra dibezin bi ken, laqirdî.

Wir hîvya wane tendûreke germ,
Kulavekî nerm, çîrokek miqerm,
Çend silq û kartol nav tendûra gurr,
Kanê ew dîdem dema sêr û surr?

Heyran, hijmekar ez li hîvyê mam,
Sal hat bihurî, nehat ew heyam...

## CARINA

Carina, wextê bi van porê sipî,
Bi gêla nolî gêla mêrê bî,
Ji hêbeta dil xebereke xweş
Dibêm canikek bisk û birûkej,

Dizvire hingê bedewa beter
Û dijene min avireke tel.

Avirek usa, bi wê fesalê,
Ku xeber dide avira delalê:
"Hergê şerm nakî ji terbe-tore,
Şerm bike, qe na ji wan porê xwe"...

Ew kê kivş kirîye, kîjan xemkêşî,
Nava muhbetê aqa varvêşî?
    Varvêşya yaşa,
    Ya rutib-rewşa,
    Dewletê û dîn,
    Zagûnê, zemîn,
    Varvêşya milet,
    Varvêşya edet...

Hergê kivş kirîye, çira wededa
Natemirîne huba nav meda,
Sist nake qam û qedemê hubê,
Çawa sist dike li me dest û pê.
Çima li dinya bîc û bergîra,
Dide me dil û dînê şayîra?

***

Keçê vî gundî bedin, bêferseng,
Ez berê xwe wan diguhêrim,
Lê bûkek heye çapik û çeleng,
Ax, ez nikarim lê nenihêrim...

Dimeşe avê porzêra dêmdurr,
Li derê malê ew kinca dişo,
Pez-dewarê xwe kîs dike nav birr,
Dil, sewdê min jî pêra dajo...

Ya xaliq, qe na şivan bûma ez,
Min bigotayê bi heyr-hêbet:
"Sebira dilê min, mîya we sorebeş
Duh nizam çima neçêrya qet"...

## NAVÊ TE

Navê te dilê minda meliqî,
Wextê wî navî hiltînim ez,
Qey tenzîveke pêva zeliqî
Radikim ji ser birîna tez.
Îsan hew zane zeynete muhbet,
Can û cinete bi def û dewat.
Lê bi rezayê yaziyê mixenet
Gelek car dibe şîn û şewat.

Merivê hezinî şîna xwe dikin-
Çel dikin qewimê xweye mirî.
Sal dibuhure, ajirû didin
Gorêd kolayî, dilêd birîn.

Lê huba min, ne tê çel kim,
Ne tê sax kim li rû dinê.
Dicirisîne ew tim şîna min,
Şaya min dike nolî şînê.

Navê te dilê minda meliqî,
Wextê wî navî hiltînim ez,
Qey tenzîveke pêva zeliqî
Radikim ji ser birîna tez...

***

Nazgula gunda-
Çayîr-çîmana...
Kula dilê min
Sal û zemana...
Hisreta dilêm
Dîn û harkirî,
Tu rojya mine
Nefitar kirî...
Nefesa ber min,
Çira çevê min,
Tu dîn û îsaf
Û mesevê min...

***

...Pampyanê koç bikin yek-yek
Ji Pampa gul û gîha...
Wê herin ji hevdu êciz,
Ji hewa bilindcî û sert...

Wê herin ji hevdû zivir,
Ji fêl û miletçya dexel.
Dilê min naqete ji vir
Mînanî pezê ser sexel...

Ax, ezê bimînim şivanê
Karkidya Pampêye paşîn,
Hê sehkim, ka cewa Davanê
Ça dike xulîn û xuşîn.

Bigerim ezê ser kaniya,
Çiyayê bê kurmanc û kerî,
Û bigrîm ser van çiya-baniya,
Çawa ser pismamêd mirî...

## BAL RESÛL

Selam elêkim,
Resûlê kurê Hemzet Sadasa!
Tu min nas nakî,
Lê xwexwe minra nas-nêzîktirî
Ji gelek nasa...
Ewto nas, wekî
Dixwezim wek wî Ebû Telîbî
Ji tera bêjim
Bê orte-berî, aza, firêqet:
"Wellehî, başe çake avarî,
Billehî, sûp jî xrav nîne qet"...

Şayîrê miletekî betbextim,
Xelqekî Şerqa Nêzîke qedîm,
Ku ev çend zeman, çendik-çend wextin
Ji dîn û dewlet zey mane, êtîm.

Ne xelqê sêsid hezare, feqet,
Û ne jî çarsid û ne jî mîlîon,
Bîst mîlîon evdin bê welat, risqet
Li rû hewata evê dinya ron...

Dil bikin, êw birc-medenê Misrê
Nava rokêda ji cî biguhêzin,
Berî beryadin çemêd Kewsêrê,
Vejenin sûra Çînaye mezin...

Lê mîna şêrê bi fendê rûvî
Qend û bend bûyî mane belengaz
Bin destê şahêd Şerqê herevî,
Qanûnêd seyasetiyêye delkbaz...

Wek şah-sultana nemam nîbûn, na,
Ne Şamîlê we, ne Barzaniyê me,
Lema jî li vê dinya nemama
Aza nekirin çiya û baniyê me.

Bûne bindestiyê dîplomatiya bîc
Lawê tebyetê azayîperez...
Te rast tê derxist, belê, Hamzatîç,
**Helbestvanekî kurmancame ez.**

Min merivê xirav zef kirye eynat,
Hemû qiralê qelpiyêye qurre,
Dîsa bi meriyê dinyayê talant,
Bi şayîrê mezin şuryam dibhure.

Nizanim, çima fikirîme tim
Ez şayîrê kurd –Fêrîkê Ûsiv:
Hemû şayîrê dinyayê mezin
Hevekî kurdin, hevekî mirtiv...

Ax, min çawa dixwest tev mirtivê eşq
Çapkira rêkê dinyayê kese...
Mîna Alêko şa bûma serxweş
Bi heyr û huba Zêmfîrek teze...

Kurmancim, feqet, merûmim, miqûf
Ji zeyneteke konê kurmanciyê

Zozanvaneke heyîrî, hinkûf,
Şeveke şerbet, şevîneke çiyê...

Min tirba Tolstoy, bile nedîtye,
Pencerêd mala Yêsênîne şîn,
Min Erez nedye, min ne bihîstye
Dinêpira Taras ça dike xûşîn.

Welle nedîtye gerr û geştê te,
Çava û Çapon Çad û Mozanbîk,
London û Lamaş, Şîraz û Şatax,
Andêr û Kordiyêr, Aparat û Pîk...

Ancaxekê dît min Kurr û Kepez,
Daxistana te bi çiya û aûl,
Bihêl, biratî te hemêzkim ez,
Bîna dinyayê ji te tê Rasûl.

*Maxaçkala*

***

Emê jî herin, ev gav û gaz ma,
Dinya miqerim dîsa esas ma,
Emirê me vexar, dewsê karas ma,
Binda nixalek tel û tinaz ma.

Dinya bi dewire, Zal, Zuqurne çûn,
Me nîv jî nekir, li me qurne çû,
Şayî şihitî, def û zurne çu,
Feyde çi, govend-gerê hewas ma...

Şîn û şaya me car -car betsar bû,
Dilê me reben ha dîn û har bû,
Bi hemd û hişva qeyd û çîdar bû,
Me çar û fitar xewneke xas ma.

Xewn - xanimeke xame xilfikî-
Şevê kamço kir, rojê silikî,
Êy, Fêrîk, derdê te vî dilikî
Ji derdulyara îlac, îtmaz ma...

***

Xaliq, tu xatirê navê xwekî,
Min hewcê meriyê nemerd nekî:
Min birçî dikî, yalvar meke,
Min bê cî dikî, bêçar meke.

Zedê didî min-zedek usa,
Wekî karibim bilipitim.
Cedê didî min-cedek usa,
Wekî ji qeyde nefilitim.

Bi dilê derda pirr hilatî
Min zefî kirye neduatî.
Li nava kubira erd û erşa,
Dîndara şemsê şîrin û şa,

Beşera bera, birqa ewira,
Naz û nûbarê keleş gewira,
Nava dîndara tifilê tiberk
Ji te hiz kirye min usa berk...

Tu xatirê wê sêra xwekî,
Min hewcê meriyê nemerd nekî.
Te bîter kirye kul û birîn,
Tu bi xwexwe jî bicebirîn...

## ÊVAR

Cêrê şemsî zer
Danizilî ser
Bera nûr-neder
Ji milê heça.
Tîrinc temirîn,
Bahork buhurîn,
Kerî hêwirîn
Li berpêşa çiya.
Şivanêd zilam
Danîn sifra nan,
Bi hewas pêçan

Balolêd hoça.
Bizinê nese no-
Pezeke xerîb,
Derd-kulê navno-
Dilekî wehîd
Heta şebeqê
Dane ber qoça...

***

Hê bengî dibim...hê bi ax-keser
Kamço dibim boy rengê kesk û zer.
Dilê min dikirin dûranêd hêşîn,
Kenarêd kevzî, etekê ezmîn...

Tucara aqa neheyrîme ez
Li êvarêd al, berbangêd gevez...
Qefesa minda pûpûkî bêxew
Gazî biharek buhurî dike,
Beytûkî wehîd digrî roj û şev,
Bîra berîke sincirî dike...

Zanim, ne zarim û ne jî cahil,
Bin barê kaltiyê va dikundirim.
Çencê mirinê pîj bûne ser dil
Mînanî şûrê Damoklê hurum...

Qey lema dilê minî birîndar
Xûlemîş dibe ji mûra bende,
Xwe davê şikevtê bi sî û sitar,
Qulç û bûcaxê odê zemande...

Gom û guhêrê pêzda dikayê,
Dikeve nava hevana şivîn,
Ditele li ber tendûra dayê...

Lê şevêd hîveronêye şirîn
Xwe davê ava û tevî beqa
Kêfxweş distirê heta şebeqa...

## NE EWE BÊM

Ne ewe- bêm ber bi te,
Ne ewe-neyêm, feqet.
Kubira te-nûr perwede,
Minra bye heyr û hisret.

Dengê te kamço dike
Dilê min-hubê sotî,
Çawa tiya kamço dike
Cewika deng cinetî...

Tu minra hisretî, hes,
Ax zûda, zûda, zûda,
Hê berî dinya dexes,
Nemamiya van hevsûda...

Ez mer bûm, yan pêxember?
Bîra min nayê, yazix...
Kevotkek nûre-neder
Disitra-mêşekî six...

Ew deng bû, ku duh na pêr
Golêda kir xule-xul.
Min nedî sufetê sêr,
Beşera şerbet û gul...

Ne ewe-bêm ber bi te,
Ne ewe-neyêm, feqet,
Kubira te-nûr perwede,
Minra bûye heyr û hisret...

***

Dixwezim defekê bidim vê
Kaltiya ersawil, decal:
Tilol kim xwe nav vê kanavê
Tevî van tifalê delal,

Gurêxê xwe berî rûviya dim,
Tevî bê hucet kim bi qoş,

Kuçikê kartola ez dadim
Ser zang û zinarê beroj.

Kereke bi xurca, naz-nemet
Barkirî destkêş kim li çiya,
Û kêfa min bira neşkê qet
Ji qerfa amojina Çîçê...
Ji tirsa ku nebên "ev dîne",
Ez zef bûm hêsîrê heqmaqa,
Û mirin lema rû distîne,
Û kaltî serva tê haqa...

Tû dikim ez lomê heqmaqa,
Zagûnê bi zeng û zede.
Min zûda, ji xwera zef zûda
Çê kirîye kodêksek teze:

"Neşkêne, nezêrîn meriva,
Heywanê bê zar û ziman,
Wekî din bavêje berêva,
Çi ku qend-bend dike ruh û can".

## EZ NAHÊLIM

Ez nahêlim mîna tozê
Kaltî dabe ser min,
Bi kalîna berxa kozê
Dawdişînim hertim...

Digerim li gaz-gêdûka,
Xwe davêjim gola,
Dadidim tev zaru-çûka
Kuçikê kartola...

Tev şivana teştê dixum
Li ser "Kaniya kaxa",
Gurzê gîhê ez dadixim
Ji serhêsûya "Şaxa".

Mesqeretya dikim tevî
Mesqereçiyê Pampê,

Veduxum bi tasa tevê
Bedewya berbangê.

Qîz, bûkara bi heyr-hêbet
Xeberê xweş dibêm.
Paldidim ber cewa cinet,
Kilama wê dibhêm.
Û bi kilam dicedînim
Ez dewrêşê kurda –
Ji kûrana dil derînim
Merê kul û derda.

## ECÊVIN ŞAYÎR

Ecêvin şaîyr...ser rê û dirbê
Dewra kosmîkiyê bi xewn difirin,
Xwe davêjin ser kopêd erebê,
Guh didin çire-çira wê şîrin...

Bêxew dimînin, dimînin wehîd,
Şevêd kanûna dertên ji hundur,
Ji hêbeta dil dikin fite-fît
Radikin rikê se û kûçikê dirr...

Hîva dêm horî şewqê dirêje,
Şepe dibiriqin...Lê lawê mûsa
Destê xwe qevza çomêx digivêşe,
Dike hêwirze û dide dû sa.

Dertê der malê keçek konefîş,
(Zef rind fem dike qancixa beter,
Wekî ku xêncî şayîrê "bêhiş"
Kesik wê demê namîne şevder).

Vedike tûrê hûcik-bûçika,
Bi ten, bi hewas dike qîre-qîr:
- Ew kiye, xwe dike hevalê kûçika?
O, nexeyde, derd meke, şayîr...

Ji te fem nakin bêarêd bêyol...
Lê tu jî ji xwe fem nakî ese:

Hiz dikî hemû tiştê kevn û kol,
Lê bengî dibî ser jinê teze...

***

- Her tişt buhurî, şayîrê dilçivîk?-
Jina min bi ken minra dibê,-
Te bîr kir dîsa ewka hizkirî?
Usane şan û şertê hubê?

Ew xweşiya dike, lê ez dibêjim:
- Ew zerî dû bûn, dûkî sihal,
Bengîbetalya cahiltyê pêşin...
Bayê wedera çûn sal bi sal.

O, badilhewa mekene,qismî jin,
Xweşiyê xwe meke, tirbetalî
Çim hergê, wekî ez tera bêjim-
Yeke porzêre dêm şemalî
Dilê minda bûye teva şebeqê...
..................................
Oh, jinik koziya dilêm venede,
Navda nevîn vî agirî,
Û bira ew ken, laqirdiya te...
Ciyê badê nebe çêr û êtî...

***

Hûn ne bi qerfa, ne jî bi pesna
Naguhêzin emirê minî şik û şîn.
Mîna nexweşê ber melehizna
Xewnerojkada ez îda dijîm.

Dadigerînim rojêd buhurî,
Mîaser dikim nêtêd nebûyî,
Ser gundîkêda pêz didim bêrî-
Bi kubira wêva bextewar bûyî.

Bostana davêm, neviya hiz dikim,
Çema dibim ser tatê terikî,

Tirşaya dilê meriya miz dikim
Bi şîrinaya kilama kurdî.

Mîna mirovê li heşa Hecê
Ez linga fesal datînim erdê,
Wekî mûrîke nekivşe neçê
Zey nebe bin piyê min evdê xwedê.

“Xwedê reme”, lê kula kezevê,
Sama ruh ro bi ro min davên çemê.
Ya xaliq, wekî min têyî xezevê,
Îda çi evdî tuyê bêyî remê?...

***

Nizanim emirê merivêd momin
Çi teheriye, bi çi qirarê,
Lê çi ku ezim, bext qedera min
Bûye rozgareke meha adarê:
    Dêmek dibe ewir,
    Dêmek din-sayî,
    Yek ji bext stewir,
    Ya dinê-zayî...

Û dem-derecê bext, îxbalê min
Haqa zû ber hev têne guhastin,
    Wekî ez pêra
    Nagihînim bile
Duayê li roja xweye xweş bikim,
Nifirê roja xweye reş bikim...

***

Zid bûıne îda ji van “Rojxêriyê” hane vik-vala.
Qîz-bûk nizanin, xêr û xweşiya min paçeke wane?...

Helaliya bende, rastî-duristiya hogir-hevala-
Minra silave, milkê dinêye, barê dilane...

Nedin min nav û dengê nemira, text û tacê şah,
Misqale guman bidin min, evdino, hevaltîk esas,

Hêsirê min çevê minda sar nekin,dema mine şa
Xurû bihêlin mîna şereva berkelêye xas...

Pê-li hesa mine xalfikî mekin, ger nikarim ez
Meşq û meydanê şaristaniyêda gavdim firêqet,

Tiştekî qenciyê berawild nake ruhê minî tez
Ji vê gotina şaristaniyêye hêle, hereket...

Dil, zarê bende ji hev qetyane wek şîrê qirêj,
Çardor diçelipe şujya zarxweşiyê xalî, bê zihom,

Piş hevirmişê perda kûltûrê gul-gulî dirêj
Horî hilfirye, cin xwe telandye - di dêstda atom.

***

Dilê min dêşe. Ez çawa bikim?
Dermana bixwum? Kul di dermana...
Rabim herim nav biçûkêd şîrin,
Wexum şerbeta beşera wana.

Xile-bila wan ter-temiz seh kim,
Paçkim tetê wanaye qirêj,
Derheq dîk-rûvî wanra qisekim,
Dibe ku dilê min berde ev êş.

***

Ezî betbextim, lê ne bêxweyî,
Pirin meriyê min, bira û pismam.
Herkê hemûşka topkin tevayî,
Wê ji wan çêbe taxbûreke tam.
**Lê...mûsayêd min wextê min dûrin-**
**Fiqarekî bê piştovanim ez,**
**Wextê li dor min lez difûrfûrin-**
**Qey hingê Rostem pelewanim ez...**

## ÇERKEZÊ REŞRA

Em betbextin- pêda, pismam,
Ji ber dawa dêda, pismam.
Meriyê heqmaq tenê kare
Bêje, wekî bexteware...

Em betbextin...Ferezî bext
Dixapîne bende herwext-
Her yekî bi emelekî:
Betbextiya xwe bîr kin belkî...

Lê ne kemal, ne hub, havîn,
Ne "quretiya malxiravî"
Min dernaxin ji nava van
Derd û êşê qîr û qetran.

Û dernaxe te jî, pismam,
Krîtîka teye beter
Ji wî halê qijkê qertal...

## TU WISA RINDÎ

Tu wisa rindî, bedew-belqîzî,
Ber dilê minda wisa ezîzî,
Wekî dixwezim asas û amin
Ji tera bêjim "xaliq-xuda" min.

Lê turiş nakim, lê turiş nakim,
Tirsim ku hêrsa xaliq xwe rakim,
Xaliq seva min-ewê xeberê,
Min miqûf bike ji te dîlberê...

*Moskva*

***

Na, hekîma min, feyde nekir, na,
Ne wan derziyê te, ne wan dermana...
Qêmîşya xatirê te nakim, bêjim:
Lingê min dîsa wek berê dêşin

Ji surr û sermê, seyr û seferê,
Ji ger û geştê ba û bagerê...

Êşa derziya jî êşek zêdeye,
Lê feqet, çapa sebirê jî heye:

...Zanî çi? Were çara dilê min,
Derxe wan derziyê ling û milê min,

Bi ewan lêvê xwe gul-şîrazî
Min kerem bike ramûsaneke nûre neterim,
Ez ji vir-mala xwedê te razî
Ber bi êla xwe darêkim-herim...

*Moskva*

***

Ev der îro bê keys û kubire,
Mîna payîzek zelûle, zivire:
Dile min pêra-pêra texmîn kir,
Wekî ezîza min ne li vire...

## NEXWEŞÎ

Li min pirr bûne nexweşî û êş,
Nexweşiyê nemam, xirav û xayîn:
Min ji dûmika dewranê dirêj,
Şaylixya dinê didine birîn...

Nexweşîk heye –miqûf dike min
Ji lezeta naz-nemetê xwestî.
Nexweşîk heye- xewêd şîrin
Kirine jana hinav û hestî...

Nexweşîk heye – nahêle rehet
Kêf kim xwera tev heval-hogira.
Nexweşya dinê mirdar-mixenet
Ew zeda linge, gelî doxtira.

Lingê min qenc kin, ez neyêm birîn
Ji gerr û geşta tebyeta delal:

Ew nazêrîne wek yara xayîn,
Edûtiyê nake mînanî heval...

***

Du cahilê rind-
Du xortê torin
Ji Ûkrayînê hatine vira,
Hevalê mevanxanêne minra.
Çi heval? – cote bûkê kurmanca
Bi heya û şerm.
Kerr, kerr vedikin derî û bacya,
Xeberdidin nerm,
Bi serê lêva dikin piste-pist,
Wekî min şerpeze nekin.
Min hîvî dikin bi dengekî sist:
"Îzin heye, em pencerê vekin"?

Ewana mêrê kurê mêrane,
Ku aha rûnerm
Hiltên û datên
Û xeber didin bi heya û şerm.
Evan ew mêrin, lawê wan bava,
Bavê ku sîngê xwe dan ber lava
Agir û hesinê faşîzmêye har.
Welat xwey kirin,
Minet nekirin
Ne ji kuştinê, ne ji xelaya,
Ne seqemêd sar...
Ez merîfeta wana dibînim
Û bê hemdî xwe ez ji bîr tînim
Ewan nemerdêd bi yaşê merî,
Ku dew-derecê "duve" direvin
Avrad teherî,
Lê wek seyêd har- tisqîne, kubar.

*Moskva*

***

Bahar kimkimye, taba min nayê...
Çiqa jî rastî olecaxa bêm,
**Ezê derkevim seyra dinyayê**
**Çawa telalê hisretê, hubê.**

Min kamço dike Rasîya rengîn,
Mîna dayîka zaru pê hisret.
Gelo hene ew pencerê hêşîn,
Wekî Yêsênîn distira dil-ced...

Qulingno, yazix, seh nekir dirêj
Ewî dengê we hisretî heyran,
Nava kabakê şehere qirêj
Ecele maşand canya xweye can...

Hisireta gund û mihînê sitira,
Lê gundda nema, xwey nekir mihîn,
Bin şemala bext nekir pêçira
Gundîke dêmzer, malkir, milahîm...

Yazix, sed yazix... Ax dikim, feqet
Ez bi xwexwe jî îtqat nabim gund,
Dixwezim bi rêyê teng û firêqet
Herim dû kubira Sîdorake rind...

Min kamço dikin beriyê erebî,
Deb û dêşa her milet û ziman,
Xwezil bijîm tev merivê berfî,
...Û kurdî bangdim ez wa bi hêbet:
"Hergê hisretê didî, ya rebî,
Çima per-baska nadî îsanet?"...

***

O, hêsûyêd hêşîn, kenarêd kesk,
Dilêm difire nolî dûmeqesk,
Maşînê leztir leber dike rê...
O, eva Şîrvan... ev çemê Kurê...

Eva-Mûsakênd...
Eva han Dêrbênd...
Bi bîna darê sincava serxweş,
Dixwezim çeva hûf kim dinya nexş,
Bifirim serê çiyayê kolozçîl,
Berê beşerşîn, bestê bê mezîl,
Qiracê qemer, mêşê terazin,
Her tek nekevim şeherêd mezin...

*Rostov*

***

Bilûrvanê jîr-bayê bîn gezgezk!
Esir-ezmanê havînê Pampê!
Kewtînê sa bûn, yanê dûmeqesk-
Difirîn usa tevî pêla bê?...

Bext, unda bûyî tu bê berate,
Ser xênî îda naqinge mirîşk,
Amojina Hacê nake dew û doz,
Hêkê nagerim nav keta kurîşk...

Qurif dikete nav dilê min ter,
Wextê dişingiya kêlendiya ewil,
Ax, kêlendîke batinî ker-ker
Çinî bir çiqas ahil û cahil...

Wê me jî bive - wê heşankêşê-
Kêlendîkêşê emirxurî ûc.
Ax, lema îda minva tê kivşê
Dinya mînanî qeseleke pûç...

## XAS XATÛNA KURMANCIYÊ

Derketibû pala çiyê
Xas-xatûna kurmanciyê,
Xemek xerav li ser rûya-
Wira tişkî digerya...
Nizam bazinê nûr beniyê

Ketibû wê nepeniyê?
Nizam gustîl, nizam tor,
Nizam birqanoka por?..

Ax, meriv zêr undake,
Gund û bajêr undake,
Text-tacê şah undake,
Xezina padişa undake,
Tek cahiltiya nûr-neder
Unda neke, nede der...
Û mîna min bêguman,
Wek nexweşê bê derman-
Nenihêre pala çiyê,
Xas-xatûna kurmanciyê...

***

Çawa mesîkî li kenar ketî-
Bi bera hewce dipirpite mest,
Usa li bîn û beyûvîkê tî-
Dinele dilê minî hub- perest...

Lê bûk û beniyê dilê min xwestî
Xwe nasipêrin min bengiyê rûşkestî:
Ew raçev dikin yed beşer tije,
Ji kîjana form û pere dirêje...

## SVÊTAYÊRA

Ez te qesidîm, aha carek din
Paşî sê sala. Nava aqa wext
Gelek tişt îda hatye guhastin
Angorî deba şeherê paytext:

Dewlemend bûye xemla mala te,
Fortêpîano, xalîçêd împort...
Îda sêz dixe ew tifala te,
Kurê te zilam îd tam bûye xort...

Xeyîriye, qey bê, ser xalîça kaw
Şikilê remetiyê mêrê te momin,
Tu dîsa mayî usa baş, bedew,
Usa ter-cahil, qe tu guhastin.
Xêncî, wekî ku angorî pêrar
Te qebûl kirim ez diha betsar...

Hîvya wê yekê ez nîbûm, hilbet,
Ku tuyê bavêjî xwe hemêza min...
Lê merîfeta dinyayêra qet
Tu çi dibêjî, beniya bêamin?...

Îlahî, wextê bi dilê hisret
Derê te xistye merîkî şayîr...
Yê ku wekî ne sîsaliye, hilbet,
Şêf nîne, şofêr yan brîgadîr,
Lê kare metihê rewşa te rihet
Bigihîne çend dewranê kibîr...

Mîna mermerê şimşat, sikî-sar
Rûniştî himber. Bi wî teherî
Dixwezî bêjî bê ziman û zar,
Wekî ku tune tişkî tomerî
Orta te beniya canik-cewahir
Û yekî hîjde sala te mezin...

Gilî ew nîne, êy dosta delal,
Ku hîjde sala te mezintirim ez,
Gilî ewe, ku tu hîjde sala
Çûktirî ji xwe terlana terez...

Mîna qîzeke tere delalî,
Dibiriqî bedew, nava xemla xas-
Tu jinebîke sîûpênc salî,
Tu diya ewledê diha bermiraz...

...Bera xwedê tim cahiltiê bide,
Hewasê bide te, kewa gozel,
Bira birqvedî tu diha zêde,
Lê bibaxşîn vê fikira mine tel:

Jina mêrmirî, çiqa ez zanim,

Emirda hevekî hêsîr dibe,
Heger hurr nîne, bêar, bêamin,
Hevekî wede zûtir pîr dibe...

*Tibîlîsî*

***

Qîza qewimê mine,
Li rex meda dijî,
Lê nav meda tune
Selaveke sar jî...

Derbaz dibim, feqet,
Tim ber mala wêra,
Dinihêrim hêbet
Perda pencerêra...

Car-carna por-guliyê
Torin û terlanê
Wek kumkora gulê
Bi minva tên xanê.

Dibiecim, dimirim
Sev wan porê wê şê,
Sev sufetê şîrin,
Wekî nayê kivşê...

## PISMAMA MINRA

Tu antêxa agirê çevê pîrikêd meye sufet zerî,
Bi text û bext, bi şaşiya wext bilmîş bûyî vî şeherî...

Bengizê teva hişyar dibe cineteke bi sur sepe,
Li ku, qey bê, koçerin steyr û hîv û ro-zeq û lepe.

Du mêr-melek pê dilîzin, ji hev dibin ha dor bi dor,
Bi kubira wê lîstika şa gulvedide dinyake sor:

Havîn distirê, lûf dikevin mêrg û zeviyê sore soron,
Bi qûrtîna teyr dişinge zêr zengilê ezmanî ron.

Naziya dike cewka cinet bi deng-seda bûktiyêye sist
Li ber guhê kesma kevzîn dike pîrqîn û piste-pist.

Rêncber birra didin mexel ser gola gund, û bîna pêz
Tev bîn-buxsa pûngêye ter ser dil dibe melhem-melês.

Tac qot dike ser roavê tacwergirê şemsê porzêr,
Neqevada kurk rûdinên sî wek teyrê qudretê sêr.

Û zer dike ewirê qulbê wek wê perda pencera te,
Ku pişva wek şeng û şepal birq dide nûr-nedera te.

Dilêm teyrkî hildifire wextê hiltê pêşa perdê,
Û bengizê te, sitaxulla, bi şewqa şems berva dertê...

Qelbê minda birq vedide dîndara te herro-herşev,
Pismamin em, feqet bile silavê jî em nadin hev...

Bi deb-dêşa kasta bilind te wergirtiyê moda paşîn,
Navmala we-biha birqok, ber derê we avtomaşîn...

Ax, ez çawa merem dikim defdim bi deng, dewa xûnê-
Norme-formê şaristaniyê, kese bêjim te xatûnê:

"Biliv herin bal xûşkê te: gul-sosinê tere terxel,
Tera bistirêm hisreta xwe ber kalîna pezê mexel...

Zûda xwera mital dikim – hergê dengê kalîna pêz
Bende xwera têkira miqam dewsa caza harbûyî hêrs,

Dewsa kînoşikilê şera û cesûsya ji eyba der,
Nîşan dana tebyeta rû-barê dinê nûr û neder,

Dibe wekî dinyayêra avek hinek zelal bibya,
Meqseda minra jî xwe rêke rast û reheh vebya...

Biliv wira, ezîza min, ku zinar siyê davên keviya,
Ça pîrkê me pêşê dêra raxistine di bin neviya"...

***

Çiqa dibhurim rex vê malêra,
Dibînim ewan zulfê ji zêra,
Wekî dibriqin ji qelşa perdê
Ça şewqa şemsê ewirê sivêra...

***

Bi lêvêd lerzok, kêlma virtikî
Min dipesinî, gulover dikî...
Seva çi? Minra dixwezî bêjî,
Wekî tu qewm û dostê min pêşî?

Lê ez te zanim, zanim, filankes!
Ez ku dixûnim Pûşkîn, Şêkspîr,
Ez ku derc dikim "Godûnov" û "Lîr",
Nas nakim, gelo, durûkî dexes?

Tu bi wan pesina, wan genefisiyê
Bîr tînî ewê gundiya gincirok,
Ya ku werdigire dêrê "pilîsê"
Li ser qerpalêd xweye qirêjok.

Dikeve govendê "xanima hêje",
Dilîze xwera bi ewê "rewşê",
Lê "koçeriyêda" ku hildiqoşe,
Şembelîkê wê bera tên kivşê...

***

O, hucet mekin, gelî dê-bava,
Di riya xwedêda, hûn hucet mekin,
Dêmê xwe dîyarî zarokê sava-
Hêlma hêrsêva sar û sert mekin.

***

Wey la xezev dinê ketê,
Dinya dilkevirî,
Ku aşkera ser tirba dê
Kur nikare bigirî...
Êvar dihat, dibû terî-
Kurikekî dayîk mirî
Direvî ji malê...

Wek xezala gurî li dû
Teriqî ji riya xwe,

Xwe ta dikir, tel-tel diçû
Ser mezelê dîya xwe...

## ŞÎNÊ ŞEYNETÎ

Şînê me naha bûne şeynetî
Li hewş-heyata şehera teng,
Îlahî wextê kivşe remetî,
Merîkî loke, bi nav û deng.

Dor textê şînê rûniştî rû şa
Dua hev dikin zane û zirr...
Dengê duaçiya, şingînya şûşa
Levketina wek Erez û Kur...

"Sêzde zimana" şêx dike gazî,
Zîliya zanîne nexş radixe,
Kêlmê xwe dibê qutam, xwe razî,
Îja deng dide dewsgirtiyê xwe.

Dewsgirtiyê xweyê xwendina bilind
Zû direvîne deng ji himber,
Ça birevîne gurêxekî gund
Kûtê, wekî ku davêjin ber...

Ji "malmezina" ew xeber dide,
Deng mîna boriyê radihêle,
Pesinê serkara, binkara dide,
Qul û qusûrê tê "nahêle"...

O, miriyêd reben! Dirûyêd hulikar
Tabûtê we jî dikin dika,
Li ser dilîzin rolêd ejdîhar
Dîyarî nezan û heşhindika...

## DAXISTAN

Daxistan,dirêjbe dûmika bende,
Wekî li dinê hunart firinde,
Qam-qirafet da xewna Dêtalos,

Hevraz hêlkir ser ber û iqyanos.

Daxistan yêrê teyrê atmece,
Firinda me teyrê te zûtir diçe.
Xwezil qasekê sêkin bûya hewê,
Têr temaşekira me te bedewê.

Hey warê şêra, mertal û şûra,
Gol mertal bûne ser çel û çûra,
Û çemêd çiyayî, çemêd bedenbir
Çivane çûne ser "mertalê" dur.

Êlbrûs û Kazbêk "begêd" van erda,
Ewira kirîne kolozê kurda.
Û dor kolozê sipî, taq-taqî
Dûman kirine şer û şimaqî.

Çiyayêd hezarnav rûniştî dor wan,
Ketine di nav şêwira dewr-zeman.
Zefî şêwir kirin,deng dane Maxaç,
Maxaç hêlva kir kela serferaş.

Kela zemande feyda nekir ber
Qetilê û qûltiyê, yaziya texveger.
Zefî şêwr kirin, deng dane Şemîl.
Şemîl şer kir, lê- yêr dîsa ma dîl.

Zefî şêwir kirin, û vir, xulese,
Şêwir danîne ser Şoreviya teze.
Şoravî şêwir kir, deng da Silêman:
Wî Homêrosê çiyayî nuhzeman,

Û Ebû-Telîb, Hemze, Êfêndî,
Û Resûl: ewî Pûşkînê zêndî.
...Ew aûla han qey Sadasaye?
Ew Resûle ser Gûnîb razaye?

Kî zane, ew çi xewna divîne?
Kî zane naha Moskovê nîne...
Yanê li Yapon, yan li Sîngapûr,
Yan welatekî mayînî hê dûr?...

Yan, dive naha li ser postê gê
Hema bavêda rûniştiye Reskê...
Yan Lêrmontovra ew xever dide...
"Dîlê Kavkazê", dive, berdide...

Yan, dive naha zerîke cahil
Porê wî sipî mizdide bi dil,
Çawa pêçiyê şems- berfa serê çiya,
Û hêsrê çiya tên hizî wan pêçiya...

Resûlê naka hişyarbe ji xew,
Xewnê bedewtir bivîne dor xwe
Daxistana xwe guldayî, aza-
Û kubira welêt, çawa ramûsan,
Bike di nava kaxez-reqemê,
Bişîne bona dinya-alemê...

## MÊZEKIN HALÊ MILETÊ KURD

Moskva rengîn, dîreka dinê,
Tu kan-mikana şêwirê mezin,
Bi dilê derd û xemava xinê,
Me tera aniye gilî-gazin...

Dinêzanê te zanin ezberî,
Wekî vê dinya ecêv tijî
Miletek heye bîst û hevt merî,
Bi dîn-dewleta xweva dijî.

**Dewletên Hacûc...Xweyê text û tac,**
**Xweyê extîyariyê xwe zemande**
**Ber bêdewletîya bîst mîlîon kurmanc...**
**Qerfa Xwedêye, yan ya bende?...**

Em ne pîngmêne, ne pîtêkantrop
Li evê dinya şaristanî.
Pêşiyê me-Îve, ku rûs dibên Xob,
Mûsa mezintire hezar salî.

Qedîmîne kurd, arî, xerîbdost.

Ji xelqê xerîv me hiz kirye,
Navê mileta bimbarek-pîroz
Li ewledê xwe ezîz kirye:

Ûris me danye navê kurê xwe,
Çerkez û Çaçan, Gêrman, Ereb.
Lê ereb...agirê kîn û kirê xwe
Li raserî me kirye bêrem...

Tirk darda dike, hebisî dike har,
Qeyd dike zar û zimanê me,
Nav û nûçika me dike bêar
Miletçiyê evan qelpî kone.

Xwedê, nedî me van kirê nuxsan,
Me nexwestye em bibin vare,
Em naxwezin jî bimînin sindyan,
Ber derbê xelqê bed, bêare.

**Em jî dixwezin cûrê xwe bijîn,**
**Welatê xweda nemînin dîl,**
**Serbest bigerin çiyayêd xwe hêşîn,**
**Parî nan bixun bê kul, kertîl.**

Sihabêd dinê! Bi çevê remê
Mêzekin halê miletê kurd!
Rênêsansek nuh vebya vê demê,
Me lê hûnaye gumanek xurt...

Belkî batmîşke bi top û tifaq
Rênêsansa nuh her zordestiya,
Îsaf ragirtî çawa ku beyraq-
Pê bike hezarsaliya sisiya...

## NEYARÊD MERA

Em dijîn van çiyayê rût û tût,
Wekî ku gur jî lê najîn qet,
Hewa sert mînanî barût,
Hûn wê jî me dikin minet.

Hûn dibên kurd xurtin, gampoxe,
Û seba me diha jar bikin,
Hûn jera dilê xwe, zarê xwe
Ser dil û ruhê me bar dikin.
Û bi wan mineta, wî barî,
Bin çevê cînartiya hevsûd
Em kir-kaş divin wey-neçarî
Li çiya û baniyê xwe rût û tût.

***

Gul şîn nabin îda her ciya,
Ax, ew bîn û bereket çû...
Îd nikarim hilkişim çiya,
Ew hucum û hereket çû.

Ma van jêra rûnêm xwera
Û pirs bikim ji cewêd me,
Ka wan gerra û sergerra
Qe çi heye û çi tune...

***

Dêrê qawereng, bi kovê reş,
Bejina çap-çeleng, çev-birûyê nexş,
Ber çevê min sovayî dikin herdem...
Ya rebî, hebûya te rusqet, rem,

Benî bedewa naza dêmdur,
Dêrî vekira, bata hundur,
Destê xweyî nûrî nazdar
Danya ser dilê min birîndar...

*Nexweşxanêda*

***

...Û zûda-zûda dijminêd min no
Beytê mirinê ser min dixûnin,
Û teze, teze destêd min navno

Min li meydanê didin seknandin,
Radikin orta xwe û dîn-dijmin.

Badê, ax badê, gelî pismama...
Şerkin bi şûra, şerkin bi qema,
Şerkin bi şerê baktêriya, bizûz...
Hevdu berbatkin babetî dijmin
Û gumana xwe nedine ser min.

Ez merivekî ecêvî cuda:
Ayrî, îmansiz, bêxwey, bê xuda...
Ezê herim nav garana kera,
Birçî bizûkim ser savêra sa...
Feqet tucara, feqet tucara
Nabim çeka dest tu teyfebaza...

## EZ XWEY DIKIM

Zidbûyî ji hevaltiya hulikar,
Ji kêfêd bi araqê keşenekî,
Ez xwera xwey dikim hijmekar
Bire dîk-mirîşkê reng-rengî:
Yek çîle qerqaşe, tîne bîr
Gultiinê berfa der biharê,
Yek zîliya amojina mine pîr,
Yek-rengê hingilê hegarê.

Yek reşe mîna siya neqevê
Kumikê sor xaşxaşke li hafê,
Yek xumira dorbenda xevxevê -
Werq dide mînanî alavê.

Dema ku distirên, diqingin
Dengbêjê bêtulim-tembûr,
Qasekê can dibe ruhê min
Bi sidqê zarutiyê gul û nûr.

Cihan bi bînekê xurû, xweş
Dora min fûr dide firêqet.
Qey ruhê hevsûdiyê teleqreş
Dinêda dewremîş nebûye qet...

Ruhê min difire cîkî dûr,
Yêrekî bê mûrî arxayîk,
Hilvetên hisretê mine nûr,
Dixwezin bang bidin tevî dîk...

O, levxe baskê sor-sincirî,
Zîl bangde, dîkê minî fêriz,
Tu çêtirî, welle, tu çêtirî
Ji nezanekî gemarî genefis...

## ERDHEJA ATAV

Erdheja atav, hêwirza bilind
Çend malê Pampê dûr xistin ji gund.
Lê xofa xafilqedê, erhede
Wê bitemire ber bayê wede.

Wê hilê bîna zivistanê sar,
Havîna Pampê kesk û lalazar
Bi kubira mêrg û qulbê al bûyî
Wê dagerîne pampîyanêd çûyî.

Mîna dagêrçiyê ji nav gemiya Nuh
Ewê geş bikin tendûr-kuçikê duh.
Wê dîsa serbest deng-seda wanbe,
Lê sed heyf îda navbeyna Pampê
Wê xanê neke bejina Şiralî:
Hekîmê hêle, hêviya ehilî...

...Na!Bi qirara qederê û bext
Wê xanê nekinî îda qe tu wext,
Ew û Leyîla wî nolî nûrdangê,
Ku rewşek tayîbet didane Pampê.

## DIBÛRDAX

Hey tu, Dibûrdax, birakê mezin,
Rojê rebê min çi zû dibezin?

Çi lez difirin teyrkî meh û sal...

Li ber pêşa te fûr dida fesal

Zeviya payîze...Simlê yek buhust
Li ser serê min dikrin piste-pist...

Nizam, ji sura kîjan cinetê...
Lê min baq dikir kulîlkê ketê.

Bejna min biçûk-gedê guhê gund
Unda dibû nav payîzeyê bilind...

...Awqa sal çûne.Dewsa gul-gîha
Şiyêr û destana baq dikim naha.

Dewsa wê zeviya li kenarê gund-
Şaneşînê min hilketye bilind.

Himber dilîzin neviyêd mine nûr.
Bera bighîjin bê keder, bê mûr,

Zar-zêçê dinê-aleınê, rebî,
Usa jî herdu çûkêd me sebî.

Tu, şikir, tûrê didî, wekî em
Reca te nekin: "Ya rebilalem!

Şûnda bistîne ji min her tiştî,
Tek dagerîn wê dema buhuştî,

Wekî bi bîna bayê cinetê
Ser serêm fûrde zeviya zarutiyê"...

## BIRRÊ EWIRA

Birrê ewira kişyan rêz-rêz
Ger-guhêrê ezmîn.
Hebiya çenge buşkulê pêz-
Xwera-m têkira tizbî...

Û bavîta du hev kit-kit:
"Xêr û şer û xuda"...
Ax, tu bextê şayîrê kurd,
Ax cenimek cuda...

Heyf nîbûn ew xam û xabûs,
Zevî, zinar û zax-
Naha hevana min hebû,
Hevalekî dilsax.

Meyê birrê xwe bajota
Nav pirêza teze,
Tase şîrê miya bidota,
Danya "Kaniya Mîrze"...

Palda, xwera xweş xeberda
Meyê ber siya partê...
Çî min û çî van nemerda,
Çî min, çî înfarktê?...

***

Dilê min li wire, kîderê kalîna pêz tê,
Adar û nîsana bi dew û dêrindês tê.

Kîderê dayîk tevna didine ber kergîta,
Dinivêjin bendeka eyana û egîta.

Hiz dikim reşaya qyalga û guhêra,
Qûçê pesariya, şivanê dilsax, kerê bin têra...

***

Ax,vira xaniyê xatiya Rihan bû...
A, tendûr vir bû, sitêr derehan bû...
Mixek wê sitûna situxarda bû,
Hêvirdangê gewir pêva darda bû.
Tarma bişkoriyê malê -Letemer
Danî bû ber wî dîwarê himber.

Tîrinca tevê wek dolîdangê
Digihîşt heta, a, ewê tangê,
Û tijîbûyî bi " temetîzkê",
Qilpîna şorba nava dîzikê,

Bi dengê xatiyê edilî û şa,
Dîwarê reşva nerm hildikişya...

Niha ji ewan dîdemê xwestî
Her tenê maye seradek şikestî...
Wede, erdhejê bêxem, bêminet
Vejandine ew îdîliya cinet...

***

Xatirê Xwedêkî, nexweşî, Zînê,
Dibên tu ketî nava nivînê?
Ax,ber serê te ezîz ez gorî-
Tera bibûma berdest, bişkorî...

***

Navê hezara danîne Zînê-
Heyrî hikyata nûre nemirî.
Lê mêr-melekê dîndara dinê,
Tek tu layîqî wî navî kirî.

***

Hobêlyan kirin: şaynetek bi rewş,
Hezar desta tev kire şîrqîn.
Û paşê...perdê şev û rojê gewir
Sepe kirin ew rewşa rengîn...
Nexweşe seyda...halê xwe tune...
Cîda dinele wehîd, bêçar...
Ji wî hezarî destek jî tune-
Bide destê wî tase ava sar...

***

Dibûrîme ez, tenê û teknefs,...hewas nakim qet
Tevî mervayê ser textê şayê kefkim firêqet,
Lev bînim beter henekêd qeşmer...

***

Xaliq, te gelek derd û êş da min,
Bi gele kira te dilê min sot.
Rikê min tîne herro û hertim
Sadîzma teye reşe melkemot.
Lê ku dinhêrim, ka çi nenera
Tîne serê xwe xelq bona pera,
Ez dua dikim-hingê te razî,
Ku te ne da min pereparêzî...

***

...Betilîme ez-ewledê mûsa...
Qutar nakim qet îda dil û ced
Çek û rihalê hurmetê terbet
Xweva berkaşkim...Usa dixwezim
Wêda bavêm wî barê nelazim,

Sivik û sihal mînanî koziya
Ketî nava bê, bigerim aza,
Bêjim, bistirêm xwera tevakel...
Giriyê min ku bê, bigirîm kele-kel,
Ku birçî bibim, mecbûrê nevsê,
Wir jî destê xwe dirêj kim parsê...

Usa dixwezim...Lê wextê zanim,
Wekî wê çawa dîn-dijminê min
Bi kenê xweyî xûjantiyê qexbet
Bikin lîqe-lîq...Ez hingê hêbet
Xwe hiltêm bi kîn-eynata poêt
"Şabûnê mede merivêd kirêt"...

## BÊXEWÎ

Çeqîne, reqîn- sehet mîna aş,
Dihêre evê şeva reş-dirêj.
Dihêre, dicû bi zor û zemet,
Lê xilaz nabe, ser hevda nayê

Va “arvanê” hanî hizêmet.

Tijî bi kevirê derd û telayê,
O, min çiqa ji dinyayê fem kir-
Aqas derd û kul, telayî tem kir...
...................................

***

Rojêd emirê min darêkirin çûn.
Derd û nexweşî dilê min dicûn.
Tu heseke ron, tu gulanek geş
Naşxulin kûra dilê min nexweş,

Xêncî vî kirrî, vê kîna kinyat,
Wekî min şaristaniyê usa kir eynat:
Him rûyê wê birqok, beşervehatî,
Him hundurê wê kîn û keretî.

Ax, min xumara emirda da der,
Wekî gund guhart bi jera şeher:
Xulîna cewa, kalîna keriya
Da qire-vira maşîna, meriya.

Şîrqîna baskê refê teyr û tûya
Da destlevdana van diz û duriya.
Na, xêr, çiqas jî poêt bim û pêş-
Nebûme boy vê dewira beravêj.

Mitala minda zûda geş vetê
Xulîn-xuşînek cewek cinetê,
Koxekî bin erd li guhê gunda,
Kevanîke heyf di gura minda.

Axilekî kerma, du bizin, du mî,
Kereke avaş, xurcek ecemî...
Û merem dikim ez bi kel û kirr-
Li ber derê min hebe sekî dirr:

Ku hergê bên “dil-ced”, min bibin zerre
“Şayîrhizêd” me cesûse-durû,

Ez gurêxê xwe bi heyr, bi hucet
Hoceyî wan kim çawa "întêrvyû"...

## TEMÎ

Ez ku mirim, hûn meytê min çelkin li pêşa çiya,
Bira bibin kumeytê min tumê ket û kuncya.

Bên û li ser mexberê min biçêrin berx û kar,
Berxvan bêjin ezberê min heyran û hijmekar.

Şivanekî kali helke – dilsaxekî fadil
Serhatiya min şiro veke, wanra bêje bi dil:

"Ew jî mina me rêncber bû, birakê me mezin,
Kerî-sûrîkî çûk ber bû, kîs dikir berx-bizin.

Me tev li ser kenarekî nan û toraq dixar,
Radibû ser zinarekî, dinhêrî çarniqar...

Axiryê jî çû û bû xwendî, bajêrda bû şayîr,
Lê ruhva ma dîsa gundî, maşoqê çol-çayîr...

Zef digerya van çol-banya, dipesinî feruh,
Belkî Xwedê van çol-banya bigihîne ber ruh"...

***

Vî serîda xêleke xurt
Min emirê xwe gur bijîta,
Bilîsta nav govendê kurd,
Pêpeskira xem di cîda.

Ser alava ramûsana
Min donê dil bihelanda,
Heyr-hisreta xweye sala
Der û dinê bireşanda...

Û dawşanda ji ked-kilam
Dara merem û miraza,

Serxweş kira evd û alem,
Min bi şerava karasa.

Hingê hêsa, sivik, vala
Bilivyama sur betalî,
Çawa karasê vik-vala
Gilol dive valî-walî..

Û rokê jî pîra herxur
Rastî-m bata wî hesavî,
Min bigota: "Bive, çevqul,
Tu jî tişkî mezin navî"...

***

"Mêrê Firîda Hecîyêvnayê"...
Min wa kivş dike bi şurya nazdar
Tatîyana doxtir-rinda dinyayê-
Dayîka şagirta jina min dersdar.

Ez dibeşirim tevî dêmsîsê,
Lê dilê xweda divêm: "Ezîzê,
Ku ez nebûma mêrê Firîda
Hecîyêvna te ezîz, erhede,
Minê cimcima vî şeherîda
Hilneda aha ev zeng û zede...
Teyê jî minra nekira qencî
Seva xatirê Frîda Hecî..."

## HUSO

Husoyê Evdîyê Birkê kale
(Rûs jêra gotine Nîkale),
Ewî şer dîtye, zulm û zinêqet,
Rev û rêwîtî, şeher û şulet.
Ew çûye Bêndêrê û Bûdapêştê.
Lê tevî zeftir dilê min xweş tê
Giliyê wî û pêz, "Guhêra kêça"...
Çaxê ku deng tê ji navsera çiya:

Dibêjin: “Huso”... Lê şivanê “xêv”-
Terpilî li dor kuçikê mastewê-
Derc nake, ku deng ziyaretê derket...
Wekî wê deqa bi qaz û qudret
Ew çi bixweze - ziyaretê bidê...

Serêm qurbana wê “Ardewidê”,
Wek şivanekî ber kerî-sûriya
Digerim ez jî wan dax û dibûrya.
Qe çima rokê min nake gazî,
Navê: “Filankes, tu çi dixwezî?”
Ez bêjim: “Bide min zîyareta nûrîn,
Kevanya konê pêşa Dibûrî”...

***

Cote gundiyê delal, dilso,
Tezo-Terlan, Terlan-Tezo,
Ter û terez, şitav û şên
Ber çevê min diçin û tên.

Keserê min hildifirin...
Ez nizanim kê dinhêrim?
Kî ji wan du zeriyê gunda
Takêş dike dilê minda?

Yek şekire, yek şîrine,
Yek sorsorke, yek sosine,
Yek şera kesk zefî lê tê,
Ya din-reşa dilhezintiyê...

Dibên meriv bi dil û ced
Benîkê hiz dike bêhed.
Lê min kamço û sewdeser
Herdara jî hiş daye der-
Ax, herdu jî geşin, gulin,
Herdu hevra dixilvilin
Dilê minî şayîrtiyêda,
Çawa cêwî zikê dêda.

***

Nav şîrine, ziman gezgezk,
Sufetsora nav şera kesk,
Te anîne ev kermê han
Li ser riya min kirine şaran-
Riya ku fire min rahiştye,
Tek buhustek te jê hiştye.

Ez bi wîkim-yekî mezin,
Minê nekira gilî-gazin,
Ger li wê buhusta mayî
Tu ber minra derbaz byayî...

***

Gerê gundê me gul dane,
Guhêr bûne karî.
Gulek nazik min navda dî-
Ji ezmanda barî...

Rewşa ezmîn hîv û steyrin,
Şemsê şemal barîn,
Rewşê erda qîz û bûkin,
Gul nazikê narîn.

Rojê xwedê cudane tim:
Yek sayiye, yek ewir.
Şemsê we ji şerqê hiltê,
Ya min –hewşa himber...

***

Gula pêşa palê,
Beniya xanim-xatûn,
Derneyê der malê-
Wextê gîhê didrûm:
Ezê kêlendiya xwe
Tûjkim, te mêze kim,

Xwe berbat kim bîrde,
Şuxul şerpezekim.

***

Te zanibû, Dibûr, birê minî mezin,
Cahiltiya min gul-nûr çû bi girmîn-gazin.

Bext û miraz, muhbet-herimî bi şikê,
Min nedî roj, lezet nav wê kezelikê.

Lema jî te cedand, ber pêşa xwe cinet,
Ji bona min gîhand ev gula pirr qîmet.

Payîza emirê min te xemiland dilbar
Bi vê Gula şîrin, kûlîlka bîn bihar...

## ÇIVÎKÊD ZIVISTANÊ

Hûn zar-zimanê tebiyeta rengîn,
Dengê derengin ber guhê min,
Hûn dilê minin-nav sur û çengîn,
Hûn serma nakin, ruhikêd min?

Xwezil wan roja, xwezil wan roja:
We ser şînkayî hûr gav dida,
Û bi wîtîna weye şîrinşa
Min kar û berxê xwe av dida.

Sal sala çûne, meh meha çûne,
Şerjê bûne ew kar, berxê min.
Li rê-pêgê min kelem şîn bûne,
Û şerjê dibe hê bextê min...

Dijmin û nexwez dest dane hevdu,
Diqefilînin dil-dînê min
Usa ,çawa ku we diarîne
Zivistana sar, ruhikêd min...

## H. CINDÎ

Na, dernekevim vî şeherê hana,
Negerim li van sûk û meydana,
Nekevin guhê min tu deng û dew,
Nevînim bengzê kulfetê bedew.
Nixta min şêlû neke tu qirêj,
Li rex wî rûnêm, mêzekim dirêj-
Sufetê wîyî helal,edilî,
Qam û qedemê kevnî ritilî-
Dapale ser min ruhê rehetyê,
Û... xewra herim hetanî-hetê...

*20.03.1990*

## SERÊ PÊSEKINIYA

Hecîyê Cindîra

Tu hatî rû-hewata dinê,
Wekî testîqkî gilî-gotinê
Miletê meyî bê dîwan-dewlet
Bi mor-mozbeta maqûlya milet.

Tu dîhar bûyî çawa planêt,
Ronaydarekî bi xûn û qinêt,
Yê ku nav bayê dewranêye har
Ji orbîta xwe derneket tucar.

Tu dinê ketî, wekî erhede
Bibî fanosa biata bende,
Wekî ji şewqê teyî nûravêj,
Çira xwe vêxe nusleteke pêş.

Himberî şer û şpûkê dinê,
Derdê sêwityê, jana girtinê, -
Qencî, edlayî her ji te barî,
Xebat û xîret û komekdarî.

Helyayî, çûyî tu bê dew û deng,
Mîna ewrekî bariyî betreng,
Te serî danî, serê pêsekin,
Û te hîvî kir – te hişyar nekin...

*1-ê gulanê, 1990*

## ÊPÎTAFIYA

Gundê Pampa kurdada (naha Sîpan, Armêniya), ser mexberê Hecîyê Cimdî ev xetê Fêrîkê Ûsiv hatin nivîsarê:

Eglebe, pismam, ber vî mexberî:
Vira definiye maqulê milet -
Dewrêşê ulmê meyî ezberî,
Serê pêsekin, pêşewitiyê merd.

## ASIYA ORTE

Digerim va li der-bestê te,
Merheba welatê çiya û rez.
Tîyan-Şan bi dengdager vedigire
Silava min kurdê çiyaparez.

Dilîze Aysûlê naziktir
Îsîka hêşîne berbitev.
Çîngîz ji du çilkê cewahir
Akbara bedewra kirye çev...

Qey bêjî ew deba derdilû
Va, li ber çevê min dibeze.
Bostonê diljendî daye dû
Bi lava, bi hewar-hêwirze...

Qey bêjî erd dike zinge-zing
Ji reva saygakê heverî.
Tanebay bi keser û hizing
Van dera çel kirye Gulserî...

Pismamno, lê kanê "Ana-Beyt?"
Ewê han mexberin, yanê yûrd?
Dikujin rewşa rûyê tebyet
Obêrê ackariyêva mankûrd.

Ackariye hîmê her qeleta,
Ackariya hebûnê, nav û deng.
Neynesiya dîvêrsiya dewleta
Çê bûye ji wê hesa bêferseng.

Digale ziyêfîk tezeva
Ew dilê paşqurna bîstîda.
Milet lev hatine xezevê
Bi gaziyê rastî û qestîva:

"Ev erdê mine, ev-erşê min..."
Diqûre îsanê şunede.
Naxweze fem bike emir kin-
Erd- erdê xwedêye her wede...

Xaliq bi hisreta xweliya cî
Dil dane perwedekirinê,
Û rusqet kirye, ku evd bijî
Wêderê, ku hatye rû dinê...

Çarhilqe para pir bûye armanc,
Dixazin xelq birna buhuştî.
**Lê em çi bêjin, em-kurmanc,**
**Wekî ku biryane ji her tiştî...**

Ma, wekî razî bin dil û ced
Em ji wan miletê xwey îtbar,
Yêd wekî bi dilê firêqet
Ji bona me dibin sî-sitar.

Yêd ku wek pan-tirkê bêş-bêter
Extiyarbir nakin me xap-xayîn.
Zulma **HELEBCÊ** , zulma der
Nakin boy miletê bêxweyî...

Û mîna Seddem bi gef û gurr
Kaw nabe kes diyarî dinyayê,
Ku hene tank û balefirr,
Sîlih û sincadê kîmyayê...

Ez bi van fikarê dilveroj,
Ji heyra Îsîka kîm-kîme
Hatime miskenê berbiroj
Bi rêça çend hezar kurdê me.

Firêqet raketye çarhewar

Miskenê cirîd û comerda.
Bi tema tevêye penzewar
Rezê xas şîn dibin van erda.

Hevt xwezil, çawa ku pêçiyê me,
Hev digirin bi şîrê qaûnan,
Usa berk, bedew û bêlome
Pismamtiya milet bê hûnan...

## ASÊ

Asê,Asê...Ez heyrana navê teyî bi nazdarî,
Ez qurbana ramûsana sûretê te penzewarim.

Dengşîrinê, kubirxweşê, te çima go : " Ezîzê min"?...
Eşq-evîna min tev rakir, reng da bax û gulgezê min...

Ax, min tirê minra yarî, min pîgarî,çar-fitarî,
Min nizanbû tu katekî serê salê par bi parî.

Min nizanbû, tu teyreke bêqedaye, bê qirarî,
Ha banz didî vî kenarî, ha banz didî wî kenarî,

Ha tarr dibî vî çingilî, ha li serê wî zinarî,
Û xêlî wext egile divî ser wî tûmî, wî kelemî,
Kîjan ku wa begem dike dilê teyî bi dem-demî...

Asê, Asê, ax ne te got: "Îro hevkî tevî hevim,
Porr, biskê min peşmûrdene, dive ne bi dilê tevin...

Ezê sivê porr û guliyê xweye nermik tera çêkim,
Bijang- birûyê çevê belek tera bi kil û kilçêkim"...

Ax lê kanê, kanê, kanê? Ez nikarim te ji bîr kim,
Dilê tifal tesmîlî vî halê kaltiyê hêsîr bikim,

Hesa dilêm teze mîna çemê gulanê leme-leme,
Ez hisreta kubira teme, ez hêsîrê huba teme.

***

Ewirada vêsyan tîrinc tew-tewî,
Gund çarseva siyê wergirt bi terbet.

Kengêda minra bûn telexewî
Şevêd Pampêye ax şîrin, şerbet?

Ba bazirganê dûmanê dajo
Li şax-şiveryê çiyayê Qemerdax,
Ber kelefekî kevn, kajo-vajo
Îxbûme di bin barê kul-derda....

***

Ka "Xamê Resûl"? Ka "Xamê Ozman"?
"Kaniya Rîspîtiyê", çayîr û çîman?
Dilikumim ez bi dilekî êş
Nava şoveke dilxore dirêj...

"Kondelê" têra lawika nekir,
Wekî ev mêrg û çîmanê bikir,
Ji hev vejandin bê rem, bê xwedê,
Tilmek nehîştin bona teyredê,

Cewa çivane delale dengbêj
Kirine kanal-goreke dirêj,
Navda çel kirin ew deng û ew reng,
Kesim, kulavok, kulîlk û kereng,

Wekî, bi kirê bîznêsa paşin
Hine ceh-genim zêde bifroşin...
Axir min xewna xweda dîtibû,
Wekî wê ravin du dêwê decal:
Xal û xarziyê ac,
Çayîr-çîmanê Pampêye delal
Têkine qirac.........

## HEKÎMÎ LOQMAN
Qelîbotk

Hekîmî Loqman-tebîbî bilyan,
Şayîrê dewrê zirzokan, eyan,
Ku tu evd-emel ser xwera nedî,

Ku hekîm sed bûn, ew-serê sedî,

Ku zên-bêhna wî gîhand wê yekê
Wekî her pincar, her kulîlkekê
Pêra xeberdan,
Ku her yek ji wan
Çi dûye, çi derman,
Bona çi derdan...

Hekîmî Loqman-tebîbî bilyan,
Rokê jî awa zor û xwe guman,
Çû halê hekîm, şagirtê xwe pêş,
Deqdenosê hevt salayî serreş.

Û bi kêr-dûzan, hacet û hunur,
Dendenê qafê Deqdenos vekir,
Dendenê hilda: dît vaye pirtî
Qirinî-pîstikê mejûyê wî girtî.

Qam-qutar nekir qirnî hilîne,
Go: "Perda mejû wê biqetîne..."

Û ma met-mirûz,
Ber qirniya uncûz:
Serda fikirî, têlê fikira rist,
Lê feqet, tu rê ji riya dernexist.

Hingê Deqdenos
Go:-Loqman-Fîlos,
Mûçikê sor ke, qirniyêva dayne,
Wê pîstik berde, hingê hilîne...

Û cara ewil
Loqmanê aqil,
Hekîmî bilyan, serekê sedî,
Ku tu evd-emel ser xwera nedî,
Alt bû, qurifî ber zêna şagirt.

Tiştekî mîna êrnûsiyê pê girt,
Li Deqdenosê bilyan kir eynat,
Ji qirniyê hiz kir, qirnî lê xweş hat...

Û alimê zor, ejdahê qurnê

Aqa nimiz bû, bû tayê qirniyê:
Û mûçika sor, sincirî, agir,
Girt û nav mejûyê Deqdenosra kir...

## GULNAZÊRA

Ewirê payîzê bûne qurquşûn,
Dûmana daniye-çiyayê kilskirî,
Hûn ji vî gundî raqetyan û çûn
Mîna baharê mine hizkirî.

Beniyê, ne ewan çêrê bêare,
Ne bêdadya min-vî yaşê hana,
Ne xeyb û xûybê evdê eware
Tu ji dilê min dernexistin, na.

Melûl digerim ez li nava gund:
Ne tu dixwênî, ne zarê te jîr,
Bengzê kîjana, porzêrîne rind,
Dîndara teye ezîz danîn bîr...

Ewirê payîzê bûne qurquşûn,
Dûmana daniye çiyayê kilskirî,
Hûn ji vî gundî raqetyan û çûn
Mîna baharê mine hizkirî.

***

Tu bahar bûyî, rewşa Paınpa min,
Kanya hisreta nure nuxurî,
Keyseta kubira zarutiya şîrin,
Dagera rojêd mine bihurî.

***

Ruhêm helyaye nav kilama we,
Ey torin-tirkino!
Çima Kurdistan we kir kambaxe,
Lo îsafberkno...

We Kurdistan bir, kilam jî pêra,
Û kilama xwe pê perwede kir...

Naha di rêça ruh û remêra
Kilama we tê, digihîje vir.
Tê mîna neviyê wî kalikê reben,
Wekî qîza wî xelqê zor revand,
Û naha nevî bona dilê wî
Himî birîne, Himî şirîne...

## KANÊ EW DÎDEM

Keriyê pêz xwe ji dûmanê dipî,
Dişiqite nav qeselêd sipî.
Nav bostanêd rût, çend golikêd jar,
Pirçêd bijoqî, dadilêsin bêçar...

Lê dayîkeke daw-dêrê pêjal,
Pilêçêd paşin direvîne mal,
Çend çivêrûkêd pêşa wê girtî,
Pêra dibezin bi ken-laqirdî.

Li wir hîvya wan tendûreke germ,
Kulavekî nerm, çîrokek miqerm,
Çend silq û kartol- nav tendûra gûr-
Kanê ew dîdem dema sehir û sûr?

Heyran-hijmekar ez li hîvyê mam,
Sal hat bihurî- nehat ew heyam...

***

Cêrga kermê pêz
Ber dîwêrda-rêz...
Esir,edlayî...
Dûyê qelina Cemêl
Hiltê xar û mêl
Ezmanê sayî.
Çend mirîşkê zer
Kicêc dikin ser

Kulîkê himber.
Dîk ketî kêfê
Eşqî axlêvê
Bang dide beter.
Tê bîna pûngê
Ji nav dirûngê
Kirta-kirta pêz.
Kewêd pirbelek
Ji "textê" qudret
Hiltêne hevrêz.
"Çi bext û qeder,-
Wa xwera ker-ker
Ax dike Hebes,-
Tev vî gundiyê han
Dîncî dilovan
Xwey kira ev pez"...

***

O, tu dijminê remreşî nealt,
Padişê mirinê nûr û nederxur,

Çiqasî min li te kiriye eynat,
Ser û sîçê te mirdare mukur...

Reş û heş dikî tu hemû tiştî:
Bedewyê, aqil, gulêd bîncinet,

Qîz û xortê nûr, teze gihîştî,
Tuyê me jî batmîş bikî bêminet...

Çare te nabe rûbarê dinê.
Lê feqet...berî hatina te reş

Ezê vekişim...bi xwe kuştinê,
Ça ku vekişya Kûtûzov lez-bez...

Tuyê bêyî mîna Napalîonê hur,
Dakutî şaneşîna min sade,

Îz û toza min nevînî hundur,
Vegerî herî por û posîde...

## FRÎCÊRA[1]

Xas –xatûnê mînanî te-
Rema Xwedêva perwede
Terbe-tore, temiz, delal,
Maqûl, kinêz, heyf û helal,
Are-are têne dinya bed û beter,
Fêl û finyaz...

...Vî teherî berî wede
Guleke nûr şax vedide,
Nermik, nazik disivsive,
Şexte dide ser û dive...

## BIRÊ MIN HEMORA

Tu çûyî, çûyî bê ziman û zar,
Ketî teveka ax û berê sar.
Sîng û sufetê te Şêrê Elî
Nahaka îda dibine xwelî...

Der mala wera derbaz dibim ez,
Dinihêrim hewşa bi derî-dervez.
Nevîngê teyî rinde hizkirî
Nava heyata ter-temizkirî
Çerxesyara xwe bi hewas dajo,
Bûk wira kinc û kitana dişo.

Ez xewnerojka xweda dîn dibim,
Wekî vaye-va li himberî min,
Ser kursiyê, li ber çeperê malê–
Rihet rûniştî mînanî berê:
"Ca virda were, - tuyê minra bêjî,-
Û deyl bûkêkî, bêjî: "Manane,
Ca min, Fêrîkra qawekê bîne..."

---

[1] Frîca Hecî Cewarî (1932-1993). Doxtira zara, kandîdata ulmêd doxtiriyê, dosênt, xudana 60-î zêdetir pirtûk û gotarênen doxtirîêye ulmî.

***

Ey kurdê keleş, ey kurdê Madî!
Ey mamê gelê Şems û Şîxadî.
Mîna xişmarek şêne şeng-şoxe
Madî tu li ser erd-esasê xwe,

Nemayî, feqet, ser dîn û dewlet
Şaxekî tera her ma ebûbet
Eşqera emir- Şemsulahê nûr
Kekozerê te bûye lêgêndek dûr.

Dijminêd alçax bi kirêd krêt
Vejandin dezge-durişmê welêt –
Nûr-nifûsa te serbeste aza
Bû antêxa bin hevt kele-koziya…

Derc nekir neyar, ku dereng yan zû,
Wê ji antêxê rabin pêlasû,
Şoxêd şivêta Şerefxan, Xanî,
Şêx Ubêdûlle, Melle Barzanî,
Zahar û Mehmûd, Hecî, Celaldêt,
Leylê-berxika qurbana welêt,
Cotê Cezrayî, Îsa Berwarî,
Îbrahîm, Delal, Şvan Perwarî,
Yilmaz, Cegerxûn-qelemkêşê xurt,
Kendal û Şekro , Eyşîşana kurd...

Mizgînê meyî Xanê Çengzêrîn….
Yê xudan rûblî, mark û stêrlîng.
Ber nûra evan gelhizê mezin
Êl û eşîr wê hevdu bihesin.
Wê bi rem-îsaf, bi xem-xîretî
Şênkin welatê xweyî zîyaretî…

## KILAMA KURDÎ

Kilama kurdî, ew hebûna ruh,
Ew mor-miqamê xûna me feruh,
Ew lûre-lûrka tebyeta dayîk...

............................................

Wekî şerqêda şingyaye dewra –
Wek zarîna bê, gurîna ewira,
Wekî bi pencê şemsê nûr, neder
Nav xûn-xeysetê meda daye der.
Rehvedaye nav meda pejale
Wek sêkvoyakî çend hezar sale...

Û naka ... talan dikin kilamê kurda -
Ser dikê dewira me xiringêle
Dihîrhîre çawa kilamên wana...
Tisqîtiya usa li rohilatê
Yek ji tirka tê, yek jî vana tê...

***

Bi methû- sene pesinandine şayîra şerav.
Lê bi femê kin ez jî fem dikim tişkî qenc-xirav:

Xwezil bê ew wext, ku bendê serwext, terbê xweda tam
Şûşê şeravê dayne deravê tek cawa derman...

Venakişe, feqet, ham-ham îsanet ji wehişê xwe.
Avgûst Oktavîan şereva şeytan kire qedexe.

Lê Hiroma hur wek hespê zifir hiriya hare-har,
Qetand "teng û ber", bi kerb û keser-carek din vexar.

Vedixar, feqet, tev hizkiriyê xweAvgûstê bawî,
Lema jî axir hukum nedikir wê fermana wî.

"Tawret" dibêje: "Tu meke pêşe xwera wê yekê,
Çi tiştê wekî tu yasax dikî ji bona xelqê"...

## LI MÊRGA FEYO

Hatime ez dîsa vira,
Kîderê çil salî berê
Mêrga rex qûçê kevira
Fûr dida bedelî berê.

Dikenya kaniya nûr-neder

Wek çevê gogîna gurca,
"Kevirê Lodîn" li himber
Telya bû hesavê hirça.

Nermeba radihişt hizing
Bi bîna berkelêd mexel,
Dibirin ber pozê nazik
Keçika kulîlkêd terxel.

Ber kenê ezmanê sayî
Birre zar-zilamê çeleng
Didan pey parçevkê trsyayî
Nav qûçê bi ket û kereng...

Naha ji wê mêrga nûre nexş
Qirekî gewr maye pêşa çiya.
Beşera şivanê xwedêxweş
Tev kaniyê erdêda nicya...

Medençîya vejendin bona "zêr "
"Kevirê Lodîn" dilkamço.
Qelya ew beybûn û bingêr
Ii "Çelê Evdoyê Xaço".

Ba, bire tûgatê delyayî
Vedirû zilê dor kevira,
Wekî ku tijîke temamî
Buxduma panzde-bîst "gura".

***

...Ez evdalekî şêst salîme, ax,
Mukuryê dêm û dengê te dikim,
Kilîta bextê minî tarmitax
Dîndara teda hatye veşartin...

Zulfê te zêrîn îda divin zîv,
Gewr dike zûda serê min kalî,
Lê dil dikute hela bi hesîn-
Kerbî muhbeta mine çend salî...

Sal ji ber sala raqetiyan rehet,
Dîwan û dewlet hatin guhastin.

Min xwest te bîr kim, fedî bim, feqet,
Dewsa te negirt tu keseke din...

Tu rewş-rukara Pampa min bûyî,
Kanya hisreta kûre nuxurî.
Tu kuda çûyî, tu kuda çûyî?
Tu kubira rojê mine bihurî...

## ÇÎNARA ÇUXREŞÎ

Min pêra-pêra kubra kurmancî
Texmîn kir li ser dêmê wê delal:
Sufeta saxlem, nûrî narincî,
Bengzê berbihêr, beşera zelal...
Şemal dibarî qey ji kenê wê,
Kêlma kubirxweş çev-birûyê lazûr...
Digulgulîn geş ber-bedenê wê,
Li bejn û balê tune bû qusûr.
Bedew bû mîna xewna Da-Vînçî,
Madona Rafayêlra dibû cot...
...............................................

## FEQÎYÊ TEYRA
Lêgênd

Rebilalem bîstpênc sala
Cor dabû ser Feqî.
Kûvî bûbû ji mal-hala
Sur pêketyê feqîr.

Kir-kaş dibû çol û baniya,
Şikeftada dima,
Xeber dida tev teyr û tûya,
Pirs didane çema.

Reh û rezê erdê dixar,
Belg û berê dara,
Xwera dikir sî û sitar
Pot-palosê wara...

Wî digerand kûzkê hinê,

Ser dîwarê şikefta,
Şiyêr dinvîsîn derheq jinê,
Bext û yazya evda.

Hingê, çaxê ku êla wî
Îda bi qewl-qanûn,
Kiribûn şîn-mehêla wî,
Xêr-xêrat lê dabûn,

Bîstpênc cara qarxûnê ser
Çemê Muxsê rabûn,
Bîstpênc cara çiyayê Ernos
Reng da bi gul-beybûn...

Û rojekê, wextê diha
Mêrg û mêşê Muxsê
Xemilî bûn bi gul-gîha,
Koç ketibûn rêzê,

Fiqarekî rûdan sipî,
Dêm qaryayî gincir
Vekir derê jineke bî,
Kere-ker çû hundur.

Nan lêdixist, loşê genim
Ber tendûra xwe gurr-
Wê jinebiya xatûn-xanim,
Wê delala dêmdur...

-Rêwiyê riyame,-fiqare nerm
Got wê şemçiryaxê,-
Ca nadî min nanekî germ
Tesequta malxwê...

-Malxwê kuye, birê rêwî?
Çerx-feleka malxwê...
Ev bû bîst û pênc salê wî
Dirize bin axê...

Nişkêva wê hingê, feqet,
Ji kuleka xênî
Şare-war ber guhê wê ket,
Hewar, çêr û êtî...

-Gundda şere, birê feqîr,-
Got û banzda ser xwe,-
Ca dîna xwe bide hêvîr,
Bera pişîk nexwe,

Herim hevkî temaşe kim,
Ka çi şere li wir,
Ezê bêm û tera çêkim
Hevirîşkekî çivir...

Got û derket ew ji xênî,
Lê fiqarê serqot,
Serî xurand, kir axînî,
Xwera lûvand û got:

"Hey wax, ez Feqîyê Teyra bûm-
Şayîrê êl-êşîr,
Hatim teze li vira bûm,
Bişkoriyê ber hevîr..."

***

Na, qudûm tune,
Hal-hucûm tune.
Şil û şet bûme,
Bêtaqet bûme,
Qews bûme xweda,
Dimirim bêxeda...

## HELALA MINRA

(Wexta ew şeherê Tagîlêda bû)

Û niha, wextê ez wa bêsehet
Dinelim nava telî- tengasiyê-
Bîra te kirye min usa dilcet,
Bîra xemxurya teye kinêziyê.

Ez gelekava hatim xapandin,
Dilê te êşand min nezan-nezan,
Lê axir min dît – ya here amin,
Ya here bedew- ew tuyî dîsa...

***

Çaxê axê ez bûm heqî,
Li min nedin xêr û baqî:
Bera yar bên hev ramûsin,
Ser min bêjin beytê Feqî...

***

Ez kalim, extiyarim, ji hal ketî,
Dilê min –zareke bê fem û nes.
Şev û ro bêhewal, bêtabetî
Nahêle hêsa bim, rehet bim ez.

Ha digirî, dikene, ha diqare:
Lê hiltêm, ew ya xwe dike dîsa,
Ya rebî, ya xaliq ev çi zare:
Deqekê namîne dînc û hêsa.
Roja min pûç diçe, li min tê şev,
Hê digirî sêwya min colangqefes,
Xewa min difire, çev naçin hev,
Dikevim hal-bela can û nefes.

Û hêbet distirêm, dibêm "Lûrî",-
Wê dihejînim bi kilam û beyt,
Zara min dikeve xewa kûrîn,
Hêja ez radizêm dînc û rehet...

## GAZIN

Te emirê min pêda kire jer û jan,
Tîraxa kewkiyê nemerdêd xûjan.
Bi hêrseke har, bi kîneke ûc
Min dizêrînin sûckar û bêsûc...

Çi ji min dixwezin? Naşêkirînim ez
Ewê dayîna te bi heyr û hewas-
Da şayîrekî bê dîn û dewlet
Li vê navbeyna mûre mixenet?...

O, min bavêje cenima Dantê, heger dixwezî,
Lê ez nikarim, ya rebilalem, wek Narêkasî -
Balêsim destê teyî nûr-neder,
Yê ku min dixe usa bed, beter...

***

Ez ku mirim –

Min bi axretek axreta nûrîn,
Definkin hûn ser çiyayê Dibûrî...
Ku batan kerî, batana sûrî
Dora tirba min çiyayê Dibûrî –
Hingê ruhê min-berxvanê berê,
Hêlbya hisreta xubara qebrê,
Tevî kerê pêz ji çiyayê bilind,
Êvara bata belabya nav gund...

**POÊMA BIÇÛK**

Ew xewin bû gelo,
Yanê xewnerojk?
Kurekî rindik
Ji dora kelojk

Birra berxê xwe
Ajot pirêzê.
Qîzê tirmixçî
Ketibûn rêzê...

Ji wana yeke
Qemere çevreş
Kurik nihêrî
Usa beşerxweş,

Kenya bi bîna
Gul û rihana:
"Çî xasike, go,
Belqitîyê hana"...

Qemera qibrax,

Xîrete êgin
Çû mal û mêra
Li gundekî din.

Wêderê ewê
Qîzikek anî-
Porzêrîneke
Nûre nazanî…

Qey bi xîretî
Zeyîka dayîk
Dinê xisti bû
Doteke layîq,

Yeke por zêrîn
Bi bengzê tavê-
Bona berxvanê
Gundê malbavê…

Porzêrîn rabû,
Axir- aqûbet,
Bû divornîka
Şeherê şulet…

Berxvan bû poêt,
Maşoqê surê,
Keribî li ser
Ewê dêmdurê,

Wekî ew gula
Nazik, birûzêr
Ket xiringêla
Gemara bajêr…

Lê birûzêrê
Diran jî zêr kir,
Çend sala ser hev
Poêtra çêr kir…

Dilê wî êşand
Ûsa neheqî…
Qalmesa qure
Nizan bû, wekî

Bi qas-qudretê
Rebê Alemê
Diya wê ew anî
Rû-barê dinê-

Bi porê zêrîn,
Bi bengizê tavê-
Bona berxvanê
Gundê malbavê...

## ZERÊRA

*bo eyda roja 8-ê adarê*

Qîza min ezîz, tu di baştedа
Baş bûyî, bedew heyf û hêje.
Di nava qefsa sîngê teda
Dilekî bi rem hildavêje...

Xerîbdostî tu, pêş û pêcirî
Te ji meriva bawer kirye,
Pariyê bi cefê zor qazanckirî
Birçiyê bêçarra te ker kirye...

Li ser fesadiya nebûye guhê te,
Ne fêlbaz bûyî, ne hoqilbaz.
Lê anegorî rastiya ruhê te
Xwedê neda te bextekî baş...

Divên dizgîna bextê îsanet
Destê wîdane bi xem û dem.
Tu zef xîretî, terbet û zane –
Layîqî şanê benîadem...

*07. 03. 1997, Nîjnî Tagîl*
*(Ev helbesta Ferîke dawiyêye*. F. H*)*

*3-ê gulana sala 1997-a, 63 saliya xweda li Yêrêvanê Fêrîkê Ûsiv çû rehmetê, hata definkirinê gundê Sîpanêda.*

# DESTAN

## ÛSIVÊ NEVYA

### PÊŞKARVAN

Qelem, tu şiva mine qudretê,
Wertînim, awa, te ser kaxetê,

Ber xwendevanêm dewrek dûr vekî,
Rêkê - li Kenana qedîm kesekî,

Dîsa dîharkî gula buhuştê,
Kevirê senemê, selbiya teniştê.

Û em lezekî ji bext duakin,
Xwe li ber pût û senemê takin...

Mêzekin..., hatin, a wê ji dûrva
Qîzê şeherê Şahê Bilûrvan.

Libsê wan çawa perê tawisa
Çiqilê selbiyêda melisîn wisa.

Û vepeşirî gola cinetê
Ber sur û sêra eşq û muhbetê.

Ew ji ezmanda hîv bû-hilşyayê?
Siteyr bûn cariyê rinda dinyayê?

Av lê reşandin, û li çardorê
Kevan rahiştin ken, keskesorê.

Û nazdar "ûfkir" wê nûrik-nazê,
Perik pelişand wek qubeqazê.

Guliyê wê nolî cot soremera
Ser rûyê avêra kişyan kenara.

Ew hêl bû hanga heta navkêlkê,
Ma di hindavda wek xewnexêlkê.

Ser sing ricifîn cotê hinarê,
Qey bê biçivîn, hev hatin xarê.

Daçivî îcar hilat hindavda,
Destê nazikî-kevirek navda.

Dûrva avîte kevirê senemê,
Ax, kî bû nêta wê nûr-meyremê?...

Lê yazix bext û mirazê jinê
Dest wêda nine nolî bazinê.

Meyanek xwera dilda heyamkî,
Berawild dike cahil-cîwankî.

Feqet Aqûkî çil û çar salî,
Bavê deh kurê tere delalî,

Padişê Kenana nav-deng hilketî,
Mêrê Bedîla no, kubir ketî

Rokê hiltîne tîr û kevana,
Tîr û kevanê van nêçîrvana,

Û banz dide ser hedekî,
Ser hedekî kumeytekî,

Dajo deşta "Erzîhalê",
Siyarî dide ser xezalê.

Û li tûnc nêçîrê gorî-
Digihîje wî sînorî,

Li ser gola qîz di navda
Disekine di hindavda,

Û xwe davê ser libasê
Wê gozelê, gerdengazê.

Û Meyana bîst biharî
(Qîza Şahê Bilûrvanî)

Lê tê lava û dîleka:
- Gidîyo, di riya hevt meleka,

Sitar heye-boy Xwedêye,
Libsêm bavê, bira bêye...

Erf-edete, xatirceme,

Libsêm bavê, bona teme...

Û Aqû jî libs didêda,
Ewê horiya nav golêda-

Dewsa ewê kar-xezalê
Digire xwera tine male.

## KARVANÊ EWLIN

Dilê min xanek beyte buhurtî,
Kişya karvanê ji dil dagirtî.

Evî karvanî pêşpejal gavda
Mîna Deeleki best û binavda.

Decleyê nava kevî-kenara
Aqû bû nava cotê dîndara.

Yek nerm û naz bû, ya dine bed bû,
Yek mêrga xas bû, ya dine tet bû.

Sal-misal dora mêrga muhbetê
Aqû bû çemê-gêjgerîng ketê.

Pêl dida, naz û nûbar difrotin,
Jêra çîrokê cinet digotin,

Û xwe davîte pêş û bedenê,
Xweş radimûsa xala gerdenê.

Û mêrga mawar jêra beşirî,
Gulek ji berê nûrîn nitirî:

Tiflekî mîna hemûşka sade
Bû xamdergûşa diya esilzade.

Aqû ewledê yanzda hesav kir
Û tiflê teze Bînamê navkir.

Lê salek jî ku salê zivirî,
Padişa diha bû xweyê çi durî?

Kurekî nûrîn, ku nolî birq bû
Ji ber daminê Meyanê firq bû.

Qey bê "Yûpîtêr" rijya ezmanda,
Wekî digotin "Yûsiv" nav wanda.

Û esil-esas nave siteyrê
Li tifal kirin wê hewas- heyrê...

Ûsiv –bedew û rindekî wisan,
Ku natye dîtin nav evd û îsan,

Ji nedîtyane, nebûya, nebûya,
Û jêra gotin- Ûsivê Neviya.

Du kerem, feqet, timê tunîne,
Xwedê jî bide, bende distîne:

Ûsiv ku nolî royê nedîrda,
Bîn –beşer birya ber dîya hêsîrda.

Xubarê da dêm, reng lê teyîrî,
Nexweş nelîn kir-li kur heyîrî.

Lê kur ji wêra hê nego "dayê",
Ewê qulivand çev ji dinyayê.

Çel bû nolanî toxim-tiberkê,
Lê Ûsiv digihîşt nolî nûbarkê.

Qaş û qelemê dayîka buhurî
Li ser sifetê tûnc dinitirî.

Kubra kur nolî antêx-alavê
Geş dikir qelb û qinazê bavê.

Wek gulbaxana berbi şems xare-
Mêla bavê ser kurê dîndare.

Diniya bi kurva wî diqeşire,
Şev diçilmise, ro dibeşire...

Lê bengzê Beda dêmarî jere,
Ûsivra kîne, dil qal û şere.

"Emirekî diya wî li min bû qeda,
Naha jî ew bû edûyê ewleda"...

Dilkuliya xwera beniyê fikar kir,

Fikarek li ser fikarê bar kir.

"Min dê verê kir, go, bi jejîkê...
Ka li vî badim ez çi gizîkê?

Eger ku holkim wî jî riya dêda...
Lê min ruh heye destê Xwedêda"...

Na, îcar bo heqê îsafê
Beniyê jer nekir tu nan, tu avê.

Lê wek padişake dew û duanê
Dew danî li ber padişê Kenanê:

- Çawa, min deh kur tera anîbe,
Mêla te li ser wî êtîmîbe?...

- Nellet, -Aqû go,- nevisa xezevê,
Derheq Ûsikê min wan gilya mevê...

Çûkê malêye, dîndar delale...
-Na, go, li dinê "şewq û şemale"...

Bîne wî sêwiyê heramî reda
Dayne ser serê min û ewleda...

Bende jî, belê, mînanî baxe
Bedewî şemsê şewq û şepaxe,

Xweş dike berê dara hinarê,
Lê tev radike jera ançarê...

Ew bende bêje - Ûsiv bedewe,
Ew ber xanimê dîn û derewe.

Ew bende bêje - Ûsiv aqile,
Benî Bedîlê ew miqabile.

Lê aqil xwe ne siteyra rojêye?
Na, hucet îcar dora padişêye:

Bera hunurê perrê kaxetê
Safîke qala mêr û kulfetê.

***

- Te dît, Bedîlê, zerpê dinyayê?-

Ken û kêfhatî padişê pirs dayê,-

Çi alimî wê xêncî Ûsikê me
Bigota qesir qederkê kême?

Lê min tek-tenê perrê kaxeza
Yekqat danîbû bin pîandeza.

Benî Bedîla wî diqirqile:
-Na,-divê,-lêpe, ew ne aqile.

Ew text û bexte,
Na, ne serwexte.

Aqû go:- Te vî qewilî înkare,
Şertê min îcar tera ducare.

Û derbaz nebû li vira xêlek,
Ber kura danî wî seqavêlek.

-De, go, bişkênin, ça semta we tê:
Binhêrim îcar we û qewatê...

Û yekî vir da zora bîleka,
Pîrê qewatê yek hat dîleka,

Yekî danî ber derba midasê,
Yê dinê-guvaşt li cokê hasê.

Yekî jî revand ji destê birê,
Kirgalkî tewand ser situkurê.

Dikin û nakin, seqavêl naşkê.
Dora Ûsive - bike îlackê.

Ewî saqavêl vekir û hanga
Çirpî şikênandin wek pîzpîzanka.

Aqû firnax bû:-Şêwir çiye, lawo?
- Şêwir tifaqe,-Ûsiv go,-yabo,

Eger çend bira, yan eger êlek
Hevdu civyabin ça seqavêlek,
Tucar di nava ceng û cebara
Alt nabin li ber derba neyara.

Lê bê tifaq bin, ji hevdu dûr bin,
Nola van çirpiya wê bişkên, hûrbin...

- Eferim, lawo...Bêje, Bedîlê,
Tê li vî şertî bikî çi qîlê?

- Ew jî şîrete,-xanimê gotê,
Û mêrra dewkir wek melkemotê:

-Te şîret kirye... bi wê şîretê
Li ber kurêd min tînî xîretê?

...Ezê vê derbê qewlekî daynim...
Mêr go:- Keremke, dayne, ezbeynim...

Ewê yek mirîşk da dest ewleda:
- Bivin, serjêkin cîkî xewleda...

Cîkî usayî xalî xewlebe,
Wekî ku Xwedê haj pê tunebe...

Û birin: yekî-qulçê tewlêda,
Yê din serjê kir kuncê hewliyêda,

Yekî serjêkir li bin siya tarê,
Yê din "xewle kir" di bin sakarê...

Lê Ûsiv, binhêr, qey bêjî qesta,
Hat û sekinî-mirîşk di destda...

- Hi, lawo, çima te serjê nekir?
Tunebû tu ciyê bi semt û seqir?

Ûsiv go:-Yabo, Bedîlê, yadê,
Çi cî wê hebe li rû hewatê,

Wekî ku Xwedê lê ne guhdarbe,
Herge îsafa meriv hişyarbe...

Bedîl bozxûn bû, îdî dey nekir,
Vekişya, diha hucet xwey nekir.

Vekişya, feqet, bi wê hesavê,
Çawa mer vekişe, wekî xwe bavê...

***

Roj çûn, lê neçû ernûsîya qeda,
Dê bû xeyb, kete guhê ewleda:

-Lê gere reha dijmin-decala
Mala min xweybe dewsa delalya...

Ew li padişê bê xanê wek tevê,
Hûn merê reşbin ber çevê bavê?

Bav, wekî aqa femkor û dîne,
Ku derc jî nake durfê wî nine...

Çi bira, lawo, pirtiyê dijmine...
Kîjan heqmaq bi dijmin amine?

Bivin undakin wî cinê cedû,
Ku hê we nebûye emel û edû.

Dara pêşberî rê disekine,
Radikin, hela koka wê kine...

Bivin hê nebûye padişê Kananê,
Hûn jî nekirine kerê olamê...

## KARVANÊ DUDA

Xweşe havîn li ware Kananê,
Çil-çiya ketine rewş û pihanê.

Deştê wê nexşin-zîliyê xemilî,
Gujmê wê gewirin, qeya-qimilî.

Çemê kewserî nerm fûre-fûrin,
Darebî serda gulya dihûnin...

Teyrê cinetê çiqlava tarin
Karê xezala hev bare-barin...

Evê rozgara nolî cinetê
Nêçîr li lawê padişazade tê.

Wana wergirtye kirasê zirî,
Kumê qemtokî, sole saqkirî.

Qemê wan li ber kemberê zîvin,
Gurzê xedenga li qaşa zînin.

Wê çûn qulivîn "Girê Gewrava"
Bi hesp, cenûyava, seh û cewrava.

Kuna bîn dikin tejiyê hîn kirî,
Bûye fire-fira hespêd zîn kirî.

Teyr-tûyê tirsyayî qey bê ber xewa
Vedicêniqin, xwe davên hewa..

Şîlan, hewşanê bin wan sitirî,
Ça destê bidin demaxatirî.

Dihejin, û wek hêsira tên xarê
Aviya ser wane ji terîbarê.

Beyaniya bîna hesin hildane,
Silikî li ber tûm û teldane.

Qey bêjî, nêçîr qelyaye, qate.
Lê, wa, mêşeda tiştek lipate…

Qoçin, yan çiqilê dara palûte,
Wekî ji parva şîn nebûye, rûte…

- Merale,-qûrîn Ûsivê kurîn tê,-
Ji tîrêd bira gujîn-gurîn tê.

Meral pertav kir nolî birûska,
Silo zengû kir hespê xwe zûzka.

(Edete, wekî nêçîr kudurye,
Rikêf-rikêfa birê nuxurye).

Meral bi bayê sawê teriqî,
Banzda ji qeyak tîke terikî,

Ser newalêra çing kir, çilqas kir,
Hespê kihêlî newal xilaz kir.

Feqet Silêman ha bero-paşe,
Tîrê davêje tîra wî şaşe…

Çye, hewasa wî nêçîrê tune?

Yan meremê wî nêçîrek dine?

Ûsiv qirqilî nîşanê digire,
Lê tirse tîra wî birê bigire...

- Usivo, bajo,-Silo qîrîne,-
Pêşyê lê bigire, ser minda bîne...

Kihêlê Ûsiv qil bû, pêşyê ket,
Dilê Siloda xezevek vêket...

Tîr-kevan rast kir, raçand tetikê,
Dûrva raçev kir mêşa patikê...

Lê ricafekê jend serê pêçiyê...
Axir bira bû, destê wî neçûyê.

Meral xilaz bû, elk-elka saye,
Firîn-fişîna hespê xûdaye.

-Werin,-Silêman rû tel ferman da,-
Xwera nêçîr kin çend teyr-teyreda.

Ro hat derbaz bû teştiya mîranî...
Û bira wirda rikêf hilanî,

Derketin serê gola hezekê,
Çend werdek kuştin nava lezekê,

Hildan, qewlekî li hev şêwirîn,
Hatin ser bîra Betman êwirîn.

Kûrme lê kirin, û qelîya betê
Bîn avît, bîna temê cinetê.

***

Şems di şeqîva çiyêda çû xarê,
Çiya reş girêda bi sî-sitarê.

Bû şinge-şinga bayê bahêsiya,
Bêra şîhîn kir hespekî bê siyar.

Vekin delan û dergê hesarê,
Yanzde bûn, deh siyar hatin dîharê.

Qey bê barî bûn gûlik di serda,
Diçûne qesirê- serê wan berda.

Û dema pê dan ser pêpelînga,
Qûjyan wek çemê ser gêjgerînga:

-Ûsiv brao...Ûsiv brao...
Aqû heverlû go:- Çi bû, lawo?

Çi we qewimî, ka, Ûsiv kanê?
Gotin:- Gura xar gula Kenanê...

Birûskê qey bê ewirekî xêj xist,
Gurîn jê anî û li erdê xist,

Qey pêlek berê nolanî çiyakî
Aqû raxist wek gûlegîhakî...

Hewara bira îcar bû "yabo"...
Hewar Hesarê hêle bela bû.

Şîn, girî kirin, deng dan "weylêrka"...
Aqû çev vekir teze çevkêlka.

- Ka nûra ser min, go, Ûsiv kanê?
Ka bîna ber min, go, Ûsiv kanê?

- Xwe bihêvişîne,-kura go,-yabo...
Nellet nesevê gurê no, yabo...

    - Ûsivê min...gura?
    Gelî kafira,
    Cabeke îsaf...
    - Gura xar, ay bav!
Gura xar.Belkî em gurê harbin,
Cenimêda jî bê cî û sitar bin...

Em ji Gebaxda xar dibûn palê,
Ûsiv teriqand karek xezalê.

Me go:-Pey meçe, Ûsiv, webale...
Guneye, maka wê ne li bale...
Lê divên: "Wekî hatye ecele,
Ecel jî diha nade mecale"...

Me gotê, ewî gura me nekir,
Karik kudirand, axir ya xwe kir.

Çû pişta "Girê Gewrava" ta bû,
Ji ber çevê me usa beta bû:

Hetanî em çûn pêra gihîştin,
Gura ev kiras li dewsê hîştin.

Kiras derxistin, danîn ber bavê-
Kizîn Aqû hat nolî kivavê.

"Lawo"... kir, qey bê ewirê gulanê
Gurr-gurr kelicî berî baranê.

Hêsir hesavê ava berkelê
Dibarîn li ser xûn û xedelê.

Haqa barîn ser kirasê xûne,
Ta xûn jî rijya herdu eyûne.

Ta hêsir çikyan,Aqû nalîn kir,
Hilda kirasê bêmiraz bîn kir.

Nava avxûnê kiras mewicye,
Lê geza gura ka ku tunicye?

Dilê Aqûda şikek şulikî,
Ji şîn-giriyê xwe qey bê xûlikî.

-Ay gurgê dupê,- wî dew kura kir,-
Lê ka, gurgana diran kura kir?

Wekî li ser vî kirasê hanê
Tu gen û gezek nehate xanê...

Na, fenda nekin, menek vir heye,
Wekî derewa weva perdeye...

Yanê na, kê dye nêrê havînê
Gur bixun siyarê ser zîn-dizgînê?...

Eger hûn rastin, we qelpî nekir,
Bînamê çima we xwera nebir?

- Yabo, wan pirsê gunekar meke,

Kula dilê me hê xedar meke.

Çira ji bavê ceger-xûnav çûye,
Ji me birangê reben av çûye?

- Bêjin, na, bêjin, dirya Xwedêda,
Ûsivê min saxe, yanê we lêda?

- Gurga xar,yabo, ax bêje gurno,
Nellet-nesevno, gurno, gawirno,

Belkî diranê we bişkên, gurno,
Dil-hinavê we jorda bên, gurno,

Belkî lingê we bikişin, gurno,
Belkî çevê we birijin, gurno.

We ça xof nekir ji wê nederê,
Ew nûr temirand ber wê fenerê...

Kifirî kirin, gotin, lûvandin,
Aqû ji hemd û hemad birandin.

Padişê porr verû, şanê xwe şîn kir,
Xwelî xwe wer kir, hêbet zûkîn kir.

## KARVANÊ SISIYA

Guhêm gujîne, guhêm gujîne,
Guhêm gujîne, karvan zingîne.

Çi bazirganê mirinê bese?
Ev bazirganê evdmerexese.

Hevt ro, hevt şeve- li serê riyane,
Hokîn-horîna ismayîlyane...

Hat bazirganê delû-dewara,
Çawirme danî bin sî-sitara.

Bîra Batmanî, kaniya cinetê,
Avek zelal bû, û dewlik ketê.

Çi avek ava avilheyatê!
Dewla ewlin çilk û çeva tê...

Dema ducar bû, dewl nivîşkan tê,
Lê cara sisiya çima giran tê?

Xwedê, tu bidî yeke bi xêre,
Avkêş betilî, yan bîr bi sêre?

Şirît kişandin, hê dewl bîrêda,
Keviya bîrêra qey nedîryê da.

- Benîo, tu kîyî? Tûra meriyanî?
Yan ji nesevê horî-peryanî?

Lê Ûsiv kere, qey bêjî lale,
Û nade caba pirs û suale.

Dinê dinhêre, hêsir li çeve,
Nizane çawa xeberde, şabe...

Qewatîk danê, gulavek serda,
Gulavê xweştir Ûsiv xeverda,

Go:- Xwedê xweşno, ez jî ku heme-
Bendekî nolî weyî sademe.

Ketiyê birame-vê qiyametê,
Xilazê weme bi rayê Xwedê.

Bira daxistim, wekî ji vira
Avê derxim bo qawirmexura...

We çawa rem kir, derxistim avê,
Usa jî bivin teslîmkin bavê.

Bavê min, wekî xwe-xwe padişake,
Bê qencî, qedir we verê nake.

Lava-dîle kir, dîlek dehcar kir,
Bazirganbaşî, feqet, înkar kir:

-Lawo,-ewî go,-çi padişa hebe,
Bera esas li text-tacê xwebe.

Lê ewled-tewled tişkî min tune,
Hilbet xaliq jî li aliyê mine,

Wekî tu lawê nûr, cewahirî

Li vê çolêda min biter kirî.

Bivim te şirîn-nûrîn lawê xwe
Xweykim nolanî nûra çevê xwe.

***

Kişya karvanê biha barkirî,
Seda zengila wek gezo barî,

Li hev xurdilî di deşta kûrda,
Çiya û beyara xweş pêra fûrda...

Rê tên dibuhurin, rê tên dibuhurin:
Ha deşt û dûzin, ha çiya û girin...

Aha xanê kir "Gujimê hewara",
Aha garana deve-dewara...

Aha gihîştin deşta "Sîsarê",
Aha mikanê miriyêd hesarê...

Ûsiv ku gava dûrva mêze kir

Hêstirê çevê melûl zevt nekir...

- Ha, lawo, bêje,-serek sual kir,-
Çi xemê wusa kêfa te tel kir?
-Mezelê hanê...
Axahim, hergê didî rusqetê,
Herim bi qewlê sond-selewetê,

Demaxatirîkê bidime diya xwe,
Bêm, û em dîsa herin di riya xwe...

- Lawo, em gişk jî ewledê dêne,
Qûlê ber rem û reza Xwedêne,

Here, webale, li ser seferê
Texsîrkim sêtya dê û cegerê.

***

Heykelê dayîka Ûsiv eyane:
Mermere, kevirê reşî bin piyane,

Kêrtik û kove li her çar dore,
Beyt-bîranînek bi serva more:

"Dilê min ewirê erda geryayî,
Meyane, te wek birûskê jendê,

Mîna birûskê çûyî vêsyayî,
Agir-alavê kulê hilşandê".

Aha dixûne kur beyta bavê
Û dibarîne hêsirê alavê:

- Dayê, ez diçim, dayê rêwîme,
Ji te sêwî bûm, bavê jî sêwîme...

Dayê, ku hatin ewilê havîna,
Rojê mezela, piş firavîna,

Zêndî ku hatin ser miryê xweda,
Û kûrîn kete dê û ewleda,

Dengê min hingê tu ku seh nekî,
Nexeydî, dayê, dilê xwe nekî...

Xeber pirîsk bûn, dil-dê şewitî,
Qey bêjî heykel ji cî lipitî...

Serê kurr bire ser ber û bistan,
Bi destê dêva pore wî mizdan:

"Ax, berxê minî dû dê zêryayî,
Bi jera kîna bira çêryayî,

Bêbexta çi yek serê te kirin,
Tabetya min jî birandin, birin.

Lawo, wekî nav heyat û emira
Bextê te hebûya, diya teyê nemira,

Dê ku tev bavê cot per û baske,
Ku zarr bi wanva kewkî firqaske...

Niha tu-kewê baskek şikestî,
Serê riya ketî, melûl û mestî.

Yek kare bive te bi nan-avke,
Yek kare bive bi dax kivavke.

Ê, lawo, çi jî bibînî, sehkî,
Îsaf û Xwedê xwe jî bîr nekî"...

Ûsiv "xeberê" dayêva dêrî,
Qey bêjî ketye xewek xewn-xêrî.

Ew texmîn nake teviya baranê,
Qey hêsirê dêne aviya baranê,

Nerm vedimalin ji çevê diya wî,
Tên û dirijin ser temoriya wî...

Lê ewir veçixyan, baranê vekir,
Ûsiv pirtîna çivîka seh kir.

Qey çivîk nîn bûn, lê ruhê meyta,
Ku derketibûn tûjkê kumeyta,

Û çîve-çîva wane cinetê
Difûrfûrî nav çol û tebyetê.

Dûrva dixwênyan birc û bazarê
Ûrta Kenanê - şeherê Hesarê.

Lê Ûsiv...îda wê neçe malê.
Miste xweliya dê wî kir dezmalê,

Piyê heykel paç kir..."Xatirê te dayê"...
Û dilşikestî pişta xwe dayê.

Hat. Karvanbaşî no û neheqe,
Agirê xezevê ji ber dipeke.

- Lo, kuro, lawo...,-wî da xebera,
Tu bûyî meytê nava mexbera?

Ev eşyayê han xas, hizêmetî
Qumaş û etiran, kevirê qîmetî,

Malê wek xizina padişê Kenanê-
Tev bêxeda çû ber vê baranê...

Got, sîlek dayê: qey sîle nînbû,
Topek ji topa erşê ezmîn bû...

- Qirar-qesembe, go, Senem şede,

Em gihîştin cî bê ziyan, bê zede,

Ez te dewsa vê ziyan û zirarê
Şeherê Şamê derxim bazarê...

## KARVANÊ ÇARA

Oxira Ûsiv neaçix lêda,
Lê neyî mestim nav melûlyêda:

Nûrekê Şamê şewaq vedaye,
Dilê min walî terrî hildaye...

Wek mіnminîk çûye, qesirek mermerî,
Li ku dişxule beniya fenerî...

...Ax beniyê, beniya sufet simawe,
Qesira mîr Şibqî gelekî kawe:

Dîwar mermerin, derî yaqute,
Binî şimşate- mer dişiqite...

Şewqa binrexa davê arîka,
Şewqa arîka davê şêmîka.

Lê çevê te wir tevê dirêjin,
Memik şemdanêd şevê dirêjin...

Şeherê Şamê teva dibiriqe,
Ça gustîlk qaşa xweva bibriqe...

Qe çend tucarê çirûke tima
Ji Celatûran, Hegar, Alima,

Durrê ku bera Sor deranîne,
Hedaya mîrê Şamê anîne,

Wekî tek-tenê, qe na deqekê
Bibînin dêmê te nûr-melekê...

Werin temaşa rind û bedewa,
Ey xwendevanno, lê feqet çawa
Ez dêmê ewê nûrîn elîfê
Bitifiqînim wek dêmê hivê?

Divên "dara bî", çawa qûtarkim,

Bi bejina bîyêva ya vê dîharkim?

Lê por zef nolî teyrê zêrîne,
Wekî li sere darebya şîne...

Lê wekî zulfê zêrîn ew berde,
Zanî çi tiştê dîharbe ber te?

Heykelê hewê bi dur nijartî,
Di nava çirkê avê veşartî...

Lê ku bext lêda, lêv kenyan tera,
Tê hew texmînkî- cotê gulpera

Biçivîn û wek kumkura sipî
Diranê qerqaş binva biriqîn.

Lê ku reqisîn birûyê qelemê,
Tê hew texmînkî, rebê alemê

Bi wan birûyava, ku terazîne,
Bext, ne bextya te hêbet dikşîne.

Eve Zelîxe...Lê feqet eve?
Çilka baranê wê şêlû neve?

Wekî ji çevê ewira xilazbe,
Nav toz-xubara dewra derbazbe...

***

Zelîxe dêmê nûrîn şimşatî
Dişo bi ava "kaniya heyatî".

Her ew av nerme, nolî zeytaxe,
Herkê li dêmê nazikî naxe.

Lê derengî ket cariya rûstendî...
Porkur, xanimê kengêda şandî?

Naha meydana bes, mûşayîra
Kire-kir ketye dengbêj, şayîra,
Ka kengê beniyê li wan nedîrde,
Eşqê li dilê xort û bapîrde.

Ka deng û rengê kê wê qebûlke,

Kîjanî şake û kê melûlke.

Lê hê ber eyna
Horiya bethina

Çev-birûyê xweye belek dinhêre,
Libsekî libsê din diguhêre.

Bîn dike kûzkê misk û emberê...
Çirîn kir, a wê, derê sivderê.

Carî birûsk bû, ku hate xanê,
Benî gujya wek ewirê nîsane:

- Sive ku, êvar ku, mukir-mirarê?
Çiye, te ji bîr kir rê-dirbê malê?

Ro hat derbaz bû teştiya mîranî,
Teze ji minra te jî av anî?

Belkî wê avê çawa jer firkî,
Ser mîr Şibqîda pore xwe kurkî...

- Pî, xanim, xwekî - bi wî ekberî,
Tê ewî dêmê nûrîn nederî,

Nola rûyê ava hênik, tenikî
Bayê hêrsêva tevî hev nekî...

Xanim, tucara benîk anîne,
Li serê sûka "Nûbar" danîne.

Xwedêkî, here serîkî pêxe,
Paşê were û serê min lêxe.

***

Dinê bazara reng û rewşane,
Alvêr babetî şah û padişane.

Dinê bazara kevn û kelane,
Alvêr babetî kesîv-kolane.

Dinê bazara naz û nemete,
Alvêr li hemû benda babete.

Dinê bazarar Ûsivê Nevyane,
Alvêrî ancax
Babet-beyanî Zelîxe benyane,
Badê, ehilê sûka "Nûbar"
We ev eşiya, sêv û hinar
Ber bengzada usa hiştye,
Dor vî beniyê han rahiştiye...
Badê, pîra hevtêsalî,
Tu jî bi xwe-wî qerpalî.
Te daye du geçî dezî,
Bahê beniyê nûr dipirsî...

Ser rê hildin, beniya mîr tê,
Hîv ber bi şemsê nedir tê.
Çev đî, oh, dilik pirpitî
Mîna kewek netebitî.
Yareb, ewê ev dîndarî
Xewnêda diye, yan hişyarî?...

Dil begem kir, pirs keseye:
-Tucaro, go, çi hêjeye?
- Beramber zêr...Benî bûkê
Qursê zêra anîn sûkê.
Û wek hirçê delê đerê
Tucar kete hele-belê.
Lê ça teraziya takêşe,
Dilê beniyê hildavêje...
Zêr zêde kir, badilhewa,
Ew ta dîsa hêl bû hewa.
Wê ben-bişkoşkê xwe jî qetand,
Lê dîsa ta ranegîhand.

Tayê Ûsiv giran dertê...
Qey bê bû lengerê erdê.
Çetine bo esilzada-
Bimîne ser ta-tereziya...
Çev kir beniyê: "Çenge xwelî,
Go, tu bavê ewî alî.
Çevê îsanet li zêre,

Lê xweliyêva tenê têre".
Beniyê birû-bijang hêl kir,
Go: - Tucar, te fend û fêl kir?
Çevê kê bi toz û telpe...
Biguhêre, mêzîn qelpe!

Û ta tucar pev guhêrî,
Heta tayê zêr nihêrî,
Wê çeng xwelî zêra warkir,
Ta bi tava beranberkir...

***

Rezê baxeta sertê sêvane,
Çar û çerezê malî, mêvane.

Rezê kaxeta xasê beytane,
Çar û çerezê xwendî, seydane.
Rezê muhbetê xweş ramûsane,
Ne çar-çerezê Ûsivê Nevyane-
Wî xam zilamê hivde salane...

Divê:- Xerîvê te nînim, xanim,
Divê:- Nevsnîvê te nînim, xanim,
Divê:- Bav-birê te nînim, xanim,
Ev çi hewale, çi ramûsanin?

- Wey lawikê xam xêvikî,
Çi sualê bêfem dikî?
Welle, bira bav zêdetir,
Ji ruh, îsaf, nav zêdetir,
Ji rewş û ro,-
Zelîxê go,-
Hube hisret, heydada min.
Îmdada min...-Û ça kurşe,
Kurşa çiyakî tîkda hilşe,
Ber bi Ûsiv xar bû, feqet,
Ûsiv revî ji ber derket.

Sîngê beniyê mîna berê-
Ber firtona kenar derê,

Hêbet-hêbet hilket-daket
- Wey,go, cariya bê merîfet,
Te por kurbyê ser pore min...
Axir birçiye nûr beniyê min,
Lema beşer-lêv tunîne,
Misiletê kêf tunîne...

Anîn fenî singê periyê
Birinc dan ber bi lengeriyê
Û qelîke sor, kizirî
Wek dilê hub, nehizkirî.
Zelîxê da cama çinî,
Ber sekinî:
Yek gulm gulav
Yek loq pelaw
Çû orta can-kirasê law...

"Ya Ezîrîs,-benî bilya,-
Vî teyrê dibûrî-zerya
Kedîkim bi çi pirs-gilya?"...

Wê hemdema xwe hilanî,
Li ser çoka narînc danî.

Dest mînanî perê kewa
Nerm dawşandê, sitira awa:

- Ûsiv, bejina min zeytûne,
Sîng û berê min hêlûne,

Were wek teyrê cinetê
Dayne hêlûna muhbetê...

- Xanim, "Zembûl" kitêb dibê:
"Wê ocaxê meke hubê,

Kêderê te nan û av xar",
Xûşka minî, dayka dîndar...
Zelxo bengz û beşer avît,
Hemdem gumanteher avît:

- Ax, bextê kor,- got û girya,-
Te rem hinda minda birya?

Canîya mine bîstdusalî
Da wî Şibqiyê hevtê salî...

Lê qe wê hiz neke zilam
Ji Zelîxa Qeyxan Sultan?...

- Lawik, lawikê esiltorin,
Em hilkişin qesira jorîn,
Hilbet eywan pir sadeye,
Ne babetî bala teye?

Û dest hêbet avît zendê,
Ûsiv bire eynebendê:
- Ûsiv, nellet meseva min,
Çeva veke - ne seva min...
Çi hiz dikî?
- Zarûya, zarûya...

Anîn hatin zarek cariya.
Zaro gixya: û wek beybûn
Çevê Ûsiv bi ken vebûn.
Lê qey sêr bû, xewna şeva,
Wekî vebû li ber çeva:

Rast nihêrî –Zelîxeye,
Çep nihêrî- Zelîxeye,
Jor nihêrî- Zelîxeye,
Jêr nihêrî – Zelîxeye...

Mîna meralê nav mêşê-
Agir ezmanada hilşê,
Hundur giştkir,û wê giştê,
Benya temserî rahiştê,
Lê dêstva ma qusês kiras,
Buxdaneke dinya dekbaz:

Zelîxê kinc zîtol kirin,
Daw-delingê xwe qol kirin,
Dakuta nav dîwana mîr,
Por verût wek sêrbazek pîr.
Go:- Lê? Kali qoncî qirac,
Ne tu bî, ne ew text û tac.

Lê navêjî,
Min benîkî xarinpêjî
Aniye, acî gahûteye,
Çevê wî nivîna teye…

## KARVANÊ PÊNCA

Wextê vedibin derê biharê,
Derva dibezin berbi berwarê,

Binevş bi şemsra xweş dibeşire,
Ji kexmê tevê zêrr dipişire,

Xwezî li hingê, rêwî, rêncbera,
Ne xwezil hingê li girtiyê kela.

Wextê deştada leylan dibiriqin,
Revoyê hespa dûr diteriqin,

Û ser kewşenê dûrî derexe
Çivîk distirê hub-hisreta xwe,

Xwezil maçgirê cot û cubara,
Ne xwezil hebsiyê nava neyara.

Wextê mînanî ber û ovkyana
Çev zelal dibin berê ezmana,

Û wek gultime hiriya şeh kirî
Ewir datê hafa qulba buhurî,

Xwezil qulinga û qubeqaza,
Ne xwezil teyrê nava qefesa.

Ne xwezil halê Ûsivê Nevya,
Wekî derket van kêşver û kevya.

Ji benda bîra Batiman aza bû,
Kela Şamêda teze ceza bû…
Ewil ji kînê, naha ji hubê
Merûm-miqûf bû ji kubira dinê…

Ax, ref-ref hatin ewirê adarê,
Dîsa guryan ew zengilê biharê,

Birûskê tûjkê kela Şamê xist,
Dilê hebsîda hisretek vêxist,

Û dil der vebû wê şeva şilî
Ba, baranêra xuşya, xulxulî:

"Ewirno, ewirno, hey wax ewirno,
Hûn beranê nav kerê me kole gewirno,
We dîsa hat kella da hev, bela da hev,
Dil-dînê min tev rakirin,
Min bûn mukur, dûmik dewrno.

Ax baranê, ax baranê,
Dayîka min, xweyînga min,
Wehîd mame vê aranê.
Tu dûr têyî
Ji nûr têyî,
Hûr-hûr têyî,
Kan û keysa Kenanê bê qusur têyî.

Îsal serê çend salane, çend qederin,
Zîndanîkî kes-kinêza bêxeberim:
Kubir-kêlma kes-kinêzê-m qey ji te tê,
Ca tu bêje, heyranim te- wê suhbetê,
Kerê kavirê Bekir Memed
Mexel bûn ser cewa cinet?
Pezê Îbranê remetî
Tê ser "Kaniya Koro" nedî?
Karvan danî serê sûkê?
Qîz, xort çûne bindarûkê?
Temiyê Telo garan anî?
Bedê şîva malê danî?
Yabo sazê xwe hilanî?
Ax baranê, ax baranê,
Dayîka min, xweyînga min,
Wehîd mame vê aranê..."

***

Xwedê, nevsê tengiya remkî,
Serê li ser belgiya remkî,

Xwedê, dîsa rem-keremkî,
Li van benî-bengiya remkî,
Benî-bengiyê-yar hebsêda...

O, çi tenge bîn qesrêda...
Xewa Zelxo nayê îda
Di paşila wî kalîda...

Cariyê, ca tu bicedîne,
Potekî qewaza bîne,
Bejina beniyê biedlîne,
Li dor kelê bigerîne.
Kela çêtirin ji qesira
Vê êvara kilam-kesira.
O, tev mîna vê kilamê
Şewqê davê Şerq û Samê,
Û kewkî berf der biharê
Dişiqite şev-êvarê,
Ji qrackî date xarê.

Ew çiçaxda, çi şevînê
Ew kûvî bû ji hêlînê?
Lê hingêda, şeva reşda,
Çaxê Şibqî kêfek xweşda
Dest biribû li berpala,
Nivîna xwe dîbû vala,
O, hingêda kulek tarî
Da ser dilê wî extyarî.
Xewnê xerêq bûn çerezê
Kal-hêsîrê wê terezê.

Qe çend xewnê xederlîda
Wî dye gurkî nav gêlîda,
Û kareke kar-xezalê
Çing kirye çûye nav newalê.

Ax, kula van kar-xezala,
Çawa kalekî zemana,
Mîr-hakimê serê yêrkê
Dikin şivanê şevînçêrkê...
A, îşev jî...feqet îşev

Mîr xewêda fîşe-fîşe,
Xewna wî kumreşî nine,
Ew xewneke din divine...

## KARVANÊ ŞEŞA

"Sive tê, divên, û xêr jî pêra"...
Xêr tê, lê feqet, çika ji kêra?

Rêncbera "kîsî" kerê xwe kirin,
Xerîva qesta derê xwe kirin,

Karvançiya ço kir,
Cotkariya ho kir,

Lê mîr wek elkê derzî pêsîrê
Melûl rûnişt ser text û tivdîrê.

Birûk wî hêl bûye nolî xençelê,
Çevê melûlva hatye metelê.

Oh, wê brûyêva, wekî hilbirye,
Qe serê çendik-çend merya biriye.

Ew destêd wîye ser her destara,
Ku hev xaryane nolî destara,

Çend serêd "serhişk", "qafêd qalmesî"
Hêrane weke genimê wezî.

Lê îro dîlê bext û qederê
Bûye hewcekarê dîlêd xwe berê:

- Alimêd siyanet,- ewî xeberda,-
Bîn bereketbin, çara kul-derda.

Babet bû, wekî roja axînê
Hûn li padişê xwe col bûna şînê...

Lê palûtê kal, ku natye xarê,
Gotî berkevin hûn wek xişmarê.

Rayê Ezîrîs, şêst salî pêda
Sî bûm di serê Şerq û Şamêda.

Nevsê tengyada bi minva çar bûn,
Xerîvê riyada minva sitar bûn.

Fikram kevankî radiçya hingê,
Qirar jê diçû nolî xedengê.

Min pîs zey dikir, baş begem dikir,
Bi gemekê çil padişa gem dikir.

Lê gunê min jî, hilbet, pir hene,
Wekî pût-senem li min menene.

Îşev padişakî batinî, beta
Qasidêd zulmê şandye ser meda.

Ez dikim-nakim, bi tek û tenê
Ji hev dernaxim tu rê, tu menê...

Dinyayê batbe.We neqewimye
Çaxê çevê we xewê xitimye,

Hevt ga, gaqora bata ezmanda,
Li erda hevtê kok dabelanda?...

Nîşana vê çiye? Ka bêjin çira
Ew xewinê ese parbya ji minra?

Şibqî xewna xwe got û melûl bû,
Alimek, a wê li ber daxûl bû:

- Mîrim, go, sur û sêrê dinyayê
Pirin, îsînra nayêne rayê.

Xaliq terî û ronî levxistye,
Pêra jî fikira benî levxistye.

Her şêwirek xewnê kanek terîyêye,
Ne zevtî benda serederyêye.

Rusqetke, feqet, fikira sadeva
Şirokim xewna esilzadeha:
Divêjin dinya ser pişta gêye,
Mozek ber poze, ga li şipêye,

Razanê, lê ku xew lê zor dike,

Moz li poz dixe, ew vedicêniqe.

Û, mîrim, lema erd jî diheje.
Xewn dive - lê wê bê rojek doje.

Gayê xilmaşbe,
Ew mozê şaşbe,

Û mîna barê ketî ji piştê
Wê hilşe dinya nolî buhuştê...

Divê, lê Şibqî melûl û kere:
Bengzê wî dive "tu wêda here"...

Sirê tê sirya alimê duda:
- Hilbet tu rebî, tu xaliq-xuda

Nahêle dinya wîye şên kirî
Tarmitax bive...Aqilê min birî-

Wê jorda bên hevt dêwê firinde,
Hûfkin hevt gund û bajarê bende...

Yekî din aha ortê hat xanê,
- Tuyê çi lev bînî?- mîr avirdanê.

- Ez na, girtîkî te heye, mîrim,
Surêd kevir jî wîra hevîrin...

Fem dike sêrê erd û ezmana,
Dixûne dilê evd û îsana,

Ew Al-dewrêşra diket hucetê,
Xeber didan ji dewlet, tebyetê,

Ji ked, kesîviyê, ber û binyatê,
Qenciyê û qelpiyê, hub û eynatê.

Lê xewn li ber wî xortê Kenanê-
Çawa berf li ber teva aranê.

Ez gunekar jî, wekî ku heme,
Xewn xilazekî wî hebsiyê teme.

Min xewn dî, wekî destikî dizîva
Da ser serê min selek bi nînva.

Girtîkî din jî dîtibû, wekî
Goşt ser serê wî danîbû yekî.

Û me xewn gotin, wî hanga bêşkir,
Her yekê mera bextek pêşkêş kir:

Go: "Nan kereme, ber te berdane,
Lê goştî qane, serî lêdane".

Û rastî hatim aza kirinê,
Yê din jî hate xeza kirinê.

A, mîrim, li wî xortê Kenanê,
Hergê ku vekî derê zîndanê,

Ew jî wê bive kilît li meda
Kûpê wê xewina te xafilqeda.

***

Mînanî fener, findîke sêrê
Ûsiv ji kelê anîn lihêrê.

Nûr ji sufetê tije dibare,
Cimet metel bûye, mîr lê pirsyare.

- Xorto, -Şibqî go,- tu bi çi wisa
Xurt bûyî nolî kêfçî-kupusa?

- Bi xweliyê...
- Xweliyê?

-Bi xweliyê, belê,
Ez wa kok bûme bi xweliya kelê.

-Êh,- Şibqî gotê,- te loşî can be,
Hergê xwelî be, yan hergê nan be.

Tu li vê yekê
Were komekê:
Şibqî şiro kir xewna xwe jêra,
Ûsiv vegerand cav pêra-pêra:

- Hevt sala nanê usa billet be,
Berê bigihîje, hema erd xetbe.

Lê wê hevta jî xelayîk usave,
Ku bera van hevt sala ber rave...

Cava Ûsivra di fikira mîrda
Qey ewir veçixyan û şems nadîr da:

- A, go, maşella,
Esilûella,

Te cavek usa rast û bilyan dî-
Min hilda mîna rûne helandî.

Min çawa heta naha tu bilyan
Hîştî di nava kela û zîndan?

Destûre tera.Ji kelê derê,
Û hilde dest xwe mifta kîlerê.

Hevt sala pêda nan hev nijarke,
Ku hevta têra gund û bajarke.

***

Lê ji hevt salê heq û hesavê
Hevt ro jî neçûn di wê hindavê,

Bîna xelayê wek bayê samê
Hingavt hinavê Şibhanê Şamê.

Dinya hê têre, nav ked-kesrêye,
Feqet firyata mîre Misrêye:

- Emman,-divê,- ez birçîna mirim...
Delyam, elkê dil-navê min birin...

Divê, dihêre weke beraşa,
Ûsiv li ber bûye nolî qeraşa..

Pêra nagihîne, çi didê, nadê,
Kata didêda, kişmîşa, badê...
Çara nexweşê zede di zikda-
Kapek-kuloç man destê Ûsivda.

Nellet, kêzika kulfê nebxêrî,
Şevê jî tabê nade camêrî.

Rabû, li nava kox û kîlerê
Hejya wek hirçê ji delê derê:

- Beniyo, birçîme,-wî tûfe-tûf kir.
Ûsiv kuloçek dayêda.Hûfkir.

Hûfkir û teze tevizîk da xwe:
- Yekî jî,-divê,- tesequta xwe...

- Mîr, tune, ew bû, razê ji xwera...
- Kuloçekî jî...mîrtiya min tera...

- Mîrtî bi xweyibe... binhêrim çika...
Yek jî dayêda. Hûf kir hahanga.

- Pey, go, çi xweş bû...
Hevikî xilmaş bû.

Xêlekê şûnda rabû zûkîn kir,
Çû destê Ûsiv nolî sa bîn kir.

- Mîr, tune îda, razê ji xwera...
- Gidiyo, yekî jî... Zelîxe tera...

- Zelîxe bi xweybe...Û yek jî dayê...
Şibqî xar, raza heta-hetayê...

## KARVANA HEVTA

Şev danizilî, şevreşek Misirê.
Edilî bendê ser ked û kesirê.

Teriyê mînanî çarşeva hermûş
Nixamtin birc û qesirê qubetûj.

Dara behîvê wek kopê çeva
Belg civandin ser karbarêd heva.

Çirçirka seda sazê xwe brrîn,
Bilbil ser gulê ket xewnê zêrîn.

Cotê muhbetê wek cote çema
Situ hevra çûn bi hisret-heyran.

Dinya xilmaş bû.Her Nîl ma hişyar

Benî Zelîxa delîl ma hişyar-

Kelrabûyî wek Nîlê axlêvê,
Wekî davêje kenar û keviyê,

Wergirtye ewê libsekî mermaş
Mînanî berfa yekşevî qerqaş.

Porê wêye kej mînanî simla
Daketine ser sergirkê mila.

Nermik diçe-tê,
Wê hereketê...

Dişûlikin zilf nolî tîremer
Dor pişta terxan, bedena mermer.

Û ça kevotikê ji mera sawgir,
Ricafî ketye şemamêd şekir.

Hîvîkar diçe ber bi pencera,
Pencerê ku bi nûr û nedera

Şam û şemdanê eywanê qudret
Vê şevê bûne cot çevê hisret...

"Dîsa nehat, na... ax, evdê çikûz...
Hatin mizgînî dane min mexsûz

Seva çend zêra...Xwezilya min we,
Wekî dilê we bi zêr dihewe"...

Melûl, reşguman hate ber eynê,
Nihêrî li xwe, çeva û eniyê

Û zilfê zêrîn, û kêlmîn ketê:
" Gelo tiştekî ne hêjeme, Xwedê?

Yazix pîr bûn tê: hevt salê din jî
Minê teyax da bi hisret tijî,

Ûsiv bigerya ser-binê Misrê,
Bihata bi wê kezelik-kesirê,

Bigota: "Tune,
Zelxo, taa te welêtda tune...

Feqet, ax, tune,
Nûr Ûsiv tune,
Rem-îsaf tune"...

Vekişya mîna milyaketa şev
Xwe-xwe ji ber çev,

Şûrtika dora serê xwe tacgul
Derxist û avît bê hewas, bê dil.

Paşê gewşek ket, rûnişt xemşayîş,
Bi êgir geş kir qeylana heşîş...

Lê...deng dêrî hat... "Bûmê şevêye...
Ûsiv? Na, Ûsiv ne wê heyrêye"...

Zelîxe fikirî, lê wek pilte ewir
Derî vekişya, û va li himber

Nav rewş-rihalê mîrtiyêye xasda
Ûsiv wek hivê reng û rewaz da.

Zelîxe çeva hê bawer nake,
Aminiyê sêra nûr-neder nake.

-Ah, -divê,- teyrê min fedîbûyî,
Tuyî? Tu hatî? Tu kedî bûyî?

Û mîna pêla rabûyî ber bê
Gihîşte Ûsiv, pişirî ber pê.

Xeber bi îskîn
Pekiyan pirîskî:

- Gunêm afûke...buxdana îsan...
Min şerr avît te...lê nehişt dîsa,

Heremetiyê mîr bi baltê celat
Bike dîwana te şengê şimşat.

Destêm te nebû...Min bêîmanê
Hukum kir, ku te bavê zîndanê.

Lê tirba bavê, ku hiştim tenê,
Min diha kişand cezê zîndanê...

Her cara nanê destê dizîva

Min tera dişand teştiya û şîva,

Gele wext hêsrê çevêm diketê
Dewsa eşqera naz û nemetê.

- Bawerim, wele, Zelîxe xatûn...
Guman ber dilê Zelîxê bû stûn.

Kenya hesavê
Gulek ber tevê:

- Nazik, delalê dilê min, Ûsiv,
Tu melek-pêxembera minasiv.

Min îşev, axir, xewna xweda dî,
Wekî tu hatî...Û tu jî hatî...

Tac da serê te teyrê dewletê,
Gumanim, tuyê jî
Bidî sere min tacê muhbetê?...

-Çima ranezayî? Te xêre, evdê?
- Ax, "ranezame"... min "xêre",Xwedê...
Min xêre? Çizam... Xwedê bizanbe...

Xwedê bizanbe, kafirî dijmin,
Wekî hatî wê pirsê didî min...

- Cengim li kafir, ne-kafir, ay jin.
Kafir ewin, ku şerra davêjin...

- Ax şerr...
- Belê, şerr...

- Şerr ewe, wekî
Birûskê davê nav bax û fêkî:

Ew pîs qaside,
Wekî meleka berî hev dide:

Ew bilqana bi jere û genî,
Wekî reş dike dilê çiya-banî:

Ji çi kanê bê-
Şerê keratî qumsye li hubê...

- Ez zef razîme,
Bêhed û bêsed,
Ay qismî kulfet,

Him buxdanê te,
Him ji nanê te,

Wekî te dinya minra kir kela,
Û nan dida min, îdarek ela...

Dinhêrim,yazix, dêmê te nedîr-
Bengz-bala horî-periya divînim,

Buxdan min tê bîr-
Bedewî, tewya mera divînim.

Bizan, her dema muhbetê meyîl,
Hemêz kim ewê bedena te çîl,

Şerr û şiltaxê merkî fişkînke,
Kulokaniya xwe nav me û sîngke...

-Ûsiv, min mekuj...

- Te kuştin, hiştin destê Xwedêbe.
- Beniyo, boy kenar, qestê Xwedêbe,

Ger min nastînî, min bigire carî.
- Pirin li qesirê cariyêd hegarî...

Zelxo vekişya, ça germ ji şextê...
- La min bêbextê,

Bi hegareke reş ne hêjeme,
Lê vê eywanê, ka, çi pêşeme?

Gunê min, hilbet, pirin, pût-senem,
Ku çevê Ûsivê Nevya bûm kelem...

Got, kevnek wergirt, derket ji dêrî,
- Zelîxe, meçe, şevreşe, terî...

- Berbange, Ûsiv, berbange îda,
Berbang-berbanga bêkes, wehîda...

## KARVANÊ HEYŞTA

Wede, karvançiyê hetanî hetê,
Bajo, karvanê min jî dû te tê.

Karvana kar kir li ser karvana,
Qeraşa xar kir cemê arvana.

Îsal rijyane gurzê hevt pûtê,
Cew jê kişyane, hê çem li dû tê.

Ne ji şilyane, ne ji tevyane,
Ev salewexta Ûsivê Nevyane.

Ev kar û keda hemû bendane,
Sed av û derav Nîlê berdane.

Biha bol kirin, arzan difrotin.
Xerîva virda karvan ajotin.

Çi bazirganê kef û kesiriye-
Li hewşa mîrê Şamê hêwirye?

Vî lokî çima usa şîhîn kir,
Erd wa pêkol kir, dor û ber bînkir…

Nebî ku teriya xweyîkî xwe kir?
Lê bazirgançiya çima dey nekir?

Hilkişyan û bi qeyde-qebilî
Selamek dan û qesirê edilîn…

O, qesira mîra, qesira xekana,
Qe çiqa padişa, xan û qeyxana

Navbeyna teda dew daxistine,
Xayîn û xerîv rû hev xistine…

Lê îro, Xwedê keysa te bêxe,
Bira nas nakin bengizê birê xwe?

Sipî bûye ser-rûyê Silo pirpişî,
Lê sipî nebûye çevê Ûsiv jî,

Wekî nas neke vê ro-roniyêda,
Wan çevêd wîye di bin eniyêda,

Wê dexma Qibtî hevkî civyayî,
Xala Hoze qey berjêr livyayî...

Hibtaxim dîsa usa qeşmere,
Bedoyî eşqe, bengz û beşere.

Lê mîna gulek- desta mirmisî
Ruhê Bînamê çevda çilmisye...

Ûsiv dinhêre birê nîvmirî,
Dilik şewitî, xweda kewgirî...

Hêjeye, gelo, heta mirinê,
Ew van birava bê nas kirinê?

Mêvan-mêvanê Xwedêne feqet,
Qulix qeydeye merd û merîfet:

- Cem we,- Ûsiv go,- qey nangiraniye?
- Xezeve, Xwedê ser meda aniye.

Çilk baran nehat, qulixiyê lêda,
Ji kodê nîv jî nehat dewsêda.

Xelqê xelayê dan têr-çewala,
Rahiştin nava şên û şengala,

Lê me – ewledê padişê Kenanê
Bi mîrim vêxist çira gumanê...

- Xêr bên, û Xwedê vêxe çira we.
Hûn her yanzde jî, dêmek, birane?

- Belê,-Silo go,- yanzdene demê,
Qurbana tebe, yek jî çûye remê.

- Cinetbe ciyê wî li qebirstanê,
Lê qe çawane padişê Kenanê?
- Evel û edet duaçiyê mîre,
Lê hema çeva diha hêsîre.

Ûsiv kela dil ancax dizgîn kir,
Lê hêsira ziya-ziya çeva bilqîn kir.

- Belê,go, çeva bol belengazin.

Ez jî – çevaviyê ha dikim gazin.

Dinya jî malek kul û derdane,
Îsanê bê derd Xwedê nedane,

Lê xwezil derdê evd li dinyayê
Her ew bûya, çi ku tebyetê dayê.

Xwezil bedewra ebilû kîn nîbya,
Fêlbaz aqilra qelp, xayîn nîbya,

Qelpî tunebya, buxdan tunebya,
Hevsûdî nava îsan tunebya.

Bêdeng dengbêjra telik çê nekira,
Kina dirêjra çelik çê nekira,

Û xwezil dîsa nefsê zêryayî,
Ji bext biryan, ji bav biryan,

Ji yêr-miskenê şîrin biryan,
Benî-misrîke horî biryan,

Qenciyê bike qenc-xiravê xwera
Dewsa tomika, zirar û şera,

U xirav femkin heta-hetayê
Helaliye hîmê bextê dinyayê.

Lê ser çevara hûn bên. Bi qedir
Dehkî mêvanê min bin hûnê vir...

Ez belkî bona şan û navê we
Çarkim dermanê çevê bavê we,

Û miraz şakim xizmeta we jî,
Hûn şa vegerin –dil û bar tijî...

***

Mîna zincîrek zêrîne zirî
Raçiya karvanê gênim bar kirî.

Têre tijîne, bira serbarin:
O, çiqa eşqin, çiqa kubarin,

Tu kêm nîne, ku hesariya bêjin:
"Ewledêd Aqû ew qedirpêşin,

Ku mîre Misirê barxana hanê
Xwexwe danye bo padişê Kenanê.

Û ji Aqûra dermanekî usa,
Ku biter nave-perê Tawisa.

Lê hê derneket karvan delanê,
- Ka,-mîr go,- koda me zêrîn kanê ?

Çawa ku teyrêd ji bask berbatbin-
Rêwî risa bûn, sûc serda hatin.

- Mîrim,-wan gotin,-em gişk jî vane,
Ev barê meye, eva karvane,

Keremke binhêr, hê eme virin,
Paşê nevêjî koda min birin...

Hatin nihêrîn
Ha li vî lokî,
Ha li wî lokî,

Serî û binê karvîn lev xistin,
Têra Bînamê kod jê derxistin.

- Wey, nemerd, kurê bêaqûbetê,
Mîr mera bike vê kiriyametê,

Wa me verêke bi qedirhizî,
Tu rabî koda mêrik bidizî?

Bira li Bînamê dikûm kirin,
Yê bi çêr, yê bi kulm hucûm kirin.

- A, birê wî jî wa bêhûde bû,
Hetanî çû ser- bela xwe vebû.

Ûsiv mînanî mertelek pola
Dest hilbirî ber ewan bêyola.

- Eferîm,-wî go,- wekî hûn usa
Qal û şerin li çepel û diza.

Lê yêra meda ev qirar heye:
Dîwana dizê me destê meye.

Hûn herin, bira wera oxirbe,
Ev xortê hanê wê hê li virbe...

Û bira li vir razîbûn gotin,
Bînamê hiştin, karvan ajotin...

## KARVANÊ NEHA

Eşqî hatina Bînamê bira
Ûsiv li serê rê, pêga, pira,

Li ber rêwiyê riya, şirîk û şulet
Kir xêratxanek bê hesav, billet...

Û koçika xweda rastkir kêf, şayî,
Xelatkir heckê dan çevronayî.

Û li birê kir çekêd here xas
Qapût û qutinî, qenewiz, qumaş.

Hevt ro, hevt şeva bi keser, bi ken
Ewan ketin îstekiyê weten.

Bînamê teze fem kir hal-hewal,
Wekî Ûsiv qest kod kirye çewal.

Lê şeva heyşta bi xewneke nûr
Ûsiv firî çû nav Kenana dûr.

"Gebaxe, aha, çiyayê hesarê,
Delmekî kesk lê daketiye xarê.

Cewek qeytanî şîn, cewahirî
Dibiriqe pêşa çiyayê buhurî.

Ûsiv li rex wê cewa cinetê
Ketye kamçûra kewek cinetê.

Ha diqaqice, fesalê fikre-
Lê kew dikene: "Karî, min bigre"...

Wî pelek avît teyreda nesda,

Kar bû kar-xezal û ji cî banzda.

Revî, Ûsiv reva wêra
Banzdide ser wê cewêra.

Dinihêre bîrde dor xwe:
Bira hespa dajon orxe.

Wan kar ku dît,
Mîna aşît
Wê aqarê
Dan ser karê.
Dajon, dajon…
- Ûsiv, bajo,-
Dengekî got.
Ûsiv dajo wek melkemot.
Ser pişta hed,
Bi cor û ced
Dizgîn kişand,
Kevan raçand,
Mêş girt fesal,
Kara xezal
Ji ber tîrê
Gulp xwe avît
Nava bîrê…

Sêra nexş deqîqêda betilî.
Çev wîda, bira eşq û edilî,

Îcar rûniştin dora kûrmekê,
Her yekî daye fîq, dûzelekê,

Xwera lê dixin qeydê govenda.
Lê, pî, Zelîxe va orta wanda…

Dimilmile wek pêlasûk xalî,
Nazdar mêl dive valî û walî.

Û Hûtî porê wêva mijûle,
Qibitî bi torê wêva mijûle,

Bedo jî bêetb dûzel hilanî
Û da Zelîxê : "Lêxe, ka zanî?"

Ûsiv qaqicî, Zelxo dinhêre.
Zelxo xeyîdî dêm diguhêre.

Lê, ay Silo
Xwe da rex Zelxo,

Bi rusqeta birê mezin
Dest davêje zenda bazin...

"Berde, nemerd!",- Ûsiv divê,
Û hişyar bû... – xewna şevê...

Kela girî li qirikê,
Xûdan diçe wek çirikê:

" Kevrêm, go, qulîbe belkî,
Zelîxe çû, çi hat sêrî?...

Bêxwey, bê nan û bê îlac...
Beniya bedew...Evdêd çevac"...

***

Sor bûye, sincirye teva aranê,
Li hewê dixe çilka baranê.

Pencê wê nolî şîşê sorkirî
Qul dikin stuyê fehlê barkirî.

Koma dewrêşa, evd û ewara
Kurk rûniştine ser siya dîwara.

Çevnasan tune kesek ber tavê,
Wekî ber mîre xwe pante bavê...

Û kî wê hebe? Vê kîne-kînê
Kî wê derê ser sêla havînê,
Xêncî yêk agirê di dilê wîda
Hê gurre, ne ku germa havîna.

Mîrê Şamêye – xewna xwe şevê
Digere di nav pencê vê tevê.

Û ji ger-geşta rojê kesirî
Çû kesirê bide baxê torkirî.

Baxvançî qevzê gul û sûsanber
Pijinand ber piyê "şemsil we qember",

Bin selbiya pirsî
Ediland kursî,

Sele fêkiyê zer keremkire ber.
Hatin seyrançî, dilketî, malder,

Nedîrya Ûsiv man heyr-hijmekar.
Du dewrêş aha daxûl bûn dilbar:

- We er hemdilla, Rayî Ezîrîs,
Me dî dîndara Mîr-Misirê ezîz...

Mîr silav vegirt bêhewas mirûz,
Melûlya dilda dabû eyna rû...

Dewrêşa feqet çarmêrkî vedan,
Maşqûlî metihê Mîr-Misirê xwe dan:

- Ji nûr tê bengizê Ûsivê Nevya,
Lema rema wî davê her kevya-

Fenanî pencê royê nûr-neder.
Wî zanîn bere, bera Sor çap der.

Zimanê mîrim şîrin wek fêkyê
Pêçira zêre bin çira heqyê.

Nuh reqema mîr sûpreke sipiye,
Her kerem, îkram sirê ser rêz bye.

- Bicehmin ji vir,- mîr ji xwe derket,
Dewrêşa pante avîtin, feqet,

Û nerm, paşopê ber mîr vekişyan,
Seyrançî şaş û metel raweşiyan.

Çûn, feqet, aha jinek parsekçî,
Filitî ji ber bala baxvançî.

Dêmê wê tenî, çevek bi rûqal,
Hat sekinî ber mîrêe dêmxyal.

Dest dirêj kirê, recakir hêsîr:

- Çend polik pere, tesequta mîr...

- Lo, bimire mîr ser te parsêda,-
Got, bêhemdî xwe kevzanek lêda.

- Ca tê min nexî, Xwedê hevînî...
- Yah...

Mîr metel ma:
- Evdê, tu kîyî, hevîn bîr tînî?

Lê feqet...Hevîn qûl-daxûlê xwe
Ronaya çeva belengaz nake...

Şikber dest avît tenzîva ser çev,
Û çawa xaşxaşk vebe li ber tev,

Xanêbe dilkê xaşxaşkêyî reş,
Tifiqî çevê parsekçiyêyî reş...

- Zelîxe!- Mîr carîya,- parsekçyê banzda.
Ewî bi teyrikî li pey perwazda.

Dest avît zendê, Zelîxa girtî
Wek kewek baskbend dêstda pirpitî.

- Min berde, di-rîya wî text û tacî.
- Na, Zelîxe, na, tu îdî naçî...

Ezê tacê xwe pihîn kim riya te...
Tu naçî, bese, bes zelûlya te...

Û ça keweke hêlîn îtbar bû-
Ew ser bedena Ûsivda xar bû:

Hisreta sala bend ber hilatî
Çemkî dikişya ji çevêd kanî.
Hêbet ketibû ber îske-îska,
Teniya dêm dişûşt hêsir-pirîska.

Û bi dezmala bîna etranê
Mîr temiz dikir dêmê nûrcanê,

Paç dikir sûrtê sincirî narîn,
Û hêsir, hêsirê wî jî dibarîn...

Û karêtçiyê ku cotê muhbetê
Bir ber bi yalê koçika dewletê,

Wan dinihêrî û nedizanî-
Çi sêre sêra vî evd-îsanî...

### PAŞKARVAN

Dinya bi fesile, fesilê dinyayê
Qewlekî nînin heta-hetayê-

Ro dema dertê alyê Alemê,
Ji Kan û Kenan vetê wê demê.

Û hinge Gebax-çiyayê buhurî
Dive sevakî mest mirûz kirî.

Dûman lê dive şîn-şimaqîkê,
Kaniyê nûr divin kasê baqîkê.

Qijika bêyomiyê ser baxê bextê
Welêt diqûre bi sama şextê.

Û wek sêvekê padişê Kenanê
Gilol dike rex çemê Ordanê.

Ordan qey bêjî gulîk wetîne,
Pêl û badeka li hev datîne...

Qey ziyayê zere hûf kirye hevt yêr,
Ber bi berwara vediqepçe jêr...

Tê gêjgerînga hey dizivire,
Qey bê poşmane, li xwe mikure,
Wekî hişt yêrê xweyî ku jê za,
Diçe xerîbiyê, der-dinê nezan,
Car din dizvire, çerx dide dor xwe,
Diçe hesavê hedekî orxe.

Û borê Aqû pêra gav dide,
Qey çem dilûve, Aqû cav dide:

- Ez jî mîna te tenême, Ordan,
Ez jî mîna te bê xwey, bê xulam,

Min xwera nanîn xulam-xizmetkar,

Ne ewled, tewled, ne xizne, ne par:

Min destê xwe şûşt ji wê qirêjê,
Her tişt hişte jêr, hilketim fêzê.

Tera lazimin, Ordan, cew, derav,
Lê minra tu kes, tu mal, tu dirav:

Wana xûna min çeng-çeng fir kirin,
Çawa fir dikin, ava te, Ordan,

Kevir û kuçik li min war kirin
Wek kevir-kuçikê nava te, Ordan,

Dilêm derxistin,
Çawa derdixin mesî ji nav te,

Çevêm kor kirin-
Çawa vêdisînin
Lal-durê birqok teyîsî nav te...

Û yê ku didît korim, teriyê dîl,
Çîlra digot reş, reşra digot çîl.

Milê min digirt, dibir eywanê,
"Keremke, padişa,- digot,-dîwanê".
Milê min digirt dibir dîwanê,
"Keremke, padişa,-digot eywanê".

Şikir, nave te, bînaya çeva,
Ez nemam heyra ronaya çeva.

Şems vekir çevê gulbaxana kor,
Bi dermanê kurr min dî şems û şox.
Menceneqêd min, lawêd dayîk dêl,
Kor kirim ez bi cava fend û fêl.
Lê xwexwe kor bûn axir û oxir,
Ku nas nekirin dêmê cewahir.
Ûsive, Ûsiv, ew mîre Misirê,
Bira hişt bal xwe, li Qeyxan qesirê...
Merd-merd verê kir karvan bi arvan,
Û çevê bavê xwera dû-derman"...
Û Aqû çêmra cara kutasiyê
Zivirî dîna xwe dûrva da çiyê:

"Xatire te, Gebax, birê min mezin,
Wek te sed kanî dilêm dibezin,

Ji hişê min te hezar xas meden,
Lê yazix diha ne ji bo weten.

Zanim, wê sibê ordiyê şiletê
Kenanê bikin sêva hucetê,

Û kan-mikanê rûn û hingivzê
Kaşkin, bikujin wek berdûya pezê.

Çi bikim, feqet, ciyê qelpî ketê,
Dil û îsaf û ruhê min - ne tê.

Çi dil, hûnarî welêt lev bînim,
Çaxê birara bira xayînin...

Lawêd Bedîlê, qelp û qestbende,
Herambe bavtî – kurtiya min û we!

Heram- dîwana bêbext, bêferseng,
Ew merêd jere hezar û yek reng.

Welatê bavê...dilê min şîne,
Lê axirya min berbi kur dikşîne.

Xatirê te, weten, nûra çevê min,
Tirba dayîka min, tirba bavê min,

Xatirê te, horiya binax, Meyane,
Vî erdî kulê te şax vedane...

Lê av û risqê Aqû jî, feqet,
Wê bigihîşta wê Şama şulet.

**FERHENGOK**

**Alvêr**- kirîn,frotan
**Alim**-zane
**Ançar**- dara jerê
**Buhuşt**- cinet
**Berewildkirin** –dîtin, raçevkirin
**Bapîr**-kalemêr
**Bozxûnbûn**- altbûn
**Benî**- xanim-xatûn, benîadem
**Babet**- anegor

**Baxet**-baxçe
**Bes-mûşayîr**- huceta şayîr û aşiqaye eydî
**Gebax**- Çiyayê Kenanêyî sereke
**Gurgan**-gur
**Decle**- navê çemê Tîgrîsê
**Dewil**-elba darîne mezin
**"Zembûl"**- kitêba tirêqiyê
**Îmdad**- çar, komek
**Yabo**-bavo
**Yadê**-dayê
**Kevirê senemê**-kevirê pûtperestiyê, zyarata berê
**Misk û ember**- ava bînxweş
**Mivt**-kilît
**Mistek**-çengek
No-nes, bed
**Sual**- pirs
**Simawe**- bedew, qerqaş
**Sefer**- rêwîtî
**Seyda**- mamoste, xwendî
**Selbî**- cûrekî darê
**Sakar**- sepeta mezin
**Hed**- hesp, kihêl
**Hevt melek**- bi şirovekirina tirêqêd kurmanc: Melek Tawis, Şems, Şêxistin, Şêxyûbekir, Aladîn, Sicadîn, Ferxedîn
**Hemdam**-saz
**Hevîn**- navekî xwedê
**Hesar**- şeherê Kenanêyî merkeziyê
**Qelb-qnaz** – net-merem. fikir, dilq
**Qelmes**- serhişk
**Qeraş**-aşvan
**Tenzîv**- vira brînpêç
**Şepax**- ronayî, pence tevê, şewq
**Kenan** – yêrê qewimandina serhatiya Ûsivê Nevya, bi gotina dîrokzana Îsrayêlê niha, bi Hordananêva
**Kergedan**- tariş, barbir
**Xedeng**- tîr
**Xişmar**- teyaxê ber çiqilê darê
**Xekan**- mîr, hakim
**Eyûn**- çev
**Ezîrîs**- xwedê Misrêyî kevn, Ozîrîs
**Pertav**-rev bi banzdan
**Ismayîlya**- miletekî Misrêyî berê
**Çawirme**- çar alî
**Webal**- gune, îsaf-gune
**Ordan**- çemê welatê Ordanêyî mezin

## HISRET

### PÊŞKILAM

Îda dilê min nakirî,
Nav û dengê qube, qutam,
Naha minra buye mukurî
Çûktya mine xêvike xam.

Rojêd çûyî bune bîrî.
Dêmek diha ez kal dibim,
Beng – bihara min buhurî,
Firî, dêmek, cahiltya min.

Çiqasî jî bêyol bêjin:
"Ew ro herin, venegerin",
Hûnin dîsa, rojêd pêşin,
Mora ruhê me miqerim,

Belengazî, telî – tengî
Betreng nakin kubra we xweş,
Hûn mitala meye rengîn,
Hûn siba me hertime geş.

Em ji kana weye qudret
Dertên, mîna cewê temiz,
Pey nav û deng, mal û dewlet
Dixulxulin xêv û xemsiz.

Dişkên em li çivanê teng,
Dixeşivin kevir – kira,
Li rê – dirbê dûr û dereng
Qirêj digrin, dibin grav,

Heta dertên berek şorge
Ruh li wira fedî dibe,
Hulmegulmkî hildigere
Berbi kan û mikanê we.

Ew kan şehere bo yekî,
Bona yekî – aûl, ade,
Bona min jî ew gundekî
Dorbiçiyaye, yêrek sade...

## YÊR - MISKEN

Mîna zilamekî qure
Mêrekîra bê dew – dozê –
Qemerdax sîng gupvekirye
Li himberî Elegezê.

Jêlava du karwanê çiya
Rahiştine milêd wîya,
Ber çêbûne, wek xalîça,
Du beyarê gul û gîha.

Yê şerqêra dibên "Pçêx",
Ji yê roavêra - "Davan",
Wir şîn dibin kesim û kêx,
Wir distirên şivan – gavan,

"Davanêda" ceweke jîr
Dixulxule bi gul û nûr,
Mîna qeytaneke hêşîn
Tê ser pêşa çiyayê Dibûr.

Quloz bûne dor wê cewê
Şaneşînê Pampê bilind,
Lê maleke kevn hela hê
Melisye wir, mînanî kund.

Bûkek bedew, nûr û neder
Herro dertê ji wê malê,
Ser milê wê qasik –qenter,
Du gulî nav namila wê.

Nerm û nazik dimeşe tê
Ser çirika navbeyna gund,
Qîz – bûkara beşer vetê,
Ser milekî mêl dibe rind.

Deqekê wir çirika dengbêj
Lal dibe nav elba rindê,
Wek merê tî gulya dirêj
Di ser elba avêda tê...

Balêd bengî dû difirin,

Ça minnminîk li dû lempê,
Lê bi kubra benya şîrin
Şa nabe ew mala Pampê.

Berê malê – cewa biniyê,
Ser şêmîkê nalek xilmet,
Mîna meriyê dest ber eniyê
Fikar dike gav û sehet.

Qey dixweze ew bîne bîr,
Ferih bike xwera dilxem,
Ka kuda çûn ew kal û pîr,
Xweyêd wêye dilsax û rem...

Ew çûn, yazix heta – hetê –
Xatya Xezal, apê Îsa,
Û brnotiya paşla metê
Û pîşoyê apoyî ziya...

Dihat diket nav kerê miya-
Korî girtî navbeyna gund,
Serda hêdî dadiçivya
Û dihejand guhikêd kum…

Lepe pembû wî miz dida
Nav xûdana bin pîlê miya,
Û xûdana germ kevz dida,
Divirçiqî orta pêçya…

Reşît dihat, şivanê gund,
Dar ser mila dihat wira,
Ax, dikenya, ew usa rind;
-Apo,- digo,- te pez gura…

-Hêêşt, qerê can,- Îsa digot
Pembyê wî rind kef ser diket,
Qevza xweda digvaşt, disot
Û ji nava pêz ew derdiket.

Pîşo ewî hazir dikir,
Pîşo bona kevir-hesta,
Wekî hebe hertim hazir
Agir, mêlît li ber desta…

Karî qelina xwe pê vêxî,
Karî lempê, karî çirê,
Karî agirê wê antêxkî,
Hildî seba sivetirê...

"Agir – gula zivistanê" –
Apê Îsa awa digot,
Diçû oda zivistanê –
Kevir, heste di cêva pot...

Lê hetanî zivistanê
Hebûn feslê zeynet û zêr,
Hebûn rojê berodanê
Hebû havîn, hebû guhêr...

## GER – GUHÊR

Hey şivantî, meşûr bûyî,
Tu çawa heyr, çawa hisret,
Lê tu tenê bilûr bûyî
Boy şayîrêd kurd û culet.

Bûyî xurû xeberekê,
Seba formê hatî gotin,
Û ji nava devterekê
Gulol bûyî defterek din.

Hudikê me jî, wekî nedye,
Ku bile ça pez diçêre,
Ji "hisreta", "şivantya" xwe,
Û "bilûra" xwe "dizêre"...

Lê min bilûr nedî, feqet,
Li bal Reşît, apê Îsa
Min dî serpiyêd wane xilmet
Û hevanêd mîna hîza.

Min didît, ça "Gera Hesen"
Sî tê , diza hêdî - hêdî
Sepe dikir beroj – beden,
Di ser gundda dişeridî.

Diçû dighîşt "Birnê bella",

Fire dibû mînanî ziya,
Birn û bêlan dadibeland,
Hilpark dibû bedena çiya.

Reşît hingê gazî dikir:
"Qesav – Çalê!.. Qesav – Çalê"...
Û diewtyan sahîlê dirr,
Quloz dibûn berbi palê...

Ewan denga dilêm dibir,
Kamço dikir guhêra pêz
Û rokê jî min tab nekir,
Sayîlara hêlbûm hevrêz.

Şeqalêra pez dikişya,
Gihîşt milê çiyayê Dibûr,
Jorda, mîna kurşê hilşya
Nav newala Davanê kûr.

Rakete ser cewa bînxweş,
Mîna teyrê – pervedide,
Û qasekê hilçinî xwe
Kilama wê pûng – perwede...

"Îyûf – îyûf, qurût – qurût"
Şivanara min "dem" digirt,
Qey ji sîngê xwe vedirût,
Hisreteke qedîm û qird...

Giran – gran pez hilkişya,
Derbaz bû ji kendal, kanî,
Li guhêra berpê çiya
Bi merkî bû "kulokanî".

Kelbêd gurêx ketin pêncê,
Dor guhêrê tewl dane xwe,
Çûn hetanî şeqala çiyê
Û hatin ser "tolana" xwe.

Apê Îsa serpî êxist,
Devzendkê xwe hildan hêdî,
Û... kef li ser şîr bû buhust,
Mîna kumkoreke sipî.

Reşît çinî qevşe once,
Parzinî şîr nav koda kûr,
Û me bi du bokonê ce
Hilfirand xwe şîrê gul – nûr,

Hîqik hate apê Îsa:
- Çox, şikir, - got ewî dilbar.
Reşît kenya dilsax – dilsax:
- Apo, tê bê, te qelî xar...

- Yaxlîc meve, birê apo,
Çi kêm bû ew nan û nemet?
Ewto merî heye, - wî go,
Şîr jî bi dêst nakeve qet...

Bişêkrîn wek hingiv –hêjîr,
Çi qismetê Xwedê da te.
Razî nebî bi nan û şîr
Xwedê qeliyê qet-qe nade...

- Ay, Xwedê da, - nav hûrkê nîn
Reşît derxist çivî şekir,
Eva kêra? – Bide "mêvîn", -
Îsa xweşiyê xwe bi min kir, -

Hatye "ulmê" min hilîne,
Bibe şivan "kurê malê",
Şivantyê çi tera bîne?,
Xwera bixûn, "gedê çolê"...

Şewqê avît ser rûyê Îsa,
Hîvê serî nerm hilanî,
Şevreşa qer, qey bêjî za,
Berxeke çîl –qerqaş anî...

Gol-biriqî li besta şîn,
"Tulumbazê" beqa raçyan,
Ser şerqêda sî vekişîn,
Tîr bûn di nav neqevê çiya.

Çingilêd çiyê li ser hafê
Dêmcewiqî mêl bûbûn ser,
Qey dêw rûniştibûn kêfê –

Kaxê tijî şerav li ber...

Rapalikî bayê bêşerm
Gerdena gul-gîhê hêşîn,
Xwe xurdilîn gulêd rûnerm,
Ji şermana kirin wîşîn.

Deng dakete best û bêlan,
Dinya bû hub, bîn û buhuşt,
Û Reşîtê cahil – cîwan
Kesereke kezix rahişt.

- Ax, - go, - meriv şeveke wa
Hilda yeke mîna Asê,
Firqaskira, mîna kewa,
Ser wî heçê Elegezê...

- Rav razê, rav, - Îsa kenya, -
Yan na, tuyê zef bikî keser...
... Me pal veda nav nepenya
Rex guhêrê – kulêş li ser.

***

Kerixî bû xwera rehet
Pezê zikî nolî têra,
Mîna beraşekî bêhed
Xirme – xirm bû xweş "dihêra... "

Qey ji sîngê çiyê dikişya
Beyta edilayê kibîr.
Nav – navara pez dipişkya,
Dikir intîn bizinek pîr.

Mîke xewna xirab dîtî
Ji ber xewna dikir barîn.
Yeke kepenekê ketî
Dibênijî, dikir firîn.

Beranekî bêxew, bengî,
Dimiqande mîke mexel,
Dikir kalîn bi deng-dengî
Berdîreke teze sexel.

Hey diewtyan sehêd şikber,
(Reşît hingê dikir fitîn),
Careke din dihatin ser
Tolana xwe ditebitîn.

Îsa dikşand cixara xwe:
Miştika xwe dirêj, darîn,
Û hildabû şivdara xwe
Tûş dikire steyrkê ezmîn:

"Ewa hana – Pêwr- mêzîne,
Ewa hana – Isteyrka çûr,
Ewa hana – Mem û Zîne,
Eva dinê – Leyl û Mecrûm.

Ewa han, ku diçilvile,
Ew ya Qrixêye hemîn,
Ewa rexda-steyrika xûle,
Lê gelo ka siteyrika min?

Dengê wîyî awakî xweş,
Qey dûr diçû hêdî – hêdî,
Û min, steyrka apoye geş
Xewna xwede zêrînda dî.

## ÇÎYA – BANÎ

Çivîkara firî qulbê,
Kir çîveçîv xewna min xas,
Hev ket erşê ezmîn, tu bê,
Wek zengilê zîv û almas.

Perda şevê nerm vekişya,
Qulbê gulda bi kesk û zer,
Qey dadabûn li pişta çiya
Kûrmeke hed – hesava der.

Hêlipîtka davît ezmîn,
Wek gulavdûn, qeytanê zêr,
Dor daminê ezmînî şîn,
Şaxvedidan kevan û kêr.

Û zeraya xalis, xûsîn
Danizilî, nerm ramûsa
Enya Elegezêye – sîng
Bin orxana berf û bûza.

Usa dê bi şurya şîrin
Diçe enya kurê mezin,
Wekî kur ji xewa şîrin
Hişyarbe bê gilî – gazin.

Qemerdax hê xwera rehet
Dihêniji – xew li sêrî,
Lê dilezand pêz, qey bi ced –
Berî tevê here sêrî...

Lê pez hê nav siyêda sepe –
Neghîştibû binya zangê,
Şeridî hat tev ji tepe,
Ça avkî ser sêlêda tê...

Zang zeriqî mîna kirkût,
Hulm – gulm mîna dû jê kişya,
Qarqarkê ser kir qûrteqûrt,
Baskê xweye xunav dawşand.

Sî lerizîn li dor sirta,
Ji hevdû çûn zîtol-zîtol,
Qincilîn nav çel û korta,
Mîna kelbê lêdayî tol.

"Kaniya kaxa" beşervehat,
Aviyê birq da, wek lal û dur,
Zeriya porsor hevraz hilat,
Mîna pirtî alava gur.

Defand bîna cetiriyê xweş
Tev şingîna zengilê pêz,
Sa rakirin kêwrîşkek reş,
Teriqandin berbi hevrêz...

Min tab nanî, min da dû sa,
Hevraz hêlbûm keloşk – keloşk,

Ragihîştim navsera çiya,
Dinya ber min bû xewnerojk.

Mîna xalîçeke bêhed,
Bi nexş – nîgar, reng û rîşî,
Fire – fire ber min raket
Sergera gul – gupik tijî.

Serê jorin qeyayêd kal
Rûniştibûn bê deng û hes.
Binatarê cewêd tifal
Qişte – qiştbûn bi heyr – hewas.

Pervedabû li dora çiyê
Dinyake hed – hesava der,
Bi kesk û zêr, hêşîn û şê
Difûrfûrî bedelî ber.

Mij dihelyan bere – bere,
Û ji nava bera mijê,
Mîna hûtê binê bera,
Gultima çiya dihat kivşê.

Gêdûka wek pişta devê
Xanê dikir ter û temiz,
Daketibû ser neqevê
Şiverya gewr mîna weris.

"Wirra, - min digo, - diçin aşa,
Nivtê tînin, xwê dikirin.
Xerîbê gund bi dilê şa
Ji Tivlîsê dadigerin.

Filê daşnak li wê tingê
Topa xweye bi ga – horîk
Sepe kirye li piş zangê,
Wekî şerke ber bolşêvîk.

Lê ehlê gund uris xwestye
Daşnak wextê ber rabûne,
Apê Tajdîn zurnê xistye,
Pêşya bolşêvîkda çûne...

Gotine, ku rûskî Îvan
Wê bê, dayne qeydekî rind
Daşnakê ber merîkîva
Telef neke hevt mêrê gund.

Tirkê neyên bi qeydê me
Zurnê nexin xayîn – xayîn,
Li qeyd – gîzmê nexin nebin
Pêncî mêrê gund arxayîn...

Briye bi riya Davanêra
Berbi alîê Ortinavê.
"A, min digo, kîsê zêra
Niho geliyê handa davê".

Wextê gundî payîz – payîz
Erbe sergîn, bizinek qor,
Cêcike rûn, çend gulok rîs
Yan eyare toraqa şor

Dibin diçin Ortinavê,
Kelemara diguhêrin,
Hingê ewan wê hindavê
Li wî kîsê zêr digerin.

Badilhewa. Kî zane ka
Nahaka bûye qismetê kê...
Dibe, ku zabitê tirka
Xwera hildaye wê deqê.

Dibe mişkê beleban dye,
Birye kirye qulika xwe,
Dibe evdê eylevan dye,
Birye xwera ker – ker dixwe.

Yan jî dibe biye qismetê
Şivanekî mîna Îsa...
Kî dizane, dayna Xwedê
Bi kêra biye usa hêsa"....

Ez duşurmîş dibûm usa
Xwera li wir – sergera çiyê,

Min dît, vaye, apê Îsa
Bi lez û bez berbi min tê.

Ser – çevê wî qemere gir
Tev dihejyan, mîna bêjing.
Hat bi hêbet destê min girt,
"Were, go, ez tera bêjim".

Min nihêrî li aliyê sa,
Xwe xurdilîm – nava tirsê:
"Gurin",- min got,- feqet Îsa
Şivdar tûş kir aliyê Qersê:

- Ewî pirtiyê ewir divînî?,
Ewê usa mîna mesî.
Ewî gujmê gewr divînî?
Divînî wî beyarê sî?.

A, gundê me wê derê bû,
Binatara ewî kirî,-
Got û mîna kêvir ker bû,
Dirêj – dirêj wir nihêrî.

- Wê derê bû, birê apo, -
Wekiland wî careke din,
Paşê hizing hatê û go:
"Şam şekire, weten – şîrin"....

Ez şaşmayî ber xwe ketim.
Wekî dewsa Pampa bikir
Apê Îsa gundekî din
Hesav dikir "Şam û şekir"...

***

Dorana dûr bere – bere
Hiqo dibû nava telpê,
Li pey ewrekî eware
Radiqetya ro ji qulbê.

Germê tevna xwe dadixist,
Tev tûj dibû nolî niza,
Şivana îd serpî dêxist,

Îd elkîn ketibû sa.

Mîna pêla li ser berê,
Fişe – fişa pêz bû, dihat,
Ragihîşte goçê gerê,
Qilpika wî li wir hilat.

Reşît danîn hevan û pot,
Pêşberî xwe şivdar nikand,
Siya xwe çap kir, “wedeye”, got,
Dar hilvekir, pez veqetand.

“Hic kavirê, hic”, - bereka çiya
Dadigerand hêwirza wî,
Dibû şîrqe-şîrqa ginciya,
Jev dipekyan kavir û mî.

Hatin hingê kelbêd birçî,
Dor şivana bûne topik,
Birin – anîn poçê pirçîn,
Alastin dev-lêvê şirrik.

Îsa derxist tasa rivîn
Ji hevana xweye mezin,
Bi fesal, bi semta şivîn
Serdoş kirin neh-deh bizin.

Û quricîn kelbêd qafreş
Li ser şîrê bizina şîn
Û çelpandin usa xweş-xweş
Ji çarixê Reşît rêzîn...

Reşît paşê bir tase şîr
Sipart lêva kaniyêye sar,
Lê li binya zinêre sî
Îsa palda, nolî zinar.

Ber piyê wî ket dêlika têr,
Çena xwe da ser lingê wî,
Hilkişya ser serê zinêr
Tiştîreke bedensipî.

Îsa pêça vir cixarek,

Tiştîrêda kir berê xwe:
"Tacê minî, go, bimbarek",
Û kenya ser xeberê xwe...

Lezekî din me "padşê"çiya
Tevî "text û tacê" wî hişt,
Ajote gund gultima miya
Ji nava gul – gîhê buhuşt.

**BERXVANTÎ**

Çiqasî jî apê Îsa
Pêşê şivan hêç hesivand,
Minra mukurî bû dîsa
Tûr û tevarcixê şivan.

Lê hema ez nebûm şivan.
Belekî ku ketine çiya,
Min bire berx hingê berdan
Qalçîçekê dor belekya...
[

***

Tu xewn bûyî, berxvantya min,
Bawîşka berbangêd bêxew...
Dengê deylkirina diya min
Tev xulpîna sirsûmê dew...

Tu kewa rû ezmîn bûyî,
Beyta teyra terîbarê,
Toyê pêzî ser nîn bûyî,
Êmîşê amojna Karê.

Hewla ber zyaretê bûyî,
Fîqa Şekro û Mamîko,
Tu huba Şuretê bûyî,
Henek – mesqeretyê Şîko.

Tu girtina gola bûyî,
Xemla çayîr û çîmana,
Tu kuçkê kartola bûyî,
Qelandina qerxemana...

Sawa qurixçiya bûyî tu,
Gaze – gaza Sefoyê pîr,
Sêwana ser çiya bûyî tu,
Rê û menya pîrê şayîr,

Wekî roke havînê germ
Kere – ker hat li çiya – banî,
Mor – mozbeta xweye miqerm
Daxkî dilê minva danî...

Tu nûr bûyî, berxvantya min,
Kubra erd û ezmana şîn,
Lê na, dîsa tu bona min
Mayî – "sêra Xamê Ozmîn".

Min kar – berxê xwe berdidan
Tût xudûdê "çemê bella",
Dişing – şingin zengilê wan
Tevî dengê cewa zelal...

Çêre – çêre birêm diçû
Heta "Xamê Ozmînî" gewr,
Li wê dere giran dibû
Binya birê Reşîtî stewr.

Ewê hingê ji aliyê gund
Bi riya orta çayîra tat
Merivekî neyî bilind
Dilingirî jêla dihat...

Nîvê rêda me nas dikir
Rêvaçûna Kekê Nevo,
Ser – sufetê kekoyî gir,
Bêşmêrta wî mîna zevûn...

Dihat, digot: - Bereket be...
- Ser çevara hatî, keko...
- Xudê çevê we xwey bike, -
Keko serda mera digo, -

Reşît, were, tera bêjim...
Tu jî were, kurê Ûsiv...

Û dest dibir cêva bêşmêrt,
Du çeng kşmîş derdixistin...

Yek dida min, yek jî Reşît,
- Xwera çerez bikin, - digot,
Dibeşirî rûyê sorî fît,
Îda zêde tişt nedigot...

Li kenarê cewê jorin
Ser pişta xwe vedilezya
Lingek drêj dikir, yê din
Dikir kevan wek pişta ziya...

Şiva dest xwe hevraz – berjêr
Rex xweda nerm dibir – danî,
Qey bê şiva qudretê sêr
Emir dida çol û banî.

Qey bê digot: "Ewrê tenik
Xwe bavêje rûyê royê germ,
Ser meda bê hêwak hênik,
Cewa canik xulînke nerm...

Çivîk bistrên eşqî avê,
Eşqî mêrg û harosê nexş,
Bîna pûngê gûclî bavê,
Zenglê berxa şingînkin xweş"...

Û wisa bû, emirê Xwedê,
Qudretî bû, meriv digot,
Tenê berxek nese netê
Dihat kumê keko dikot...

"Hîr, binbarek, - keko wira
Dihejand ser berxikê şiv,
Lê nedixist qe tu cara,-
Berdê,- digot,- kurê Ûsiv..."

Xwera wira xêleke xurt
Pîrê momin vedilezya,
Û radibû, xwe radigirt,
Raçev dikir şiverya ziya.

- Keko, duakê me nakî?
Reşît hingê bi ken digot.
- Xudê belkî mrazê we
Bi dilê we bike, - digot...

Û germaşiv li ber piştê,
Mil di serda çemilkirî,
Çayîr-çîman li teniştê,
Diçû, rêda dilingirî.

... Û hê diçe, diçe, diçe
Li ber çevê hisreta min
Bejna kekê Nevo nîvçe
Mîna hikyateke şîrin...

## REVA ASÊ

Kêlendî, ku dertê deştê,
Çol – çayirê bîncinetî,
Sênca dilê min jî dişkê
Tevî gul û gîhê ketî.

Melûlîke mirûzkirî
Ser minda tê bi telayî,
Qey bê, dilê minda digrî
Qulingekî – refa mayî.

Ax, çûn ew roj – ew refê min,
Ji berpêşa çiyayê Dibûr,
Lê hê naçe ber çevê min
Ev dîdema bi gul û nûr.

Qelfa qîza bi kincê reng,
Ser milê wan – tirmix, tûrpazk,
Hilparkî çiyê dibin çeleng,
Wek "tawisê" bi per û bask...

Min berxvantî ewê hingê
Spartî Onîkê bira –
Tev hevala diçim "vîlkê", -
Pey wan canik cewahira.

Em diçine Dibûrê kal,
Li ku perçê sînor, zevya,
Wek qerçûmek, zoxal – zoxal
Raçyane ser kenar – kevya.

Hildikişin em bi cefa
Ser sînorê çiyêyî bilind,
Wir çît digrin, nolî refa,
Û dinhêrin jorda li gund.

Gund şivêta şanek moza
Tevrabûye, nerm dike zmmîn,
Dûyê kuleka, mînanî ziya,
Bi tîtikî hiltên ezmîn.

Cew xwe merkî vedişêre
Nav bostanê mala Hûtê,
Gezo daye "daw û dêre",
Berda lez – bez diçe û tê.

Xata xalojn "kuleka xwe"
Kapkêş dike berpêşa çiyê,
Hime – hima Hinarêye –
Den dikute tevî Çîçê.

Çîla Horyan li ser sûrê
Sergînê xwe şarang dike,
Safa Mizraq li ser kûrê
Kaxikê xwe xarang dike.

Dengê Kamil – kizîrê gund,
Mîna dengê top – tivinga
Digurgure usa bilind:
"Elî – Eliyo, ga bîne, ga!"

Û kilama me anîzaz
Ji bedena çiyê banz dide,
Diçe, mîna teyrekî baz,
Di ser gundda perwaz dide:

"Kadarazû, Kamil Cano,
De dabuhure der malêra"...

Lê Kamil jî beter û no
Nav gund mera dide çêra:

Dengê Sedir tê hêrsketî:
"Bixevitin, gelî bîca"...
"Avê, avê, xalê Fetî,
Avê bişîn tev erbeçiya".

Û hon digre qelfa qîza,
Qey bê gul û gîhê çinî
Rabûn û milmilîn dîsa
Bi qudreta bîn batinî.

Bi tirmixê xweye nolî
Şehêd bêhûdeye ecev
Ew "şeh dikin" turlî –turlî
Ser û sîngê Dibûrê dêw.

Lev dibe bor gîhê gêçî,
Keçik ancax jorda tînin.
Lê lawikêd me vîlkeçî
Ji ber yekê her hiltînin.

"Lo – lo, werin vira hildin,
Çiranê me gune kirye,
Wekî xwedê heve reng – rû
Mîna Fîlê nedaye me"?

Heqe gazna Gulça qeşmer,
Lê zef geşe kubra Fîlê.
Diteyîse sifetê zer
Li ber birqa qerefîlê.

Dev û diran beşer vetên,
Wek kumkor û belgê gula,
Sûretêda govek dertên,
Dibin du hêlînê dila.

Lê deh û du dilê zilam
Hildifirin dor nazyê wê,
Dirgan, nolî destê dila,
"Daxûl" dibin ber dest – piyê wê.

Li ber Gulçê dibe "dûçik",
Berbi wira em dibezin,
Em çê dikin "çiyayêd" çûçik
Li ser sîngê çiyayê mezin.

Bilind dikin nolî elkan
Li ber teva derhavînê,
Wekî paşê li ber sya wan
Bixun nanê firavînê.

Xwera paldin, xeberdin wir,
Ji hal – hubê bikin qise,
Vexun dewsa şîr û şekir
Bîn û buxza gîhê teze.

Gozqulaxiyê bikin bêşerm
Li keçikê xame ter – can,
Kanê ji dest rozgara germ
Kê vekiıye ber û bistan.

Ka çi dibê Fîla me rind
Derheq "yazî – miqederê"...
Lê... nişkêva ji nava gund
Tê hêwirza meta Şerê:

- Kerkingî ne nolî meriya,
Sêva devê te bû Asê?
Ji serê riya, ji ber derya
Xelq direve mala Cesê.

Em dirgana wêda davên,
Jorda çilqas dikin bi lez,
"Kuro, kuda, kuda, hûn tên?
We hîviya kê hiştin ew les"?

Kê guh dide xalê Etê?
Em jorda tên bayê bezê
Û her tenê têne zevtê
Ser kuleka mala Cesê:

Asê – hundur ketye qulçik
Û dicare:- Dûrîm here...

Lê Reşît ber bûye qoncik,
Lava dike, ber digere.

- Asê, Asê can, - ew dibê, -
Bîr neke bext – biata xwe...
Asê bi çêr xwe jê dipê
Û jêla deyl dike diya xwe:

- Inê, - dibê, - qîza teme...
Lê Şerê bûye agir – aşît,
Kulekê jev vedijene,
Pela jorda davê Reşît.

Lê li hewşê, li ber dêrî
Ûsê hatye hort û zortê:
Birê Asê "sîlo" sêrî,
Neçelnîkê "paşîportê".

- Dêrî veke, dibê, Cesê,
Veke, tera ez divêjim,
Yan na, derê te vê lezê
Ezê têkim tarebêjing.

Û destê xwe bi wê hêrsê
Dibe berbi qava qirmê,
- Pî, dirya Xwedêkî, Ûsê, -
Tê carîna meta Surmê.

- Ê, birao, min çi bikra?
Cesê ber dêrîra dertê,
Hatin xwe avîtin vira,
Star heye – ji boy Xwedê.

Asê mîna pezek kûvî,
Şer şiqitî stukurê,
Mal direve, dertê dû wî,
Xwe davêje sîngê birê.

Digrî, giva ku "am û tam",
Hatiye avê – ewê jorê,
Ewî "seypisanê nemam",
Girtye birye "destê zorê".

- “Zefî zore” kurê “Gewro”,
Mêr ser xwera nedîne qê,
Wekî ku ro – nava nîvro
Direvîne erzê xelqê.

Min di ha – ha, - Ûsê seqet
Ji Reşîtra dide çêra, -
Lê te hesav nekirin qet
Bav û birê Aslîkêra?.

De, wekî tu me natirsî,
Dîwan heye ji me zêde.
Were, usa bi “mêrxasî”,
Ber dîwanê cawê bide.

Dibêje û ser xûşkêda
Hêrs dikeve: - Megrî, - dibê, -
Biliv nehiyê, binhêre ça
Diya wî didim giryandinê.

Malî – gundî gultimayî
Wanra diçin usa pê-pê,
Reşît bîn di berda mayî:
- Ya bext – ji Asêra dibê, -

Ne, neynika te ovanê...
Ne te dezmal minra şandye
A, ser vê dezmala hanê
Herfa “R”, “A” kê kişandye?

Û derdixe dezmalek zer-
Hiqişandî bi du herfa,
Tilya xwe reş datîne ser:
-A, eva “R”, eva jî “A”

-“R”, “A”, raste – Reşît, Asê, -
Dike qirtîn dengê Mecît.
Lê Ûsê guh nade Mecê,
Dest tûş dike aliyê Reşît.

- Qereçoban, ew tu pakî
Mî –bizina jev nas nakî,

Îja xwe – wî halî hatî
Minra vira bûyî “xwendî?”
Tu sebirke, tu bisekin,
Ez “R”, “A” nîşanî tekim...

- Ûsê, terkde, bext – mirazin, -
Gundî Ûsê didin şermê...
- Bicemin, hun çi dixwezin?
Ew dest dîsa dibe qirmê,

- Vana nedim ez ber gulla?
- Kuro, çi bû, xwe ne dînî?
- Kuro, Ûsê, staxulla,
Xwe tu bavê Asê nînî?

- Bira, wekî xûşka webya,
Weyê usa pêva berda?
- Wey, bira seh bavê wîbya,
Kê deykira, kê xeberda.

- Ûsê, qurban te dikeve,
(Eva Eliê me laqirdçye)
Wekî îro xweyînga te
Bê ziyan –ziat ji malê çûye...

Bira Kirdasîkî keleş
Dest bavîta zenda Gulçê,
Çikanê min miya kele beş
Kaş nedikir ber “Qaltaxçiyê”...

- Reva jinê – qeydê dinê, -
Gundî Ûsê “diguvêşin”,
Wêda Bekirê bavê wî tê,
- Were, - dibê, tera bêjim.

Terkde, lawo, min – vê yekê,
Belkî ew bû yazî – qeder...
Em xwe seva keçikekê
Kurê mêrik nadine der?

- Pî, lê remel bavê tebî...
- La xwedê hewarê hatî, -

Dua dikin her celebî,
Der û cînar, xal û xatî.

Lê Kida met: dayîka Reşît,
Destê apo wir paçdike,
Digre destê Asê, Reşît,
Berbi malê zû kaş dike.

**BERANBERDAN**

Hey gidî, Asa beter,
Gazin – giriyê qîza qibrax!
Hindik mabû te bida der
Reşîtê me heyfî dilsax.

Lê kê kerê pêz bajota,
Têkra hokîn û hêwirze?
Kê ji mera şîr bidota,
Danya kevya “Kanya Mîrze”?

Lê kê li wan mêrg û pala
Gazîkira kelbêd qafreş:
Kê pez berda binya mala
Roja beranberdanê xweş?

Diçilvilî xozana zer,
Mîna bera ber zerayê.
Bir û bertel col dibûn ser,
Nola adek meha mayê.

Digulgulîn bedew – bedew
Serpiştê pêz deq û dûçik
Ji dena sor, gevez û kew,
Şîn û şîrkî, kesk û qîçik.

Fûr dida wan der û besta
Fîte – fîte şivana şa.
Sellê zeda li ser desta –
Derdiketin jin ji hewşa.

Beranê şelt, situ hevreng,
Niqişandî bi sor û sût,

Dû kevaniyê çapik – çeleng
Dihejandin dûvêd yekpût.

Lê dû rewşa berana rind
Zar û zilam taxim-taxim
Diçûn – tevî rêncberê gund
Loqa zed û zihomaxin...

Aha, riştê xatya Çîlê
Aha, hêkerûna Xatê
Serbidewa meta Fîlê
Jejerûna Şerefatê.

Aha, Çîçê birinc anî,
Danî pêşya apê Îsa.
Reşît rişte wir hilanî
Û valakir ber herdu sa.

Aha, Asê bêjingêda
Hewla meta Kidê anî.
Ser dêmê wê birq vedida
Beşereke baş – beyanî...

"Eva ew Asêye, Xwedê, -
Meriv wira difikirî, -
Wekî ewê roja revê
Usa dikir şîn û girî"?

"Kuro, bixwun, - ji mera got, -
Boylixiye, şêne şikir"
Û lê civyan serêd serqot,
Loq kirin ew zedêd çivir.

Me xar – vexar û wê eşqê
Çirpya "syar bûn", çawa – hespa,
Ketin nava "meydan – meşqê"
Xwera li wan der û besta.

"Cirîd" dilîst û "şeranî"
Me wê derê li dora pêz
Berî wan cirîdê eynî,
Wan dewetê bi ra û rêz...

## DEWET

Hey, hevalêd zarutya min,
Hûn li kune, kune naka?
Ez li dor xwe dinihêrim
Û dibînim tek û tûka.

Werin, qewmêd mine ezîz,
Heytehole û hewasî,
Bi dengê def – zurnêye zîz
Zarutya me dike gazî.

Hûn seh nakin, hûn nabihên?
Hûn qet nakin mukurya gund?
Qire – vira şeherêd şên
Ker kirine hûn nolî kund?

Xwedê bi wera. Va ez diçim,
Şandye pey min Mehê kurmet.
Berev bûne, oh, çito jin,
Çito "xwendyê" xudanhurmet.

"Lenger bûne" hewas – heyran
Ew dor bera îçkê – aza,
Simêlêd reş, nolî teyra,
Tar bûne bin girê poza.

Pel bûne ser textê jorin
Bor – bendekê zikêd mezin
Wek şerava tel û şîrin,
Dixulxulin ten û pesin...

...Lê qenc ew bû, hûn nehatin,
Gelî qewm û pismamê dûr:
Hûn jî, dibe, mînanî min,
Rûniştana awa melûl.

Lê hûn nekin fikrê başqe,
Tiştekî êrî tune, hilbet,
Şikir şaye, şikir eşqe,
Dewlet – Xwedê serê kurmet.

Va, rêz bûne cêrgê vaza,
Tebax – tûsyê bi nexş û nîş.

Mîna perê qubeqaza
Ragirtine qûçêd êmîş.

Bi bengzê qîz – bûkêd hebeş,
Gurc û ûris, çîn û tûngûz
Beşer vetên hevra xweş – xweş
Sêv û xurme, hinar û gûz.

Ser hurmyada hatine xar
Tirîêd "xaçebaş" û xercî,
Ça têne xar torê karbar
Ser memikê qîza tezî.

Ji lengeriyê xaşlemê germ
Nazya dike hulma hêşîn,
Beşervetê "tqmalya" nerm,
Şampayn bi hêrs dike fişîn.

Ser butulgê vexarokê
Weraq didin sehetê zêr,
Daliqyane lempê tokê,
Mîna hurmyê cinetê sêr.

Tilî – pêçiyê zurneçî jî
Bi zêr û zîv tije bûne,
Belê, xelqê me baş dijî,
Lê kesîv bûye deweta me.

Pera, zemîn kurtisandye
Per û dûçkê wê "tawisê",
Ruh di çevda çilmisandye,
Wek yê gula piş payîzê.

Ew şayneta reng û rewşa
Bûye bazara cirm û cedê
Pirtî govend li der hewşa
Tevakelî lev diçe – tê...

Û gedekî şeher hatî,
Dewsa wekî berde kewê,
Gultime dû bi tisqîtî
Gur "berdide nava hewê".

Diqncile heyr û hewes,
Şayî di ser hevduda tê,
Wek bêdera berevkin lez,
Tirsa tevî û teyrokê.

Nîvî nabe barê texte
Ji lengeriyê tort û tolma,
Mirîşkê sor, mesiyê "bextek",
Qûçê gûza, sêv û xurma,

***

Çûktya xweda em digiryan
Sev sêvekê, gûşî tirî,
Naha digrîm hisreta wan
Dewetêd me dabuhurî...

Nava gundda bi def – zurne
Digerandin darek ecêv,
Çiqlê wêva gûz û fişne,
Kalêt, kanfêt, hinar û sêv.

Raçev dikir me bi hewes:
Kîjan sêvê, yan hinarê
Xwera birevînin lez-lez
Wextê dawşandina darê...

Me sed xewnê delale dur
Şeva berî hingê didît,
Heta mîna tofanek gur
"Crîdê" ser hevra davît...

Du khêlê xwey nav û deng
Huf dikirin riya toz-dûman.
Cote xortê çapik-çeleng
Ser pişta wan hildiqoşyan.

Yekî yê din dû xwe dihişt,
Zengû dikir kihêlê şê
Û mînanî lêyî-lêmişt
Dadikuta nava hewşê.

Belgî davît destê zevê

Mîna qazek nêçîrkirî,
Dû xwe, destkêş dida revê
Seglaviyê xwe belgî birî.

Zurna hêrslû zerp digujya,
Berbya dikir hêle-hêbet.
Ser bûkêda dadiweşya
Dar mînanî tevya qudret.

Radihiştê me ûce-ûc
Yek wir dima mirûzkirî,
Ku kete dest gûzeke pûç,
Dewsa sêva raçevkirî.

Xemek mezin nîbû, feqet,
Undakirina sêveke kal:
Şev-êvarda xweş radiket
Keskesora govendê kaw...

Sêva bedewtir bûn, mqîm,
Sûretê qîz-bûkê bikir,
Wek tirya reş dibiriqîn
Çev û brûyê ale-agir...

Çîta govendêva dirêj
Destê wan tar dibûn cot-cot
Mîna kewê belek û bêş,
Zer û qerqaş, reş û mişot...

Û hesavê çevê kewa
Diteyîsîn, birq vedidan
Qaşê gustîlkê bedewa,
Zend û bendê morî-mircan.

Reşîtê me merdî momin
Ber stûnê mal govendê
Dinihêrî şîrin-şîrin
Li Asa xwe, bazinê zendê.

Îsa-hevan wir êxistî,
Def avîtî milê bûşlat,
Dehlikê sor bin kum xistî,

Diringandê bi muhumat.

Hêle-hêbet wî lêdida
Bi çomaxê xwe defdirîn
Û pêlasûyê lempê darda,
Wek minminîk, hildifirîn.

Nolî ewrê şebeqê al
Xêlya bûkê nerm hildihat,
Û dîndarya demê delal
Tevteherî geşvedihat.

Bala gişka dizvirî ser
Ça gulbaxan – berbi royê,
Û sor dibû sufetê zer –
Qey rabûbû ji ber şoyê.

Zeva li xwe dixurdilî,
Dezmal dida sergovendî...
Ewî dezmala gulgulî
Hildifirand bi qeşengî.

Dikir hoqîn wek şêzera
Dibû xirmîna sapoka
Şingîn diket kêr – kembera
Tew diketin kapê çoka.

"Ya bi deng" – dikirin gazî
Molet didan def û zurnê,
Hemîd, Temûr tev diqûryan:
"Hey, zemano, wey lê qurnê"...
Etê Rizgo li çargoşê
Malgovendê sêtî dikir,
Şiv dawdişand pelagoşê
Gedê, wekî nesî dikir.

"Bilîz, - digo, - kurê kerê".
Şiv dihejand bi qûre – qûr.
Govend, mîna poça merê,
Zirav dibû ser zarê hûr.

Hêdîka nerm, ew dikişya

Bi kilamek Hemîd teze,
Sazbend radibûne şipya,
Dihelandin "Nexşê Mîrze".

Sirê dikete şabaşa,
Apê Îsa şa û razî
Li ser serê bedew – başa
Dar digerand, dikir gazî.

Wezîr wira tas tijî av
Diediland ser serê xwe
Binda dilîst ştaf – ştaf,
Nedirêjya qe dilope.

Lîst, istira wî teherî,
Heta nîşev Wezîrê xal,
Heta wekî ku "koçerî"
Ji ser sêrî av anî xar...

## ODE

Dewet ditemirîn diçûn,
Pey dewata "antêx" diman:
Çend xort, zilam bengî dibûn
Ser qîzê gund "zerî – domam".

Nefer mala zêde dibûn,
Kevçîk zêde dibû kodê,
Zevê salê tembel dibûn
Îda nediçûne odê.

Xwezî li wan, yan li geda?
Li wan çendik zar – zilama.
Wekî îda li piyê oda
Rûdiniştin dewsa wana.

Çêtir bûn ji bûka, hilbêt,
Horiyê hikyatada mayî,
Çêtir nîbû ode, feqet, -
Roja zivistanê sayî.

Çaxê şevda dibû bager,
Bayê serxweş dikir fîtîn,

Tev radikir berfa kever,
Pêra direqisî dîn-dîn.

Hildibirî, bi eşq û înk
Davît gelyê kûrîne kunc,
Lev dizvirand, wek gêjgerînk,
"Dingê" dixist, nolî birinc.

Li berê çiya dikir "mermer",
Ser "dikişand" kêrtikêd kaw,
Li dor gera dikir "Senger",
"Sûrêd" sipî, kurcêd bi saw...

Êciz dibû paşê diha
Ji dîndara berfêye sar,
Ji hisreta gul û gîha
Dikir hewer û zare-zar.

"Bîn hildida" û direvand
Çend gurz gîha ji ser loda,
Dibir, zil-zil dadiçikand
Li ser şepa nava ada.

Zila dixist cinûbetî,
Çawa aşiq – sîmê saza,
Û şebeqê, ji hal ketî,
Diçû, nizam, ku radiza.

Şems pîj dikir pêçyê xwe sist,
Ser deraxa wê "xozanê",
Xalê Teyar pez derdixist
"Çêrecaxa" zivistanê...

Me banzdida hingê pêxas
Ser peynê germ, derê malê,
Mêze dikir bi heyr – hewas
Çobanmaza wê berpalê.

Mîlîard –mîlîard qazê qerqaş
Melisîbûn, qey, rû erdê.
Mîna çevê qazaye qaş
Diteyîsîn pirîskê berfê.

Nêrîkî gir zengilê zîz
Dûr dişingand, nolanî sêz,
Berbi “Kaniya Dirbo” nêzîk
Dû xwe dikşand zincîra pêz.

“Eyveze ha... – bi bîn – beşer, -
Hesenîkê digote me, -
Çawa mîna şêrekî zer
Daye pêşyê û dikşîne”.

Ewte – ewta kelbêd hirçîn
Dihat tevî sewta merya,
Tivingekê dikir qirçîn,
Rûvîk pala çiyê direvya.

Dibû hêle carna wira,
Lev diketin dar û darim,
Memliyê Xemo xweş distira:
“Hêdî bajo, birîndarim”...

Çi “dajotin”? – me nizanbû –
Gayêd sivik? hespêd orxe?
Me her tenê rind zanibû
Ajotina lekanêd xwe.

Me zanibû – li ser bûzê
“Qilê” bilîzin bi holê,
Kûçka berdin der û dûza,
Hocekin ser rûviyê çolê.

Me zanibû – şeva eydê
Dolîdankê xwe biklên rind,
Sibê bigerin bi qeydê
Eşîretê nav malê gund.

“Siba we xêr, eyd – bimbarek”...
O, çi baş bû, çiqas aza
Mêrê bengî wê roja tek
Hizkirya xwe radimûsa,

Pelawa wê den û rişta
Dixar xweş – xweş, dilê şewat,

Wek nemetê nav buhuşta,
Mîna ava "avilheyat".

Berî eydê goreke rîs
Me kindirek pêva dikir,
Dadiliqand, nolanî kîs,
Kulekada, dua dikir.

"Dolî – dolî, dolî dankê,
Xortê malê zevankê,
Pîra malê qurbankê
Tişkî têkin dolîdankê"....

Me "maşê" xwe berev dikir,
Û dikire nava kodê
Çend liv qeysî, çend çir şekir,
"Kêf dikir" ser karga lodê.

Lê çiyayê "Xam" dibiriqî geş,
"Gera Qeymes" – sî bin lêvê,
Wekî mîna beşerek xweş
Kamço dikir ta axlêvê.

Ro dişiqitî piş wî çyayî,
Sî dihatin serê loda.
Mezin – çûka bi tevayî
Dilezandin berbi oda.

***

Zû biçûna yanê dereng,
Her yek ciyê wî hebû – sekya:
Maqûl – mezinê bi nav û deng
Fêzêda pişt didan belgya.

Li pey wana angorî yaş,
Ser kulavêd – binda pelex-
Mêrêd malxwê, zilamêd baş
Rêz digirtin xeleq-xeleq.

Nexşê gora gul vedidan
Ser kêrtikêd kulavê sor,

Tizbiyêd serî poxik, mircan
Bi şinge – şing dizvirîn dor.

Zivra wanra dadigeryan
Kubr û keysa rojêd çûyî,
Oxirmeêd emir eyan,
Îş – îcatêd sêrvebûyî...

Hevba dibûn şûrtik-şirdan
"Gilyê gura", gurêxya sa,
Kiryameta "Memê şivan",
Qisêd aşa, reva qîza...

"Glîyê diza" dihat ortê,
Diqarqibî buxdan û şer,
Qema Şaho "necînartiyê",
Ku hewêda qet kirye şer.

Methê Nadîyê Sedo didan,
Wekî çawa hetanî "birn"
Raqetandye dizêd eyan
Bi arkolkê tendûrê kin...

Tosnê Ûrşan danîne bîr,
Tewakelyêd wî pêkenîn,
Û bangdana Memedê pîr
Li ser xanyê mala Ozmîn.

Salxê Qeriyê Heso didan:
Mêrê cote xûşkê bedew,
Xebatxurtya wîye tîtan
Û xarina beroşe dew...

"Ordya Romê" dihat ber çev,
Şuhurandin, rev û rikêf,
Veşartina Çîla bedew
Di nava badeka kulêv.

Hilşandina mala Qero
Dest batraka bi def-zurne,
Qaçaxbûna "bengî Biro",
Serhatya Zal û Zuqurne.

"Ditifiqîn" Zînê, Xecê,
Ker û Kulik, Zelxê, Heso,
Du dengbêj diketin lecê,
Dizarya bilûra Baso...

Lê wir, li bin dîwarê gewr
Bexîra gur dimilmilî,
Mîna tûme xaşxaşkê ber
Zinarekî qij – qimilî.

Û çawa mer derê ji tûm,
Bi zinêrva hilkişe jor,
Hildikşya gewlaza dû
Ji nav kûra sincirî sor.

Bişkorîke jîre êgin,
Çapik- çeleng nolî kara,
Kaxek kûrda şelê êgir
Wir digerand ber cixara...

Lê nedima wira, feqet,
Zavit hîvya wî agirî,
Derdixist bi heyran – hisret
Kevir-hestê xwe hizkirî,

Dawdişandê hestê xwe zerp,
Pirîsk dida kevrokê reş,
Pê digirtin hevra, yekderp,
Pîşoyê wî, beşera xweş.

Mil diniçand hevalê xwe:
-Hi, çawane, digo, Nîşo?
Nîşo metel dima:- Pehe...
Ay ji tera, - digo, - pîşo...

Şa dibûn ew pîşokîva,
Bi zed – zhomekî sibê,
Şa dibûn, ku piştokîva
Merîyê wanê – Tilbîsê bê.

Şa dibûn, ku wanra diket
Morya katê serê salê,

Ku kelbê wan dir derdiket,
Û mê danî peza malê...

Dikenyan, ku Tosnê Ûrşan
Meta xwera gotye “xatî”,
“Qolincî bûye bizina wan
Bi kuloçê nehilatî”...

***

Naha, wextê qişa sipî
Xwe avîtye nav porê min,
Mîna porê reş û spî
Tev rabûne fikarê min:

Kîne bextewarê dinê?-
Ew kesîvê xwey eşq û ken?
Yanê yê xiznêda xinê –
Dême mirûz, dile bi fen?...

...Her yek bi tişkî hisrete,
Her yek tişkî dicedîne,
Lê hisreta min erhede
Padşatî û pere nîne.

Ez seba wê dikim ax – wax,
Çi ku wede xwera birye,
Zid ji gelek saxêd alçax –
Min mukurya mirya kirye,

Bîra ewan rehmetiyê gund –
Neferê vê poêma min:
Meta Zeytûn, apê Zavit,
Îsa û Reşîtê Momin,

Bîra Hemîd, bîra Medet,
Xata xalojn, xalê Wezîr,
Xatiya Seyrê û Kida met,
Kekê Nevo, Kamilê Kzîr....
Lê naxazim hela, feqet,
Herim miskenê mirinê.
Tişt hene, ku bi dil û ced
Jê hiz dikim rû vê dinê.

# HUBÊ XWEDÊHIZ

Pirr dewletî bû Hubê xwedêhiz,
Xweyê mal û milk, hebûna dengiz.
Çarpiyê wî hebûn wek mêrg û mêşa,
Garanê dêwêr, ga û gamêşa.

Pezê wî hebûn heft hezar serî,
Qûlê wî hebûn hezar-sed merî.
Lê ji hebûna hizêmet zeftir,
Xwedê rem dabûyê, zên û ulimê pir.

Hub beramberî mal-neferê xwe
Xwey dikir xulam-xizmetkarê xwe.
Feqîr-fiqare bi wî çar dibûn,
Malder û beytû wî sitar dibûn.

Tu rêwîkî riya bê nan û bê av
Derbaz nedibû ji tixûbê wî.
Tu kireke qenc, şêwireke îsaf
Bi mor-myaser nedibû bê wî.

Xebereke tel, gulê girantir
Merivê maqûl nedigot kesî.
Mûriya erdê jî pêpes nedikir,
Ji bext û roja xwe timê razî-

Dûa-dirozge dikir dil û ced,
Rojî digirtin, xwey dikir edet.
Û şibhan bû zef ew esilzade,
Werdigirt kinc û kitanê sade:

Ew dixar, çi ku xilama dixar,
Xarîc nedinhêrî li erzê cînar.
Lê ewledhizê omidî êşan
Ji ewledê xwe nedihêvişand.

Heft kurê wî bûn û sê qîzê wî,
Ewana dixar rez û pezê wî.
Rojê kurekî mesref dadanî,
Gazî xûşk-bira dikir mêvanî.

Heft roja ewan kêf dikir xemsiz,
Lê roja heyşta bavê xwedêtirs
Deh nêriyê kever ber çiyayê Mefê
Dikizirand ser textê telefê,

Wekî lawêd wî cahile kêfxweş,
Hergê gotibin xebereke feş,
Xaliq bi xûna wan deh qurbana
Afûke zimanzêrifîya wana...

Roja sicûdê mêr û milyaket
Civyan dîwana xaliqe qudiret,
Cin jî tevî wan sekinî serqot.
-Tu ji ku têyî?-rebî jêra got.

-Ji diniya bende,-cin gote rebî,-
Digeryam xwera nav evdê sebî...
-Qe çawane Hub-qûlê minî başi?
-Dua te dike bi qurban û maş...

Wê çira neke? Destê teyî nûr
Li dora mal û milkê wî bûye sûr.
Te ne hêvişandye, dayêda her tişt,
Dinyalik ber wî te kirye buhuşt:

Bêxem, bînfire xwera kêf dike,
Îda wê çira dua te neke?...
Ca hela, kanê, ya xaliqê min,
Çi ku te dayê, jê bistîn car din,
Çika qûlê te
Xwe nade rûyê te...
-Here,- xaliq got,- mal bi destî te,
Lê her degmîşî emirê wî nebe...

***

Li mal-oda xwe bedew, bîncinet
Hub axa xwera rûniştî rehet,
Tev helala xwe qawe vedixar
Û qise dikir dînc û bextewar...

Nişkêva mîna pêlasûke gur
Xulamekî wî dakuta hundur:

-Ga radikirin wê derê zevî,
Merkev diçêryan li kenar-kevî,

Sepaya lêdan, mêr xeza kirin,
Ga-guhdirêjê te ajotin birin...
Tek û tenê ez xilaz bûm ji wan,
Ku tera bînim evê caba han...

Hê xeberdida ewî xulamî,
Xulamekî din heydade anî:
- Garanê te wir xwera diçêryan,
Sê kom cerdbaşiyê Kelatê lêdan,

Gavan û gede gişk xeza kirin,
Ew delû-dewar ajotin birin;
Tek û tenê ez xilaz bûm ji wan,
Ku tera bînim evê caba han.

Hê xeberdida ewî xulamî,
Xulamekî din heydade anî:
- Pez diçêryan dor çiyayê Sîonî
Nişkêva ser çiyê bû reşî-ronî,

Birûskê lêda kire reş-rijik
Ew birr û bergel, şivanêd qijik,
Tek û tenê ez xilaz bûm ji wan,
Ku tera bînim evê caba han...

Hê xeberdida ewî xulamî,
Xulamekî din heydade anî:
-Îro ji xwera cem nuxuriyê te
Ketibûn kêfê qîz û kurê te,

Bayê samê hat, hilşand xan û man,
Her deh zarê te gişk binîda man...
Tek û tenê ez xilaz bûm ji wan,
Ku tera bînim evê caba han...

Hub rabû vira serê xwe kur kir,
Kincê xwe qelaşt, sitar sipir kir,
Go:- Ez rût hatim rû-barê dinê,
Rût û tût jî mam careke dinê.

Xaliq da, sitend ji evdê sebî,
Şikir ji navê tera, ya rebî...
Wê xafilqedê metel man merî
Ji kirina Hub ewî teherî...

Ber xwe ketin boy camêrê yazix,
Û, herçê xweyê terş û temazix,
Ji wê rojêda kirine edet-
Rojê malekê hine nan-nemet

Hubra dibirin bi qedirzanî.
Hub jî hildida ji ewî nanî
Parek pir dida fiqarêd bêçar,
Para din tevî jina xwe dixar.

Û dîsa bi dil, bi şêkirzanî-
Şêkirbûna xwe ji Xwedê danî.

***

Roja sicûdê mêr û milyaket ·
Civyan dîwana xaliqe qudret.
Tevî wan cin jî sekinî serqot.
-Tu ji ku têyî?- Rebî jêra got.

-Ji diniya bende,- cin gote rebî,-
Digeryam xwera nav evdê sebî...
-Qe çawane Hub, qûlê minî baş?
-Dua te dike bi qurban û maş...

Û te çi kirye, ku evdê serreş
Dilê te nekire bi xeberek xweş?
Te hebûn jê stend-qirêja desta...
Ewiled jê sitendin-ew toqê stûya...

Hebûna îsîn here baş bilet
Hurmete, Rebî, qedir û qîmet.
Qedirê Hubo-ber, çemkî dikşin ser
Naz û nemetê cînarêd comerd.

Hubik kêf dike xwera tev jinê...
Ca tu qedirê wî hilde ji dinê
Çika qulê te xwe nade rûyê te?...

-Here,-Xaliq got,-qedir destî te,
Lê her degmîşî emirê wî nebe...

Cin kete qelbê merivêd ernûs,
Nuxsan û nemerd, canbaz û cesûs.
Nava rokêda bi sond, bi "şede"
Li her dera bû hewar-heydade:

"Hubo bêare, Hubo bêferseng...
Lema Xaliqê alemê jê sitend...
Kulfetê xelqê dilsax-dilovan
Nan jêra dibin, ew dest davê wan...
Mal-milkê wî çûye, ew ji hevsûdiya
Dermana davê nav malê gundiya..."

Û hezar şerê qirêj, qîr û sîr
Suhukîn li rûyê Huboyê hêsîr.
Yekî got-vire, deha gotin-rast,
Pismama berê xwe ji wî guhast.

Cînara diha nan ji ser birîn,
Boşê parsekçî poz lê hilbirîn,
Maqûla serî hejandin şikber...
Tisqiya pîse-pîs tû dikirin ber.

Gelekî li Hub çetin hat, feqet,
Fikirî ew bi dilê firêqet,
Xwe-xwe xwera got: "Sebira xwe bîne...
Lê Xwedê çawa dide-distîne?

Demekê mîra tiya dike ber te,
Demekê pîsa radike rûyê te...
Lê çima, feqet, wî got mîr û pîs?
Îsanet yeke-evdê cernakîs...

Ji kê zêdeme, kîjan rebenî?
Rebê min ruhek daye her benî.
Firqî tune qet, her tenê, feqet
Minê şer û şûr navîta benda
Û bi qerf û qest lê neqaranda...

Lê dibe min jî nemerd û nemam
Buxdan bavîta meriyê am û tam?

Hindik merivê eyane alim
Bin hukimê dîwan-dewleta zalim,

Ji hêrsê, tirsê, yan ernûsiya jer
Şer avîtine merivê dûrşer...
Ya Xaliqê min, kubaryê nedî,
Tu ya xwe zanî, tu herbeledî,
Tu rê kivş dikî her evidê xwera,
Şikir ji rem û kerema tera".

Hub şikirya xwe wa dîsa anî
Û diha tûrê parsê hilanî.
Diçû parsa xwe li ciyê dûr dikir,
Danî - wî, jinê pê ebûr dikir.

***

Roja sicûdê mêr û milyaket
Civyan dîwana xaliqe qudiret.
Cin jî tevî wan sekinî serqot.
-Tu ji ku têyî?-Rebî jêra got.

-Ji diniya bende,-cin gote Rebî,-
Digeryam xwera nav evdê sebî...
-Qe çawane Hub-qûlê minî baş?
-Kul bi Hub hatye,- wî nefsê nebaş

Bi ten û tinaz caba Rebî da,-
Te hurmet jê sitend-azaye îda...
Bêxem, bêminet xwera digere.
Hurmet, tu zanî, ziyane û zere,

Kincek xas û teng, wekî îsanet
Nikare navda biheje rehet...
Diricife tim bendê belengaz,
Ku leke neyê ser kincika xas.
Yê aqil xwe-xwe kincika kabûs
Ser xwe hiltîne davêje mexsûs.

...Hubik jî xwera dijî bêminet,
Temaşe dike tebiyeta cinet.
Nanê xwe dixwe, eşqa xwe dike...

Îda wê çima çêra te bike?

Ca hela tu dest bavê derema,
Miqûfke ji van kêf û kerema,
Çika qûlê te xwe nade rûyê te?...

-Here,- xaliq got,-can bi destî te,
Tenê degmîşî ruhê wî nebe...

Bû birûsk, pekya kênlû, genefis
Xiravê berî Hûde û Hirmiz.
Û heta ku Hub ber tendûra xwe
Ji rebilalem xwest destûra xwe,
Wekî ku bixwe kurtolê parsê,
Ewî şîşa xwe jende bin parsyê...

Hubo ricifî, kişya, kizirî,
Bû kûtek kûtê xweyî parskirî...
Can berkevkî bû, û kêm jê kişya,
Lê bûn kurm û kêz mûyê sîng û serya.

"Simmila",-jina wî ma şaş û met,
Hever bû ji wê sêra elîwet.
-Ezim,-deng derket ji kûtê qertel,
Ezim...Xwedê şand, nemîne metel...

Çi bikira jina reben li wira?
Xwe mêr nedavît ber kelb û gura...
Hilda ew kûtê ruhberî reben,
Pêça danî nav zembîleke kevn.

Bi xwera dibir, bi xwera danî,
Û wextê ewê zembîl dadanî,
Û kurmek hingê canê Hub diket,
Wî dirêj dikir çeçikê bêtaqet,
Erdê hildida ew kurmê werek,
-Tu kuda diçî-digot,- bimbarek?
Qismetê teme, were min bixwe,-
Û kurm berdida car din canê xwe
Û dua dikir zembîla xweda:
"Şikir, ji navê tera, ya Xuda"...

Jinê rojekê tab nanî,feqet,

Gote Hub, go:-Lo kûtê nisobet,
Xuda îda çi teda hişt,wekî
Hela hê dua li Xuda dikî?

-Sûckariyê meke,-wî got,-ya hurmet,
Dayîn edete, stendin bêdet?...
Tu kulfetî, tu rind zanî, wekî
Seva eşqeqe şevê lezekî-
Çiqa cor-cefa hêsîra jinê
Dikişîne wextê welidandinê...

A min jî usa rojêd xwe şîrin
Jît bi nav û deng, hebûn û hurmet.
Naha jî dijîm, naha dikşînim
Bext û qedera kûtê nisobet...

Ew qeder tişkî usane, wekî
Rebê min "rewa" dike her yekî,
Şah û mişayîq, padişa, pêxember
Xilaz navin ber van kurmê beter,
Hizkî defin bin bi tabûta zêr,
Hizkî bi kûpê şehîdî bincêr...

Helala xwera Hub got û li vir
Nişkêva ker bû nolanî kevir...
- Lê firqî heye,-ew kûr fikirî,-
Başqeye zêndî, başqeye mirî...

Û cara ewil bi xeyd, bi gazin
Xeber raber kir li Xwedê mezin:
-Ya Xaliq, çima ezî hê ruhber,
Te da min yaziya paşî ax û ber?

Min çi gune kir, çi şaşîk şermî,
Wekî saxe-sax bûm kûtê kurmî?
Axir guneye ruhê xêvî xam,
Xûl dibe ji van bîn-birînê can.
Te ruhê min jî bistenda, bibira,
Paşê qalvê min wa rezîl kira...

Cin bihîst, berî roja sicûdê
Dakuta derge-dîwanê Xwedê.

Go:-Ya bînaya çevayî sertac!
Te seh kir "Dua" qûlê xweyî baş?

- Belê, min seh kir, nefsa xezebê,
Qûlê minî qenc zef rast jî dibê...
Awa , şagirtê zênî şereza
Rast dike şaşya dersdarê herzan.

Te usa li min kir sibir-kubir,
Wekî rûyê teda min jî xwe şaş kir,
Û qûlê xweyî cinetê hêje
Avîte nava wî halê doje...
Here, bidêda ji berê zeftir.

Û cin vekişya, diha dey nekir...

***

Helala Hubo heyf û dilovan
Nav zembîlêda Hubik digerand.
-Ax,-wî got,- bîna nanê teze tê...
Gidiyê, tu bidî xatirê Xwedê,
Ca min dayne vir, here malika han,
Belkî ji minra tînî parî nan.

Jina berbihêr ha-hanga li wir
Çiqilê darêva zembîl darda kir,
Banzda wê malê, heta vegerya,
Dît, zembîl tune, xwe xist û girya:

-Gidîno,-wê got,- mêrkê min kê bir?
Lê hew nihêrî sekinîne wir
Hubek na – sê Hub bi bengizê berê,
Bi wê bejn-balê, bi wê beşerê...

- Evdê,-yekî got,- ji me hersêka
Yek mêrê teye, binhêre çika
Hergê te nas kir, helalbe li te,
Yan hergê ku na, îda terk bide...

Heyfa Hub zefî li jinê dihat-
Ewê helala xwey bext û biat.
Tirsiya go: "Dive tê dernexe rast"...

Û melûliyê kûr bengzê wî guhast.

Bi çevêd wîye-xemê xaricî
Jinê mêrê xwe nas kir cî bi cî,
Cariya, xwe avît ber pêsîra mêr.
Herdê din hanga beta bûn bi sêr...

Û li wêderê Hub, helala xwe
Heta dageryan derê mala xwe,
Dîtin ber dêrî dikin bare-bar
Çiqas birê pêz, çend garan dewar...

Tu nevêje, çar padişayê şerqê
Seh kirine gilî ewê derheqê...
Û ev malê han bi xulam-xayî
Hubra şandine çawa hedayî...

***

Ji ewê arê buhurîn deh sal,
Heft kur Hubra bûn, sê qîzê delal.
Mîna baxekî baharê bihuşt
Qedirê wî dîsa bîn-beşer rahişt.

Lê bi hewasa berêye bêhed
Hub nedinhêrî îd-li îsanet...
Zarêd wî teze dîndargeşe gul
Danîn bîra wî ewledêd ewil...

Û dêşya dilê bavê ewledhiz...
Lê dîsa bi rem, terbet û temiz
Sed çil salî jît Huboyê helal,
Paşê demxatirî da dinya delal.

Axa Hube çil qurnî zêdetir
Kî zane, naha ku dibe kevir...
Lê serhatiya wî hela hê dijî
Mîna bûkeke nûre niqişî.

Û navê ewî evdê xwedêhiz
Bûye xebereke xurûye xalis-
Xebera Hub, ku cumilî cimet
Dibêje çawa evîn û muhbet.

## RIHANA RESO

Qeroyê Heso mêrekî çêye,
Kêlendya dest wî ji "alûçêye".
Dema honêda xwe dihejîne,
Herçî merivê dûrva dibîne,
Yek dibê hirçe, yek dibe gure,
Yek dibe aşê çardekevire.

Almasta Reso jineke jîre,
Benî-bedewek terbe-tivdîre.
Ew berî gundiya, berî cînara
Dadigre badya soresavara,
Dide ber singê - sêvê cinetê,
Berê xwe dide "zeviya zyaretê",
Û hela dûrva bi heyr, bi nazî
Li malxwe mala xwe dike gazî:

-Lo paleyo, palegiro,
Qevza kêlendiyê paxiro,
Kavla Pampa şewitîda
Ji hevt xorta zêdetiro.

Qero dibê:- Hey Almastê,
Zar şîrinê, wek gulmastê,
Te çi gilîkî nerast kir:
Te qatixê xwe anî hat
Himberî to û tomast kir,
Te malxwêngê xwe tekmêre
Ji hevt xorta hê derbaz kir…
… Xwezî mala ku xort têda…
Hebûya rusqet di Xwedêda,
Yekî wê vir tev min lêda,
Yekî din wê gurz girêda,
Yekî din wê bêder bêda,
Yekî din wê bilûrêda…
Derdêm çi bû dinyayêda?...

Qero dema ev xeberê han digotin,
Dil hinavê belqîz –benya xwe disotin.

Wek bostanê lêde şexta der payîzê,
Diçilmisî gula eniya vê belqîzê.
Wê kutabûn barê erdê
Çev û birûê reş û belek,
Digot:- Hinda min hurmetê
Xêrê qet nebîne felek.
Feleka min minra bata,
Mine malxwê xwera banya
Çend kur – bengzê bavê çêda,
Yekî tev te wê vir lêda,
Yekî din wê gurz girêda,
Yekî din wê bêder bêda,
Yekî din wê bilûrêda...
Derdêm çi bû dinyayêda?.

Nebû, neda.
Hê başteda
Neşuxulye çira bextê
Resiyê Huso û ewleda:
Birangê min hate kuştin,
Xwedê ez bê zuret hiştim,
Rihana ser minda porkur-
Xweyînga min bi wî terzî,
Ew jî Romê mêrê wê bir,
Ter û cahil xwera ma bî...

Gava Almast gilî tîne ser Rihanê,
Tev hev dibin reng û rûyê palê hanê.
Kêlendiya wî dixarice honê dertê,
Ew çev – birûya venabire ji rû erdê.

* * *

Rêka "Davanê" rêke kevirî,
Rêka xopanê rêke kevirî,
Almasta Reso ji derdê dila,
Kula kezebê kûr difikirî,
Dikir – nedikir, gilî-gotinek
Qeroyê Heso çend sala pêşda
Îro li dilda nedisitirî...

Teze digîhîşt ew serê gilya,
Ka çima digot wî "gawrê gelya"
"Rihan rindike...Xwezil wî mêrî
Rihana Reso bibe mişterî"...

Kî wa dibêje derheq baltûzê?-
Xêncî miqûfê şerm û namûsê,
Mêrê dergistya kurap revandî,
Beşerbedewê hurî rûstandî,
Şûrkêşê qav û qema erebî,
Kêlendîkêşê hona helebî,
"Serbidewxurê" legana rivîn,
Selefxurê ac, dêwê jinhevîn,
Seglavî –syarê kihêlê "Rûto"-
Qeroyê kurê Hesoyê Pûrto...

* * *

Ji mehela mixayîla
Almast dike – dilezîne,
Xwe mehela şemsikara-
Mala Xelora dighîne.

Dibê: - Kurap, wez bi qurba,
Tu mêrekî başî, hêje,
Jev derdixî rê û dirba,
Ca tu îro minra bêje:
Meriv dewê xwe cêribî
Dide mastê necêribî?

- Na, xêr, welle, - Xelo dibê,-
Meriyê Xwedê aqil dabê
Tucar dewê xwe cêribî
Nade mastê necêribî...

-Wekî usanê, wî şertî,
Tî bê jinî, bê dar-dergûş,
Tê ça dest xelqêva berdî
Yeke mîna Rihana xûşk?
Ne heyfa Rihanê, wekî
Bikeve dest arodekî.

Tu jî bi wê nûr-nederê
Herî kotek reş bialî,
Û welgere, eblû derê
Tûra mala Şayê Alî...

Gava Almast awa dibê,
Beşer ser rûyê Xeloda tê.
Dibê:- Qîzap, welle Xwedê,
Herça wekî bîra min tê,
Mala meda hê ji kala, hê ji bava
Zewac nebûye nav xûnava.
Lê xastina Xaliqê min wekî hebe,
Îşellahî, wê goreyî gotina te be...

* * *

Rihana Reso di bejna xweda
Yeke nîvçeye.
Qam û qedemê çapikî çeleng
Mîna şiklekî ji ber virçeye.
Guliyê hur, mîna têlê tembûra,
Jorda rêz bi rêz
Rakişyane ser tilmê binpiştê,
Mîna topa sêz.
Dema rê diçe, meriva tirê
Qam-qedemê wê pêda distirê...
Dema dikene, qey gulek bikir
Vedibe li ser dev- lêvê şekir.
Keysa cinetê davêje aniyê,
Govek dikevin sûretê wê zer,
Çev dibiriqin nolî dû kaniyê
Zeraya sibê teze bidê ser...

Resoyê Huso- alimê Pampê,
Mîna Qeyxanê bavê Zelîxê,
Rihana xwera bi lutbê şîrin
Dibê: "Nar û nûr ayna dilê min..."

Gava Xeloyê kurê birê wî
Dibe "mişteriyê" "ayna dilê" wî,
Reso dibê: "Xelo, lawo,

Welle serê Husiyê Şawo,
Heyfa dota dêmfenerî –
Min bida dest xelqê xerîb.
Heqe, mala birê minda, malcînarî
Ruhuka min îşiq vede bi nazdarî,
Herçî dema ez bêm, derî li we vekim,
Ronik bive dilê minî ji derda tarî...

* * *

Diha li der mala apê
Dixingire gula Pampê:
Der – sivdera gêzî dike,
Kerma cîguhezî dike,
Bi darşivê kulav dide,
Gulbaxana ew av dide.
Gulbaxan tum şems dinhêre,
Xelq vê gula geş dinhêre...

Mîr û malxwe bi kom-kulfet,
Wextê dibe eyd-erafet,
Xwe qeşeng û qelew dikin,
Riya mala wan raçev dikin,
Wekî tek – bîr, sebîn – ella,
Sev dîtina çevêd belek,
Bêjin: "Welle, siva we xêr,
Eydanîka we binbarek..."

Lê herça bû Quda xasî,
Kulek bê ser nefsa rezîl,
Dibê: "Eve risk – qelîne...
Destqirêje...
Destdirêje...
Nîvê dew û doşanyê me çû "cirma" wê,
Nîvê din jî ew dirêje...

Gazin – gilî bi Xeloyê kurap nabe:
Xelo yekî hêrsilûyî zarxirabe,
Dibe: "Rihan, binhêre ha...
Haj xwe heve...

Tu zanî, jin dest dikeve,
Dayîk tucar dest nakeve"...

Rihan dirêj nafikire,
Xwe riya mala xûşkê digre,
Dibe: "Amê, el û eman
Dest vê pîra bê dîn-îman...
Min pez serda dida bêrî,
Bêxweya miyê bi nebxêrî
Lêda, şîrê kodêda rêt.
Evê cedûya hane kirêt
Ber şirîka, dost-dijmina
Ava kûçka li rûyê minda...

Qero hingê bi dilê kul
Dibêje: "Lê? Rihana gul,
Babetî şa-mişayîqa,
Wekî nola nûredanka
Nerm hildana, nerm danîna,
Li pêçirê serê dika,
Ketye destê Xeloyê gêj,
Quda elke dirandirêj,
Wekî canya naz û nûbar
Veçirin wek du gurê har"...

* * *

Kavila Pampê – mêrg û zevî,
Axpînê vê pişpişokê,
Ji baranê Rihan revî
Kete tevya vê teyrokê...
Xazil şer û dewê xwesiyê,
Ne – el-epêd bextberadî,
Mêrêd kotî – dil dexesiyê,
Zarê wanî kîn- keratî...

Pistepistin: "Rihan hergê
Jinek başê û hêjeye,
Mala xûşkê, kurê xelqê
Herro- hergav çi pêşeye?"

Xelo wekî delodîne,
"Bênamûsyê " nahemlîne.
Ew hêrsa xwe zef radike,
Gazî Eliyê bira dike:
- Kuro, Elî, rabê, - dibê,-
Vê sihetê tivdîr bike,
Banzde here wê mehelê,
Gazî Memedê pîr bike,
Ka binhêrim yara zavê
Ça "qiseta şîr" wê bike...
Û serbara vê xeberê
Çêrî dayîka me pîr dike..."

Elî dike – dilezîne,
Xwe taxêra digihîne,
Micêwirê ber ocaxê
Berbi taxa jorîn tîne.

Vî serekê han ruhanî
Hêdî vekir derê xanî,
Slavekê bi mîranî
Mal-mirîdê xwe pêk anî,
Paşekê got dilovanî:
- Rihan, lawo, qe çawanî?
Xelo dibê: - Cildê xwekî,
Mala minda tuyê qet nekî
Pirs û halê vê forqa han...
Kengê min telaqê wê dan,
Here hingê mala bavê,
Pirs bike kêf û halê we...

- Xelo, lawo, - Memed dibê,-
Tu ji erda Xwedê ketî,
Wekî didî rûyê Rihanê
Van xeberê bêterbetî?

- "Terbetîbe – neterbetî",
Jina qav dest nade minra...
Ber destê te, pîrê batî,
Berdidim bi şert û bira.
Xûşka mine û dayîka min,

Yeke mîna vê Quda dê,
Ez destê xwe ser hildidim,
Azaye ber şertê Xwedê...

Diya Rihanê evê arê
Seh dike vê qal û balê,
Mîna hirça kudik kuştî
Dadikute ew mala tî.

Çêra dike, dikifire
Li jintiya xwe "dirandebe"...
Û bi destê qîzê digre,
Li pey xwe kaş dike, dibe.

- Were, were, - Durê dibê,-
Merivara – meriv gotî...
Nemîne cem wê mirtibê...
Wî şindokê korî kotî...

Herro, hergav qal û bêgar,
Şer û devê rezîl-robet,
Pariyê nan jî te dike qar
Ew keftora bêaqûbet...

Mexsûs usa rebena dê
Nav cînara dike gazî,
Belkî neyê ser qîza wê
Nava berdanêyî rezîl...

* * *

Şaneşînê Qeriyê Heso- berî tevê,
Pencerara tîrinc dide, keys dikevê.
Beşer vetên der-dîwarê çîl-kilisî,
Lê beşera rûyê kevaniyê
Îro pêda diçilmisî...

Qero dibê: - Almast xanim,
Herça wekî ez dizanim,
Kêm nînin ne nan- avê te,
Ne jî dêre-diravê te...
Çi tu eva çendik rojê

Ketî van fikarê doje?
Dewsa ez evdalê Xwedê
Bikevim derd-xemê şewat...
Sivê, wexta ku qasidê
Mêrê mirinê ser minda hat,
Kesek tune ji ewleda
"Bavo – bavoke" ser minda...
Dûyê ocaxa kal-bavê min
Wê pey min bê temrandinê,
Hesêvankî ne em hatin
Û ne jî çûn ji vê dinê...

- Dewa te çye?- Almast dibê, -
Hizkî, tu jî min mal derxe,
Herim xwera mala bavê
Bikevim ser dê, xûşka xwe.
Em sê jin jî "ancaxekê"
Hevdin mal û pûcaxekê...

Qero dibe: - Delala min,
Tuyî milkê vê mala min...
Wekî çevê xwe jî derxim,
Ez tucara te dernaxim...
Zanî, wekî hizdikim te
Ji ruh, emrê xwe jî zêde...
Kî jî bê vir, çi "şam -şuret ",
Dewsa siya te nagire qet...
Tu wê yekê mevêje min.
Were, ez – tu hiş bidin hiş,
Kanê yeke çawa bînin,
Dîsa nebe teqiş-toqiş...
Te nedî qe, te û Gulçê
We çi "ceng û cebar" danî...
Min ew jina jêhatî, çê
Seba xatrê te deranî...
- Na xer, welle, - Almastê vir
Kesereke keder rahişt,-
Romê mêrê Rihanê bir,
Te wê hingê Gulçê derxist...

Dilê Qero hêbet avît
Li ser gotina Almastê,
Wek dilê wî nêçîrvanî,
Ku nişkêva nêçîr rast tê.
Ewî bala xwe da jinê,
Lê ça nanê ku diçe kût,
Rû bi rûva nat girtinê
Ber atafya wê sura rût...

Lê bîrde wî derc kir bi dew,
Ku şerm ber bûye dijminê şêrr,
Û mecalê nade, ku ew
Dest bîne we "wêrşeqa" zêrr...
Û çawa bi lepê hirçîn
Dizeliqand Hûzê "pirçîn",
Çawa ku diçinî diçû,
Li şermê xist û derbaz bu:

-Amê, go, tu – îmana xwe...
Rinde keda te xûşk bixwe,
Yan xelqeke edû, dijmin?
- Ax, ez zanim, zanim, zanim...
Zanim bextê min xayîne.
Xwedê qirar kirye hilbet,
Wekî xûşk bê, zarrê bîne,
Dewsa xûşka xwe bê zuret...
Ciyê badê jî me text û bext
Rihan da wî Xeliyê bêbext...
Yan na, dibe naha îda
Te zara xwe bihejanda...

Qero derç kir, ku ev gilî
Almastê got bi dilkulî...
-Amê, ez bi qurba, - wî got,
Û ji hêbeta wek melkemot
Xwest hemêzke, feqet jinê
Ew ji xwe da dûrxistinê.
- Wêda, - wê go, - têm lingê te,
Min nexe vê zerga zêde...

Bihêl, ka bi çi rê- meniyê
Rûyê xwe didim evê teniyê...

* * *

Zivistanê "tevn û teşî"
Daxistye dor mal û mezil
Û têl bi têl, tejî-tejî
Lev dihûne bera xwe çîl.

Dihîr-hîre bayê kihêl,
Birye beza vê kêvrîşkê,
Mala bavê, ji bona mêr,
Xûşk bûye xwezgînya xûşkê.

Dibê: - Feleka xûşka min
Kul di nava navê xwe kir...
Me - mezinê wê, jî hemîn
Rêka pakî ber venekir.

Me girt û da Xeligeniyê,
(Xelo nedibû midasa wê),
Bi şer-şûra lê hat menyê
Reş kir bext û mirazê wê...

Kurap wekî me bû neyar,
Xelqê bibe xerxwezê me?
Xelqê hevsûdî çevnebar
Ancax gliya li hev dayne...

Diteqyan ji min û malê,
Otaxa min û akûşkê.
Îja diketin wê qalê-
"Xûşk çima tê mala xûşkê?"...

Lo bera bê hema ser min...
Ser çevê min, lingê xûşkê...
Hema ji eynata dijmin
Xwera xweykim wek dergûşkê...

Êmê keda min xelq dixwe,
Bera xûşka min bê, bixwe.
Êmê xweykim zara xelqê,

Ezê xweykim ya xûşka xwe...

Sivê wekî ya xwe ketim,
Dilê wê jî ser min bêşe...
- Terkde, - Reso dibê, - canim,
Xelqê mera qe çi bêje?...

Şuriyet jî qebûl nake...
Xûşk ser xûşkê bibe hêwî...
-Lê suriyet qebûl dike-
Ev şemçiryax bimîne bî?

Bavo, hê bi devê xelqê
Kesekî nan têr nexwerye...
Gliyê xelqê nebûyê tevî,
Ser bostana min nebarîye...

Gulçê derdikete hewşê
Dikir gazî şer û dewî,
Kulya çêra davît teşiyê,
Xelqê digot: "tewî-tewî"...

Emê xwera bijîn ker-lal
Li mala xwe têr û tije.
Bira xelqê birçî betal
Çi dixweze – wê jî bêje.

Wa dibêje Almast xanim,
Dilê min jî awa dibê:
"Dewletiyê ulm berêda tim
Kesîb bûne ji malê dinê.

Resiyê Husê, ku dizanî
Beyt-çîrokê hezer navî,
Sê pirêçê dew-doşanî
Kîs dibûne ber derê wî.

Kalê neyî bavê kura,
Ku bi nanê qîzê dijî,
Ew dikeve bin bandûra
Gilî û gotinê wê jî"...

- Ê lê, lawo, - Reso dibê, -

Hûnê hevdu bihemlînin?
- Bavo, - Almast jêra dibê, -
Xwe ez teze cahil nînim?

Mal jî, mêr jî we yê wêbin...
Ezê ber wan her herim- bêm,
Parî nan wê neghîjê min
Ji wan texte û sifrê şên?...

Rukê, hûnê nan nedin min? –
Dibeşire ew rûgune.
Rihan soro-moro dibe
Û milê xwe hildiçine...

Ew nîşane, gelî bira,
Îzbatîke kivşe ferih,
Ku xwezgînya xûşkê wira
Wê bêqedir venegere...

* * *

Li mehela mixayîla
Bûkek teze diçe avê,
Geşvetê wek himayîla,
Wek werşeqê şewqê davê.

Li berpêşa çiyayê Dibûr
Hê şin nebyê gulek usa.
Dimilmile ew beqisûr,
Beşer vetê şîrin û şa...

Çevê Qeriyê Heso ronî,
Ew padşaye, şa – mişayîq,
Wekî ku bext ji bona wî
Bîter kir ev beniya layîq...

Bera biger bigurgurin,
Xelq xeberdin qarî, qencî,
Ber gul – Rihana xwe torin
Ew diçe – tê wek baxvançî...

Ewî Almast ji bîr kirye

Mîna libaseke xilmet.
Derd, mîna bizûzê, ketye
Dilê "kevna" bê rû - rûmet...

Almast Qero rind nas dike,
Wî nevshizê bi rû – rûçik...
Qero xelqe, biat tune,
Lê "qancixa" xûşkêra çi?

Hatye – natye evê malê,
Xwe "bêare" dixemlîne,
Evî "îmansizê" hanê
Şev – ro dor xwe dibe – tîne.

Dewsa wekî şevek şermî
Dizîkava bihata "ba",
Xwe vepya ji wî "heramî",
Vedizya ber çevê meriya,

Heta ku sal dihat salê,
Hûr – hingil lê dadiliqîn,
Diçû li kuncekî tewlê
Xwera ker – ker "diteliqî"...

Emirê xweda cara ewil
Almast xûşkê dike eynat,
Û bedewya xûşkêye gul
Ber wê dibe mer – micizat.

Ew Almasta, wekî digot:
"Rukê, hûnê nan nedin min?"
Bi kaxek kevn, kevçîkî kot
Hinek vê gebola gênim
Usa raber dike xûşkê,
Ça kûtekî bavê kûçkê.

Belê. Heta berî hingê
Hizkirina xûşktîêye xweş
Bûbû dûxan ber çevê wê,
Wê nedidît ev roja reş...
Naha dilda tev rabûbûn
Kir – kumreşiyê huba jintiyê,

Ber wî agirî beta bûbûn
"Dûyê" hesîn û huba xûşktyê.

Xwe – xwekirya derman tune,
Xêncî ku çend hoqe titûn,
Wekî Qero nahêvşîne
Ji kevanya "xanim – xatûn"...

Qelinê bol – bol dikişîne,
Ew kulfeta mînanî gul,
Sebr û sekna xwe pê tîne,
Mimkûn dike hêbeta dil...

Derbaz dibe roja qîr – sîr,
Lê çetinin kavlê şeva.
Şevêd zivistanê kîr – bîr
Çîçka xewê nayê çeva.

Aliyê xênî, li cem xwesiyê
Nava cîyada vedqepiçe.
Û radibe ber çirûsiyê,
Va, cixara xwe dipêçe.

-Almast, lawo, - Bellê dibê, -
Dîsa nayê xewkinga te?
Rabe bikev ciyê xwe, - dibê, -
Berê xwe di qulbêdake,
Dua pîrê şevê bike,
Belkî xew tê çevkingê te...

Almast gura dakê dike,
Radibe serê xwe datîne,
Berê xwe qulbêda dike,
"Eşeda" xwe ji bîr tîne:

"Serê min ser belgî, berê min – şifakê,
Şedetya min Sultan Ezîdê makê.
Toqa Sultan Ezîd, stûyê minkevî,
Min bêaqûbet nakî,
Ya pîrê şevê, xatirê xwe û xudakî,
Xewekê li çevê min bîtir û bûtakî..."

Pîrê şevê xatir nake,
Xewê bûte – bîtir nake,
Evda Xwedê diha di nav
Cî – nivîna sebir nake.

Ew radibe dicedîne,
Dest û linga dipelîne,
Xwe ber derê otaxêra digihîne,
Li pişt dêrî ditelîne,
Hikyatek ji van hikyatê
Resoyê bav wir dibîne:

Şewq – şemala lempa neftê
Daye dora kerevatê...
Torlî – torlî têne xanê
Ber û bedenê Rihanê...

Vî Qeroyê han çilsalî
Wek şêrekî binê berya
Sîngê beniya karxezalî
Xwera daye ber dev û rûya,
Hêdî – hêdî radimûse
Û ji Rihanê dipirse:

- Rihan? Heta hatina vir,
Gelo qe te min hizdikir?
- Qero, qurba, - Rihan dibê, -
Teyê xwera ez anîme
Û di nava dest û lepê
Xwe şêrîda va danîme,
Îda çi cayîze, wekî
Evan pirsa ji min dikî?...
-Na, dibê, - tu caniya xwekî...

Dibê: - Nizam, welle, Qero,
Min hizdikir – hiznedikir,
Lê herdema, wextê bavo
Mera gilî – qise dikir
Ya "Ker – Kulik", "Emer – Elî",
"Rotemê Zal" û "Koroxlî",

"Hetemî teyr", yan tişkî din,
Tu dihatî ber çevê min...

Cabdayîna vê canikê
Gelekî li Qero xweş tê.
Ramûsanekê mor dike
Li rûyê horya xwe-buhuştê.
Dibê: - Şîrin – şekir – gezo...,
Rezê mala Resiyê Huso...

Rihan bîrde dibê: - Qero?
Lê ku felek min nebanî?
Mîna bêbexta xûşka xwe
Min jî tera zaru nanîn?

Qero dibê: - Ruhuka min,
Ez te hezar zarî nadim...
Talaş nîne – bînî – neynî,
Her tu minra xweş bimînî.
Beşera te tim wa cîbe,
Bedena te tim tûncî be,
Ez ku mirim, ser min şînkî,
Gulekî xwe ser min jêkî,
Bi destê xwe min gorêkî...
Îda diha tişkî dinê
Ez naxwezim ji vê dinê...

- Ax, seypisan, - Almast dibê, -
Lê giva tu heta sibê
"Dinelyayî" bona kura...
Te digo "kes tune pey minra",
Ketibûyî "tefekûriya"
Dûyê ocaxa kal û bava...
Ev çi bakî "çep" hat dinê,
Wekî va tu dîn – îmanê
Hevt bavê xwe didî bin pê
Evê dêla hane dupê?...

- Nellet li kabûsa şevê... -
Nava cîda Qero dibê, -
Te xêre, nevsa xezevê?

Lê Almast mecalê nadê:
- Qero, dibê, bîra te tê?
A vê derê, xût vê derê,
Dewsa lingê min sosretê,
Mîrzê hêsîr bîst sal berê
Xwe, mîna min, telandibû,
Gune – gune me dinhêrî,
Ka çawa tev dergistya wî
Tu hal – hubê pev diguhêrî...
Min Mirzera kir bêbextî,
Tera revîm...
Ayê Mîrze minra nema,
Telabextê minî xayîn
Ez anîm vir dewsa Mirze,
Wekî ku ez temaşekim,
Ka ça mêrê min dalêse
Ber – bedenê xweyînga min...

Îskînî ji Rihanê tê,
Cilê xwe dipêçe, digrî:
-La birûsk ser minda baryê...
Ez xwe bavêm çi agirî?...
- Zanî qe xelq çi dibêje, -
Almast Rihanêra dibê, -
Zanî, min – te me qe çikir
Nava tîv – terîqa Pampê?
Megrî, - dibê, - qe tu megrî...
Xwe "mavêje" tu agirî,
"Ez" hêwîtî hatim ser te...
"Min" mêrê te girt ji ber te...
Ez jî gere xwe bavêjim,
Ez jî gere xwe bikujim...

* **

Bext Qerora dûr û dirêj nebeşirî,
Mîna gula şexte lêde, zû pişirî...
Rihan diha xwe ji Qero diparêze.
Kinca dişo, kûliyê kûrkê ew dirêse,

Şevê, mîna pişîkeke kutayî çil,
Diqinçile dor tendûrê, ser pirtî cil.

Ax, wê tirê, wextê ku nav nivînê xas
Tevî Qero ewê dikir hub û hewas,
Şaya wêra, wê tirê, sa dibe Almast...
Emir, feqet, li ber kifşkir rûyê xweyî rast:
Heverî bû cahila dilsax, wextê ku dît
Kir – kumreşyê xûşka xweye agir – aşît...

Naha, wextê şabûnê wan ,
Şevê çûyî ew tînê bîr,
Hew dizane, xap – xap, nezan,
Kêf kirye bi goştê xinzîr...

Ew îda nameşe avê,
El û epê Pampê paşin
We bikenin li ser "qavê",
We xeberê xirab bêjin...

Dinya li ber wê bûye zengil,
Zengilekî bêhed- hesav.
Hema derê, zengilê zulm
We şinginke bêrem – îsaf,
Mîna wan zavitê zulim,
Ku şingandin qeyd û zincîr,
Destê mêrê wêva kirin,
Birin Qersê, çawa hêsîr...

Gelo saxe? Gelo – mirî?
Saxbûya, Rihana pêcirî
Wê xwekira kincê gincir,
Tenî kira dêmê xwe dur,
Û biçûya bi parsê, pirsê
Bigihîşta yêrê Qersê.
Cem zavitê serekbaşî,
Xwe bavîta dest û piyê wî,
Bigota: "Ez bextê teme,
Ez bextreşim, ez guneme...
Merîkî min we gîrtye dîl,

Ewe-k jêra dibên Celil,
Pêştirî wî li vê dinê
Tunê kesê min rebenê...
Ew bêsûce, ew bê gune...
Tî wî tevî şera tune...
Ber dewleta Alî – Osman
Nekirye tu dew û duan...
Bidî xatirê navê Xwedê,
Ewî berde, bera ew bê,
Çika jinka xwe rûreşra
Qe çi gilî – gotina dibê.
Lê, ax, dibên, ew kuştine.
Canya wîye can hiştine
Nava berfê, serm û surê...
La jin korê, jin porkurê...

Dinya çawa hat guhastin.
Wê guldida mala bavê,
Wextê ew Celîlra xwestin,
Wextê xwerin şîraniyê wê.
Şîrna gişka bû ew ese...
Kulîlka Pampêye pêşin.
Dergîstiyê wê terî – teze
Dibiriqî wek gul û sosin.
Naha xwera xortê keleş
Dirize ser axa Qersê...
Ev jî nolî pûştek rûreş
Ketye evê hal û hebsê.

Amin nabe, rûyê wê nagre
Car din here mala bavê
Û ew digrî, dikewgire,
Kesekîra tişkî navê.
Û ça caba hêsirê wê,
Çawa sûdek ekis – etav,
Digujgujin ber guhê wê
Ew xeberê xûşkê xerav.

“Megrî, megrî, qe tu megrî,
Xwe navêje tu agirî...

"Ez" hêwîtî hatim ser te...
"Min" mêrê te girt ji ber te...
"Ez" jî gere xwe bavêjim...
"Ez" jî gere xwe bikujim...

* * *

Oda mala Sliyê Bozo
Odeke nav û nîşane,
Li dora vî Resiyê Huso,
Mêr û malxwê lev civyane.

Îro feqet dor ne dora
Çîrok – çerezê dilane.
Îro "Beyt û borebora"
Dew û doza van zikane...

Rojiyê "ezdî" buhurîne,
"Xirdinebî" hela dûre.
Temê lawika dikişîne
Goştê kavirê kelî kure...

De bînin ha, bînin, bînin,
Kavirê kelî belek bînin,
Lawikê bi şert û cihûd
Qemê xwe pê bicêrbînin...

Anîn, anîn, welle, anîn,
Kevirê kelî belek anîn.
Lawika qemê xwe deranîn,
Hêle hêbet serda anîn.

Ha himîne, ha gimîne,
Emer lêdixe dikuncîne,
Tihar lêdixe, diqusîne,
Şaoyê Keso nasebrîne,

"Zilfeqara" xwe dikşîne,
Destê çepê qoç wer tîne,
Destê rastê jorda tîne,
Serê hogiç dadibarîne...

Şare – ware li dor Şawo

Qeriyê Heso nahemlîne,
Dibe: "Welle, kurê Keso,
Ew qema cînartyê nîne...

Sibê, ella neke, wekî
Em û tuva hevra şerkin,
Îda jinê me gerekî
Por – guliyê xwe hazir kurkin".

Qero hê li vê xeberê,
Hê qajîne, hê qirevir
Dibe terpeterpa Bellê,
Hewalkî xwe davê hundur.

Dengê vê "bayqûşa" şevê
"Zilfeqara" Şawo tûjtir
Dibire vê deng û dewê,
Berbat dike cegera kurr.

- Weylê, dibê, - malxiravî,
Te paldaye wî kulavî,
Qet nabêjî jinkinga min
Çi haliye, çi hesavî...

Mîna bayê zivistana
Bi tep – tepî, dero – dero
Gultuma van odevana
Dadikute mala Qero.

Ew Almasta bêaqûbet
Li der malê nolî pûpû
Gaze – gaze, hewar – hêbet,
Xwe dikute, xwe vedipû...

Çevê xelq û xizma derê-
Van kes – kusê derda çûyî,
Nedîtana li sivderê
Gul – Rihana dardabûyî...

Reso nolî gura zûkya,
Qero nolî hirça orya,
Xwe jêlava avîte piya
Û jorda ket ser dev û rûya.

- Qema bînin, qema bînin...
Togê xayîn biqetînin,
Belkî nûr û nefesa vê
Şemdanê lê dagerînin...

Qema Emer dilerize,
Qema Tihar diçirçire,
Qema Şawo diçûrise,
Davêjêda û dibire...

Weris mîna merê ûcîn
Ruhê caniya canik xarye...
Çilmisîne çevê tûncîn,
Siya mirinê serda barye...

Ax, dibêjin "mirin berre"...
Lê saz nayê gula Pampê...
Zarê Bellê ça digere-
Vê kilama şînê dibê:

"Cibrahîlo, malik xirav,
Tê digerî meydan – meydan, eraf –eraf,
Tu kor bûyî, tu şaş bûyî, te ez ne dîm,
Te bir ruhê beniya bûkîn,
Zendzêrîne, enîdirav"...

"Hey wax li min, - Qero dibê, -
Ezê axînkim ser çira?
Der dilê min serbat kirye
Mîna baltekî darbira.
Li min hatye kerxa dinê,
Axîreta vê dewranê.
Ezê dêmê kê binhêrim
Pey dîndara horiya xwera"?

Reso dibê: "Wax li min, wax,
Li min vêsyan ûrt û ocax
Ne ji şûrê zavtê qaçax,
Ne fendê taşnakê alçax,
Lê – sebebya Almasta min,

Min bêbextê
Hê rû – barê dinyayê sax"....

"Herê bêje; sed car bêje,-
Almast îcar wir dibêje, -
Por – guliyê min kevnê kurke,
Hêja çevê min birêje...
Eze kor bûm, ez kotî bûm,
Dêl bûm, eqilê min negihîştê...
Bavo, ulmê der û dinê
Li cem te bû
Te nego, ez qîza xweye tere cahil
Çawa davêm vî agirî, vê aşîtê"...

"Wêlî bi wêl, - Reso dibê, -
Rihan, lawo, ezê bala xwe didimê,
Ji dîndaryê, ji hesav û husinê dinê
Ne kêmtirî tu ji Zînê, ji Zelîxê.
Aşiq- alimê dewirana metihê wan dan,
Lê metihê gul – Rihana min
Gelo qe wê bê gotinê"?

Herê, belê, ewan wisa wir digotin,
Dilê xelq û xizmê hazir tev disotin.
Dilê min jî, qewmêd hêja,
Hêja teze vir dibêje:
- Wêlî bi wêl!
Ji Qeroyê Hesora, wêl!
Ji Almasta Resora, wêl!
Ji Resoyê Husora, wêl!
Ji aşiq û efrandarê
Beyta "Rihana Resora", wêl!

## RIZAYÊ KURMET

Ew Xezala ji birr mayî
Walî sînor zare-zare,
Roj-nedîra some-sayî
Usa gazî û heware...
Dibê gotye: "Ez Xezalim,
Êzdiya sîpikî, qîza Îvo,
    Xûşka Hesen,
    Xûşka Ûsiv,
Kevanîka Hesenîkê Cemaldînî...
Sînorçiyo, ez bextê teme,
Tuyê cabekê minra bînî:
    Hesen saxe?
    Ûsiv saxe?
    Kidê saxe?
Gelo qe wan dera nakin
Pirsa halê xayînga xwe?

Kul têkeve mala Baroz:
Wî serekê ser sînorçiya,
Ça cabekê negîhandiye
Kar-xezala quntara çiya,
Negotiye: "Ber xatirê Xwedê
    Hesen saxe,
    Ûsiv saxe,
    Kidê saxe...
Wê bi kom û kulfet dijîn
Nav bereka Elegezê, gundê Pampê,
Li quntara Qemerdaxe"...

Bîst salê tam jê buhuriye,
Teze besek bi timayî,
Wî gîhandye Ûsivê Îvo
Ji dê-bava tenê mayî.
Ji zare-zar, ji nale-nal,
Hewar-gazyê xweyînga wî...

Kevanîka Ûsivê Îvo
Bera tendûra xwe dade,

Wek antêxa ber bê xistî
Dilê malxwe ber hev nade...
Gelo saxe, gelo mirî
Xweyînga wî unda kirî?

-Hemo, lawo,-Ûsiv dibê,-
Mirin-mayîn aliyê Xwedê,
Lê ji aliyê Qersê, Qulpê
Dîgor şêne wek destê dê.
Hergê Xwedê hunirmezin
Nekiribe para gorê-
Ser-beratê xweyînga min
Wê kivş bibe li Dîgorê...

Riya Dîgora Emerîkê zef ne dûre,
Meydaneke kihêlekî bê qusûre.
Lê riya zagûnê dewleta pir dirêje,
Çivaneke bi bac-bertîl, xar û xêje.
Sev xatirê xwey-xûnavtiya xerîv ketî
Hemoyê Ûsiv ziatek pirr lê dirêje.

Wede bazirganê roja
Ber bi payîzê kaş dike.
Ûsiv hîviya beseke şa
Dûyê qelinê qulac dike.

Lê rojeke payîzê sar
Mektûbeke zimrût pêva
Dewsa cixara xwe karbar
Ew dibe ser dev û lêva,
Radimûse bi ax-keser:
Dide xwendin cara bîstî
Û mite-mit guh dide ser
Wî...miqamê nebihîstî:

"Em: ewledê ana Xezal ruh remetî-
Riza, Meyrem, Hemîd, Huso, Zeytûn, Zekî,
Bîr û bitûn bi mal-nefer, bi kurr û qîz
Radimûsin destê xalê xweyî ezîz..."
-Xezal jî mir...hey wax li min,
Ji dê-bava mame tenê...

Dike îskîn mêrê mezin,
Hêsir dirêjin ser bedenê.
-Ûsiv,negirî ez bi qurba,-
Helala wî ber dilda tê,-
Kur-qîzê te şikir hene...
Xarzî mane rû-hewatê...

***

Yanzde lawê Ûsiv hene,
Kurekî wî Pewaniye
Kvartîra xwe şeherda
Têl û dezge wî daniye.

Şebeqeke zivistanê
Têl dizinge hukumetî:
-Allo,-dibên,-bidin caba
Qewimê xweyî Romê hatî...

-Allo, allo...Riza tuyî?
-Ezim,- dibê,-ez bi qurba...
Qe xalê min çawane,gidî?
-Ax, xalê te,-kurxal dibê,-
Xalê te heyr-hisreta te
Bi xwera bir ax û tirba...

Dike axîn kurê metê,
Digrî, xweda dikewgire,
Ancaxekê deng jê dertê:
-Ez hotêla Pewanême...

***

Rapalikiye bol û bilet
Rewan kuncekî dinyayê,
Lê bala Rizayê kurmet
Qet bi rewşa şeher nayê.

Dibêje:- Min bibine gund,
Nava qewm û lêzimê min,
Ber bêlanê çiyayêd bilind,
Mal-ocaxê merd û momin...

-Çî min û van qesir-qubya,
Evê mêrga dora dêrê?
Tek bire pez vira hebûya,
Raserkira min vê çêrê...

Yazix, wekî zivistane,
Sepe bûne şax û şeqal-
Kurxala wê bibirana çiyê
Kurê meta xweye Xezal.

Ancaxekê "Vîlîsa" wan
Diqelêşe şop û şepê,
Û mêvanê qedirbilyan
Digihîne gundê Pampê.

Qemerdax, va, tev Bêfesal,
Tev Dibûrî mil dane mil,
Li dor-berê Pampa delal
Sekinîne çawa qerawil...

Belek dike di nava gund
Postê berfa bertevê sîs,
Bi siya lodê serîbilind
Û qelaxêd qubegêzî.

Hey gidî ha, vir jîtine
Hesenê xal, Ûsivê xal!
Vira keser rahiştine
Bo xweyînga xweye Xezal...

Yazix, wekî ew tunene,
Ne jî heye Kida xatî.
Ma, xwe bavê xalojina xwe
Xarziyê wanî Romê hatî.

Bigirî, bikewgire kerba
Ber hemêza wê Cemedê,
Bêje: "Xalojin, ez bi qurba,
Bîna xalê min ji te tê"...

Ma Pampyara şiro bike
Yaziya zeya xerîv ketî.

Lê heyf, wekî nas nakin ew
War-mikanê wî welatî.

Nedîtine çiyayê Şehîd,
Li kî derê, ber krîşda,
Xezal û mêr mane wehîd
Şeva reva sala hîjda.

Mane jin û mêrê cahil
Tev tifala xwe pêşa çiyê,
Belkî şebeqêra tel-tel
Xwe bigihînin îza koçê...

Lê şebeqê hela berî
Nûr-nedîra "Şemsê êzdiya",
Li ser wanra du îçerî
Sekinîne tiving dêstda.

-Tîya ji kuyî, rinda êlê?-
Îçerîkî pirsiye bêşerm.
Lê Koroxlî-mêrê rindê
Di ber wîda hatye xûngerm:

-Çî te "rinda êlê ketye?
Vir îçeriyê kurmancî hur
Bi beşerek êrif keniye
-O, çiqasî kumreşe kur...

Lê seva kumreşiyê nekî...,-
Ewî tiving anye xarê,
Gurîn ketye pala Şehîd,
Carîn ketye kar-Xezalê...

Pêra negîhandye bêje:
"Min jî bikuj, vê tiflê jî..."
Hew çevê xwe vekirine-
Va odeke baş niqişî...

Nava odê diçe û tê
Merîkî yaş, gêla kurdî,
Çire şekir daye tetê
Tifalkinga wê hilgirtî.

Pêra xweş-xweş xeber dide:
-Navê te çye? Dibê:-Nazê...
-O, navekî çiqas tîte...
-Navê diya te? Dibê:-Xezê...

-Navê bavê wê jî pirske...,-
Dibe kûrîna Xezalê...
-Ber xwe mekev, remet li çûya,-
Di berda tê malxwe malê,-

Qîza kîrvê Îvoyî tu?
-Ax, kîrvotî ku ma, xalo...
Lêdan mêrkingê min kuştin
Beyaniyê we, nemerde no...

- Aqa eşîr hate kuştin,
Bera ew jî bê kuştinê...
Tu duake, tu, qîza xwe
Sax-silamet mane dinê...

Gumanê bav-bira bibir,
Meke bes û bazara mêr,
Ji xanima mîra çêtir
Xwera bijî vê mala têr.

Sev xatirê te, bavê çêtir
Ezê xwey kim vê tifalê,
Tu jî minra mevê "xalo",
Hilde dest xwe mifta malê...

Awa gotye bavê Riza:
Hesenîkê Cemaldînî,
Lê nelyaye kara xezal
Nav nivîna wî "dijminî".
Ber avirê Besa hêwî,
Deb û dêşa dînê ayrî
Keribiye ser tifla sêwî,
Xûç-xûnavê unda kirî...

Rizayê wê hatye dinê:
Nuxuriyê wê êzdî-surman,

Û dîna xwe dayê inê
Texmîn kirye bi hub-heyran

Ser sufatê biçûkê xwe
Pişkê birê biçûkî rind,
Û ji wîra gotye : " Ûsiv...
Birê minî terî-torin"...

Kur ji xwera kirine bira,
Qîz ji xwera kirine xûşk,
Û çawa dê, çawa xweyîng
Wan heyîriye dayîka dergûş.

Ji wanara gilî kirye
Yaziya xweye bi êş-êşûk,
Hal-hewalê mala bavê
Û bedewiya birê biçûk...

Lê wextê mezin bûye îdî
Qayîl nebûye wê fikrêra,
Ku xûşk-birê xwe nedîtî
Wê here nav ax û gora...

Nuxuriyê xwe daye dû xwe,
Hatye xamê "Delî-Qazî"
Û deyl sînorvana kirye,
Dûrva kirye hewar-gazî:

-Ez Xezalim, êzdiya sîpikî,
    Qîza Îvo,
    Xûşka Hesen,
    Xûşka Ûsiv,
Kevanîka Hesenîkê Cemaldînî,
Sînorçiyo, ez bextê teme,
Tuyê cabekê minra bînî:

    Hesen saxe?
    Ûsiv saxe?
    Kidê saxe?
Gelo qe wan dera nakin
Pirsa halê xweyînga xwe?..

A wane, ha, pala çiyê,
(Ku xarzîra bûbûn hikyat)
Pal dane wê qube-qûçê
Bê gazin, bê dew û şikyat...

Tevî xizm û xûnavê gund,
Xwey-xûnavê dereng hatî
Diçe pala çiyayê bilind-
Ser mezelê xal û xatî,

Radimûse kêlikêd sar:
-Xalo,- dibê,-evaya ez,
Eva- xûşka teye Xezal,
Ev- xarziyê te dûre derez"...

Û ew mêrê musulmaniyê
Dînê xweda zikirî zor
Hiltîne bo xatirê xala
Tasa Sultan Êzîdê sor...

Çenge xweliya mezelê wan
Û mezelê Kida xatî,
Dike nava dezmala al
Bi tiberkî, tulizmetî.

Wekî bibe here wira
Bireşîne bi şîn-şayî,
Ser mezelê xûşka wana-
Ax û keser dilda mayî...

Lê hetanî çûyîna wî
Hene donzde rojê bilet.
Rojê malek teglîf dike
Mêvanê xwey qedir-qîmet.

Rûdinê ew jora texte,
Beşera wî dinhêrin gişk,
Şîrin-şîrin xeber dide,
Ken û fenê xalêne pişk.

Pampiya pirsa ji wî dikin:
-Riza, cem we axa hene?

-Hûn çarixa qe pê dikin?
-Qerewilê baxa hene?...

-Nandirûna we qe çawane?
-Hûn bêdera qe têx dikin?
-Riza, bidî xatirê Xwedê,
Hûn şîrê xwe "zidêl"dikin?

Û dikenin, wextê dibhên
Malî-gundiyê têre-xamiz,
Ku wî berî ji qatixê
"Zidêlêra" dibên "dînsiz"...

Lê wextê ji qonaxa şên
Bela dibin mêrêd serxweş,
Rêva ewan xwe mukur tên,
Dihejînin serêd serxweş:

-Çi dîn-dijmin? Çi busurman?
Çi cudatî? Çi firqî?-Qeet...
Ew edete...ew zar-ziman,
Ew xeysefe, ew firaset...

**Belkî sebebkarê milet**
**Gora xweda qûnkî rûnê,**
**Tarmitaxbe textê nemerd,**
**Derem nemîne li şûnê...**

**Wê çawa ro-nava nîvro**
**Me kirin bazara kora.**
**Miletê me jev bir kirin**
**Bi van fêli-fenegora...**

***

Wextê Riza çû yêra xwe
Got-wê zû bê evê carê.
Bîne bo Hemoyê kurxal
Cixareke ji karbarê

Û zurneke Îstembolê,
Mîlekî baş, çend qamîşa

Bîne bo biçûkê xalê,
Yê ku jêra dibên Mîşa...

Got, ku hat, wê zef bimîne--
Salewextek tam û temam,
Şîn û şayê me bivîne,
Mêrg û warê xabûs û xam,

Tevî bira-beledê xwe
Bigere cî-warê xwestî,
Û ji bona ewledê xwe
Nîşan bike qîzek êzdî...

Û hîviyê bûn malî-gundî,
Hisreta hatina Riza,
Nêt dikirin mêrê cindî
Teglîf bikin kêf û şaya...

Lê rojeke şêne şayî
Dewsa bengiz û beşera geş,
Dewsa pêşkêşê soz dayî
Ji Romê hat "kaxezê reş"...

Tevî "kaxêz" reqemek hat:
"Tarîqa nexweşiya" Riza.
Ser "terîqê"-mor û mozbet,
Binîda qol- "doktor Hemza"...

Reş girêda xalojina pîr,
Kurxala kir şîn û şîwan:
Bi edetê êl û eşîr
Cînar hatin serxweşiya wan.

Serxweşî dan kurxalê wî,
Xalojina pîr-ina Cemed,
Bi dilxorî, bi dilêşî
Ji Rizara xwestin rehmet.

Lê ku derketin ber dêrî,
Nava wanda bû piste-pist,
Kirin dolav pirsa terî,

Û her yekî fikirek lê rist.

"Çi-b Riza hat?-ji hev pirsîn,-
Bi wî mêrê sip-silamet....
Nexweşiyê mir, yan bi qeziyê
Yanê kete tora nemerd?...

Kî dizane? Seyasetiye-
Setiya mixenete mexsûz.
Dibe mêrikê bê ziyan-zede
Hesivandin çawa cesûs?...

Yê ku seyasetî hunart...
Gora xweda qûnkî rûnê,
Tarmitaxbe textê nemerd,
Derem nemîne li şûnê...

Wê çawa ro-nava nîvro
Dikine bazara kora,
Serê mêr-mileta dixwun
Bi van fêli-fenegora...

1985

# JI RÛPÊLÊN JIYANA FÊRÎKÊ ÛSIV

(1934-1997)

## PÊŞIYÊD FÊRÎK

Pêşiyêd Fêrîkê Ûşiv ji qeza Qersê bûne, ji gundê Emançayîrê. Bavê wî-Ûsivê Îvoyê Hemo, ji êla sîpka, bereka wutiya bû. Şeş zarê Îvoyê Hemo û Zeyneva jina wî hebûne-Hesen, Zozan, Çîlê, Xezal, Kidê, Usiv.

Ewana pey şerê hemdinyayêyî pêşinra, salên revê-bezê, mihacir dibin. Nava şer û dewada, xelayî-celayêda ji wê malê çar nefer zêndî dimînin-Hesen, Kidê, Ûsiv û Xezal. Xezal Romêda dimîne. Wexta koçerbûnê rêva mêrê wê Koroxlî dikujin, û Hesenîkê Cemaldîn Xezalê çawa jina xwe lê xwey derdikeve. Bo xatirê diya xwe, bi pirs-pirsyara nuxuriyê Xezalê-Riza, sala 1978-a ji Romê hate Ermenîstanê, hate dîtina xatî û xalêd xwe, kîjan, sed heyf, çûbûne ax û berê sar. Ewî gilî dikir-çawa diya wî hertim destê wî digirt, û ew dihatine ber avê-wî alî sînor, û ewê dikire gazî, ji sînorçiya pirsa xûşk-birê xwe dikir...

Paşwextiyê Fêrîkê Ûsiv derheqa hatina kurmeta xwe- Rizada destana (poêma) xwe "Rizayê kurmet"da nivîsî.

Lê Hesen, Ûsiv û Kidê tevî qewim-pismamêd xwe ewil li Tiflîsê ( Gurcistanê) star divin, paşê têne Ermenîstanê, gundê Pampa kurda (naha Sîpan).

Jina Hesenê Îvoye pêşin Cewê bûye. Pey mirina wêra Hesen Hacê distîne. Fêrîk danî bîr:

"Bavê min - Ûsivê Îvo li Emançayîrê panzdeh saliyêda Misqalê distîne. Du kurê wan bûne-Paşa, Teyo. Misqal û Paşa revêda dimirin, Pampêda bavê min dayîka min –Cemeda Emer distîne. Diya min yeke sufet qemer, bejn bilind bûye...

Pey zewacêra Ûsiv û Hesen dîsa diçine Tiflîsê. Dixebitin salekê-duda, vedigerin têne Pampê, dikevine tamekî kevn. Lê zûtirekê bi ga-erebê Ûsivê Emer-birê Cemedê, kevir, dar-bara tînîn û xwera tam çêdikin, gundê Pampa Kurdada dihêwirin, dibine mal-avayî.

A li Pampê sala 1934-a 2-ê meha mijdarê (noyabirê) Ûsivê Îvo û Cemeda Emerra ewledekî kurîn jî dibe. Navê wî datînin Fêrîk.

## PAMP Û ZAROTÎ

Zarotiya Fêrîk Pampêda derbaz bûye. Pamp xurû kurmance-kurmancê ser dînê êzdîtiyê. Pamp perçekî tebiyetêyî bedewe, çiyê çiya û baniya, çayîr, çîman û kulîlka:

War-welatekî xamikî xasik,
Mkanê kawa, ciyê gulê nazik…

Fêrîk Pampa xwe pir hiz dikir. Ewî nivîsye:

Pampa mine baş, Pampa min kubar
Wê pal vedaye wan quntarê sar,
Pamp mîna bûka, bûka xemil lê bend,
Dorê çiyayêd me girtine govend…

Çiyakî bilind Pampêda heye, ku -

Mîna zlamekî qure
Mêrekêra bê dew-dozê-
Qemerdax sîng gup vekirye
Li himberî Elegezê.

Jêlava du karvanê çiya,
Rahiştine milêd wîya
Ber çêbûne wek xalîçe,
Du beyarê gul û gîha-

Ê şerqêra divên "Pçêx",
Ji roavayêra- "Davan",
Wir şîn divin kesin û kêx,
Wir distirên şivan-gavan…

Ûsivê Îvo-bavê Fêrîk, hêna salêd şerê cihanêyî dudada birîgadîrê (çawişê) kolxozê bû. Ew nebirine şêr, çimkî mala wî gran bû, îda deh zarê wî hebûn: Teyo, Hemo, Memo, Xatûn, Fêrîk, Şko, Onîk, Şerê, Miraz, Meksîm, lê birê biçûk-Mîşa pey şêrra bûbû. Salêd şêrda gundiya bi zor-cefakê ebûra xwe dikirin… Sala 1945-a, meha gulanê besa sekina şêr gihîşte gund…

Fêrîk deh saliya xweda diçe mektebê. Mekteb ermenkî bû. 7-8 salya wîda ew dişandine dibistanê (mektebê), lê çimkî bi destê çepê dinivîsî derzdar serda hêrs diketin, zaro jî ser çepya wî dikenyan. Loma jî Fêrîk ji dibistanê direvya. Bi zorekê hîn bû-bi destê rastê nivîsî. Wekî din-bi destê çepê kevçî digirt, nanê xwe dixwer, bi destê

çepê xebata giran dikir. Sala 1951-ê dibistana gunde hevtsale bi şedetnema pesnandinêva xilaz dike.

Fêrîk xwendina mektebêra tevayî diçû ber berxa. Berxvantiya wî "xewn bû jêra":

Bawîşka berbangê bêxew...
Dengê deylêkirina diya min
Tev xulpîna sirsûmê dew...

Zilamê fikirsucuh tebiyeta şênda dikete mitala, "şevêd havîna, li guhêr û bêdera, mîna ktêba xweye dersa steyr û peyrê ezmana dixwend"... Ruhê berxvanê biçûk bere-bere bi kubir keyîsa tebiyetêva perwede dibe...

Wexta gîhadirûnê Fêrîk berxvantî disparte Onîkê bira û xwe-xwe diçû xebata kolxozê.

Lê hê naçe ber çevê min
Ew dîdema bi gul û nûr:
Qelfa qîza bi kincê reng
Ser milê wan –tirmix, tûrpazk,
Hilparkî çiyê dibûn çeleng
Wek "Tawisê" bi par û bask...

Û Fêrîk tev hevala diçû "vîlkê" - gîha berev kirinê-pey wan "canik-cewahira"...

Fêrîkê Ûsiv bîr danî-çawa cara pêşin ewî helbest nivîsye:

- Dersxana çarada rojekê me hewşa mektebêda dilîst. Hevalekî me dexeltî kir, wekî ji nava lîstikê derneyê. Ewî da qeyınê xwe, derneket. Hingê min jêra got:

Kuro, derê,
Pirtiyê kerê...

Zaro kenyan. Lê mamosta (dersdarê) me, guhdarya kîjanî ser me bû, gazî min kir, rojnema destê xweda vekir, şiyêrek nîşanî min da: "Ay, - go, - hergê merîfeta teye şayîrtiyê heye, şiyêrêd aha binvîse, ne ku wan çêr- êtiyê bê merîfet lev bîne..."

Û min hingê dicêriband. Lê tenê çar salê din, hîjde saliya xweda, cara pêşin çarrêzek ser çiyayê meyî Qemerdax nivîsî...

Fêrîk wî çaxî îda xwendekarê Xwendinxana (têxnîkûma) Yêrêvanêye pêdagogiyê bû.

## XWENDKARÊ XWENDINXANÊ Û ÎNSTÎTÛTÊ

Fêrîkê Ûsiv bêy xwestina xwe Xandinxanêda hatibû qebûl kirinê. Ewî pey berxvantiyêra dixwest saltira din bibûya şivan. Dikire bîra xwe, digot, wekî bavê wî ew gilî bihîstibû û gotibû: "Tu dilê xwe dibêjî?...". Û Ûsivê Îvo, çawa mêrekî bilyan û dinêdîtî, kurê xwe dişîne Yêrêvanê - hînbûnê.

Pey kutakirina Xwendinxanêra hema wê salê jî, ya sala 1955-a, bêy komekdarî, Înstîtûta pêdagogiyêye ser navê Xaçatûr Abovyanda li fakûltêta(beşa) fîlologiyê-dîrokiyêda tê qebûl kirinê.

Kutasiya kûrsa yekêda xwendkar dibirine "xopanê"- Qazaxistanê, ku wir mehên havînê bixebitin. Stansiya Baskûnçakêda gava maşîne disekine, hevalava radivine ser vagonê. Paşê Fêrîk banzdabû erdê û lingê xwe gûzekêda şkênandibû. Mehekê mabû nexweşxana bajarê Baskûnçakê. Lê axiryê, hema gûzeka wî serma dikir-cî bi cî dêşya. Digo, wekî ciyê şkestinê wextêda pakî necebirandine.

Sala 1955-a rojnema "Rya teze" destpêkir derket. Axavtinên radîoyêye kurdî jî bûne herrojî. Heta kutakirina înstîtûtê rojnema "Rya teze"-da 22 helbest û gotarên Fêrîkê Ûsiv dertên. Şiyêreke wî "Ez û cimet" bi rûsî sala1958-a kovara "Dirûjba narodov"-da dertê (kovara "Dostiya cimeta",#9, Moskva), nivîsarêd wî radîoya kurdîda têne belakirinê. Sala 1957-a berevoka"Nivîskarêd kurdaye sovêtiyê"-da yanzde şiyêrêd wî çap dibin.

Sala 1960-î Fêrîkê Ûsiv înstîtûtê xlaz dike.

## KARKIRÊ RADÎOYÊ

Dîplom li cêvê
Berxvanê berê
Vedike derê
Radîokomîtê...
Para kurmancî,
Oh, dêmê tûncî:
Mîkaêl, Xelîl,
Memê û Hemo,
Egît û Emo,
Casimê Celîl.
Serekrêdaktor-
Xelîlê rûsor
Bi beşerek ferz

Datîne li ser
Îstola kêmber
Balola kaxez:
"Destê xwe donke,
Çevê me ronke
Bi tercimê baş..."

Fêrîk radîoyêda, para kurdîda tê kivşkirinê çawa serwêrê para edebiyetê.

Sala 1961-î kitêba Fêrîke pêşin -"Çevkanî" çap dibe. Ew ji aliyê xwendewanada rind tê qebûlkirinê. Ew hub û hisreta şayîr bû. Mîna çevkaniya zelal bû û şayîrtiya Fêrîke helal elam dikir. Wê salê jî berevoka "Efrandinêd nivîskarêd kurdê sovêtiyê"- da neh helbestêd Fêrîk çap bûn.

Radîoyêda Fêrîkê Ûsiv bi helalî dixebitî. Ewî rastgo bû. Qebûl nedikir qelpî, derewî, durûtî, nivîsarêd sist paşda dida, a bona wê yekê jî serekrêdaktorê berê dek-dolav li dora Fêrîk hunand, û ûsa kir, ku Fêrîk ji xebatê derxistin...

Fêrîk çendekî şûnda helbestêd xweye çapkirî û neçapkirî kire çelte û bir derê malê şewitand. Digo: "Kêra dinivîsim?"...

## SALÊD 1963-1968

Pey dûrketina ji xebata radîoyêra Fêrîk ber xwe diket. Ruhê wî rehetî nedidît.

Hecîyê Cindî Fêrîk kire xîretê, go:

- 250-î saliya şayîrê ermenyayî mezin Sayat-Nova gere bi şaynetî bê kivşikirinê. Were em berevokeke tercma hazir bikin,- pirtûka Sayat-Nova da Fêrîk, go, - kîjan helbesta tuyê tercmekî xwera bibjêre, yêd din jî ezê tercmekim.

Fêrîk xwend û tercme kir... klamkî sitra, tercmê xwe şande rojnema "Rya teze" û radîoyê. Bi tercmê Fêrîk kilamêd Sayat-Nova radîoyêda sitran. Paşê, payîza sala 1963-a, Fêrîkê Ûsiv tevî konkûrsa qedandina efrandinêd Sayat-Novaye baş bû.

Fêrîk helbest û terçmên xwe tim bi hostatîke mezin ezberî digot. Ev car başqe bû: gere ber jyûriya maqûl bixwenda, rind hazir dibû. Gere artîstêd ermeniye eyanra pêşda bihata. Hate elamkirinê, wekî helbestvanê kurdî cahil Fêrîkê Ûsiv wê şiyêra Sayat-Novaye "Tu hingêda aqilbendî" bi tercma xwe bixûne. Serayê bi hewaskarîke mezin li bejn-bala Fêrîk û bedewiya wî dinhêrî. Zef ker û lal, te tirê

kurmancî fem dikin, guh dane xwendina wî û pey xilazkirinêra dirêj, zef dirêj destê xwe lev xistin.

Fêrîk layîqî prêmiya (xelata) dereca sisya bû. Sedirê jyûriyê, artîstê mezin Avêt Avêtîsyam Fêrîk bimbarek kir, got:

- Ez gelekî bona tercma şiyêra Sayat-Nova û ezbergotina te firnaxim.

Hema wê salê jî berevoka şiyêrêd Sayat-Nova bi tercma Hecîyê Cindî û Fêrîkê Ûsiv hate weşandinê.

Wexta civîna para nivîskarêd kurda da Fêrîk çend tercmên xwe ji Sayat-Nova xwendin, yekî xwest emekê Fêrîk nuxsanke, got:

- Kilamêd Sayat-Nova nêzîkî ruhê mene, loma hêsa têne tercmekirinê.

Lê dîrokzanê ermeniyî mezin Morûs Hasratyan, wekî wê cvînêda hazir bû, go:

- Hêsaye hêsakirara, gotî Sayat-Novakî tezebî, wekî bi hostatîke usa tercmekî...

Ew şabûneke mezin bû bona Fêrîk.

Sala1964-a Fêrîk erza xwe da, wekî bibe endamê Yekîtiya nivîskara. Aha çi nivîsîbû helbestvanê ermenîyî mezin Hovhannês Şîraz derheqa Fêrîk da:

**"Demeke dirêje-dîna min lêye, çika çi nivîskarên teze têne dinyayê. Û vaye ne tenê nivîskarên ermenî, lê yên miletên mayîn jî bin kevira derdikevin wek kaniyên zelal, ku vê lepa axa kal-bavê me ermeniya sitirîne. Aha yek ji wana eve, yekî bi talant, xudanşuret Fêrîke, ku min bi xwe jê tercme kirîye.**

**Ez di wê baweriyêdame, wekî ew gelekî hêjaye, ku bibe endamê Yekîtiyê...**

**Hovhannês Şîraz, 1964"**

Û dîsa çevnebarî û mixenetiya hine "şayîra" Fêrîk gîhandin wê derecê, wekî xwexwe erza xwe paşda hilda... Û tenê pey deh salara, 1974-a ew bû endamê Yekîtiya nivîskara.

Salêd 1963-1967-a Fêrîk "Êbû-Ele Maharî" ya Av. Îsahakyan, "Msîrî" ya Lêrmontov, kerîkî ji tragêdiya Şêkspîr"Otêlo" weldigerîne ser zimanê kurmancî, 40-î zêdetir nivîsarên wî çap divin rojnemada. Sala 1967-a "Gula Elegezê", sala1 967-a jî pirtûka "Lîrîka" têne weşandinê.

Sala1968-a payîzê Fêrîkê Ûsiv hilgerya gund.

## GUNDDA

Fêrîk gundê Pampêda bû mamoste. Ewî dibistanêda fêrên (dersên) zimanê kurdî didan. Hevtê 2-3 roja gundda dima. Rojêd mayîn li Yêrêvanê bû, ji ber ku neferê wî bajêrda diman.

Sala 1969-a havînê çû bal birê xwe marza Svêrdlovskê, gundê Nakaryakovê, peyra-Moskvayê, Lênîngradê (S.Pêtêrbûrgê).

Salêd 1976-1980-î Fêrîkê Ûsiv bi proêkta xwe, tenê, tamek xwe û neferê xwera Pampêda çêkir. Dorê sûrek kişand, fêza sûrê jî axilê pêz çêkir. Ji hostatiya wî gund-gundîtî zendegirtî diman.

Ewî nivîsî:

...Û wextekê jî du rêncber wê bên,
Xwe bavên ber siya axilê minî şên:
"Hey gidî, -bêjin, - Fêrîkê rehmetî
Ser van tam-taşa çiqa zemet dî..."

Paşê çend berx, kar, mirîşkêd pir bedew û du golik xwey dikir. Ew avayê wî çêkirî û xweykirina heywanet jî, meriv digo, pareke poêziya wî bûn.

Sala 1973-a destana Fêrîk "Ûsivê Nevya" çap bû. Ew veçêkirineke beyt- serhatiya cimetêye tezeye û bi serecema xwe pir dewlemende. Vê poêmêda dîhar bûne karebûnêd şayîre lîrîkiyê, êpîkiyê û dramatîkiyê.

Fêrîk gilî dikir, çawa carekê ew teldê mala xwe, ber kuçkê kartola paldayî bûye: dinhêre du lawik ji aliyê kewşênva têne gund.. Pey silav-kilavara jê dipirsin:

- Gelo mala Fêrîkê Ûsiv kîjan tangêye?

Fêrîk divê: - Keremkin, pêşda werin, em van kartolê pijyayî bixun, paşê ezê wera bêjim.

Lawik tên, rûdinên ser şînkayê, çend kartola bi hewas tevî nanê loş loq dikin, dixun. Paşê razîbûna xwe elam dikin, îzinê dixwezin, wekî herin, Fêrîk bivînin.

Li wir Fêrîk divê:

- Eva mala Fêrîke, Fêrîk jî ezim.

Ewana zûr dibin –wî dinihêrin. Dibe pîrqîna wana, dikenin, xwe davên pêsîra wî, paç dikin. Gilî kiribûn, wekî xwe ji Tiflîsêne, hatine Camûşvana Çûk havîngê. Poêma Fêrîke "Ûsivê Nevya" xwendine, pir begem kirine, lema jî hatine Pampê- dîtina Fêrîkê Ûsiv.

Sala 1971-ê li Moskvayê, bi rûsî pirtûka "Hikyat derheqa Bar

Mûraz"-da destana Fêrîk "Xewna Mîrmeh" çap bû. Vira derheqa fikira fîlosofiya mirin û jîanê, dîalêktîka emirda tê gotinê.

Sala 1977-a, pey êpêce çetnayara, pirtûka "Narê" hate weşandinê.

## ÊVARÎYA ŞAYÎRE HOBÊLYANIYÊ

***Rojnema "Rya teze", 10-ê noyabirê sala1984-a.***

Navê şayîrê kurdî eyan Fêrîkê Ûsiv nava lîtêratûra kurdaye sovêtiyêda cîkî berbiçev digire. Berevokên efrandinêd wî zûva bûne xemla textê xwendewana. Şayîrê xweyê şureta mezin teql û akleke teze kire nava poêziya kurdaye sovêtiyê. Hema ji gavêd efrandarîêye pêşinda ewî nexş û awazêd şayîrtiyêye teze xwera anîn, kete nava "crîda" lîtêratûrayê, çawa sîyarê hespê Pêgasî khêl. Timtêl û xemla wî sîyarî çiqas çû-ber pencêd teva poêziyayê diha "vebûn-biriqîn". Û badilhewa nîne, wekî şayîr berevoka efrandinêd xweye pêşin navkir "Çevkanî", kîjanê rastî jî nava lîtêratûra kurdaye sovêtiyêda mînanî kaniyê kire bilqîn. Ava wê kaniyê çiqas çû- diha gur bû. Xwendinvana pêra-pêra texmîn kir, wekî şayîrê xweyê zên û merîfeta mezin tê nava lîtêratûrayê, yê ku xwera zingînya sîmêd tembûra şayîrtiyê tîne, gotina kîjanî yê mezin heye.

Derheqa riya Fêrîkê Ûsive efrandariyêye qedandî, talanta wîye şayîrtiyêda wê êvariya hobêlyaniyêda hate gotinê, ku çendekî pêşda bona 50-î saliya bûyîna wî li sera mala nivîskarêd Ermenîstanê derbaz bû. Wextê êvariyê, kû serwêrtiya Yekîtiya nivîskarêd Ermenîstanê teşkîl kiribû, şayîr û nivîskarêd ermenî û kurd, rewşenbîrêd me, xwendkar, maşoqêd poêziyayê berev bibûn.

Spîkêrê serwêrtiya Yekîtiya nivîskarêd Ermenîstanê nivîskar M. Sargsyan bi xeberdana sifteva êvarî vekir.

Derheqa emir û şuxulvaniya şayîre efrandariyêda nivîskar Babayê Keleş bi axavtin pêşda hat. Fêrîkê Ûsiv, ku tebiyetê hunur û talanta şayîrtiyêye mezin dayê, ewî got, gelek efrandinêd delal nivîsîne, saya kîjana şayîr layîqî hizkirina hemcimetiyê bûye.

Li kenarê ewî çemî, ku ji "Çevkanî"-ya enzel destpê bû, "Gula Elegezê"şîn bû. Şayîr vê berevokêda hîmlî li ser xezna zargotina cimeta meye dewlemend hîm bûye. Poêma "Xewna Mîrmih" efrandineke usane, li ku şayîr tomerîkirina fîlosofîyêye teze kirye, ew bi nexş-nîgarêd nuhva daye dewlemendkirinê.

Sala 1967-a berevoka şayîre sisya bi sernivîsara "Lîrîka" cap bû. Eva berevoka dereca teze bû nava efrandinêd wîda.

Berevoka "Lîrîka"-yêda talanta Fêrîkê Ûsiv dha "tîr" bûbû, fikira wî hê gihîştî bû û ese gotî bifirya. Û firî...Ew firîn bû xuliqandina poêma "Ûşivê Nevya", kîjan sertaceke efrandinêd Fêrîkê Ûsive. Eva poêma ser hîmê beyt-serhatiya zargotina cimetêye wî navî hatye nivîsarê.

Poêma "Ûsivê Nevya", ku aliyê çapa xweva efrandina şayîre lapa mezine, mecal da, wekî ew temamiya zoraya talanta xwe nişande. Pey wê poêmêra du poêmêd dinê jî nivîsî –"Rhana Reso" û "Hisret", ku bi navê "Hisretdefter" berevoka şayîr û nivîskarêd kurdêd sovêtiyê "Bahara teze"-ye 1984-ada çap bû. Nava van poêmada talanta şayîr bi şewqa teze biriqî, îlahî di dereca dîharkirina psîxologîya ruhê merivada.

Fêrîkê Ûsiv xweyê dilê bengîyî mezine. Nava efrandinêd wîda şiêrêd bi têma hub-hizkirinê gelekln.

Şayîr usa jî gelek efrandinêd şayîrê nav û deng bêqsûr tercmeyî kurdî kirîne: Şêkspîr, Bayron, Gyotê, Pûşkîn, Lêrmontov, Yêsênîn, Sayat-Nova, Av. Îsahakyan, Hov. Tûmanyan, ...

Êvariyêda doktorê ulmêd filologiye,profêsor Hecîyê Cindî, doktorê ulmêd dîrokê Şekroê Xudo, kandîdatê ulmêd filologiyê Çerkezê Reş bi axavtineke germ şayîr slav kirin... Wê şûnda, katiba komnehiya Aragasêye partiya komûnîstîêye duda Sîsa Husêyn, serwêrê para radîoxeberdanêd kurdî Ahmedê Gogê, dîrêktorê mekteba gundê Pampê(Sîpanê) Têmûrê Mîro û yêd din pêşda hatin û hobêlyar bimbarek kirin.

Paşê şayîr Fêrîkê Ûciv xeberda û razîbûna xwe da bona qedirgirtin û pir qîmetkirina emekê wî.

Para êvariyêye bedewetiyêda şiyêrêd şayîr hatine xwendinê, koma gûndê Camûşvanêye vokal-haceta û sazbend, dengbêjêd mayîn pêşda hatin."

Pey êvariyêra, sibetirê, Pampêda, mala Meksîmê birê Fêrîkda bira û pismama nan danîn, kêf kirin.

***

Fêrîk ruhmal bû: "Dilê min wire kîderê kalîn-pişkîna pêz tê..." Ewî her tiştê bedew- tebiyet bi çiya û banyava, mêrg û çaîrava, heywanetava, çivîkava hiz dikirin, heta berx, kar û mirîşkêd wî jî pir bedew bûn. Lê qîz û bûkêd bedew? Fêrîk zû bengî dibû... û şiyêrêd

xweye bengîtiyê dinivîsî...

Fêrîkê Ûsiv jiyana xweda pir hate zêrandinê. Ewî pesinê qeydê sovêtiyê û jîyana merivê sovêtiyê nedida...Pirtûkêd wî bi zore-zor û bi cefa çap dibûn. "Ew çi seqeme?", "ew çi derde?", "ewî çawa turiş kirye nivîsye, wekî dayîka kurde sovêtiyê naxweze mêrê wê here şêr...", "helbestên Fêrîk yê "ekisîsovêtiyêne", "eksîmorolîne"... Hey civînada derheqa van tiştada digotin, berevokên helbestêd wî paşda didan, şûnda dixistin, didane guhastinê...

Hemîn çevnebarî, ernûsî û nezaniya hineka jî alîkîda "kardikirin". Çerkezê Reş, ku xêrxazê Fêrîk bû, nivîsye "...û helbestvanekî mîna Fêrîkê Ûsiv, ku serdapê îsaf bû, dest neyara dizêriya..."

Û tenê mûsayê wî - hewasa nivîsarê, dihate hewara wî:

O, mûsa min, o, çara min...
Dema tu têyî hewara min,
Min tirê wekî Rostemê Zal
Ji minra dibe pişt û heval,

Lê wexta

Ax, mûsayêd min wexta ji min dûrin-
Fiqarekî bê piştovanim ez,
Wextê li dor min li hev difûrfûrin-
Qey hingê Rostem pelewanim ez...

Xwestinek wî ji Xwedê hebû –

Xaliq, xatirê navê xwekî,
Min hewcê meriyê nemerd nekî:
Te bîter kirye kul û birîn,
Tu bi xwe-xwe jî bicebirîn...

Fêrîkê Ûsiv derheqa axiriya nivîsarêd xweda wa difikirî:

Ax, dive binice
Çemê min van dera
Û neçe negîje
Tu okîan û bera...

Digo:

Mîna toxim direşînim pirsêd melûl ser kaxez,
Wê pey minra gûldin gelo bigihîjin, bibin rez?
Yan hêsirêd kesî serda wê nebarin wek baran
Û bêxeda wê birêzin, pûçbin, herin bê deng-hes...

***

Fêrîk selmyanekî miletê xwe bû:.

**Bra xwezil Kurdistana min şên bûya**
**Miletê min aza, xwendî û zên bûya...**

Ewî hiz dikir tevî kal û pîra seheta qisa bike derheqa walêt, koçerbûna wan, ji emirê berê. Û helbestên xweye hisretê û welatparêziyê dinivîsîn, çawa " **Mistefa Barzanîra**", "**Xûna miletê min**", "**Kurdistan**", "**Kurê minra**" û yêd din.Ewî wek yekî rê unda kirî, bi hisreta kûr digo:

**Kurdim, kuyî Kurdistan,**
**Wey dîl û bindesta min ...**

Piştira nivîsî:

**KURÊ MINRA**

....Dibe rokê Kurdistana xopan vebe,
Bavkê teyî hisret dil da lê tunebe.
**Bira hinge lingê te bi hisreta min,**
**Bigere nav ax-topraxa cimeta min.**

Halê Kurdistanê, bindestî û perçe-perçe bûna wê ji nexaşiya jî zortir Fêrîkê Ûsiv dizêrandin û dil- hinavê wî şayîrê nazik dêşandin...

3-ê gulana sala 1997-a pey nexweşiya giran ra, 63 saliya xweda, şayîrê emirhiz xatirê xwe ji cihana ronik xwest...



Bi xwestina Fêrîkê Ûsiv ew Sîpanêda, berpala çiyayê Dibûrî hate defnkirinê, weke wî dixwest:

...Ku batan kerî, batana sûrî
Dora tirba min çiyayê Dibûrî –
Hingê ruhê min-berxvanê berê,
Hêlbiya hisreta xubara qebrê,
Tevî kerê pêz ji çiyayê bilind,
Êvara bata belabya nav gund...

**Firîda Hecî Cewarî**

# FERHENGOK

**Avtor** –(rûsî) xudan, nivîskar
**Akûşke**- pencere
**Andrê** – Andrêy Nîkolayêv, kosmonavtê rûs
**Vostok**- navê gemiyê kosmosê
**Gagarîn Yûrîy** – kosmonavtê sovêtêyî pêşin
**Gêrman Tîtov** – kosmonavtê sovêtê
**GDR** – komara Almanyayêye Dêmokratîke berê
**Davan** – navê çiyakî li rex gundê Sîpanê
**Dersdar** – mamosta
**Dewsgirtî** –cîgir
**Dibûrî** –navê çiyakî li rex gundê Sîpanê, kîjan ciyê dayîk bûyna Fêrîkê Ûsive
**Egrîdax**- çiyayê Masîs
**Êlbrûs**- navê çiyakî Kavkazê
**Întêrvyû** - hevpeyivîn
**Infarkt** – qulbûn, teqîna dil
**Kabak**- (rûsî) ciyê nanxwerinê
**Katarazû** – kizîr, telal
**Kazbêk** – navê çiyakî Kavkazê
**Kodêks** – (rûsî) pirtûkê qanûna, zagûna.
**Lîtêratûra**- edebiyet
**Lêrmontov** – Mîxayîl Lêrmontov, helbestvanê rûsayî mezin (1814-1841)
**Maşîne**- trên
**Mekteb** – dibistan
**Mexulqet** - civak
**Mûsa** – di nav mîtolojîya hûnanada xudaya parêzera zanyariyê û hunermendiyê, ruhdarbûna efrandariyê, kaniya ruhdarbûnê
**Nakaryakovo** – gundekî li Rûsyayê
**Narêkasî**– Grîgor Narêkasî (951- 1003) helbestvanê ermenîyî meşûr
**Nehî**- navçe
**Palat** –koçik û sera
**Pilanêt** –(rûsî) heyetiyên qinyatiyê li ezmana (mars, yûpîtêr, topa dinyayê û yêd mayîn), kewket, seyare
**Pûşkîn** – Alêksandir Pûşkîn, helbestvanê rûsayî mezin (1799-1837)
**Post** –(rûsî) tebî, ciyê nobedaryê
**Popovîç** – kosmonavtê rûs
**Rasûl** – Rasûl Hamzatov, helbestvanê avarayî mezin (Daxistan, Rûsiya), sala 1923-a ji dîya xwe bûye
**Rewan** – Yêrêvan
**Sayat - Nova**- (1722-1795) – şayîr-aşiqê ermenîyî mezin. Sala 1963-a bi wergera Hecîyê Cindî û Fêrîkê Ûsiv berevoka helbestên wî bi kurdî li

Yêrêvanê hatye weşandinê.
**Sêrgêy - Sergey Yêsênîn**, helbestvanê rûsayî mezin (1895-1925)
**Sedir**-serok
**Sovxoz** – (rûsî) malhebûna sovêtîyê
**Sîbîr** – Rûsya rojavara dibêjin
**Şîlo**- sîlîndir (rûsî) currekî kuma
**Tarîq** – dîrok
**Talant**- merîfeta mezin
**Tayga, tûndra** –(rûsî) navên daristanên Sîbîryayê
**Tercime** – welger
**Teşkîlkirin**- amadekirin
**Têrêşkova** – Valentîna Têrêşkova, kosmonavta rûs
**Troyka**- (rûsî) xizeka sê hespa
**Xebat – kar**
**Hevtêmanat**- navê çiyakî li rex gundê Sîpanê
**Hobêlyan**- sersala mirovekî yanê jî bûyerekê
**Hovhannês Şîraz** (1914-1984) –şayîrê ermenyayî mezin.
**Ûrisêt** –Rûssiya
**Ulm** – zanyarî
**Fîrdûsî** (940-1030) –şayîrê îranêyî herî mezin. Xudanê destana îraniye here mezin "Şahnamê".
**Firinde** – balafır
**Xopan** –qirac
**Çîngîz** – Çîngîz Aytmatov, nivîskare kîrgîzayî eyan, sala1928-a ji dîya xwe bûye. Aysûle, Îsîka, Akbar, Boston, Saygak, Tanabay, Gulserî, Ana-beyt – nîgarên romana nivîskarê qirqiz Çîngîz Aytmatove "Daraqac"
**Çarlisto** – cûrê lîstikê
**Çobangelmes (Çobanmaz)** –navê gundekî kurdayî li Ermenîstanê (naha Avşên), nêzîkî gundê Sîpanê
**Cimet** – gel
**Şayîr**- helbestvan
**Şêf** -serok
**Şiyêr** – helbest
**Şulet** –miletê mayîn, vira –ermenî
**Şoş** – rê
**Şofêr**- avtoajo
**Qemerdax**- navê çîyakî li rex gundê Sîpanê
**Qûç** – navê çîyakî li rex gundê Sîpanê
**Qurne** - sedsal

## NAVEROK

Gulîzera min ..... 5
Qazê ..... 5
Gozel ..... 5
Zeriyê zenda ..... 6
Xwezil, xwezil ..... 6
Ez bûm kanî ..... 7
Lawikê min çû ..... 7
Pampa min ..... 8
Dengê Şero ..... 9
Adar go ..... 9
Agirê hubê ..... 10
Were kaw-kubara min ..... 10
Êvara adarê ..... 10
Agir barî ..... 11
Ez û cimet ..... 12
Gundê min ..... 12
Di nav koma qewim û bira ..... 13
Qemerdax çiyakî ..... 13
Ezê ravim mîna Mîrmeh ..... 13
Zerê-Zoro ..... 14
Ava gurr tê ..... 14
Mîna çem ..... 15
Bona bîranîna Etem ..... 16
Dîsa were yar keçikê ..... 16
Ew porê te reş ..... 17
Cahiltiya min ..... 17
Dewata tebiyetê ..... 18
Beranê qerqaş ..... 18
Payîza geş ..... 19
Ber bi ezman ..... 20
Nîkolayêv-Popovîç ..... 21
Gulnaz, wekî ..... 22
Te bîr nakim ..... 23
Xewin û mital ..... 23
Elegeza min ..... 24
Şeva Xidirneviye ..... 24
Îşev dîsa ..... 25
Wextê beranberdanêye ..... 25
Kilama min ..... 26
Sirsûmê diya mine ..... 27
Çivîkêd xapokin ..... 27
Şêlû nekin ..... 28
Sovêt ..... 29

Kurmanciya min ..... 29
Xêrî kilamim ..... 31
Keskesorê rengê teme ..... 32
Te go ..... 32
Reş li xweke ..... 33
Gulnaz ..... 33
Şayîrtiya min ..... 34
O, çi ediliye ..... 34
Vê êvarê ..... 35
Eîgrdax dûr ..... 35
Ezmanê bi steyr ..... 36
Çi rinde ev mêrga ..... 36
Qelîbotka Pampê ..... 37
Sayat-Novara ..... 38
Dîsa xewa ..... 39
Derdê ewira ..... 39
Herê bê guro ..... 39
Heta sivê ..... 40
Kurê minra ..... 40
Ez dihelim ..... 41
Xûna miletê min ..... 41
Cimeta min ker-kerî ..... 43
Teyare, dayne ..... 43
Ser mezelê dengbêj ..... 43
Hevalcêwiyê min ..... 44
Qurbana webim ..... 44
Fêza ewirada ..... 44
Sed qîz û bûk ..... 45
Îkiram ..... 45
Şayîr ..... 45
Dilê kurr ..... 46
Heykel ..... 46
Deng-ceng ..... 47
Bedewa gund ..... 48
Min ramûsa ..... 48
Îşev ber derê teme ..... 49
Kanên werdekên gundê me? ..... 49
Qulingêd berriyê ..... 51
Dikim çevê te ramûsim ..... 52
Tu merd were ..... 52
Min mîna aşiqê kor ..... 52
Koriyo dilo ..... 53
Beyt ..... 53
Çi çikûzî ..... 53

Deyn ... 54
Bera xwezil ... 55
Kurdistan ... 55
Dengê Arif ... 56
Dinya bere ... 56
Gundê me ... 56
Ez nafroşim ... 57
Zefî hiz dikim ... 57
Mîna toxim ... 58
Şeve sayîye ... 58
Hewa xweş bû ... 58
Bext ... 59
Gelî çiya ... 59
Wextê dagêrêye ... 60
Çiyayêd payîzê ... 61
Wê got ... 62
Keçikê qurba ... 62
Tu dîn, îman ... 63
Kafir ... 63
Heyr-hijmekarî ... 64
Dil ji min bir ... 65
Gul perîke ... 66
Tu çûyî, çûyî ... 66
Delala min ... 67
Pez ... 68
Duman dibûrya ... 68
Şevêd havînêye ... 69
Mem û Zîn (pêşxeber) ... 69
H. Cindîra ... 70
Bager ... 70
Bedewa gund ... 71
Na, heye isaf ... 71
Dinihêrim dayîka xwe ... 72
Erê, lawo ... 72
Dewatiyê dîlbend ... 73
Mîna xwebe ... 76
Bahare, şayîr ... 77
Va min hemkirye ... 78
Cênîk ... 78
Demaxatirî ... 78
Min pêz didot ... 79
Rindê ... 79
Fîrdûsiyê mezin ... 80

Bahara min ........ 81
Elegez ........ 82
Sûretsûfê ........ 82
Remel çûyê webe ........ 82
Êy xêvê dil ........ 83
Hema hevkî ........ 83
Dewat ........ 83
Bavê min - Ûsivê Ivora ........ 85
Bona dayîka min ........ 86
Tuk digrîyî ........ 86
Sal hate salê ........ 87
Dema heçê çiya ........ 87
Vê şevê quling ref-ref ........ 87
Çendik û çend sal ........ 88
Kurd xerîbdoste ........ 90
-Hinek hene ........ 91
Şev-mişev ........ 91
Usa min dixwest ........ 92
Ez bimirim ........ 92
Gelek fort û çêr ........ 92
Bikin toz û fisildûman ........ 93
Hûn usa min nenihêrin ........ 93
Hîveron ........ 94
Ev şev şeva hîveronê ........ 94
Wext tê ........ 95
Berê çembya ........ 95
Mirin û mayîn (Şikoyê Hesenra) ........ 96
Şera zer ........ 96
Li zeviya emir ........ 97
Pîrka mine rem ........ 97
Ji rojêd buhurî ........ 98
Odê kevin ........ 98
Dîsa gulan geliyara hat ........ 99
Pûpû ........ 100
Vê şeva şîrin ........ 100
Min bîra havînê ........ 100
Hecîyê Cindîra ........ 101
Siva zivistanê ........ 102
Mistefa Barzanîra ........ 103
Ji ewê rojê ........ 104
Ida "qirix" hilatiye ........ 104

O, mûsa min ... 105
Porr û pencê ... 105
Ji hisreta çiyê ... 105
Mînanî deravê baharê ... 105
Nedin min ... 106
Min çêkirin ... 107
Qurbana tamê xwe ... 107
Û rabilalem ... 107
Mal-neferê min ... 108
Xaliq daxa poşmanbûnê ... 108
Methê dîndara te ... 108
Min dîtin qesir ... 109
Tîrinca tevê ... 109
Mînanî bezê ... 110
Selam ... 111
Û bere-bere ... 111
Şiklê Araksyayê ... 111
Şivano ... 112
Badilhewa ... 112
Erdî sipiye ... 113
Wezîrê Nadirîra ... 113
Îboyan ... 114
Dinya, tu çiqas bedewî ... 115
Bin hîveronê ... 115
Dayîk û tendûr ... 117
Kesek Pampêda ... 117
Nara minra ... 118
Û naha-naha ... 118
Metel nemînin ... 119
Seqem ... 120
Derva teveke ... 120
Zarotiya min çû ... 121
Li ser çiyayê Qemerdax ... 122
Destana jiyanê ... 122
Em hê gerek ... 127
Havînê Pampê ... 127
Edilî bîna bagerê ... 128
Roj mîna rojê ... 128
Tu gul-sosina gundê me ... 129
Wexta şaya min kirin ... 129
Hiz nekiriye ... 129

Payîza emir ........ 129
Gere tû bikim ........ 130
“Ew mamosta meye ........ 130
Esirê mînanî ........ 131
Tevekêd lazûr ........ 131
Ser mezelê diya min ........ 132
Mîkaêlê Reşîdra ........ 132
Gund bû ........ 134
Diçim gund ........ 134
Bizanbe ........ 134
Heyamek heye ........ 135
Carina ........ 135
Keçê vî gundî ........ 136
Navê te ........ 137
Nazgula gunda ........ 137
Pampiya koç dikin ........ 138
Bal Resûl ........ 138
Emê jî herin ........ 140
Xaliq, tu xatirê navê xwekî ........ 141
Êvar ........ 141
Hê bengî dibim ........ 142
Ne ewe bêm ........ 143
Dixwezim defekê ........ 143
Ez nahêlim ........ 144
Ecêvin şayîr ........ 145
Her tişt buhurî ........ 146
Hûn ne bi qerfa ........ 146
Nizanim emirê ........ 147
Zid bûme ........ 147
Dilê min dêşe ........ 148
Ezî betbextim ........ 148
Çerkezê Reşra ........ 149
Tu wisa rindî ........ 149
Na, hekîma min ........ 149
Ev der îro ........ 150
Nexweşî ........ 150
Du cahilê rind ........ 151
Bahare kimkimye ........ 152
O, hêsiyêd hêşîn ........ 152
Bilûrvanê jîr ........ 153
Xas-xatûna kurmanciyê ........ 153

Çawa mesîkî ........ 154
Svêtayêra ........ 154
Qîza qewimê mine ........ 156
Pismama minra ........ 156
Çiqa dibhurim ........ 157
Bi lêvêd lerzok ........ 158
O, hucet mekin ........ 158
Wey li xezev dinê ketê ........ 158
Şînê şaynetî ........ 159
Daxistan ........ 159
Mêzekin halê miletê kurd ........ 161
Neyarên mera ........ 162
Gul şîn nabin ........ 163
Dêrê qawereng ........ 163
Û zûda-zûda ........ 163
Ez xwey dikim ........ 164
Erdheja atav ........ 165
Dibûrdax ........ 165
Birrê ewira ........ 166
Dilê min li wire ........ 167
Ax, vira xaniyê ........ 167
Xatirê xwedêkî ........ 168
Navê hezara ........ 168
Hobêlyan kirin ........ 168
Dibûrîme ez ........ 168
Xaliq, tu gelek ........ 169
...Betilîme ez ........ 169
Bêxewî ........ 169
Rojêd emirê min ........ 170
Temî ........ 171
Vî serîda ........ 171
Mêrê Firîda Hecîyêvnayê ........ 172
Huso ........ 172
Cote gundiyê ........ 173
Nav şîrinê ........ 174
Gerê gundê me ........ 174
Gula pêşa palê ........ 174
Te zanibû Dibûr ........ 175
Çivîkêd zivistanê ........ 175
H. Cindî ........ 176
Serê pêsekiniya ........ 176

Asiya orte....... 177
Asê....... 179
Ewirada vêsyan....... 179
Ka "xamê Resûl?" ....... 180
Hekîmî Loqman....... 180
Gulnazêra....... 182
Tu bahar bûyî....... 182
Ruhêm helyaye....... 182
Kanên ew dîdem....... 183
Cêrga kermê pêz....... 183
O, tu dijminê....... 184
Firîcêra....... 185
Birê min-Hemora....... 185
Ey kurdê keleş....... 186
Kilama kurdî....... 186
Bi methû-sene....... 187
Li mêrga Feyo....... 187
...Ez evdalekî....... 188
Çînara çuxreşî....... 189
Feqîyê Teyra....... 189
Na, qudûm tune....... 191

Helala minra....... 191
Çaxê axê ez bûm mêvan....... 192
Ez kalim....... 192
Gazin....... 192
Ez ku mirim....... 193
Poêma biçûk....... 193
Zerêra....... 195
**DESTAN**
Ûsivê Nevya....... 196
Hisret....... 246
Hubê xwedêhiz....... 283
Rihana Reso....... 293
Rizayê kurmet....... 317
**Ji rûpêlên jiyana Fêrîkê Ûsiv**....... 328
Ferhengok....... 339

## BERHEMÊN FÊRÎKÊ ÛSIV

1. Çevkanî, Yêrêvan, 1961.
2. Gula Elegezê, Yêrêvan, 1964.
3. Lîrîka, Yêrêvan, 1967.
4. Ûsivê Nevya, Yêrêvan, 1973.
5. Narê, Yêrêvan, 1977.
6. Hisretdefter, (di berevoka Baharda, hej.3), Yêrêvan, 1984.
7. Dinya delal, (di berevoka Baharda, hej.6), Yêrêvan, 1987.
8. Hîveron, Stockholm, 1993.
9. Hisret, Yêrêvan, 2004, piştra - Êrbîl 2004.
10. Gahavêj arvî apîn (Ber ava gurr), berevoka helbesta bi zimanê ermenkî, Yêrêvan, 2004.
11. Destan, Yêrêvan, 2005, piştra- Êrbîl 2006.
12. Bera ber deriya, berevoka wergera, Yêrêvan, 2006.
13. Kerdîga kilama, Yêrêvan, 2007.
14. Berevoka berhema, cilda I-ê, Yêrêvan, 2008.
15. Berevoka berhema, cida II-a, Yêrêvan, 2008.
16. Berevoka berhema, cilda III-a, Yêrêvan, 2009.
17. Pampa min, berhemên bona zarokan, Yêrêvan, 2009.
18. Bijare, Yêrêvan, 2010.

FÊRÎKÊ ÛSIV

# BIJARE

Pirtûk amade kir
FIRÎDA HECÎ CEWARÎ